

KT

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**LÊKOLÎNEKE FOLKLORÎ
LI SER DESTANA MEM Û ZÎNÊ**

Hikmettin ATTI

10711021

Şêwirmend

Prof. Dr. Kadri YILDIRIM

Mardin 2013

KT

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**LÊKOLÎNEKE FOLKLORÎ
LI SER DESTANA MEM Ê ZÎNÊ**

Hikmettin ATTI

10711021

Şewirmend

Prof. Dr. Kadri YILDIRIM

Mardin 2013

JI BIRÊVEBERIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ RE

Ev xebat ji aliyê jûriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de wekî teza lîsansa bilind hatiye pejirandin.

(îmze)

Serok :.....

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

(îmze)

Endam :.....

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

(îmze)

Endam :.....

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

(îmze)

Endam :.....

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

(îmze)

Endam :.....

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku îmzayên jorîn ên endamên perwerdeyê yên navborî ne.

Îmze

.....

Unvanê Akademîk, Nav-Paşnav

Birêveberê Enstîtûyê

(Mor)

T. C.
Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili Ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

MEM Û ZÎN DESTANI ÜZERİNE
FOKLORİK BİR İNCELEME

Hikmettin ATTI

10711021

Tez Danışmanı
Prof. Dr. Kadri YILDIRIM

Mardin 2013

LÊKOLÎNEKE FOLKLORÎ

Hikmettin ATTI

Mardin 2013 Teza Lîsansa Bilind

LI SER DESTANA MEM Û ZÎNÊ

10711021

LÊKOLÎNEKE FOLKLORÎ

LI SER DESTANA MEM Û ZÎNÊ

Hikmettin ATTI

KURTE

Di vê tezê de me di çarçoveya prensîbên zanyariya nûjen ên folklorê de, li peywendiyên di navbera berhema folklorî ya bi navê Memê Alan û berhema nivîskî ya Ehmedê Xanî ya bi navê *Mem û Zîn*, kola. Di teza xwe de me ji bo Destana Memê Alan a folklorî, diwanzdeh (12) varyantên cuda ku di pirtûka Qanatê Kurdo ya bi navê *Mem û Zîn* de hatine berhevkerin û *Memê Alana* Roger Lescot esas girtin. Ji van diwanzdeh varyantên ku di pirtûka navborî de derbas dibin, yek jê ji ber ku bi zaravayê soranî ye (ji ber pirsgerêkên muhtemel ên zaravayî) me ew li derveyê xebata xwe hişt (Varyant 12). Yek jê jî ji ber ku bi tevahî wekî kopiyeye *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî ye (Varyant 3), me ew jî li derveyê xebata xwe hişt. Ji bo *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî jî me wergera Prof. Kadri Yıldırım a bi navê, *Mem û Zîn, Çeviri ve Kavramsal Tahlili*, esas girt. Her wiha digel zimanê wê yê otantik, me beranberî her rêzikên *Mem û Zîna* Xanî, wergera wê ya bi kurdiya îroyin jî li hember wê nivîsand. Ji bo vê jî me wergera Jan Dost, a bi navê *Mem û Zîn, Şîrove û Kurdiya Îro*, esas girt.

Teza me ji destpêk û ji sê beşên bingehîn pêk tê. Di destpêkê de me bi giştî xwest ku em derbarê zanyarî û termînolojiya folklorê de hin agahiyan bidin.

Di beşa yekem de, me di navbera varyantên navborî û *Mem û Zîna* Xanî de, li gorî çend epîzotan (beşan) muqayese kir. Di vê muqayeseyê de, heta ji dest hat, me xwest ku em hemî prosesa destanê li gorî varyantên cuda û *Mem û Zîna* Xanî bidin. Bi vê yekê armanca me ew bû ku, em xalên hevbeş (muhtemel e ku di destanê de xalên herî kevnar bin) ên di navbera Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî de tesbît bikin û nîşan bidin û li têkiliya aktîf û dualî ya di navbera Memê Alana folklorî û *Mem û Zîna* Xanî cardî şahidî bikin.

Di beşa duyem de, me di çarçoveya avahîsaziya motîfan de (motif structure), li Memê Alana folklorî û *Mem û Zîna* Xanî kola. Di vê beşê de, em di binê sê sernavan de li ser her motîfê xebitîn. Yek jê; bi giştî di nava folklorê de nirxandina wê motîfê,

ya diduyan; di varyantên Memê Alana folklorî de nirxandina heman motîfê û ya sisêyan jî; di *Mem û Zîna* Xanî de tezahura wê motîfê. Di vê beşê de me di tesbît û tesnîfa motîfan de, xebata navdar a Stith Thompson a bi navê *Motif Index of Folkliterature* (Indeksa Motîfên Wêjeya Gel) esas girt. Di tesbîtkirina motîfan de me bi giranî, li hevbeşiya motîfî ya di navbera *Mem û Zîna* Xanî û Memê Alana folklorî nihêrî. Lê di xebata xwe ya li ser her motîfê de, me di destpêkê de ew motîf bi giştî di nava folklorê de nirxand û bi taybetî di Memê Alana folklorî de çawa derbas dibe tesbît kir. Dûre di *Mem û Zîna* Xanî de bi çî rengî derketibe pêş me, me ew nîşan da. Her wiha di vê beşê de, me xebata Zeynelabidîn Zinar a bi navê *Di Çanda Kurdî De 37 Şaxên Zanistiyê* jî esas girt. Di vê xebatê de, xalên hevbeş ên çîroka kurdî (133 xalên hevbeş) ku bi xebata me ya motîfan re têkildar derketibin pêş me, me şîrove û pênaseyên Zinar jî dan.

Di beşa sêyem de, me ji aliyê Hêmanên Çanda Gel ve li *Mem û Zîna* Xanî kola. Di vê beşê de me bi tenê *Mem û Zîna* Xanî esas girt. Ev hêman bi vî rengî ne: Hêmanên dînî-bawerî, çanda şîn û şahiyên, (Newroz, nêçîr, dawet, şîn û hwd), hêmanên hekîmiya gel, muzîk û leysitikên gelêrî.

Di dawiyê de, di beşa encamê de me tesbîtên ku em gihaştinê dan.

Di vê tezê de me sê rêbazên cuda bi kar anîn. Yek jê Muqayese; ji vê rêbazê mebest, tesbîtkirina xalên hevbeş û yên cuda di navbera varyantên Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî de ye. Ya duyem lêkolîna li ser avahîsaziya motîfî ya Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî ye ku ev rêbaz di salên dawîn de, di xebatên zargotinê de wekî rêbazeke nûjen bêhtir derketiye pêş. Ya dawîn, wekî rêbazeke klasîk, lêkolîna li ser *Mem û Zîna* Xanî ji aliyê hêmanên çanda gel ve ye.

MEM Ū ZİN DESTANI ÜZERİNE

FOLKORİK BİR İNCELEME

Hikmettin ATTI

ÖZET

Tezimizde modern Folklor biliminin prensipleri çerçevesinde, halk edebiyatı ürünü olan Memê Alan Destanı ile yazılı bir eser olan Ehmedê Xani'nin Mem u Zîn'i arasındaki ilişkiyi inceledik. Tezimizde halk edebiyatı ürünü olan Memê Alan Destanı için, araştırmacı yazar Qanatê Kurdo'nun, *Mem û Zîn* adlı eserinde toplanan oniki (12) varyantı ve Roger Lescot'un *Memê Alan* adlı derlemesini esas aldık. Qanatê Kurdo'nun eserindeki oniki varyantan birisi, kürtçe'nin sorani lehçesiyle kaydedildiği için, doğabilecek muhtemel lehçe ve anlaşılma sorunlarından dolayı bu varyantı (Varyant 12) değerlendirmemizin dışında tuttuk. Bir diğer varyant da (Varyant 3), Ehmedê Xani'nin Mem u Zîn'inin bir kopyası niteliğinde olduğu için onu da değerlendirmemizin dışında tuttuk. Ehmedê Xani'nin Mem û Zîn'i için, Prof. Kadri Yıldırım'ın, *Mem û Zîn, Çeviri ve Kavramsal Tahlili*, adlı çalışmasını esas aldık. Bunun yanında her Mem û Zîn'in orijinal beyitinin karşısında günümüz kürtçesiyle çevirisini de verdik. Günümüz kürtçesine çevirisinde, Jan Dost'un, *Mem û Zîn, Şîrove û Kurdiya Îro* (Mem û Zîn, Yorum ve Bugünün Kürtçesi ile) adlı çalışmasını esas aldık.

Tezimizi, Giriş bölümünün dışında, üç anabaşlık altında hazırladık. Giriş bölümünde genel olarak Folklor bilimi ve terminolojisi hakkında kısa bilgiler vermeye çalıştık.

Birinci bölümde, yukarıda bahsettiğimiz Memê Alan varyantları ile Xani'nin Mem û Zîn'i arasında birkaç epizota göre mukayese yaptık. Bu mukayesede mümkün olan en üst seviyede, destanın bütün süreçlerini değişik varyantlara ve Mem û Zîn'e göre vermeye çalıştık. Bunu yapmakla amacımız; Memê Alan ile Mem û Zîn arasındaki ortak noktaları tesbit etmek (ki muhtemelen bu ortak noktalar aynı zamanda destanın en eski pasajları idiler) ve göstermek ve aynı zamanda Memê Alan ile Mem û Zîn arasındaki aktif ve iki taraflı geçişlilik ilişkisine dikkat çekmek.

İkinci bölümde, motif yapısı çerçevesinde, folklorik Memê Alan ile Xanî'nin Mem û Zîn'ini inceledik. Bu bölümde tesbit ettiğimiz her motifi üç ana başlıkta değerlendirdik. İlk olarak, bu motifin genel olarak halk edebiyatındaki yerini ve önemini değerlendirdik, ikinci olarak; bu motifin Memê Alan Destanı'nda karşımıza nasıl çıktığını değerlendirdik ve son olarak; motifin Xanî'nin Mem û Zîn'indeki yerini tesbit ettik. Bu bölümde motiflerin tesbitinde, Stith Thompson'un ünlü *Motif Index of Folkliterature* (Halk Edebiyatının Motif İndeksi) adlı çalışmasını esas aldık. Motifleri tesbit ederken ağırlıkla, Memê Alan ile Mem û Zîn arasındaki ortak motifleri bulmaya gayret ettik. Her motifi incelediğimizde, o motifin genel olarak Halk Edebiyatı içindeki yerine dikkat çektik ve özelde Memê Alan Destanı'nda nasıl karşımıza çıktığını inceledik. Ve sonra aynı motifin, Xanî'nin Mem û Zîn'inde, nasıl geçtiğine baktık. Bu bölümde aynı zamanda, Zeynelabidin Zınar'ın, *Di Çanda Kurdî De 37 Şaxên Zanistiyê* (Kürt Kültüründe Bilimin 37 Dalı) adlı çalışmasını da esas aldık. Bu çalışmada kürt masalında tesbit edilen ortak noktalardan (133 ortak nokta), çalışmamız ile ilgili olanlardan faydalanmaya çalıştık.

Çalışmamızın üçüncü bölümünde, Xanî'nin Mem û Zîn'ini, halk kültürü unsurları bakımından inceledik. Bu bölümde sadece Xanî'nin Mem û Zîn adlı eserini esas aldık. Bu halk kültürü unsurlarını, dini-inançsal unsurlar, yas ve şölen gelenekleri (Newroz, Av geleneği, Dügün merasimi, Yas geleneği vb.), halk hekimliği geleneği, müzik, halk oyunları gibi çeşitli başlıklardır

Sonuç bölümünde kısaca ulaştığımız bazı sonuçları verdik.

Tezimizi üç ayrı bölümünü, üç ayrı metodla inceledik. Birincisi Mukayese yöntemidir. Bu yöntemden amaç; Memê Alan varyantlarının kendi içinde mukayesesi ve Mem û Zîn ile ortak noktaları ve ayrışan yanlarını tesbit etmektir. İkinci yöntemimiz; motif yapısı bakımından incelemek. Bu metod halk edebiyatı araştırmalarında son zamanlarda modern bir metod olarak ön plana çıkmıştır. Bu bölümde Memê Alan ile Mem û Zîn'de geçen ağırlıkla ortak motifleri tesbit edip inceledik. Üçüncü yöntem olarak, bir klasik yöntem olan, ve halk edebiyatı araştırmalarında genelde halk kültürünün maddi ve manevi unsurlarını ön plana çıkarıp inceleyen yöntemdir. Üçüncü bölümü bu yöntem ışığında Xanî'nin Mem û Zîn adlı eserinde uyguladık.

A FOLKLORIC REVIEW

ON MEM Û ZİN EPIC

Hikmettin ATTI

SUMMARY

In this thesis, within the frame of the principles of the folklore, we studied the epic of Memê Alan and compared it with the Mem û Zîn of Ehmedê Xanî. For the epic of Memê Alan, we have selected twelve (12) different variants that were collected by Qanatê Kurdo under the title of *Mem û Zîn* and Roger Lescot's work named *Memê Alan*.

From variants, we have dropped two because, one was in the kurdisch soranî dialect (Variant 12) and the other (Variant 3) was just a copy of Xanî's Mem û Zîn. For Xanî's Mem û Zîn, we have preferred Prof. Kadrî Yıldırım's work, entitled *Mem û Zîn, Translation and Conceptual Analysis*. For each couplet of the original Mem û Zîn, we have given the translation of original passages in today's kurdisch. For this, we have preferred Jan Dost's work, named *Mem û Zîn, Comment and With Today's Kurdish*.

We have organized the thesis in three chapter. In the intorductory section we explain the terminology of folklore.

In the first chapter, we have compared the folkloric Memê Alan's variants with each other and with Xanî's Mem û Zîn, under a few episodes. In this chapter we have tried to give the whole process of the epic at the highest level as far as we could. With this, we aimed to find common features shared by the folkloric variants and Xanî's Mem û Zîn (that are probably the oldest passages of the epic), and observe to the active and double-sided relation between Memê Alan and Mem û Zîn.

In the second chapter, we have examined the variants of Memê Alan and Xanî's Mem û Zîn, within the framework of the motif structure. We have examined each motif under three point: generally in folk literature, and in the Memê Alan epic, at last especially in Xanî's Mem û Zîn. For the determination and the classification of motifs we have preferred Stith Thompson's famous work, entitled, *Motif Index Of Folkliterature*. In addition to this we have taken advantage of Zeynelabidîn Zinar's work, entitled, 37

Branches Of Science In Kurdish Culture. In this work, Zinar has identified 133 common point of kurdish tales.

In the third chapter of the thesis, we have worked wholly on the elements of folk culture in Xani's Mem û Zîn. These were: elements of religious-beliefs, the mourning and feasting traditions (Newroz, the tradition of hunting, the wedding ceremony, the mourning ceremony etc.) the elements of folk medicine, music and folk dances.

In the end, we give a summary of the conclusions reached.



NAVEROK

KURTE.....	III
ÖZET.....	V
SUMMARY.....	VII
NAVEROK.....	IX
PÊŞGOTIN.....	XV
KURTEBÊJE.....	XVI

DESTPÊK

1. FOLKLOR.....	1
1.1. Efsane.....	5
1.2. Destan.....	8
1.3. Çîrok.....	10
1.4. Çîrokên Gelêrî.....	14
1.5. Folklor û Edebiyat.....	20
1.6. Di Folklorê De Motîf.....	22
2. Rê û Rêbazên Ku Me Di Tezê De Şopandine.....	27

BEŞA YEKEM

1. LI GORÎ ÇEND EPÎZOTAN MUQAYESEYA MEMÊ ALANA FOLKLORÎ Û MEM Û ZÎNA EHMEDE XANÎ.....	29
1.1. Mekan û Statuya Civakî ya Mem û Zînê.....	31
1.2. Hevdîtina Ewil a Mem û Zînê.....	37
1.3. Gihaştina Hev a Mem û Zînê.....	51
1.4. Mirina Mem û Zînê.....	59
1.5. Kuştina Bekoyê Ewan.....	65

BEŞA DUYEM

2. LÎ GORÎ AVAHÎSAZIYA MOTÎFAN MUQAYESEYA MEMÊ ALANA FOLKLORÎ Û MEM Û ZÎNA EHMEDE XANÎ.....	71
2.1. Motîfa Xewnê.....	73

2.1.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Xewnê.....	70
2.1.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Xewnê.....	74
2.2. Motîfa Derasayî û Sêhrê(Perî, Cin û Cadû).....	76
2.2.1. Di Destana Memê Alan de Motîfên Derasayî û Sêhrî.....	78
2.2.2. Di Mem û Zînê de Motîfên Derasayî û Sêhrî (Perî, Cin û Cadû).....	82
2.3. Motîfa Evînê.....	86
2.3.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Evînê.....	87
2.3.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Evînê.....	88
2.4. Motîfa Astengêr.....	91
2.4.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Astengêr.....	93
2.4.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Astengêr.....	94
2.5. Motîfa Jehriyê.....	101
2.5.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Jehriyê.....	102
2.5.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Jehriyê	103
2.6. Motîfa Îmtîhanê.....	104
2.6.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Îmtîhanê.....	105
2.6.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Îmtîhanê.....	107
2.7. Motîfa Hîleyê.....	111
2.7.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Hîleyê.....	112
2.7.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Hîleyê.....	113
2.8. Motîfa Qedexe û Ceza.....	116
2.8.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Qedexe û Ceza.....	117
2.8.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Qedexe û Ceza.....	119
2.9. Motîfa Civakê.....	121
2.9.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Civakê.....	123
2.9.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Civakê.....	126
2.10. Motîfa Mirinê.....	134
2.10.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Mirinê.....	135
2.10.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Mirinê.....	137
2.11. Motîfa Kordûndetî û Yekzarokiyê.....	139

2.11.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Kordûdetî û Yekzarokî.....	140
2.11.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Yekzarokiyê.....	141
2.12. Motîfa Gustîlikê	143
2.12.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Gustîlikê.....	144
2.12.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Gustîlikê.....	145
2.13. Motîfa Fal û Remlê	148
2.13.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Fal û Remilê.....	149
2.13.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Fal û Remilê.....	150
2.14. Motîfa Tayinkirina Pêşerojê.....	156
2.14.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Tayinkirina Pêşerojê.....	157
2.14.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Tayinkirina Pêşerojê.....	158
2.15. Motîfa Ava Heyatê û Avên Pîroz.....	160
2.15.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Ava Heyatê û Avên Pîroz.....	162
2.15.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Ava Heyatê û Avên Pîroz.....	162
2.16. Motîfa Xocê Xizir.....	165
2.16.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Xocê Xizir.....	166
2.16.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Xocê Xizir.....	167
2.17. Motîfa Xeberguhêz û Pîrejina Xeberguhêz.....	170
2.17.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Xeberguhêz û Pîrejina Xeberguhêz.....	171
2.17.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Xeberguhêz û Pîrejina Xeberguhêz.....	172
2.18. Motîfên Mîtolojîk.....	178
2.18.1. Di Destana Memê Alan de Motîfên Mîtolojîk.....	180
2.18.2. Di Mem û Zînê de Motîfên Mîtolojîk.....	181
2.18.2.1. Efsaneyên Afirînê.....	181
2.18.2.1.1. Efsaneya Tofanê.....	181
2.18.2.1.2. Efsaneya Newrozê.....	183
2.18.2.1.3. Efsaneya Bejn û Boht.....	186
2.18.2.2. Lehengên Efsaneyî.....	188
2.18.2.2.1. Efsaneya Cemşîd.....	188

2.18.2.2.2. Rustemê Zal.....	190
2.18.2.3. Heyinên Efsaneyî.....	192
2.18.2.3.1. Teyrê Enqa/Teyrê Sîmurg.....	192
2.18.2.3.2. Teyrê Hûma.....	194
2.18.2.3.3. Ejder/Ejderha.....	195
2.18.2.3.4. Hesp.....	198
2.18.2.3.5. Şahêmar.....	203
2.18.2.3.6. Dêw.....	205
2.18.2.3.7. Efsaneyê Mar û Gencîne.....	207
2.19. Hejmarên Formel.....	210
2.19.1. Hejmara Sisê (3).....	212
2.19.1.1. Di Folklorê de Hejmara Sisêyan.....	212
2.19.1.2. Di Mem û Zînê de Hejmara Sisêyan.....	213
2.19.2. Hejmara Çar (4).....	214
2.19.2.1. Di Folklorê de Hejmara Çaran.....	214
2.19.2.2. Di Mem û Zînê de Hejmara Çaran.....	215
2.19.3. Hejmara Heft (7).....	216
2.19.3.1. Di Folklorê de Hejmara Heftan.....	216
2.19.3.2. Di Mem û Zînê de Hejmara Heftan.....	217
2.19.4. Hejmara Çil (40).....	217
2.19.4.1. Di Folklorê de Hejmara Çilî.....	217
2.19.4.2. Di Mem û Zînê de Hejmara Çilî	218
2.19.5. Hejmara Sed (100).....	219
2.19.5.1. Di Folklorê de Hejmara Sedî.....	219
2.19.5.2. Di Mem û Zînê de Hejmara Sedî.....	219
2.19.6. Hejmara Hezar (1000).....	220
2.19.6.1. Di Folklorê de Hejmara Hezarî.....	220
2.19.6.2. Di Mem û Zînê de Hejmara Hezarî.....	221
2.19.7. Hejmara Hezar û Yek (1001).....	221

2.19.7.1. Di Folklorê de Hejmara Hezar û Yekî.....	221
2.19.7.2. Di Mem û Zînê de Hejmara Hezar û Yekî.....	222
2.19.8. Hejmarên Dî.....	222

BEŞA SÊYEM

3. DI MEM Û ZÎNÊ DE HÊMANÊN ÇANDA GEL.....	223
3.1. Di Mem û Zînê de Bawerî û Dîn.....	225
3.1.1. Di Mem û Zînê de Dîn û Şexsiyetên Dînî.....	228
3.1.1.1. Adem û Şeytan.....	231
3.1.1.2. Hz. Îdrîs/Hermes.....	231
3.1.1.3. Hz. Îsa û Çarmix.....	232
3.1.1.4. Hz. Mûsa û Qewmê Yahûdî.....	233
3.1.1.5. Hz. Îbrahîm û Nemrûd.....	236
3.1.1.6. Hz. Yaqûb û Hz Yûsuf.....	237
3.1.1.7. Hz. Suleyman û Belqîs û Asef Berxiya.....	238
3.1.1.8. Hz. Danyal.....	240
3.1.1.9. Harût û Marût.....	241
3.1.1.10. Xocê Xizir.....	241
3.1.1.11. Dînê Zerduştî.....	244
3.1.1.12. Dînê Manî.....	245
3.1.1.13. Rojperestî.....	246
3.1.1.14. Bûyera Kerbelayê.....	247
3.1.1.15. Mûcîzeyaya Ava Zembemê.....	248
3.1.1.16. Bihişt û Dojeh.....	249
3.1.1.17. Dara Tûba.....	254
3.1.1.18. Di Mem û Zînê de Baweriya Bêyomiyê.....	255
3.1.1.19. Di Mem û Zînê de Baweriya Niviştê.....	257
3.2. Di Mem û Zînê de Kevneşopa Şîn û Şahiyan.....	258

3.2.1. Cejna Newrozê.....	259
3.2.2. Merasîma Zewacê.....	265
3.2.2.1. Qîzxwestin.....	266
3.2.2.2. Mehrbirîn.....	269
3.2.2.3. Dawet.....	271
3.2.2.4. Xwarin û Vexwarin-Firaq û Çînî.....	273
3.2.2.5. Muzîk û Meqam, Amûrên Muzîkê.....	275
3.2.2.6. Kevneşopa Şoşbîniyê.....	276
3.2.2.7. Şahiya Dawetê.....	278
3.2.3. Kevneşopa Mizgîniyê.....	282
3.2.4. Kevneşopa Nêçîrê.....	283
3.2.5. Di Mem û Zînê de Şîn.....	287
3.3. Di Mem û Zînê de Kevneşopa Hekîmiya Gel.....	296
3.4. Di Mem û Zînê de Lîstikên Gelêrî (Reqs û Govend).....	300
3.5. Di Mem û Zînê de Muzîk.....	303
ENCAM.....	307
ÇAVKANÎ.....	311

PÊŞGOTIN

Zargotina miletê kurd, wekî ku gelek zanyarên folklorê jî tesbît kirine; yek ji dewlemendtirîn û kevnartirîn zargotina miletên cîhanê ye. Digel ku hin xebatên berhevkarîyê hatibin kirin jî, ji ber ku heya niha di binê banên zanîngehên Tirkiyê de, bi rengekî akademîk û sistematîk, li ser zargotina miletê kurd xebat û tez kêşandin, di amadekirina vê tezê de, hem ji aliyê bidestxistina zanînan akademîk û hem jî ji aliyê bikaranîna termînolojiya akademîk ve me hin zehmetî kişandin.

Armanca me ji vê tezê ew bû ku em Destana Memê Alana zargotinî û *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî, hem ji aliyê prosesa epîzotan ve bidin ber hev hem jî ji aliyê avahîsaziya motîfan ve li wan bikolin û di encamê de li hemanên çanda gelêrî di *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî de binihêrin.

Girîngiya vê tezê ev e ku; digel ku xebatên bi vî rengî li ber destê me pir kêşandin, em di binê sîwana nêrîna akademîk de lêkolîneke wiha dikin û bi vî awayî li dewlemendî û otantîkbûna zargotina miletê kurd û xwerûbûna Destana Memê Alan şahidî dikin û vê yekê nîşanê cîhana akademîk didin.

Di amadekirina vê tezê de, me hin zehmetî kişandin. Yek ji van ew bû ku, dema ku me li kêleka rêzikên orjînal yê *Mem û Zînê*, wergêra wê ya bi kurdiya îroyin nivîsî; di tesbîtîkirina hin bêjeyên krîtîk de, me zorî kişand û di hin deran de li wergêrê mudaxele kir. Di bikaranîna termînolojiya akademîk de jî hin zehmetî derketin pêş me lê dewlemendî û ferehiya zimanê kurdî rê lê vekir ku, em van pîrsgirêkan çareser bikin.

Di buhartina van pîrsgirêkan de û tesbîtîkirina rê û rêbazên akademîk de, şewirmendiya mamoste Prof. Kadrî Yıldırım, her tim rê li ber min vekir û cesaret da min. Ji ber vê alîkarî û şewirmendiya wî ez jê re spas dikim. Dîsa bi alîkariya xwe ya bi qîmet û teşwîqîkirina jidil, mamoste Al. Doç. Abdulbasit Sezer, rê û bergê li pêş min vekir. Ji bo vê alîkariya wî ya bi bandor, ez spasîyên xwe pêşkêşî wî dikim.

KURTEBÊJE

bnr. : binêrin

c. : cild

ç. : çap

g. : gotar

g.n. : gotara navborî

h.b. : heman berhem

h.g. : heman gotar

j. : jimare

k. : koçî

r. : rûpel

hwd. : her wekî din

wer. : werger

vgz. : veguhêzer

z. : zayînî

DESTPÊK

1. RÊ Û RÊBAZ

Destana Memê Alan û *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî, hem di nava wêjeya nûjen de hem jî bi demên dirêj di nava wêjeya gel de bi rengekî pir aktîf bandor li ser nivîskar û dengbêjan her wiha li ser civakê bi xwe kirine. Wekî ku em ê di dirêjahiya vê lêkolînê de jî bibînin, taybetmendiyeke girîng ya destanên wiha ev e ku; ew jî ber ku ne di nava erdnîgariyeke fireh de, li her herêma ku ew millet lê dijî tên zanîn, bi rengekî pir xwezayî jî her herêm û çandên herêmî hin hêmanên dirûvî û vegotinî girtine nava xwe û wilo hatine heya dewra me. Ev yek jî bo Destana Memê Alan jî bi heman rengî ye. Ev taybetmendî rê lê vekiriye ku gelek varyantên cuda yên vê destanê derkevin meydanê. Her wiha, *Mem û Zîna* Xanî jî digel ku bi îlhama Memê Alan derketiye meydanê jî, wê bi xwe jî bandor li hin varyantên Memê Alan kiriye. Pir muhtemel e ku, vê destana folklorî ku em wê bi navê Memê Alan dizanin, jî ber bandora *Mem û Zîna* Xanî, li gelek herêmên ku civaka kurd lê dijî, wekî Mem û Zîn hatiye binavkirin.

Ev rewş problema pêşîn a lêkolîna me bû ku me tesbît kir. Lewra di beşa yekem a teza xwe de, di binê sernava “Li Gorî Çend Epîzotan Muqayeseya Memê Alana Folklorî û *Mem û Zîna* Xanî” me xwest ku em bi rêya rêbaza muqayeseya li gorî bûyerên bingehîn ên di destanê de, lê binihêrin ku varyantên destanê di kîjan radeyê de jî hev dûr ketine û li gorî Mem û Zîna Xanî ev jihevduketin di çi radeyê de ye. Di tesbîtkirina epîzotên destanê de, me hem hewl da ku em li gorî pîvanên akademîk ên xebatên bi vî rengî tevbigerin û hem jî li gorî taybetmendiyan xwerû yên Destana Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî tevbigerin. Lewre tu pîvanên giştî li berhemên taybet bi temamî nikare bê tetbîqkirin. Ji ber vê yekê, me ligel epîzotên giştî yên ku di gelek destanên gelêrî de bi rengekî hevbeş derdikevin pêş me, kuştina Beko jî wekî epîzotekê nirxand ku ev rewş wekî xaçerêyeke destanê di hemî varayntan û *Mem û Zîna* Xanî de derdiket pêş me. Dîsa bi rêya vê rêbazê me tesbîta xalên hevbeş yên ku di hemî varayntên folklorî û *Mem û Zîna* Xanî de hene kir.

Lewre bi helbijartina rêbaza muqayeseya li gorî epîzotan, mebesta me ew bû ku, em bi tesbîtkirina xalên cuda yên di nava varyantên folklorî û *Mem û Zîna* Xanî de, nîşan bidin ku destan di kîjan radeyê de li herêmên di yên ku kurd lê dijî belav bûye û bi tesbîtkirina xalên hevbeş jî em nîşan bidin ku di destanê de kîjan xalên herî orjînal û kevnar hê jî hebûna xwe diparêzin.

Di beşa duyem de, armanca me ew bû ku em ji aliyê avahîsaziya destanan ve, ku li gorî prensîbên giştî yê folklorê hatine tesbîtkirin, li Destana Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî bikolin. Ji bo vê yekê me rêbaza Stith Thompson a ku ji aliyê motîfan ve li avahîsaziya destanan dikole, esas girt. Sedema ku me rêbaza Stith Thompson helbijart ev e ku; gelek lêkolînerên folklorê balê bi ser motîfan ve kişandine lê yekem car Thompson, bi renekî berfireh hemî motîf tesnîf kirine û bi renekî sistematîk ew di binê 23 sernavan de li hev civandine. Bi vê rêbazê me xwest ku em di destanê de hêmanên herî piçûk ku ji wan re motîf tê gotin û di heman demê de hêmanên herî dînamîk in, tesbît bikin û li gorî van hêmanan li ser avahîsaziya destanê tehlîlan bikin. Her wiha bi helbijartina rêbaza Thompson, me xwest ku em destaneke wiha kevnar bi rêbazeke nûjen û akademîk binirxînin û di navbera zargotina kevnar ya miletê kurd û cîhana hemdem de pirekê ava bikin.

Di vê beşê de me xebata Zeynelabidîn Zinar a bi navê *Di Çanda Kurdî de 37 Şaxên Zanistiyê* jî bi kar anî. Zeynelabidîn Zinar di vê xebatê de 133 xalên hevbeş ên di çîroka kurdî de tesbît kirine. Dema ku me li van xalên hevbeş nihêrî; her çendî ku Zinar ji wan re motîf negotiye jî, me dît ku ev xalên hevbeş dikarin di nava têgiha motîfê de bîr nirxandin. Lewma me di nirxandina her motîfê de, hem tesbîta vê motîfê di xebata Zinar de kir û hem jî hejmar û pênaseya kurt a vê motîfê di berhema Stith Thompson de da.

Di vê beşê de, di destpêka her beşê de me pêşî motîfa ku tesbît kiriye bi giştî di nava folklorê de nirxand dûre me varyantên folklorî yê Memê Alan li gorî vê motîfê nirxand û herî dawî me tesbîta vê motîfê di *Mem û Zînê* de kir.

Di beşa dawîn ya teza xwe de me wekî rêbaz, rêbazeke klasîk a ku di xebatên folklorê de derdikeve pêş me bi kar anî. Di vê beşê de me lêkolîna xwe li ser hêmanên çanda gel kir. Ev hêman, bi piranî merasîmên civakî yê wekî cejn, şîn, dawet û bawerî û efsaneyên civakî ne. Lê ji her du beşên dî cudatir, me di vê beşê de bi tenê *Mem û Zîna* Xanî esas girt. Ji ber ku, ev hêmanên çanda gel di Memê Alana folklorî de yan hiç derbas nedibûn yan jî di cihên ku derdiketin pêş me de jî, wekî şîna li dû mirina Mem, bêtir ku li ser karaktera wan a civakî were sekinîn derdiketin pêş me. Lê di *Mem û Zîna* Xanî de bi taybetî merasîmên civakî yê wekî cejn, şîn û dawet, bi renekî pir dewlemend hatine teswîrkirin, derbarê civaka kurdan a wê demê de agahiyên gelekî girîng hatine dayin û her wiha merasîmên wekî Cejna Newrozê û derketina nêçîrê di prosesa destanê de jî roleke girîng dilîzin. Lewre me vê beşa teza xwe bi tenê bi *Mem û Zîna* Xanî bisînor kir.

2. FOLKLOR

Di jiyana û hişmendiya civakê de, wekî gelek qadên dî yên ku çanda civakî û atmosfera manewî pêk tînin (dîn, felsefe, zanyarî, etîk, bawerî, huner, zagonên civakî û hwd.) folklor, xwedî cihekî taybet e. Li ser rûyê cîhanê tu miletekî nîn e ku bi rengê şareza derketibe qada dîrokê. Şarezatî, di encama hin serboriyên maddî û manewî yên civakan de, bi erdnîgariyekê ve girêdayî û bi rengê kolektîf derketiye meydana. Yanî miletên ku bi serê xwe medeniyet ava kirine an jî hin tiştên nû xistine ser xeta giştî ya medeniyetê, ne bi hewldana tekane ya kesane lê bi afirîneke kolektîf ev yek kirine. Navê vê afirîna kolektîf, çand e. Folklor, di pêkhatina çanda civakê de, xwedî roleke bingeşîn e. Çunkî afirîneriya kolektîf a civakê, hê di destpêkê de, di hêmanên folklorî de rû daye.

Di demên ku di wateya îroyin de zanistî pêş neketibû, yanî zanyariyên pozîtîf derneketibûn; mirovên pêşîn raman û baweriyên xwe, tesewirên xwe yên der bareyê paşeroj û pêşeroja dinyayê de, li dû şertên çandî-bawerî yên wê demê bi rêya hin formên vegotinê dianîn ziman. Em îro jî wan formên vegotinê re, ku di encama afirîneriya hevpar a civakê de derketine; mîtos, efsane, destan, çîrok, çîrokên gelêrî, pêkenok, tiştanok, stran, gotinên pêşyan, mersiye, lorîn û hwd. dibêjin. Folklor jî, ji wê zanyariyê re tê gotin ku; van hemî cureyan li gorî prensîbên zanyariyê tesnîf dike û li ser wan tehlîlan dike.¹

Lêkolîner Doğan Kaya, ji bo folklorê, pênaseyê kurt û fireh kiriye:

“Folklor: Ji zanista ku, çanda gel berhev dike, lédikole û digihîne sentezekê re tê gotin.”²

Folklornas Erman Artun, ji bo zanista folklorê weha nivîsiye:

“Folklor; ji zayinê heya mirinê, hemî hêmanên çanda maddî-manewî yên di jiyana mirovan de, bi rengê zanistî berhev dike, li ser wan lêkolînan dike, wan dinirxîne û bi rengê sistematîk şîrove dike û bi vî rengî serencama pêşketina çanda gel nîşan dide û di navbera çandên dî de cudahî û hevbeşyan dibîne.”³

¹ Izeddîn Mistefa Resûl, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, Weşanxaneyê Aras, ç.3., Hewlêr, 2010, r. 11

² Doğan Kaya, *Ansiklopedîk Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*, Weş. Akçağ, Ankara, 2007, r. 327

³ Erman Artun, *Türk Halkbilimi*, Weşanên Kitabevî, Çap. 6, İstanbul, 2010, r. 16

Xebatên li ser folklorê, her çendî ku ne sîstematîk bin jî bi giranî di sed sala XVII. de li Ewropayê dest pê kirin. Xebatên bi vî rengî, bi piranî di binê bandora hişmendiya netewebûnê û naskirina çandên cuda de derketine. Her çendî ku derketin û belavbûna hişmendiya netewebûnê bi şoreşa Fransayê ya sala 1789an ve têkildar e jî, bêguman bingeha vê ramanê digihîje tevgera humanîzmê ku di sedsalên XII-XIIIan de li Italyayê bi Dante Aligheri, Francesco Petrarca û Giovanni Boccaccio re derketiye⁴. Di bingeha tevger an jî ramana humanîzmê de, li çand û zimanê xwe xwedîderketin û redkirina otorîteya klîseyê û serdestiya zimanê latînî hebû. Vê ramanê di heman demê de rê li reform û ronesansa Ewropayê jî vekir.

Zanyarê îngilîzî Thomas Browne di sala 1646an de berhema xwe ya bi navê *Enquiries Into Vulgar And Common Errors* (Lêkolîna Der bareyê Baweriyên Gelêrî yên Pûç de) nivîsand. Paşê zanyarê fransî Jean Baptiste Thiers di sala 1677an de xebata xwe ya bi navê *Traité Des Superstitions* (Rîsaleya Baweriyên Batil) amade kir. Di sala 1697an de Charles Perrault berhema xwe ya bi navê *Histoires ou Contes du Temps Passé* (Çîrok an Çîrçîrokên Demên Borî) ku ji çîrokên gelêrî pêktê weşand. Her wiha Olivier Perrin berhema xwe ya bi navê *Breiz-Igel ou Vie Des Bretons Dans l'Armorique* (Breiz Îgel an jiyana Bretonan le herêma Armîrîk) ku ji stranên berhevkerî yên Breton pêktê di sala 1838an de weşand⁵.

Di dawiya sed sala XVIII. de zanyarê elmanî Johan Gottfried von Herder (1803) bi awayekî bîrewer li ser folklorê xebitî. Wî, wek efsane, stranên gelêrî li ser qadên din ên folklorê jî lêkolîn kirin. Herder, stranên gelêrî berhev kirin û ev xebat bi navê *Antolojiya Stranên Gel ên Elman* hat weşandin. Di sala 1778an de xebata wî ya navdar a bi navê *Stimmen des Völker im Leidern* (Dengên di Stranên Gel de) çap bû. Vê pirtûkê, hem bandoreke mezin li ser Romantîkan kir, hem jî bi muqayesekirina berhemên gelên din re asoyeke nû vekir.⁶

Di sala 1818an de du bira, Wilhelm (1859) û Jacob Ludwig Karl Grimm (1863) ku bi navê *Birayên Grimm* bi navûdeng in û wek îlhama ekola romantîzma elmanî tîr qebûl kirin, xebatên mezin kirin li ser folkora elmanî û Ewropayê. Xeberoşk, efsane û menqîbeyên elmanî berhev kirin û bi navê *Kinder und Hausmarchen* (Çîrokên ji bo Zarok û Maliyan) weşandin. Birayên Grîmm bi awayekî zanistî li ser devok û awayên

⁴ Edward Said, *Hümanizm ve Demokratik Eleştiri*, Kîtabxaneyê Agora, Çapa I., Istanbûl, 2005.

⁵ Arnold van Gennep, *Le Folklore : Croyances et coutumes populaires françaises*, Paris Weşanxaneyê Librairie Stock, 1924, r.9

⁶ Ramazan Pertev, *Notên Dersên Wêjeya Gelêrî*, Zanîngeha Mardîn Artuklu, 2012-2013

wan jî rawestiyan. Kesên ku yekem car li ser xeberoşkan lêkolîn kirin ew in. Her wiha wan pêşengiya Teoriyên Zimanên Hînd-Ewropî jî kirin.

Zanyarê finî, Dr. Ellias Lönnrot (1884), di navbera salên 1835-1849an de destana finiyên a bi navê *Kalavela* berhev kir û weşand.⁷

Her çend li Elmanyayê di wateya zanista gelêrî de peyva “volkskunde” ji aliyê Friedrich Ekkard ku gerîndeyê weşanê yê kovara *Der Reisende* (Gerok) bû, di sala 1782an de di nivîseke vê kovarê de hatibe bikaranîn jî, peyva “folklor”ê yekem car ji aliyê arkeologê îngilîz William John Thomas ve hatiye bikaranîn. Nivîskar di hejmara 22ê Tebaxa sala 1846an a kovara “Atheneium” de nivîsek daye weşandin. Wî, di vê nivîsa xwe de bêjeya *folklorê* bi kar aniyê. Dû re di sala 1891an de di Kongreya Folklorê ya Navneteweyî de ev peyv bi awayekî navneteweyî hate pejirandin.⁸

Ev hemî pêşketin û xebatên ku me li jorê ji wan behs kir, di cîhanê de bûne pêşketinên ewil ku, bi zanistî li ser folklorê hatine kirin. Bi xebatên ku dûre hatine kirin re, der bareyê berhevkarî û prensîbên berhevkarîyê de, der bareyê tesnîf, lêgerîn, rêbaz, nezeriyê û termînolojiyê de gelek pêşketin çê bûne û ev hemî têgih bi wateyên muşterek rûniştine. Bi vî rengî folklor wekî zanistê serbixwe, li seranserê cîhanê hatiye qebûl kirin.

Piştî ku folklor wekî zanistê serbixwe tê qebûl kirin, li her welatî, bi taybetî di nava milletên ku di nava pêşketinê de ne, xebatên li ser çanda gel, bawerî û adetên gel û her cure hêmanên manewî ku, bi jiyana civakî re rasterast têkildar in, bi lez tîn kirin. Di cîhana rojhelat de jî xebatên bi vî rengî, di destpêkê de, bi piranî ji aliyê mîsyonerên rojavayî û rûsî ve hatine kirin. Her wiha xebatên li ser folklor an jî çand û zimanê civaka kurd jî, bi vî rengî dest pê kirine.

Divê em vê rastiyê destnîşan bikin ku, ev xebatên mîsyoner û lêgeran ku di çarçoveya *Rojhelatnasiyê* de tîn nixandî, xebatên gelek hêja ne û her wiha dokumentên pir hêja gihandî dewra me. Lê divê em vê rastiyê jî bibînin ku, ev zanyarî ku bi xwe xwedî nêrîna “oryantalîst” e⁹, her çendî xwe dispêre agahî û dokumentên rastî jî, bi şîrove û tehlîla xwe her tim me ber bi rastiyê ve nabe. Bêguman mirov dikare di vê mijarê de şîroveyên kûrtir bike lê ev yek ne mijara vê tezê ye.¹⁰

⁷ Ensar Aslan, *Türk Halk Edebiyatı*, Maya Akademi, Ankara, 2008, r. 5

⁸ Ramazan Pertev, *Notên Dersên Wêjeya Gelêrî*, Zanîngeha Mardîn Artuklu, 2012-2013

⁹ Ji oryantîzme mebesta me wateya wê ya îroyîn e

¹⁰ Christine Allison, *Yezidi Sözlü Kültürü*, Weş. Avesta, Istanbul, 2007, r. 23

Li Kurdistanê xebatên mîsyoneran, bi giranî di sed sala XVIIIan de dest pê kirine. Di vê sedsalê de mîsyonerên îtalî yên wekî Leopold Soldini¹¹, Domenico Lanza (1718-1782), Giuseppe Campanile (1762-1835) û Mourizio Garzoni (1734-1804) yê ku yekemîn berhema li ser zimanê kurdî, bi zimanê ewropîyan nivîsandîye û her wiha wekî bavê Kurdolojiyê tê nasîn, li ser ziman û çanda miletê kurd xebat kirine.¹²

Zanyarên alman ên wekî Oscar Mann, E. Rodiger, A. F. Pott, Theodor Noldeck, Albert Socin, Ferdinand Justin, Karl Hedank li ser ziman û wêjeya miletê kurd, her wiha li ser jiyana civakî, bawerî û adetên miletê kurd, xebatên hêja kirine.¹³

Bêguman di xebatên rojhilatnasiyê de û her wiha di xebatên Kurdolojiyê de, xebatên ekola rûsî pir girîng in. Akademiya Zanistî ya Imparatoriya Rûsî, di demeke kin de bû navenda rojhelatnas û lêkolînerên rojavayî. Peter Lerch, Eugen Prym (1843-1913), Albert Bernhard Dorn (1805-1881), August Jaba (1801-1894), Ferdinand Justi (1837-1907), Albert Socin (1844-1899), Hugo Makas û hinên di jî berhemên xwe yên li ser kurdan, li Petersburgê weşandin. Di nava van rojhelatnasan de, bi taybetî girîngiyêke pir mezîn a A. Jaba heye ku, di encama têkiliya ku wî bi Mela Mehmûdê Bayezîdî (1797-1867) re daniye, gelekî berhem, hem li ser civaka kurdan, hem jî li ser dîrok û çanda wan, derketine.¹⁴

Ji bilî van lêkolînerên rojavayî, di berhemên kevin ên cîhana îslamê de, ji aliyê şexsiyetên wekî, Istexrî, Ibn Hewqel, Belazûrî û Mesûdî behsa civak û çanda miletê kurd hatiye kirin.¹⁵

Lê ji van xebatên biyaniyan girîngtir, xebatên ku di nava civaka kurdan de, ji aliyê zanyarên kurd ve hatine kirin hene ku li ser çand û civaka kurdan hîn jî hêjatiyên xebat in ev. Di mijara nasandina çanda civaka kurdan de, Şerefhanê Bedlîsî, Mela Mehmûdê Bayezîdî lêkolînerên girîng in. Her wiha em ji berhemên nivîskarên kurd ên wekî Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran jî, di heqê çand û edebiyata kurdan de gelekî agahî digirin. *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî di vî warî de gelekî girîng e. Ji bilî van, di sed sala dawîn de xebatên Roger Lescot, Celadet Bedirxan, Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl, Heciyê Cindî, Emînê Evdal û Qanatê Kurdo, Şukriye Resûl Îbrahîm, Izedîn Mistefa Resûl yên li ser folklorê kurdan, xebatên gelekî hêja ne.

¹¹ Di navbera salên 1760 û 1779an de li Zaxoyê jiyaye û li wê dere wefat kiriye.

¹² Jan Dost, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiyê, M. Mehmûdê Bayezidî*, Weş. Nûbihar, 2010, r. 7-8

¹³ h.b., r. 10-11

¹⁴ h.b., r. 10-11

¹⁵ H.b., r. 6

Bêguman xebatên li ser folklorê civakan, mijarên gelek fireh di nava xwe de dihewînin. Hemî hêmanên çanda maddî û manewî ku, di nava jiyana rojane ya civakê de tên îcrakirin, dikarin bibin mijara xebatên bi vî rengî.¹⁶ Em dikarin van bi vî rengî, bi kurtî rêz bikin: navlêkirin, tiştanok, dua, nifir, xîtab, leqeb, têkiliyên civakî, têkiliyên cîranî, têkiliyên xizmî, zayin, sunet, zewac, mirin, hekîmiya gel, teqwîma gel, hiqûqa nava gel a toreyî, rojên pîroz (wekî cejn, qendîl û newroz), baweriyên nava gel, ziyaret, fal, sêhr, pêşbaziyan gelêrî, muzîka gelêrî, lîstikên gelêrî, cil û berg, xemil, huner û zenaetên gel, mîmariya gelêrî û hwd.¹⁷ Lê ji ber ku di tezeke wiha sînorkirî de, em ê nikaribin li ser hemî van aliyên folklorê bisekinin, em ê mijara xwe ya destpêkê, bi çend cureyan wêjeya gelêrî ku bi esasê teza me re ji nêz ve eleqedar in, bisînor bikin. Ev cure: efsane, destan, çîrok û çîrokên gelêrî ne.

2.1. Efsane

Di nava zanyaran de, li ser têgiha efsaneyê nelihevkirineke aşkera heye ku bingeha xwe ji cudabûna çanda rojhelat û rojavayê digire. Ev nelihevkerin ew e ku; hin zanyar efsaneyê di nava tixûbên mîtos an jî mîtolojiyê de dinirxînin û hin jî wê li derveyê tixûbê mîtolojiyê dinirxînin. Li gorî nêrîna Mircea Eliade; mîtoloji xwe dispêre bingehên pîroz û metafîzîk, lê mijara efsaneyan çîrokên bi efsûnan xemilandî ne ku civak wan bi hêza xwe ya xeyalî derdixe meydanê.¹⁸

“Mîtoloji, çîrokên ku di dewrên herî destpêkê de, di dewrên arkaîk de pêk hatine neqil dibe. Mijarên mîtolojiyê, bi piranî pêşketinên li ser afirînê û serencamên aydê cîhana metafîzîkî ne. Yanî heyinên pêşî çawa derketine meydanê, çawa pêk hatine û di nav kîjan şertan de gav avêtine cîhana heyinê.”¹⁹

Her wiha li gorî nêrîna Eliade, mirovên pêşîn, mirovên dewrên arkaîk jî cudahî xistine nava mît û efsaneyan. Mirovên dewrên arkaîk, mîtolojiyê wekî ‘pîroz û rast’ dîtine, lê efsaneyan wekî ‘ne pîroz û derveyê rastiyê’ dîtine.²⁰

¹⁶ Şukriye Resûl Îbrahîm, *Edebî Folklorî Kurdî*, Weşanên Zankoya Selehedîn, Hewlêr, 1984, r. 3

¹⁷ Doğan Kaya, *Ansiklopedîk Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*, Weş. Akçağ, Ankara, 2007, r. 328

¹⁸ Mircea Eliade, *Mitlerin Özellikleri*, Wer., Sema Fırat, Weş., Simavi, İstanbul, 2001, r. 9

¹⁹ H. b., r. 10

²⁰ H. b., r. 10

Lêkolîner Abdurrahman Güzel jî cudahiyê dixê navbera mît û efsaneyan. Li gorî nêrîna Güzel; mît, behsa bûyerên cîhaneke cuda û rabirdûyeke dûr dikin, lê efsane behsa bûyerên cîhana îroyin û rabirdûya nêz dikin. Mijarên mîtan, bi piranî heyinên derveyî mirovan in, lê mijarên efsaneyan mirov in. Mît, bi piranî wekî pîroz tên telaqîkirin lê efsane her çend ew jî pîroz bên telaqîkirin jî di hin halan de dibe ku ne pîroz bin.²¹

Şükrü Elçin, efsane û mîtan di heman wateyê de dinirxîne û wiha pênase bi têgiha efsaneyê dike:

“Cureyeke çîrok in ku, di dewrên beriya dîrokê de an jî di dewrên herî kevnar ku mirov derketiye sehneya dîrokê de, li erdnîgarî û derdorên cuda û di nava qewmên cuda de derketine û pêş ketine, di nava demê de pir-hindik di teşekila bawerî, tore, kevneşop û merasîman de rola wan çêbûye. Ji van çîrçîrokên ku di kevneşopa gotinî de jiyane re, di zimanê erebî de ûstûre/esatîr, di zimanê farisî de efsane û di zimanê yûnanî de ji wan re mîtos an jî mît hatine gotin.”²²

Lêkolîner Doğan Kaya, ji bo efsaneyê pênaseyeke kurt kiriye û der bareyê mijarên efsaneyan de wiha nivîsiye:

“Hikayeyên rastîn an jî xeyalî ku, der bareyê şexsiyet, bûyer û cihên diyar de tên gotin, wekî efsane tên binavkirin.

Di kongreya folklorê de ku di sala 1963yan de li Budapeşteyê hatiye kirin, ji aliyê tesnîfê ve, li ser mijarên efsaneyan hevbeşiyê wiha derketiye meydanê:

- 1 Efsaneyên ku behsa afirîn û dawîya cîhanê dikin.
- 2 Efsaneyên dîrokî, efsaneyên li ser dîroka medeniyetê.
- 3 Efsaneyên ku behsa bûyer, heyin û hêzên derasa dikin.
- 4 Efsaneyên dîni.²³

Wekî ku em ji pênaseyên jorîn jî têdigihên; efsane an jî mît, cureyeke pir kevnar a çanda zargotinî ye ku ji roja îro ve pir zor e ku mirov tesbît bike ku ew di kîjan şertên civakî-xwezayî de derketine û her wiha rol û erka wan a di nava civakê de çi bûye û bi rastî çi efsane ne an jî ne efsane ne.

²¹ Abdurrahman Güzel- Ali Torun, *Türk Halk Edebiyatı El Kitabı*, Weş. Akçağ, Ç. 3., Ank. 2005, r. 404

²² Elçin, *Halk. Edeb. Giriş.*, r.314-315

²³ D. Kaya, *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*, Weş. Akçağ, Ankara., 2007, r. 303-304

Mirovên dewrên pêşîn –çawa ku di mirovê îroyin ên nexwenda de jî tê dîtin-sedemên bûyerên xwezayî nizanibûn. Ji ku derê hatin û ber bi ku derê ve çûyina mirov, girîngiya jiyana û mirinê, tevgerên stêrkan, rabûna avê/behran, barîna baranê, îcad û çêbûna heywan, nebat, ax, daristan, çiya, agir, maden û qewimînên wekî dî, mirov di nava heyrîmayîn, tirs, heyecan û memnûniyetê de, sewqî xeyalkirina hin tiştan dikirin. Xeyalên bi vî rengî, cureyeke fikirîna taybet derxistin ku, mirovan ev hemî bûyer û qewimîn li xweza û hêzên derveyê xwe bar dikirin.

Ev cure raman û zanîn, bûye zanîna herî kevnar ya mirovan. Di vê zanîna kevnar de, ku hê zanîna pozîtîf pêş neketibû, têgihên wekî xweda, rûhê baş û rûhê xerab, qiyamet, melek, şeytan, cin, perî, ezman, çiya, av, efsûn û efsûnkar hebûne ku mirovan carcaran bi rêya teşhîs û întaqê li ser wan hin çîrçîrok afirandine ku ev ji têgiha giştî ya çîrokê cuda ye.²⁴

Dema ku mît an jî mîtos tê gotin, bi piranî mîtolojiya Sumer, Babîl, Misir, Hînd, Îran û Yûnaniyan tê bîra mirov. Di vê pêvajoya dîrokê de, mîtolojî têgiheke wilo ye ku, li gorî baweriyên wê demê, di heqê xweda an jî xwedayan de ramanek yan jî cureyeke ramana mirovî ye. Bêguman ev jî parçeyekî ji çanda gelan e lê mît an jî mîtos ku, em wateya ku jê fêhm dikin zêdetir di peyva efsaneyê de dibînin, ji vê zanîna giştî ya mîtolojiyê cudatir e û her wiha ji aliyê zargotinî ve bêtir mijara me eleqedar dike.

Eger em di çarçoveya wateya bisînorkirî ya mîtosê de û bi wateya fireh a efsaneyê li van têgihan binihêrin, em dikarin pênasîyê wilo lê bikin: Mîtos an jî efsane, cureyeke raman an jî bawerîya miletan e ku, der bareyê şexsiyetên dîrokî an jî xeyalî, bûyerên xwezayî an jî civakî û şexsiyetên dînî û baweriyên dînî de, hin fikrên ku îmkana ispata wan nîn in dide, lê civak bi têkiliyê xurt bi wan ve girêdayî ye. Di roja îroyin de jî bandoreke xurt ya vê cureyê, li ser jiyana û psîkolojiya civakê heye.

Têkiliya efsane û çîrokên li ser şexsiyetên dînî jî ew e ku, di lîteratorê de ji van çîrokan re *menqibe* hatiye gotin û ev hîkaye li ser nebî, ewliya û şexsiyetên, pêşewayên dînî ne. Mînak li Kurdîstanê gelek hîkaye li ser Hz. Elî hene, her wiha efsaneyên li derdora jiyana şexsiyetên mîna Weysel Qeranî, Siltan Şêxmûs û dîsa efsaneyên li ser hin ziyaretan, li ser têkiliya îroyin a efsane û baweriyên dînî mînakên girîng in.

Her çendî ku di sererastkirina termînolojiyê de pîrsgirêkeke aşkera xuya dike jî, mirov dikare vê cureya ramanê yan jî van bawerîyan, wekî çîrçîrok binav bike. Lê hîç guman nîn e ku pêdivî bi lêgerîn û lihevkerîneke berfirehtir heye.

²⁴ H.b., r. 315.

2.2. Destan

Peyva destan, bi eslê xwe îranî ye û di zimanên îranî de wekî *dasîtan* an jî *dastan* derbas dibe. Destan cureyeke wêjeya gelêrî ye ku piştî efsaneyan derketiye. Di jiyana êl, eşîr, millet an jî qewmekî de, bêyî ku bigihên huviyeteke tam a estetîk, di şeklê nezmî de dertên û berhemên herî kevnar ên wêjeya gel in. Ev berhemên anonîm, girêdayî kevneşopa gotinî ne û çîrokên dîdaktîk in. Di derdora jiyana rastîn an jî menqîbeyî ya şexsiyetên “Leheng-Zana” ku îradeya civakê di dest wan de ye (di nava zeman û mekan de), teşkil dikin. Her çendî ku girêdayî dîrokê ne jî, nabe ku ew wekî dîrokê bîn hesabandin. Ji aliyê ozanan/dengbêjan ve, bi renekî ku hêvî û êşên hevpar ên civakê bidin der, hatine gotin.

Ji bo derketina destanên mezin, pêdivî bi “demeke afirînê” heye ku, ev dem di bûyerên mezin ên ku li ser jiyana hemî civakê tesîr dikin de, dertê. Ev cure bûyerên mezin, bi piranî bi rengê şer, guhartina dîn, koçberbûn, xela û hwd ne.²⁵

Lêkolîner Erman Artun pênaseyeke weha ji bo destanê kiriye:

“Destan, ji berhemên menzûm yên ku, behsa derasayî an jî rastiye dikin, efsaneyan û dîrokê bi hev ve dikelijînin, hin bûyerên lehengî û bûyerên mezin yên civakî bi renekî helbestî vedibêjin, re tê gotin.”²⁶

Li gorî nêrîna Pertev Naili Boratav; destan di demên ku, civak di nava xwe de bi aramî dijî lê rûbirûyê bûyer an jî dijberiyeyeke bi civakeke dî an jî xwezayê re dimîne de dertên. Taybetmendiya herî girîng a ku pêkhatina destanê ferz dike ew e ku, ew di dewra ku di nava civakê de dijberiyên dijwar nîn in û mucadele bi tenê ber bi derveyê de ye dertên, yanî berhemên dewrên wilo ne. Lehengên destanan jî kesên wekî serkêş, rêber û lehengên ku karên mezin bi ser dixin in ku, ew vê mucadeleyê di radeya herî bilind de temsîl dikin. Mirov dikare bibêje ku, destan cureyeke edebî ya zumreya arîstokrasiyê ye.²⁷

Ensar Aslan di heqê destanê de wiha nivîsandiye:

²⁵ Elçin, *Halk Edeb. Giriş.*, r.72

²⁶ Erman Artun, *Türk Halk Edebiyatının Giriş*, Weş. Karahan Kitabevi, Ç. 6., Adana, 2001, r. 25

²⁷ Boratav, *Halk. Hik. Ve Halk. Hikayeciliği*, r. 57-70

“Di nava demê de hin bûyerên dîrokî li serê miletan diqewimin û ew bûyer bi demê re bi hêmanên efsaneyî û mîtolojîk tîn hûnandin û taybetmendiyêke neteweyî li wan tê barkirin û bi rengê menzûm dertên... Her çendî ku destan yek bi yek dîrokê nadin der jî, ne berhemên dîrokî ne jî, dîsa jî wekî çavkaniyêke dîrokî ji wan dikare sîd bê wergirtin. Lê dema ku ev kar bê kirin, hewce ye ku ew di nava muqayeseya bi hin çavkaniyên dî re, bîr xandin.”²⁸

Izeddîn Mistefa Resûl, destanê wekî, *dastan, poem* an jî *epos* binav dike. Bi nêrîna Resûl; destan, bîngeha xwe ji bûyerên rastîn digirin. Yanê ew taybetiyên ku di çîrok û efsaneyan de hene ku xwe naspêrin bûyerên rastîn, di destanan de nîn in. Her wiha Resûl, li gorî cureyên dî yên zargotinî, hevbeşiyêke zêdetir berbelav di nava destanan de dibîne. Çunkî mijarên wan hemî civakê eleqedar dikin û objektîf in.²⁹

Lêkolîner Doğan Kaya, li ser destan û taybetmendiyên wê weha nivîsiye:

“Destan, hîsên bilind yên neteweyê, ramanên wan û armancên wan ên hevpar didin der... Destanên her neteweyê nîn in. Lê neteweyên ku dîroka wan ber bi dewrên dêrîn ve diçin, xwedî destan in... Derketina meydanê ya destanan ji sê merheleyan pêk tê: kakil (a bûyerê), (merheleya) bûyinê û merheleya tesbîtê... Ji ber ku, bandoreke mezin û kûr ya bûyerên ku di destanan de diqewimin li ser civakê heye, nabe ku lehengê van bûyeran jî mirovên ji rêzê bin. Lehengên destanan xwedî taybetmendiyên xwerû û derasa ne. Ew, hê di welidîna xwe de bi rengê derasa tîn dinyayê.”³⁰

Wekî ku em ji van pênaseyên jorîn jî têdigihên, destan; cureyêke gelekî girîng a folklorî miletan e. Ew cureyêke wilo ye ku, hemî civakê eleqedar dike. Çunkî ne wekî çîrok û efsaneyan bi erdnîgariyêke teng bisînorkirî ye. Eger ku navê destanê li berhemeke zargotinî hatibe kirin, ev tê wê wateyê ku ew kêm zêde ji aliyê piraniya gel ve tê zanîn. Her çend mumkun e ku, li her deverê welat hin guhertoyên wê yên cuda hebin jî, bi piranî bi nav û naveroka xwe ya aşkera, li her derî tê zanîn.

Di destanan de bûyerên asayî û derasayî di nava hev de ne, dîsa lehengên destanan wekî Memê Alan û hespê wî Bozê Rewan, xwedî taybetmendiyên derasa ne. Ev cure, piranî di nava civakê de bi rengê menzûm derdikevin lê dûre dibe ku beşên menzûm bîr jibîrkirin û pexşan şûna wan bigire. Yanî eger em îro rastî berhemeke

²⁸ Aslan, *T. Halk. Edeb.*, r. 22-23

²⁹ Îzeddîn Mistefa Resûl, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, Weşanxane Aras, ç.3, Hewlêr, 2010, r. 31

³⁰ D. Kaya, *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*, Weş. Akçağ, Ankara., 2007, r. 222

zargotinî bân û ew bi tamamî ne menzûm be, ev yek nayê wê wateyê ku ew ne destan e. Lewra destanên ku heya niha di nava civakê de mane, bi piranî nezm û nesir têkel in.

Ji bilî vê eger em ji aliyê naverokê ve behsa destanan bikin; destan bi piranî yan li ser lehengiyê yan jî li ser evînê ne. Her wiha bûyerên wek şer, koçberî, xela û hin bûyerên xwezayî jî, dibin mijara destanan.

Hin zanyaran, destan wekî *destanên xwezayî* û *destanên çêkirî* li du beşan veqetandine. Ji *destanên xwezayî* mebest; destanên ku me li jorê behs ji wan kirine, yanî yên ku berhemên anonîm in; wekî Kalavela, Manas û Memê Alan. Ji *destanên çêkirî* jî mebest; hin berhemên ku ji aliyê hin helbestkarên mezin ve bi forma destanê hatine nivîsîn in; wekî Aeneis'a Vergilius ku, li ser şerê yûnaniyan yê bi trûvayîyan re ye.³¹

2.3. Çîrok

Çîrok cureyeke girîng ya folklorê ye ku, ji sedsala XIXan û vir ve, bi hin hevbeşiyên xwe, bala gelek zanyar û lêkolînerên folklorê kişandiye. Di sedsala XXan de bi taybetî lêkolînerên mîna *Anti Aarne*, *Vladimir Propp* û *Stith Thompson* hem li ser tesnîfa çîrokan, hem li ser motîfên ku di çîrokan de derdikevin pêş me û hem jî li ser avahîsaziya çîrokan, xebatên gelek girîng kirine.³²

Lêkolîner Doğan Kaya, ji bo çîrokê pênaseyeke bi vî rengî kiriye:

“Çîrok ji wan berhemên pexşanî re tê gotin ku; bûyer di cîhaneke xeyalî de diqewimin, lehengên wan carina mirov, carina heywan û carina jî hin heyinên derasa ne, bi mebesta kêfanîn an jî perwerdekirina guhdaran tîn gotin û rastiyan bi hin remz û simbolên derasa û bi rêya hin qaliban tînin ziman.”³³

Sedemê hevbeşiya di navbera çîrokên çandên cuda de, bûye mijareke girîng ji bo lêkolînerên folklorê. Bi lêkolînên li ser vê hevbeşiyê ve girêdayî, sê nêrînên bingehîn derketine ku bi vî rengî ne:

- 1 **“Nêrîna Mîtolojîk:** Li gorî alîgirên vê nêrînê: Ji ber ku di navbera çîrokan û mîtolojiya kevnar de hevbeşiyeye berbiçav heye; ew wekî perçeyên ku ji

³¹ H.b., r. 221

³² Nurettin Albayrak, *Halk Edebiyatı Terimler Sözlüğü*, Weş. LM, Ç. 1. İstanbul, 2004, r. 365

³³ D. Kaya, *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*, Weş. Akçağ, Ankara., 2007, r. 488

mîtolojiyê veqetiyayî hatine nirxandin. Yanî, eslê çîrokan ji mîtolojiya kevnar tê. Alîgirê herî girîng ê vê nêrînê Max Muller e ku di encama lêkolînên xwe yên li ser çîrokên Hînd û Ewropayê de, gihîştîye vê fikrê.

- 2 **Nêrîna Dîrokî:** Li gorî alîgirên vê nêrînê: Kaniya esas a çîrokan Hindistan e. Yanî berevajî nêrîna mîtolojîk ku kaniya çîrokan digihîne mîtolojiyê, alîgirên vê nêrînê, kaniya çîrokan digihînin *Pançatantraya*³⁴ hîndîyan. Li gorî teorîsyenê vê nêrînê Theodor Benfey: Kaniya hemî çîrokên cîhanê Pançatantra ye. Ev çîrokên hîndîyan bi rêya musulman û bûdîstan li rojava û rojhelatê cîhanê belav bûne.
- 3 **Nêrîna Etnografîk:** Alîgirên vê nêrînê, lêkolînerên bi navê Andrew Lang, Edward Taylor û M. Lennan in. Li gorî nêrîna wan: Kaniya çîrokan ne mîtolojî an jî Hindistan e; ew bermayên jiyana medenî ne. Li gorî nêrîna Lang: Ji fikrên îptîdaî ku di çîrokan de hene diyar e ku, ew ji dewrên arkaîk mane lê ew li deverên cuda û bi rengekî ji hev serbixwe derketine meydanê. Ji ber ku çandên cuda jî bi rengekî paralel pêş ketine, di nava çîrokên wan de jî hevbeşî hene.³⁵

Ji bilî xebatên li ser bîngeha çîrokan, der bareyê tesnîfa mijarên çîrokan de jî ji aliyê Anti Aarne û Stith Thompson de xebatên girîng hatine kirin. Anti Aarne ji aliyê mijarên wan ve çîrok di binê sê koman de civandine.

- 1 Çîrokên Heywanan
- 2 Çîrokên Resen/Esil
 - a. Çîrokên Sêhrî/Sêhrê
 - b. Çîrokên Dînî –Efsaneyî
 - c. Çîrokên ku di cureyê hikayeyên kurt de ne
 - d. Çîrokên li ser dêwên bêaqil
- 3 Pêkenok û Hikayeyên Kurt³⁶

Piştî xebata Antî Aarne(1910), Stith Thopmson (1928), xebata Aarne ji xwe re kiriye bîngeh û çîrok li gorî mijara wan bi vî rengî tesnîf kirine:

- 1 Çîrokên Heywanan
- 2 Çîrokên Resen/Esil Yên Gel
- 3 Çîrokên Mîzahî/Pêken, Pêkenokên Bi Nukte

³⁴ Pançatantra: Pênc Kîtab. Mijar: Rêveberiya dewletê û politîka ye

³⁵ Aslan, T. *Halk Edeb.*, r. 276-277

³⁶ H. b., r. 273-274

4 Rêzeçîrokên Zincîrî/Rêzeçîrok

5 Çîrokên Ku Nakevin Tu Sinifê/Nehtine Tesnîfkirin.”³⁷

Taybetmendiye çîrokê yê dirûvî û naverokî

Di nava civaka kurd de, ji gelek cureyên zargotinî yê ji hev cuda re, bi giştî çîrok hatiye gotin. Mînak ji çîroka “Eliyê Newêrek” re jî çîrok hatiye gotin û ji Destana “Mem û Zînê” re jî çîrok hatiye gotin. Her wiha ji “Cembelî û Binevşa Narîn” ku em dikarin wê wekî çîrokeke gelêrî binav bikin re jî çîrok hatiye gotin. Dîsa ji destanên ku li derdora jiyana “Rustemê Zal” pêk hatine re jî, kurdan gelek çîrok gotine. Bêguman ev ji aliyê zanyariya folklorê ve problemeke tesnîfê diafirîne ku, divê bi xebatên berfirehtir li serê bê rawestîn.³⁸

Çîrok an jî li gorî vegotina hin deveran *xeberoşk, metel*³⁹ berhema herî girîng a çanda gotinî ye. Taybetmendiyeke wê ya karakterîstîk heye û eger em bi vê balê lê binihêrin, mefhûmên wê yê xwerû û vegotîneke wê ya xwerû heye. Bûyerên asayî û derasayî bi rengekî perwerdekar tî vegotin. Berhemeke pexşanî ya çanda gotinî ye ku karaktereke kevneşopî û kolektîf di hundirê xwe de dihevine.⁴⁰

Di çîrokan de têgiha dem û deverê nî e. Bûyer di dem û devereke tesaduf de derbas dibin. Berevajî dinyaya rastîn ku em tê de dijîn, her tim başî û baş bi ser dikevin û xerabî û xerab tîk diçin.

Avahiyên çîrokan ên mijarî (carina bi vegotîneke sembolîk be jî), bi piranî li ser toreya gel û baweriyên civakî yê gel rûdin.

Çîrok ne berhemên dem û devereke diyar in lê ew her dem û li her derê tî afirandin. Her wiha ji erdnîgariya ku jê derketine dertî û dûre li her derê belav dibin.

Li ser vê cureya girîng Şükrü Elçin wiha gotiye:

“Di nava berhemên anonîm ên wêjeya gel de, yê herî berbelav çîrok in. Di zimanên erebî û aramî de *masal, mesel* hatiye gotin jê re. Li gorî wesfîyetên serdest yê çîrokan, em dikarin wiha pênase pê bikin: Ew, hikayeyên bûyerên aydê heyin an jî kesine nayên zanîn in ku, di dewrên ne diyar de derbas dibin. Sedema ku dewrên wan ne mûeyen in jî ev e ku, bi piranî çîrok bi qaliba, “*hebû tunebû*”, yan jî, “*wextekî, di*

³⁷ h.b.,r. 273.

³⁸ Ramazan Pertew, *Zarok û Çîrok*, Weşanên Doz, Istanbul, 2009, r. 83-87

³⁹ Îzedîn Mistefa Resûl, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, Weşanxaneya Aras, ç.3., Hewlêr, 2010, r. 172

⁴⁰ H.b., r. 31

dewrên berê de, di zemanê berê de” dest pê dikin. Wekî ku em ji van qaliban jî têdigihên, dema çîrokan demeke ne diyar e. Her wiha sedema ku, heyin an jî mirovên nayê zanîn, tê gotin, ev e ku; di vê mijarê de vegotina çîrokî wiha ye: *mirovek, keçikek, jinek, parsekek, padişahêk, derwêşek, darek, dêwek* û hwd. Wekî ku tê dîtin, kîbûna wî/wê kesê an jî wî/wê heyinê ne girîng e lê nasnava ku ew teşhîs dike girîng e. Çûnkî çîrok, bi mebesta diyarkirina hin tiştan nayên gotin lê ew bi mebesta perwerdeyê û li dû armançêkê tên gotin. Ji ber vê yekê ye ku, kurt in, li ser detayan nayê sekinîn û gelekî bi fonksiyon in.”⁴¹

Pertev Naili Boratav ku, li ser folklorê Anatoliyayê gelek xebatên hêja kirine û her wiha li Tirkiyeyê di pêşveçûna zanyariya folklorê de kedeke wî ya mezin heye, der bareyê çîrokê de wiha dibêje:

“Taybetmendiya sereke ya çîrokê ew e ku; ew xwedî teknîkeke vegotinê ya pir kurt û serî ye. Di çîrokê de xaleke pir girîng jî ev e ku; her tim tê aşkerakirin ku bûyer di demeke borî de derbas bûne. Ji bilî van, taybetiyeye girîng a çîrokan ku ew ji destanan vediqetîne ev e ku; çîrokbêj (û guhdar jî) dizane û dixwaze bibêje ku van hemî tiştên ku tên gotin bi rastiyê re li hev nakin yanî derveyî rastiyê ne. Di çîrokê de hêmanên fantastîk gelekî zêde ne û di cureyên dî de bi vê mîqdarê nayên dîtin. Her wiha ji aliyê şeklî ve jî çîrok xwedî vegotineke taybet e. Dîsa di destan û çîroka gelêrî de evîn mijareke bingehîn e. Lê di çîrokê de li ser evîne ew çend nayê israrkirin.”⁴²

Li gorî fikra Boratav, her çendî ku di hin taybetiyên girîng de çîrok, çîroka gelêrî û destan ji hev cuda dibin jî ev her du cure bi çîrokê re ji pir nêz ve têkildar in.

Wekî ku ji van pênaseyan jî em têdigihên, çîrok di zargotinê de cureyeke pir taybet e. Eger em zargotinê wekî deryayekê bibînin, çîrok ew çem in ku vê deryayê xwedî dikin. Girîngiyeye dî ya çîrokan heye ku, gelekî cureyên zargotinî, mirov dikare bi dewrekê bi sînor bike lê ji bo çîrokê ev ne pêkan e. Çûnkî çîrok di her dewrê de tên gotin û her wiha tên afirandin. Armanca herî sereke ya çîrokan ew e ku, ew bi mebesta perwerdekirinê di nava civakê de hatine gotin.

Çîrok bi vegotineke taybet û bi armanca terbiyekirin, perwerdekirin carina jî bi armanca kêfanîne an jî ji bo derbaskirina wextê, bi piranî ji aliyê jinan ve bi rengekî pexşanî hatine gotin. Di naveroka wan de hin mijar û şexsên “xeyalî an rastîn”, “razber

⁴¹ Ş. Elçin, *Halk Edeb. Giriş.*, r. 368-370

⁴² Boratav, *Halk. Hik. Ve Halk. Hikayeciliği*, r. 64-65

an jî şênber”, “maddî an jî manewî” hene. Girêdayî kevneşopeke gelekî dûr û dirêj in û berhemên hafizayeke kolektîf in. Dibe ku carina di çîrokan de behsa hin deverên diyar jî bê kirin. Wekî; Çîn û Maçîn, Yemen, Hindistan, Bexda, Misir, Stenbol û hwd. Yan jî carina hin çîrok dibe ku behsa hin dewrên diyar bikin. Mînak; di dewra filan padîşahî de. Lehengên çîrokan carina mirov in wekî, tucar, bazirgan, cotkar; carina heywan in wekî, şêr, rovî, gur, hirç, xezal, masî; carina nebat in wekî, dar, kulîlik; carina hin ûnsûrên maddî ne wekî, çiya, şkeft, bîr, av, aş; carinan aferîdeyên xeyalî ne wekî, dêw, cin, perî, pîrebok, efrût, hût; carina jî hin fikrên sade ne wekî, başî, xerabî, aqil, xweşikî û nexweşikî.

Her wiha wekî ku lêkolîner Hans Agust Ficsher jî dibêje, di çîrokan de derasayî yanî hêmanên fantastîk gelekî li pêş in. Pêşketina bûyeran û her wiha karakterên di çîrokan de derasa ne û her kesê ku dibêje û guhdar dike jî hay ji vê yekê heye ku ew ne rast in lê bi mebestekê tên gotin.⁴³

Dîsa taybetmendiyeke di ya çîrokan ew e ku, evîna ku di çîrokan de derbas dibe wekî ku lêkolîner Hikmet İlaydin dibêje; evîneke gelekî basî û sade ye. Wekî cureyên di yê wêjeya gotinî, evîna platonîk nîn e û avahîsaziya çîrokê li ser evînê nayê hûnandin.⁴⁴

2.4. Çîrokên Gelêrî

Çîrokên gelêrî ne bi tenê berhemên kesekî an dengbêjekî ne. Ew berhemên ramana hevpar, hîsa hevpar û afirîneriya hevpar yê mîletekî ne.

Çîroka gelêrî, di zargotinê de cureyeke taybet e û hem bi destanê re hem jî bi çîrokê re têkiliyeke wê ya xurt heye. Bêguman ji bo berhemên gelêrî, tesbîtkirina dîrokeke diyar gelekî zehmet e. Lê dema ku em li taybetmendiyan vê cureyê dinihêrin, em dibînin ku, ew piştî destanan an jî piştî vegotina destanê derketine û heya sedsala dawîn jî hebûna xwe domandine. Cudahiya di navbera vê cureyê û destanê de ne cudahiyeke naverokî ye lê cudahiyeke formî û vegotinî ye. Lê eger ku em hêmanên fantastîk wekî hêmanên naverokî bihesibînin, hingê em dikarin bibêjin ku ji aliyê hêmanên fantastîk ve jî cudahiyeke berbiçav di navbera wan de heye. Çunkî, ji ber ku formeke dêrîntir in, di destanan de hêmanên fantastîk zêdetir hene.

⁴³ Vgz., P. N. Boratav, *Halk Hik. Ve Halk Hikayeceliği*, r. 64-65

⁴⁴ Hikmet İlaydin, *Makaleler*, Weşanên Aydın Kitabevi, Ankara, 1999,

Ya rast dema ku em li hin berhemên ku wekî çîrokên gelêrî tîn binavkirin dinihêrin, aşkera tê dîtin ku ew bermayên destanên mezîn in û di nav wan de hêmanên çîrokî jî hene. Lê di nava demê de guherîne û destanên dêrîn bûne çîrokên gelêrî.

Lêkolîner Pertev Naili Boratav, li ser tîkiliya di navbera çîrok û çîroka gelêrî de wiha dibêje:

“Eger em çîroka gelêrî bêyî ku bi helbestî hatibe stîrîn, bi metnê wê hêlsengînin; eger em, forma wê ya bi nezm û nesrê tîkel û dirêjîya wê ya ku di çîrokê de dernayê pêş me negirin ber çavan, di wê de em tu cudahiyekek ji çîrokê nabînin. A rast em van hîkayeyan ji perçeyên nezîm tecrîd bikin û ji hêmanên ku vebêj li dû kevneşopa xwe ya hunerî daxilê wan dike tecrîd bikin, di destê me de bi temamî çîrok dimîne. Heta bi taybetmendiyên hêmanên fantastîk bi xwe jî, gelek çîrokên gelêrî di karaktera çîrokan de ne.”⁴⁵

Lêkolîner Hikmet İlaydın, di heqê cudahiyan di navbera çîrok û çîroka gelêrî de wiha dinivîse:

“Di çîrokan de evîneke hêsan-sade û îptîdaî heye lê di çîroka gelêrî de evîneke pir gihaştî û platonîk mijara esas a berhemê ye.”⁴⁶

Di vê mijarê de Boratav jî İlaydın piştrast dike ku, di çîrokên gelêrî de bûyer li derdora evînê cereyan dikin lê di çîrokan de li ser evînê nayê israrkirin. Lê ew li dij e ku, mijara evînê wekî cudahiya herî karakterîstîk a di navbera çîrok û çîroka gelêrî de bê nîşandan. Çunkî li gorî fikra Boratav, gelek çîrokên gelêrî hene ku mijara wan ne evîn e. Boratav dibêje ku taybetmendiya sereke ya ku çîroka gelêrî ji çîrokê vediqetîne ew taybetmendî ye ku, çîroka gelêrî digihîne kevneşopa destanê. Yanî dengbêj bûyeran wekî ku bi rastî qewimîbin qebûl dike û bi vegotîneke stranî neqil dike. Lê di çîrokan de her kes, hem çîrokbêj û hem jî guhdar dizanin ku tiştên ku behs ji wan tîn kirin, bi rastî neqewimîne û her wiha vegotîneke stranbêjî di çîrokan de nîn e.⁴⁷

Lê dîsa jî Boratav balê dikişîne ser tîkiliya çîrok û çîroka gelêrî û wiha dibêje:

⁴⁵ Boratav, *Halk. Hik. Ve Halk. Hikayeciliği*, r. 64

⁴⁶ Hikmet İlaydın, *Makaleler*, Weşanên Aydın Kitabevi, Ankara, 1999

⁴⁷ Boratav, *Halk. Hik. Ve Halk. Hikayeciliği*, r. 64-66

“Rewşeke ku em pir lê rast tîn jî ev e ku, epîzot an jî hin motîfên çîrokan ketine nava çîrokên gelêrî. Di hin rewşan de, hema bêje bi tevahî çîrokekê, wekî ku epîzoteke çîroka gelêrî be, tevli wê dibe. Carina jî çîrok bi hostetî tê perçekirin û li çend epîzotan tê dabeşkirin û wilo di bunyeya çîroka gelêrî de cihê xwe digire. Lewre jî tehlîla ji aliyê motîf û çîrokî ve ya çîrokên gelêrî û muqayeseya wan bi hev re, gelekî girîng e.”⁴⁸

Bi rastî jî em vê nêrîna Boratav li çîroka gelêrî ya Siyabend û Xecê –ku bermaya destaneke dêrîn e- dikarin tetbîq bikin. Çunkî li vê derê hin serboriyên Siyabend, bêyî ku bi mijara esas a destanê ve tu eleqeya wan hebin, yanî bêyî ku bi evîna Siyabend û Xecê re eleqeya wan hebin, di nava çîrokê de tîn dîtin. Lê dema ku em li Destana Memê Alan dinihêrin, tiştêkî wilo nabînin. Li wê derê her bûyerên ku diqewimin, bi evîna Mem û Zînê re tîkiliya wan heye.

Lêkolîner Otto Spies, taybetiyên hevpar ên di navbera çîrok û çîroka gelêrî de wiha destnîşan kirine:

- 1 Memleketê lehengan, memleketê çîrokan e. Wekî Hînd, Yemen, Tebrîz, Stenbol û hwd.
- 2 Navên lehengan bi pîranî navên di nava gel de berbelav nîn in.
- 3 Leheng, şexsiyetekî xwedî taybetmendiyên derasa ye û di navenda bûyeran de ye.
- 4 Leheng wekî lehengên çîrokan, xortê xweşdivî, keça xweşdivî ye.
- 5 Hemî leheng xwedî heman wesfîyet in; xweşikbûna wan, temenê wan her tim bi heman rengî tîn teswîpkirin.⁴⁹

Gelek lêkolîneran ev nêrîna Spies rexne kirine, ji ber kêmahî û xeletiyên wê.

Li gorî yek ji van lêkolîneran Hans August Ficsher; çîroka gelêrî ji çîrokê bi tevahî cuda ye. Ji bilî cudahiyên formî, ev cudahî hene:

- 1 Di çîroka gelêrî de, yê ku dixwîne, yê ku vedibêje (dengbêj/hîkayebêj) û yê ku guhdar dike jî xwedî helwesteke sêbjektîf in. Lê di çîrokê de ne wilo ye.

⁴⁸ H.b., r. 64-66

⁴⁹ Vgz, Boratav, *Halk Hikayeleri ve Halk Hikayeciliği*, r. 64-66

- 2 Digel ku di çîrokê de derasayî li pêş e û jiyana rastîn wekî xemlekê heye; di çîroka gelêrî de berevajî vê, jiyana rastîn li pêş e û derasayî wekî xemlekê heye.⁵⁰

Li gorî van hemî fikran, em dikarin cudahiyên di navbera çîrok û çîrokên gelêrî de wiha rêz bikin:

- 1 Çîroka gelêrî ji aliyê bi stranî gotinê ve, ji çîrokê vediqete. Çîrokên gelêrî ji aliyê dengbêj û hozanan ve bi rengekî stranî tèn gotin lê di çîrokan de ev yek nîn e. Yanî her du cure, di forma vegotinê de ji hev vediqetin.
- 2 Forma çîroka gelêrî hem helbestî hem pexşanî ye lê çîrok pexşan e.
- 3 Çîroka gelêrî dirêj e lê çîrok kurt e. Hin çîrokên dirêj jî hene.
- 4 Di her du cureyan de jî hêmanên fantastîk hene lê di çîrokê de zêdetir in. Di çîroka gelêrî de hêmanên fantastîk bi piranî di destpêk û dawiyê de ne.
- 5 Di çîrokan de evîneke hêsan û îptîdaî heye. Li ser evînê nayê israrkirin. Lê di çîrokên gelêrî de evîneke gihaştî û platonîk heye.
- 6 Di çîrokan de çîrokbêj û guhdar xwedî helwesteke objektîf in lê di çîrokên gelêrî de hem hikayebêj/dengbêj û hem jî guhdar/civat xwedî helwesteke sûbjektîf in.

Jihev cudakirina çîrok û çîroka gelêrî, wekî ku ji van tesbîtên jorîn jî xuya dike, mijareke zêde zor nîn e. Lê di jwariya lêkolîneran ev e ku; çawa wê destan û çîrokên gelêrî ji hev bèn cudakirin. Gelek lêkolîneran, ji ber ku çîrokên gelêrî wekî bermayên destanan dîtine, zêde serê xwe bi vê pîrsgirêkê re mijûl nekirine. Ya rast di navbera wan de pîr cudahiyên piçûk hene. Hin lêkolîneran, ji ber ku çîrokên gelêrî wekî berhemên zargotinî yên ku piştî sedsalên XIII û XIVan derketine dîtine; cudahiyeke kronolojîk xistine navbera destan û çîroka gelêrî. Lê hemî cureyên ku ji wan re *destan* an jî *çîroka gelêrî* tèn gotin, li gorî vê tercîha kronolojîk, ji hev nikarin bèn cudakirin. Mînak di nav kurdan de ji “Kela Dimdimê” re jî, ku di sedsala XVIIan de pêk hatiye, destan hatiye gotin. Hingê tê dîtin ku, bi cudakirina li dû kronolojiyê jî, pîrsgirêk bi tevahî çareser nabe.

Boratav li ser vê yekê wiha dibêje:

⁵⁰ Vgz. Boratav, *Halk. Hik. Ve Halk. Hikayeciliği*, r. 64-66

“Dema ku em behsa t kiliya destan    roka gel r  dikin, div  em  rok n gel r  wek  form n xerab y  y n destanan an j  destan n ku taybetmendiya xwe ya ep k winda kirine, neb nin. Div  em, wan wek  curey n edeb  y n n  ku,  rt n n  ew afirandine, bib nin. Dibe ku mijar n wan   destanan yek bin j .”⁵¹

Taybetiyeke hevpar a destan    rok n gel r  ev e; veb j pi t  ku ji qeyd n dem    mekan  xelas dibe, yan  pi t  ku bi kurt  wan neq l dike, yekser derbas  aksiyona berhem  (b yer ) dibe. Di berhem n niv sk  de ev k m e l  di y n bi xwezay  t n neq lkirin de, h kayeb j p    wek  ku behsa b yereke pir li d r   di demeke pir ber  de qewimiye dike, wek  ku dest bi  rokek  bike, dest p  dike. L  d re h d  h d  ji qeyd n dem    mekan  xelas dibe   tevli h kayey  dibe, p  re dij . Di v  k liy  de tems la destan  dest p  dike. H kayeb j dico e, wek  karakterek  di nav h kayey  de, h kayeya xwe vedib je. Carcaran digir  heta ji xwe ve di e, dikeve. D re d sa vedigere ser  rok . Ev xus siyeta hevpar a destan    roka gel r  ye.⁵²

Ji van hemiyan diyar dibe ku,  roka gel r  ku wek  cureyeke n    orj nal derketiye meydan , h  j  gelek taybetmendiyan destan  di nava xwe de dipar ze. L  ev taybetmend , ne ew taybetmend  ye ku, karaktera w  diyar dike. Kevne opa destan  her ku di e z f dibe.  unk  ew  rt n civak  ku, karakter n esas  y n destan  tayin dikin, her ku di e ji meydan  radibin.

Eger ku em ji aliy  form  ve li destan    rok n gel r  binih rin, form n destanan  n destp k , teqez nezm  ne yan  helbest  ne.  unk  ew berhem n dewr n ber  ne ku, b yer   serp hatiy n gir ng  n civak    bi taybet  leheng , bi vegotineke helbest  dihatin gotin. L   ro, hin berhem hene ku, digel ku em ba  dizanin ew destan in j , ew di formeke nezm   nesir t kel de ne; lewma wek  ku me li jor j  destn  an kirib  ew bermay n destan n kevnar in l  ji aliy  form  ve hinek  guher ne.

B guman cudahiyeke d  ya berbi av j  ev e ku; destan ji aliy  h man n fantast k ve gelek  xurt in yan  mirov dikare di war  h man n fantast k de j  cudahiyeke bixe navbera destan    roka gel r . M nak di nava civaka kurdan de Destana Mem  Alan   Destana Siyabend   Xec , ji aliy  h man n fantast k ve, gelek  xurt in l  h kayeya “Cembel    Binev ”   “Derw  e Evd    Ed l ” ji aliy  h man n fantast k ve ew  end ne xurt in. Her  end  ku her  ar berhem n zargotin , ji aliy  form  ve bi tevah  di ibin

⁵¹ Boratav, *Halk. Hik. Ve Halk. Hikayecili i*, r. 57-63

⁵² H. b., r. 57-63

hev jî yanî nezm û nesir têkel in jî, “Memê Alan” û “Siyabend”, destan in an jî çîrokên gelêrî yên bermayên destana ne lê “Derwêşê Evdî” û “Cembelî” çîrokên gelêrî ne.

Li aliyê dî gelek lêkolîner, li ser mijara çîrokên gelêrî sekinîne. Wekî mînak, Îgnaz Kunoş ji aliyê mijarên wan ve çîrokên gelêrî wiha tesnîf kirine:

1. Çîrokên lehengiyê.
2. Çîrokên hunermendên sazê/Ozan-Dengbêj.
3. Çîrokên lehengî û helbestvanên sazê.⁵³

Li gorî fikra Nihat Sami Banarlı, mirov dikare wan di sê beşan de tesnîf bike.

1. Çîrokên lehengî yên menqibeyî.
2. Çîrokên evînê.
3. Çîrokên ku ji wêjeya klasîk derketine.⁵⁴

Hikmet Îlaydın hîkayeyên rojhelatî, li gorî mijara wan di binê sê sernavan de civandine.

1. Mijarên dînî (Mewlûd).
2. Mijarên neteweyî, destanî (Şehname, Îskendername).
3. Mijarên evînî (Leyl û Mecnûn)⁵⁵

Lê Boratav ketiye dû tesnîfeke hêsantir û di cih de û ew li du beşan veqetandine.

1. Çîrokên lehengiyê.
2. Çîrokên evînê.⁵⁶

Li gorî fikra Boratav, hîkayeyên evînê li du beşan dikarin bînin veqetandin. I. Hîkayeyên ku lehengên wan xeyalî ne. II. Hîkayeyên ozanên ku ji aliyê gel ve tînin zanîn û di demeke diyar de jî ya ne.⁵⁷

Der bareyê jêdera çîrokên gelêrî de jî mirov dikare bibêje ku, bi piranî mijara xwe ji bûyerên qewimî wergirtine. Bêguman li vê derê ji peyva ‘*bûyerên qewimî*’ mebest ev e ku; ew bûyer yan bi rastî qewimîne yan jî gel wilo bawer dike ku ew qewimîne. Her wiha çavkaniyên edebiyata klasîk jî bûne mijara çîrokên gelêrî. Wekî,

⁵³ Boratav, *Halk. Hik. Ve Halk. Hikayeciliği*, r. 70

⁵⁴ Vgz., Boratav, *Halk. Hik. Ve Halk. Hikayeciliği*, r. 120-127

⁵⁵ Hikmet İlaydın, *Makaleler*, Weşanên Aydın Kitabevi, Ankara, 1999

⁵⁶ Vgz., Boratav, *Halk. Hik. Ve Halk. Hikayeciliği*, r. 120-127

⁵⁷ h.b., r. 120-127

Leyla û Mecnûn, Ferhad û Şîrîn, Mem û Zîn. Ji bilî van, berhemên wekî Şehname, Tûtîname û Çîrokên Hezar û Yek Şev jî ji bo çîrokên gelêrî bûne jêder.

Xaleke balkêş jî ev e ku, hin stranên anonîm hene ku piştî xwe dispêrin hin bûyerên ku qewimîne; yanî ew stranên ku behsa bûyerê dikin, çi evîni û çi jî lehengî. Wekî ku tê zanîn di zargotina civaka kurdan de mînakên vê cureyê gelekî zêde ne. Strana *Lawikê Metîni*, *Emê Gozê*, *Ahmedo Ronî* û hwd. Ev hemî stranên anonîm, bi rastî piştî xwe dispêrin hin qewimînên çîrokî lê em nikarin wan wekî çîrokên gelêrî binav bikin. Di stranên çîrokî de bi temamî vegotina stranî li pêş e. Vegotina pexşanî hîç nîn e yan jî ku hebe jî, ev ji bo şîroveya stranê ye. Lê di çîrokên gelêrî yê mezînde, hêmana esasî li ser pexşanê ye. Di van çîrokên gelêrî de, pexşan li pêş e û stran wekî xemla berhemê ye. Yanî hem ji aliyê dirûvî ve di navbera wan de cudahî hene û hem jî ji aliyê avahiya hikayeyê ve cudahî hene.

2.5. Folklor û Edebiyat

Ji ber taybetmendiya wê ya gelêrî, têkiliya folklorê bi gelek cureyên zanistan re heye; wekî, dîrok, etnografya, etnolojî, antropolojî, sosyolojî û psîkolojî. Lê têkiliya wê ya herî dînamîk û dualî bi edebiyatê re ye.⁵⁸

Folklor, wekî zanistekê mijarên gelekî fireh di nava xwe de dihewîne. Ev mijar, hemî hêmanên çanda madî û manewî yê civakê digirin nava xwe. Wekî mînak; cil û bergên netewî an herêmî, lîstik û govendên gelêrî, bawerî û tabûyên kevneşopî, civîn û merasîmên civakî, zargotin û heta bi çanda navlêkirin, sondxwarin, rabûn û rûniştinê jî dibin mijarên folklorê. Lê têkiliya edebiyatê bi folklorê re bêtir di ser zargotinê de pêk hatiye. Yanê destan, efsane, çîrok, çîrokên gelêrî û gelek cureyên di yê zargotinê di heman demê de wêjeya gel ya anonîm pêk tînin. Em bi giştî ji hemî van berhemên ko di encama afirîneriya hevpar ya civakê de derketine re, zargotin dibêjin.

Zargotin an jî wêjeya gelêrî, di nava zanista folklorê de xwedî cihekî taybet û gelekî girîng e. Peywendiya di navbera zargotin û edebiyatê ji du aliyên ve girîng e. Yek jê; bi giştî bandora berhemên gelêrî ya li ser wêjeya klasîk û modern e. Ya di; piştî derketina zanista folklorê, derketina meyleke nû ya bi ser çand û zargotina civakê û bi vê bandorê peydabûna êkolên nû di nava cîhana edebiyatê de ye. Ji ber ku me di beşa

⁵⁸ Erman Artun, *Türk Halkbilimi*, Weş. Kitabevî, Çap. 6, İstanbul, 2010, r. 21-22

folklorê de behsa prosesa derketina zanista folklorê kiribû, em ê di vê beşê de bi kurtî li ser bandora berhemên zargotinî ya li ser wêjeya klasîk û modern bisekinin.

Dema ku em bala xwe didin destpêka derketina berhemên nivîskî yên edebî, em li kaniya zargotinê rast tên. Nivîskar Homeros, ku berî mîladê jiyaye, ji destan û efsaneyên gelê yûnanî îlham girtiye û bêguman afirîneriya xwe ya edebî tevli wan kiriye û du berhemên şaheser ên bi navê “Ilyada” û “Odesia” diyarê miletê yûnan û her wiha diyarê hemî miletên cîhanê kiriye. Dema ku em van berheman dixwînin, em tê de rastî hêzeke wilo ya edebî-gotinî tên ku, ew hêz belkî hê îro jî nehatiye buhartin. Lewma ev berhem, berhemên herî mezin ên cîhanê ne û her wiha îspata hêza zargotina gel û têkiliya wê ya bi wêjeyê re ne.

Li aliyê dîn, Hindistan, ji aliyê gelek zanyar û lêkolîneran ve wekî kaniya zargotin an jî çîrokên hemî cîhanê, hatiye dîtin. Berhema bi navê “Pançatantra”, di derbaskirina nivîsê ya çîrokên gelêrî de, berhemeke gelek girîng e. Her wiha di mijara têkiliya di navbera wêjê û zargotinê de jî cihekî girîng digire.

Li Îranê, “Şehname”ya Fîrdewsî, belkî hêjatirîn berhem e bo nîşaneyê têkiliya di navbera zargotin û edebiyatê de. Nivîskar Fîrdewsî, vê berhema xwe ya hêja deyndarê çanda îranî ye ku ev çand, ji çanda miletê kurd û pers pêk tê. Dema ku em li efsane û destanên ku di vê berhemê de derbas dibin dinihêrin û dema ku em li lehengên Fîrdewsî dinihêrin û em bala xwe didin zargotina miletê kurd; em vê têkiliyê carekî dî ji nêz ve dibînin. Destanên Rustemê Zal û Efsaneyê Kawa mînak in ji bo vê têkiliyê.

Bêguman mînakên bi vî rengî dikarin bîrê dirêjkirin. “Gulîstan” û “Bostan”a Sadî, “Mantiqût Teyr”a Ferîdûn Attar, di vê mijarê de mînakên balkêş in. Berhemên bi vî rengî, bi piranî mesele, hîkaye û efsaneyên di nava gel de ji xwe re kirine bîngeh û bi afirîneriyeke wêjeyî ew ji nû ve nivîsîne.

Di wêjeya rojhelat û rojava de mînakên mîna Leyla û Mecnûn, Ferhad û Şêrîn, Weys û Ramîn, Wamiq û Ezra, Yûsuf û Zuleyxa, Mem û Zîn, Romeo û Juliet ji bo peywendîya di navbera zargotin û edebiyatê de mînakên balkêş in. Ev hemî berhemên ku ji pênûsa nivîskarên mezin derketine, di eslê xwe yê pêşîn de, berhemên zargotinî bûne lê dûre bi hêza hunerî ya van nivîskaran ji nû ve hatine afirandin. Her wiha berhemên bi vî rengî, ji aliyekî dî ve bandor li zargotinê kirine û nêrîna nû ku, wan li berhemên zargotinî kirine, ji nû ve bandor li dengbêj û ozanên ku veguhezêrên destanên kevneşopî ne, kiriye û rê lê vekiriye ku varyantên cuda di nava gel de belav bibin.

Dema ku em bala xwe didin wêjeya klasîk a kurdî, ev rastî car dî derdikeve pêş me. Di cîhana edebiyata kurdî de, berhemên mîna *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî ku, şahesera edebiyata klasîk a kurdan e, di encama vê têkiliya di navbera zargotin û edebiyatê de derketiye meydanê. Dîsa berhemên helbestkarê mezin Feqiyê Teyran ên wekî Zembilfiroş, Bersîsê Abid, Kela Dimdimê⁵⁹ mînakên balkêş in. Her wiha têkiliya herî karakterîstîk a di navbera zargotin û edebiyatê de di mînaka helbestkar, dengbêj Selîm Silêman de derdikeve pêş me ku, ew hem dengbêjekî navdar e û hem jî berhemeke klasîk mîna Yûsuf û Zuleyxa nivîsiye.

Mînakên peywendiya di navbera berhemên zargotinî û wêjeya nûjen de, di sedsala dawîn de, zêdetir derdikevin pêş me. Ev yek hem ji bo wêjeya modern a hemî cîhanê û hem jî ji bo wêjeya nûjen a miletê kurd bi heman rengî ye.

Di vê sedsala dawîn de di berhemên nivîskarên mîna Ebdurehîm Rehmî Hekarî, Erebe Şemo, Eliyê Evdirehman, Nûreddîn Zaza, Cegerxwîn, Mehmed Êzûn de û her çend bi zimanê tirkî nivîsî be jî di berhemên Yaşar Kemal de, em bandoreke mezin a zargotina miletê kurd, destan û çîrokên gelêrî yên civaka kurd dibînin.

2.6. Di Folklorê de Motîf

Dema ku em bala xwe didin avahîsaziya çîrok, destan û efsaneyan; hem ji aliyê prosesa teşekilkirina rêzebûyeran hem jî ji aliyê hêmanên esasî yên ku hîkaye li serê rûdinê ve, em gelek hevbeşiyên dibînin. Ev hevbeşiya ku, ne bi tenê di navbera berhemên zargotinî yên devereke diyar de tê dîtin; lê di heman demê de di navbera hemî berhemên zargotinî yên her deverên dinyayê de dikare bê dîtin, bala gelek lêkolînerên folklorê kişandiye. Wekî mînak, lêkolînerên mîna Anti Aarne (1910), Vlademir Propp (1928) û Stith Thompson (1932-36) li ser van hevbeşiyên ku di çîrokan de derketine, lêkolînan kirine û ev hêman ango motîf, li gorî nêrîna xwe tesnîf kirine.

Li ser têgiha motîfê, dûre lêkolînerên wekî Arthur Christensen, Vlademir Propp, Veselovsky û Max Luthi pênaseyên curbecur pêş xistine. Hevbeşiya girîng a di navbera van pênaseyan de, nîşanî me dide ku, motîf perçeyeke girîng a honaka çîrok, destan û efsaneyan e. Bêguman teşekila fikrên van zanyaran ên li ser têgiha motîfê, bi dema ku ew tê de jiyane û lêkolînen ku wan kirine re ji nêz ve têkildar e.

⁵⁹ Bnr. Xalid Sadinî, *Feqiyê Teyran*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2011

Arthur Christensen, ku yek ji lêkolînerên girîng ê vê qadê ye, der bareyê motîfê de wiha gotiye:

“Motîf, di çîrokê de ew hêman in ku, bi dînamîkbûna xwe, xwe didin qebûlkirin, li dû zagoneke psîkolojîk ku nayê terîfkirin, guhdaran bi xwe ve girê didin û li gorî qalibên demî dikarin bên perçekirin an jî nûjenkirin. Yanî ji motîfên herî kevnar, ên ku li dû silsîleya fikrên îptîdaî hatine afirandin, terkîbên nû dikarin bên derxistin an jî ew motîfên esasî dikarin li perçeyan bên dabeşkirin.”⁶⁰

Veselovsky, motîfê wekî yekîneya herî piçûk ku nayê perçekirin terîf kiriye. Bi nêrîna Veselovsky; mijareke (çîrokî) di heman demê de rêzematîfekê ye. Yanî çîrok, bi rastî ji hatina cem hev a watedar a motîfan pêk tê. Li gorî nêrîna Veselovsky; di çîrokê de motîf di rêza sereke de tê. Mijar li dû wê ye. Mijar, meseleya afirandin û anîna cem hev a motîfan e. Li gorî nêrîna Vlademir Propp; motîf ew pêşnûma ye ku bi sîmgeyan tijî ye. Yanî girîngiya motîfê ji aliyê tiştê ku ew simbolîze dike ve tê, ango ew bi xwe simbol e. Formulîstê rûsî Tomachevsky, ji bo motîfê wiha gotiye: Motîf ew yekîneya tematîk e ku, di berhemên cuda de bi dubare derdikeve pêş me û nayê dabeşkirin an parçekirin. Stith Thompson ku, li ser motîfên çîrokan xwedî xebatên gelek hêja ye, ji bo motîfê wiha dibêje: Motîf, hêmana herî piçûk a çîrokê ye ku, ji berê de xwedî qabiliyeta jiyînê ye. Lêkolînerê Alman Max Luthi jî ji bo motîfê wiha pênase pêş xistiye: Motîf, hêmana herî piçûk a hîkayekirinê ye ku, xwedî ew şîyan e ku xwe di kevneşopa çîrokan de diparêze.⁶¹

Lêkolîner Doğan Kaya, ji bo motîfê pênaseyeke weha kiriye:

“Motîf, hêmana herî piçûk e ku; di cureyên mîna mîtolojî, çîrok, efsane, destan û çîrokên gelêrî de dikare bijî.”⁶²

Bêguman ji aliyê lêkolînerên folklorê ve navê ku derketiye pêş, Stith Thompson e. Thompson di berhema xwe ya bi navê “*Motif Index of Folk Literature*” de (Indeksa Motîfên Wêjeya Gel), di encama lêkolîna li ser çîrokên gelek deverî de, tesnîfa motîfan kiriye. Di vê xebata Thompson de ku ji şeş cildan pêk tê; di pênc cildên pêşîn de motîf hatine tesnîfkirin û di cilda dawîn de îndeksa têgihên ku di van cildên pêşîn de derbas

⁶⁰ VgZ., Abdulbasit Sezer, *Murathan Mungan Ve Halk Bilimi*, Weşanên Maya, r.14-17

⁶¹ VgZ., A. Sezer, *M. Mungan Ve H. Bilimi*, Weşanên Maya, r.14-17

⁶² D. Kaya, *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*, Weş. Akçağ, Ankara., 2007, r. 532

dibin hatiye dayin. Li gorî tesnîfa Thompson, motîfên ku di hemî çîrokan de hene, di binê 23 sernavên cuda de dikarin bî tesnîfkirin. Ev sernav bi vî rengî ne:

- A- Motîfên Mîtolojîk
- B- Motîfên Heywanan
- C- Qedexe
- D- Sêhr
- E- Mirin
- F- Derasayî
- G- Motîfên Dêwan
- H- Îmtîhan
- I- Bîaqîl û Bêaqîl
- K- Xapandin/Hîle
- L- Berevajîbûna Siûdê
- M- Tayinkirina Pêşerojê
- N- Siûd û Şans
- P- Civak
- Q- Ceza
- R- Esaret û Firarîbûn
- S- Zûlmên Anormal
- T- Cinsiyet
- U- Xwezaya Jiyanê
- V- Dîn
- W- Taybetmendiye Karaktera
- X- Mîzah
- Z- Komên Curbecur Yê Motîfan

Li gorî fikra Thompson; divê motîf, taybetmendiye wan ên baldar û derasa hebin. Di vî mijarê de Thompson balê dikêşe ser sê beşên esasî. Yek jê kesayet in; wekî xweda, heywanên derasa, mexlûqên derasa (sêrbaz, dêw, perî û hwd). Ya duyem; tiştên ku di bûyeran de li pişt perde dimînin in; eşyayên bi sêhr, kevneşopên xerîb,

baweriyên xerîb û hwd. Ya sêyem; bûyerên taybet in. Ev beş piraniya motîfan teşkîl dike.⁶³

Saim Sakaoglu, der bareyê girîngiya motîfan a di çîrok û çîrokên gelêrî de, wiha dibêje:

“Têgiha motîfê di warê Zanîna Gel de pir bi berfirehî tê bikaranîn. Cureyên wekî çîrok, çîrokên gelêrî û efsane, li ser motîfan tîr avakirin. Em dizanin ku hin efsane û çîrok bi tenê li ser motîfekê hatine înşakirin. Lê piraniya çîrokan û hemî çîrokên gelêrî, ji yekê zêdetir motîfan digirin nava xwe.”⁶⁴

Lêkolîner Ali Berat Alptekin, bi nêrîneke firehtir li motîfê dinihêre. Li gorî fikra Alptekîn; motîfa ku di neqîş, resim û mîmariyê de derdikeve pêş me û ya ku em di berhemên zargotinî de dibînin, ji hev gelek cuda ne. Tiştêk, ji bo ku di berhemên zargotinî de bibe motîf, divê derasa be. Ev derasayî dibe ku di leheng de, di bûyerê de, di demê de, di mekan de bi kurtahî di her prosesa pexşana gelêrî de derkeve pêş me.”⁶⁵

Der bareyê lêkolînên li ser çîrokan, avahîsaziya çîrokê û motîfên çîrokan de, yek ji hêjatiyên xebat, xebata Vlademir Propp a bi navê “*Dirûvsaziya Çîrokê*” ye. Ev xebat di sala 1928an de hatiye çapkirin. Wergêr Mehmet Rifat, armanca xebata Propp bi vî rengî vegotîye: “Armanca; di nava bi hezaran çîrokên ku li cûrbecûr deverên cîhanê hene de, keşîfkirina hêmanên hevbeş ên ‘bi fonksiyon’ e, ango bi îfadeyeke dî; destnîşankirina zagonên neguhêrbar e ku ev avahiya çîrokên gel saz dikin.”⁶⁶

Propp, di encama xebatên xwe yê li ser cûrbecûr çîrokan de, gihîştîye çar taybetmendiyên bingehîn. Ev bi vî rengî ne:

1. Di çîrokan de hêmanên ku berdewamiyê teşkîl dikin, ji nasnameya leheng bi renekî cuda, ji rêbazê jiyîna wî bêrî bi fonksiyonên ku ew pêk tîne re girêdayî, derdikevin meydana. Ev fonksiyon beşên esasî pêk tînin û avahiya bingehîn a çîrokê li ser wan rûdinê.
2. Di çîrokên gel ên ku mijarên wan derasayî ne de, hejmara van fonksiyonan bisînor in.
3. Rêzbûna/Merheleya derketina van fonksiyonan di prosesa çîrokê de, her tim bi heman dorê ye.

⁶³ Vghz., A. Sezer, M. Mungan Ve H. Bilimi, Weşanên Maya, r.14-17

⁶⁴ Saim Sakaoglu, *Anadolu Türk Efsanelerinde Taş Kesilme Motifi ve Bu Efsanelerin Tip Kataloğu*, Ankara, 1980, r. 23

⁶⁵ Ali Berat Alptekin, *Halk Hikayelerinin Motif Yapısı*, Weş. Akçağ, Ankara, 1997, r. 297

⁶⁶ Vghz., A. Sezer, M. Mungan Ve H. Bilimi, Weşanên Maya, r.14-17

4. Hemî çîrokên derasa xwedî heman avahîsazî(tîp-yapı) ne.⁶⁷

Bi kurtî em dikarin ji bo motîfê pênaseyêke wiha bikin ku; ew di berhemên zargotinê de ji aliyê avahîsaziya vegotinê ve hêmanên herî biçûk in ku hem bi serê xwe wateyêke wan heye û hem jî di nava vegotinê de, di bunyeya hîkayeyê de ji xwe re cih dibînin û dibin perçeyêke wê. Ew bi heman wezîfeyê ji çîrokek derbasî çîrokeke dî dibin û di temamkirina avahiya vegotinê de roleke girîng dilîzin. Carina dibe ku li gorî dem û deverê di forma wan de hin guherîn çêbibin jî lê ev yek bandor li wezîfeya wan ya bingehîn nake. Di bunyeya wan de hêza afirîner ya civakê û xeyalên civakê krîstalîze dibin û ew vedigerin sembolekê.

Her wekî ku, motîfa Xocê Xizir, bi serê xwe jî wateyêke wê heye lê di heman demê di avahîsaziya gelek berhemên zargotinê de ji xwe re cih dîtiye û bûye perçeyêke hîkayeyê. Her wekî ku ev motîf bi heman wezîfeyê di gelekî çîrokan de derdikeve pêş me û di temamkirina prosesa hîkayeyê de roleke girîng dilîze. Dîsa her wekî motîfa Ava Heyatê ku em bi curbecur forman, wekî giyayê nemiriyê, kaniya heyatê dikarin di destan û efsaneyan de lê rast werin. Û dema ku em li van her du motîfan jî dinihêrin, ew, halên herî krîstalîze yên xeyalperestiya civakî di bunyeya sembolên wiha de tînin wicûdê û bi rêya berhemên zargotinê ji deverê derbasî deverê dî dikin û ji dewrekê neqlî dewreke dî dikin. Û bi vî rengî di çîrok, efsane û destanan de hêmanên herî esasî ne ku berdewamiyê teşkîl dikin.

Li vê derê pirsê girîng ev e ku; eger em berhemên zargotinê ji van motîfan xalî bikin hingê wê çi bimîne li meydana? Wekî ku em ji Destana Memê Alan, motîfa Xocê Xizir derxin, (ku bave Mem bi alîkariya wî dikare bibe xwedî zarok yanî Mem tê dinyayê) yan jî em ji destanê motîfa periyan derxin (ku Mem û Zîn bi alîkariya wan hev dibînin) hingê wê ji berhema zargotinê çi bimîne. Bêguman wê tu tiştêke nemîne; ji bilî hin qalibên gotinê. Hingê em dikarin bibêjin ku, wekî ku lêkolîner Veselovsky jî qeyd kiriye; çîrok bi xwe, ji hatina cem hev a watedar a motîfan pêk tê.

⁶⁷ Vladimir Propp, *Masalın Biçimbilimi*, wer. Mehmet Rıfat-Sema Rıfat, Weş. BFS, İstanbul, 1985, r. 6

BEŞA YEKEM

LI GORÎ ÇEND EPÎZOTAN MUQAYESEYA MEMÊ ALANA FOLKLORÎ Û MEM Û ZÎNA EHMEDÊ XANÎ

Epîzot: Di cureyên wêjeya gelêrî yên wekî destan, çîrok û çîrokên gelêrî de; ji pasajên metnekî, yên ku ji hev cuda dibin lê bi mijara bingehîn re têkiliya wan hene re tê gotin. Ev cure pasaj, hev tamam dikin û teksta bingehîn tînin wicûdê.

Di şûna vê têgihê de, têgihên mîna *beş*, *xeleka bûyeran* an jî *rêza bûyeran* jî hatine bikaranîn.

Di çîrokeke gelêrî de bi piranî ev epîzot derdikevin pêş me:

1. Malbata leheng, 2. Hatina dinyayê ya leheng, 3. Perwerdeya leheng, 4. Rasthatina leheng li hezkiriyê, 5. Evîndarbûna leheng, 6. Derketina derve ya leheng, 7. Kesên ku dibin asteng li pêş gihaştina leheng bo hezkiriyê an jî hezkiriyê bi yekê dî re zewicandin, 8. Vegera leheng ya memleketê xwe, 9. Encam.⁶⁸

Di vê beşê de, em ê li gorî çend epîzotan danberhevekê di navbera hin varyantên folklorî ên Memê Alan û *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî de bikin. Di tesbîtkirina varyantan de me kitêba Qanatê Kurdo, ya bi navê *Mem û Zîn Duwanzde varyant* û *Memê Alana* Roger Lescot ji xwe re kire bingeh û me di her epîzotê de ev varyantên Memê Alan, bi *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî re muqayese kirine. Di kitêba Qanatê Kurdo de duwanzdeh varyant hene. Lê ji van duwanzdeh varyantan, varyanta sisiyan (III) ji ber ku bi tevahî wekî *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî ye, me wekî varyant ew daye lê li derveyê nîrxandinê hiştiye. Dîsa di vê kitêba navborî de, varyanta duwanzdan (XII) bi zaravayê soranî ye. Ji ber pîrsgirêkên muhtemel ên zaravayî, me ev varyant jî li derveyê nîrxandinê hiştiye û wekî varyant nedaye. Di destpêka muqayeseya her epîzotî de, me pêşî varyanta Roger Lescot daye û dûre varyantên ku di kitêba Qanatê Kurdo de derbas dibin dane û herî dawî me epîzotên têkildar li gorî *Mem û Zîna* Xanî dane. Li gorî rêza ku me di vê xebatê de ev epîzot nîrxandine, varyant bi vî rengî ne:

⁶⁸ D. Kaya, *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*, Weş. Akçağ, Ankara., 2007, r. 313

- Varyanta R.** Me tu hejmar nedaye vê varyantê. Bi navê berhevkar hatiye binavkirin Lescot.
- Varyant I.** Gotin: Fekoyê Miraz, ji nehiya Axbaranê, gundê Gozelderê. Nivîsîn: E.Evdal.
- Varyant II.** Ji kitêba Albert Sosin “Kurdische Sammlungen” St.-pb.1887
- Varyant III.** Resume de l’ouvrage kurde d’Ahmed Effendi Xani, fait et traduit par A. Jaba, 1857
- Varyant IV.** Ji kitêba Le Coq kurdische texte, Berlin 1903, rûpelên 36-43
- Varyant V.** Gotin: Mihemedê Amînê, ji Mêrdîn. Nivîsîn: G. Makkaş, Tekstên kurdî, Lengîngrad 1926
- Varyant VI.** Qanatê Kurdo, ji destnivîsara Hartman bi alfabeya latînî nivîsî, Destnivîsxana înstîtûta rohilatnasiyê ya akademiya Leningrad.
- Varyant VII.** Gotin: Mihemed Sadiq, ji Bamernê li Behdînan. Nivîsîn: Maxsimê Xemo
- Varyant VIII.** Gotin û nivîsîn: Ardaşê Emo (Arabov)
- Varyant IX.** Gotin: Memliyê Eliyê Evdalê Xemo, li nehiya Aragasê. Nivîsîn: Maxsimê Xemo
- Varyant X.** Ji kitêba “Folklora Kurdî, Êrevan 1936” ya Heciyê Cindî
- Varyant XI.** Gotin: Xudoyê Qaso, ji nehiya axbaranê, gundê Karvanserê, Nivîsîn: E. Evdal
- Mem û Zîn.** Ehmedê Xanî. Ji kitêba Prof. Kadri Yıldırım, Mem û Zîn, Çeviri ve Kavramsal Tahlili.

Me di nirxandina her epîzotê de, pêdivî nedîtiye ku em çavkaniya van varyantan ji nû ve bidin. Lewma me bi tenê hejmara wan daye. Wekî mînak: Varyant I, Varyant II û hwd.

Di vê beşa teza xwe de, min varyantên folklorî yên Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî, di binê pênc epîzotan de daye ber hev. Ev epîzot bi vî rengî ne:

1. Mekan û Statuya Civakî ya Mem û Zînê
2. Hevdîtina Ewil a Mem û Zînê
3. Gihaştina Hev a Mem û Zînê
4. Mirina Mem û Zînê
5. Kuştina Beko

1.1. Mekan û Statuya Civakî ya Mem û Zînê

Roger Lescot di pirtûka *Memê Alan* de, ku ew bi xwe dibêje ku wî gelek varyant anîne cem hev û ji van hemî varyantan varyanteke nû derxistiye, bi rengekî bi detay behsa malbata Memê Alan dike. Her wiha behsa cih û warê Mem, welatê Mem dike. Li gorî varyanta Roger Lescot, Mem ji bajarê/welatê Mixribiyana e û kurê Padîşahê Mixribiyana e. Her wiha di vê varyantê de, bavê Mem û dûre Mem bi xwe wekî ‘Padîşahê Kurdistan’ tê binavkirin. Ev yek xaleke balkêş e. Ji ber ku, her çendî ku di varyantên dî de jî welatê ku Mem jê hatiye, wekî Muxrubzemîn yan jî Mixribiyana hatiye binavkirin jî behsa Mem û ‘padîşahiya Kurdistan’ nehatiye kirin. Her wiha hem di varyantên dî de û hem jî di varyanta Lescot de, her tim bajarê Mixribiyana, wekî cihekî ku ji Cizîra Botan pir dûr be hatiye teswîrkirin. Di hin varyantan de derbas dibe ku, Mem bi hespê xwe yê efsaneyî; Bor an jî Bozê Rewan (Li gor varyanta Lescot ev hesp ji behrê derketiye) encax di şeş mehan de karibûye bigihîje Cizîra Botan. Li gorî hin varyantên dî ew, digel ku bi hespekî derasa derdikeve rê jî, encax di çil roj û çil şevan de karibûye bigihîje Cizîra Botan. Yanî em vê yekê têdigihên ku, di çîroka kevna de, bajarê Mixribiyana û Cizîra Botan du cihên ji hev gelekî dûr in. Bêguman di dîrokê de cihekî, welatekî an jî bajarekî bi navê Mixribiyana an jî Muxrubzemîn derbas nabe. Yanî ev wekî warekî xeyalî xuya dike. Her çendî ku di çîrokên gelêrî û destanan de yan jî di mît û efsaneyan de em rastî derine xeyalî yan jî hin heyinên xeyalî tên jî; wekî *Çiyayê Qaf*, yan jî *Teyrê Anqa*; Muxurzemîn li gorî van ew çend ne xeyalî ye. Çunkî ji wateya peyvê ku, bi eslê xwe ji erebî tê, em têdigihên ku ev dereke li gorî Cizîra Botan li rojava ye. Peyva *Muxrub*, tê wateya *êvar* e. *Zemîn* jî wekî ku tê zanîn bi wateya *cih* û *mekan* e. Yanî em dikarin vê şîroveyê bikin ku, ev bi wateya cihê ku roj lê diçe ava, hatiye bikaranîn. Bi giştî çî *Mixribiyana* û çî jî *Muxurzemîn*, tên wateya *Rojava*. Eger em li ser wateya taybet a vê peyva *Rojava* bisekinin; ev yek di çîrokan û destanan de gelekî derbas dibe. Şaristaniya ku em çî ji pirtûken kevin wekî Herodotos, Anabasis dizanin û çî jî ji pirtûkên kevin ên çanda îranî dizanin; cîhan di dewrên berê de li du beşan hatibû dabeşkirin. Yek Rojhelat û ya dî Rojava. Tixûbê vê cîhanê jî bi piranî Deryaya Spî û deryaya ku îro em jê re dibêjin Ege, bû. Yanî ji wê derê û vir ve wekî rojhelat û ji wê derê wir de jî wekî rojava dihate zanîn. Û di navbera van her du şaristaniyan de, wekî ku Herodotos jî behs dike yan jî wekî ku Homeros jî di pirtûkên xwe yên bi navê *Îlyada* û *Odesia* de behs dike, her tim destanên evîne qewimîne. Carina ji ber van têkiliyên evîne an jî qîzrevandinan şerên mezin derketine. Hingê em wekî şîroveyekê dikarin bibêjin ku, ji *Rojava* yan jî *Mixrib* mebest ne derekî ku li gor bajarê Cizîra Botan rojava

ye, li vê derê ji *rojawa* yan jî *Mixrib* mebest ew e, şaristaniyeke cuda ku, jixwe hingê cihan ji du şaristaniyan pêk dihat; Şaristaniya Rojhelat û Şaristaniya Rojava. Li dû vê yekê em dikarin bibêjin ku; digel ku hin lêkolîner, mîna Alaeddîn Seccadî û Abdulreqîb Yûsuf, îdîa dikin ku destan di dewrekî nêzî diyar de derbas dibe jî;⁶⁹ hem termînolojiya destanê ya ku kaniya xwe ji efsane û destanên arkaîk distîne û hem jî ji bilî Cizîra Botan nînbûna tu der, bajar, welat, dîrok an jî şexsiyeteke dîrokî û mûeyen, vê yekê nîşan dide ku ev destan di dewreke dêrîn û ne diyar de pêk hatiye.

Lê divê em vê yekê destnîşan bikin ku, di hin varyantan de jî welatê Mem wekî Yemen hatiye nîşandan. Em ê di vê beşê de binirxînin ku, ev yek li gorî varyantan çawa derbas bûye û di *Mem û Zîna* Xanî de çawa derbas dibe.

Varyanta R. Lescot

Di varyanta Roger Lescot de welatê Mem wekî Mixrib/Mixribîyan hatiye binavkirin. Her wiha bajar weke cihê ku li kêleka behrê be hatiye teswîrkirin û teswîra bajar yanî warê ku Mem lê dijî, bi vî rengî hatiye kirin:

Bajarê Mixribê bajarekî ezîm î pir giran e

Li ser heft çîyan e

Li ser sê sed û şêst û şeş qapiyan e

Her qapîkê li ser sê sed û şêst û şeş walîlixan e

Her walîlikê li ser sê sed û şêst û şeş midirlixan e

Ji bilî vê epîzotê di gelek cihên dî de behsa bajarê Mixribîyan derbas dibe. Di rûpela 22yan de tê gotin ku, li bajarê Mixribîyan miheleyeke bi navê Miheleya Qureyşîyan heye. Di rûpela 34an de jî dema ku Mem xwe bi Zînê dide naskirin, dibêje ku ew xwarziyê Şêxê Qureyşîyan e.⁷⁰ Her wiha di rûpela 25an de dema ku behsa hespê Mem, Bozê Rewan tê kirin, em têdigihên ku bajar li kêleka behrê ye. Çunkî torvanan tor avêtine behrê bo masiyan lê Bozê Rewan ketiye tora wan. Yanî hespê Mem wekî gelek hespên lehengên destan û efsaneyan, ji behrê derketiye û heywanekî mîtolojîk e.

Li gorî varyanta Roger Lescot; Mem kurê padîşahê Mixirbiyan e. Her wiha di hin cihên vê varyantê de, ji bo Memê Alan, danasa “*Padîşahê Kurdan*”, “*Siltanê*

⁶⁹ Alaeddîn Seccadî di pirtûka xwe ya Mêjûyî Edebî Kurdî de dîroka 1350 destnîşan kiriye û Abdulreqîb Yûsuf jî di pirtûka xwe ya Dîwana Kurmancî de dîroka 1451 destnîşan kiriye.

⁷⁰ Xwe bi rengê gihandina nijada mîletê ereb û ya Qureyşîyan, meyleke kevnar a mîr û begên civaka kurdan e. Lê ev yek nayê wê wateyê ku di orjînalîteya destanê de tiştekî wilo hebûye.

Kurdan” jî hatiye bikaranîn. Li gorî vê varyantê welatê Mixiribiyay ji aliyê sê birayan ve tê îdarekirin û navê wan *Elî Begê*, *Emer Begê* û *Elmaz Begê* ne. Mem kurê birayê mezin, *Elî Begê* ye. Di hin cihên vê varyantê de, Mixiribiyay wekî welatekî mezin û serbixwe hatiye teswîrkirin û di hin cihan de jî wekî bi tenê bajarekî musteqîl hatiye teswîrkirin. Jixwe her çendî ku ji bo Mem têgiha Padîşahê Kurdan hatibe bikaranîn jî, em ji danasên ku li dû navê bav û apên Mem hatine bikaranîn (Beg), têdigihên ku ew ji welatekî serbixwe bêhtir, bajarekî musteqîl îdare dikin.

Di vê varyantê de ji bo Zînê û cihê ku ew lê dijî, wiha hatiye gotin:

“Bavê wê waliyê bajarê Cizîra Botan e
Keça Mîr Zengîn, Zîna Zêdan e.”

Her çendî ku di vê epîzotê de, Zînê bi navê bavê xwe hatibe bibîranîn jî, di berdewamiya destanê de em têdigihên ku, bavê wê ne li heyatê ye û li şûna bavê wê birê wê Mîr Ezîn, îdareya bajarê Cizîra Botan dike. Her wiha Zînê, qelendayiya Çeko ye.

“Kurê Mîr Zengîn yek e, navê wî Mîr Ezîn e, niha li şûna bavê xwe Mîrê bajarê Cizîra Botan e.”

Li gorî vê varyantê, statuya civakî ya her du lehengan jî bi heman rengî ye.

Varyanta I.

Li gorî vê varyantê, statuya civakî ya Mem û Zînê û cihên ku ew lê dijîn bi vî rengî ye:

“Memê kurê Al paşa bûye li bajarê Muxir-zemînê, Zînê jî qîza Mîr Sêvdîn bûye: ji bajarê Cizîra Bota.”

Di vê varyantê de Zînê, bûka Qeretacdîn e. (Dergisitya Çekan an jî Erfan e.)

Varyanta II.

Di ve varyantê de behsa cih û statuya Mem zêde nayê kirin. Navê wî wekî Memê Ala derbas dibe. Dema ku Qeretacdîn, Mem bi Mîr dide nasandin wiha dibêje: Kurê Mîrê Alan e, paşayê Yemenê ye.

Zînê, xuşka Mîrê Cizîra Bohta, Mîr Zeydîn e, sitiya Cizîrê Bohta ye.

Varyanta IV.

Di vê varyantê de bi vî rengî behsa mekan û statuya civakî ya Mem tê kirin:

“Le wîlayetî Muxrîbê nefsî bajarî Muxrîbê dilî minî xane, bajarî Muxrikî reşî pane, le serî çel û çar koşane, le serî bîst û çar çiyane, le ser sê sed û şêst û şeş mehelane, we her mehelekî xa, sê sed û şêst û şeş minare zerave tê de venane.” Bajarê Muxrîbê li ber behrê ye.

Memê Alan kurê mîrê Muxrîbê, Şîrîn Alman e. Apên Mem, Rîcal Hesên û Şêx Îbrahîm in. Şîrîn Alman piçûkê her sê birayan e. (Di varyanta Roger Lescot de bavê Mem Elî Begê, mezinê her sê birayan e.) Navê diya Mem Zelîxa ye. Qîza Şêxê Qureyşîyan e.

Di vê varyantê de statuya Zînê û cihê ku ew lê dijî bi vî rengî ye:

“Qîza Mîr Ezîm, xuşka Mîr Zeydîn (di hin deran de wekî Mîr Zendîn derbas dibe), dotmama Hesên, Çeko, Qumsî Beko, Qeretajdîn e.”

Varyanta V.

Di vê varyantê de jî behsa cih û warê Memê Alan nayê kirin lê dema ku Mem xwe bi Qeretajdîn dide naskirin dibêje: Ez kurê Mîrê Alan im.

Zînê xuşka mîrê Cizîra Botan, Mîr Sevdîn e.

Varyanta VI.

Li gorî vê varyantê, Mem ji welatê Yemenê ye û kurê padîşahê Yemenê ye.

Zînê qîza Mîr Ebdal û xuşka Mîrê Cizîra Botan; Mîr Zeydîn e.

Varyanta VII.

Di vê varyantê de her çendî ku di statuya civakî ya Mem û Zînê de guherîn nîn e jî, cihên ku ew lê dijîn berevajî hemî varyantên dî ye.

Li gorî vê varyantê, Mem, kurê Mîrê Cizîra Botan e û Zîn, xuşka Mîrê Muxrezemînê; Mîr Sevdîn e

Varyanta VIII.

Li gorî vê varyantê, Mem ji bajarê Muxurzemînê ye, kurê Al-paşa ye. Lê di vê varyantê de, welatê Cizîrê li rojava ye, Muxurzemîn li rojhelat e. Her wiha wekî ku di varyantên dî de jî derbas dibe, dema ku li Muxurzemînê behsa Cizîra Botan tê kirin tu kes hay ji bajarekî wiha nîn e, yanî derekî ji Muxurzemînê pir dûr e.

Zînê, xuşka mîrê Cizîra Botan, Mîr Zendîn e.

Varyanta IX.

Di vê varyantê de jî Mem ji bajarê Muxurzemînê ye, kurê padîşahê Muxurzemînê ye. Navê bavê wî Al e.

Zînê, qîza Mîr Zeydîn, xuşka Mîrê Cizîrê; Mîr Sevdîn e. Dergistiya Çekan e.

Varanta X.

Mem ji bajarê Muxurzemînê ye. Kurê padîşahê Muxurzemînê, Al paşa ye.

Zînê ji bajarê Cizîra Bota, birazya Mîr Sevdîn, qîza mîrê Cizîra Bota; Mîr Seydîn e.

Varyanta XI.

Mem ji bajarê Muxurzemînê ye. Kurê padîşahê Muxurzemînê; Al paşa ye.

Zînê, ji Cizîra Bota, qîza Mîr Zeydîn, xuşka Mîrê Cizîra Bota; Mîr Sêvdîn e.

Zînê dergistiya Çeko ye.

Mem û Zîna Ehmedê Xanî

Li gorî *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî, Mem ne ji bajarê Yemenê ye û ne jî ji derekî bi navê Muxurzemîn e. Li gorî Ehmedê Xanî, Mem jî wek Zîn, ji bajarê Cizîra Botan e. Ehmedê Xanî wiha behsa Mem û Tacdîn dike:

10/23 Tacdîn weledê wezîrê dîwan

Mem jî xelefê debîrê dîwan

Ango, Tacdîn kurê wezîrê dîwana Mîr e, Mem jî kurê katibê dîwana Mîr e.

Xanî, Zînê wiha daye nasandin:

8/26 Ye'nî ku ji wî nejadê 'alî

Hemşîre dibû di laûbalî

Yek serwê riyadê rasitî bû

Wê navê bi rasitî "Sitî" bû

Ya dî ji dil û hinavê Mîr bû
Wê navi ji nîsfê navê Mîr bû

Rawî wehe gote min mu'emma:
Ew hûrî bi navê "Zîn" musemma

Xanî, Mîr Zeynedîn û welatê Cizîra Bohtan wiha daye nasandin:

8/3 Go: "Padîşahek zemanê sabîq
Rabû di hukûmeta xwe faîq

Ecnasê milel mutî'û munqad
Nesla wî 'Ereb, Emîrê Ekrad

Textê wî Cizîr û bexti Mes'ûd
Tali' qewî û meqami mehmûd

Rom û 'Ereb û 'Ecem di ferman
Meşhûri bi navê Mîrê Bohtan

Abaê 'îzam û cedd û walid
Mensûb û muselselêd Xalid

Cebbarê felek ji wî hizirkar
Meslûl ji sellê Seyfê Cebbar

Zîbendeê mulk û zeynê dîn bû
Navê wî emîrî Zeynedîn bû

Herwekî ku em ji van beytên jorîn jî têdigihên Xanî, wekî ku di hin varyantên folklorî de jî derdikeve pêş me (ku nijada Memê Alan, digihandin Qureyşîyan), Xanî nijada Mîr Zeynedîn digihîne Xalid bîn Welid ku navdarekî ereban e. Wekî ku me li jorê jî gotibû ev meyl, di demeke dirêj a dîroka milletê kurd de, wekî meyleke mîr û begên kurdan derdikeve pêş me lê bi realîteyan ve tu təkiliyeke vê îdayê nîn e.

1.2. Hevdîtina Ewil a Mem û Zînê

Di çîrokên gelêrî û destanan de hevdîtina lehengan gelekî girîng e. Lehengên destanan yan di dîtina cara yekem de aşiq dibin yan jî carina di xewna xwe de hezkiriya xwe dibînin û wilo evîndar dibin yan jî carina bi tenê resmekî hezkiriyê dibînin û wilo dikevin derdê evînê. Di Destana Memê Alan de jî hevdîtina Mem û Zînê, bi rengê ku di jiyana rastîn de dernakeve pêş mirov pêk tê.

Varyanta R. Lescot

Di varyanta Lescot de, sê perî tên cem hev û navê wan Tavbano, Stêrbano û Heyvbano ye. Her duyên mezin kincên xwe ji xwe dikin û ya piçûk, Stêrbano li wan heyran dimîne, lewma jî dipirse ku, di cîhanê de gelo kes ji wan xweşiktir heye yan na. Li ser vê yekê her du xuşkên dî jê re dibêjin ku Mem û Zîn hene ji wan xweşiktir. Li ser vê, her sê perî bi xwe biryar didin ku, Mem û Zîna ku xweşiktirînên hemî cîhanê ne lê hev nas nakin, bînin cem hev. Bi vî rengî şevêkê, dema ku Zînê, li ser textê xwe, di nava nivînên xwe de radizê, perî û cin, wê tevî textê wê heldigirin û dibin koşka Memê Alan, dixin odeya Memê Alan.

Li gorî vê varyanatê, hevdîtina yekem a Mem û Zînê bi vî rengî pêk tê:

Hebûn sê qîzên Padîşahê Periyane

Navê xwişka mezin Tavbano ye, navê xwişka navîn Heyvbano ye, Stêrbano navê biçûka xweyîngan e

Rojekê derketin çûn ser kaniya Gulane

Ji xwe danîn postên kewane

Ketine nava hewza gulane

Stêrbano nihêrî ku cemala ku xwedê daye herdû xwişkane, ne daye tu kesane

Postê xwe li xwe kir û rakir yê herdû xweyîngane

Di ser wan re firî da perwazane

Herdû xwişkan kirine bang û emane

Gotin: “Te çira rakir postê me herdû xweyîngane?”

Wê got: “Min hîn nediye mîna cemala we herdûyane!

Ez dikim çikî binihêrim li cemala we herdû xwişkane.”

Gotin: “Xweliya dinyayê bibare li serê me hersêyane!

Dido hene, yek qîz e, yek xort e, bi çelengiyê kesek nagihê wane

Yek kurê Mîrê Mixrîbiyane

Ew mîr padîşahê kurdan e,
 Ya din bavê wê waliyê bajarê Cizîra Botan e
 Keça Mîr Zengîn, Zîna Zêdan e.”
 Stêrbano got:“Bi kitêba bavê me, heta win raber min nekin Memê Alan û Zîna
 Zêdane
 Ez nebînim cemala van herdû lewend û eşqiyane
 Ez daneynim postê we herdûyane.”
 Herdû xwîşkan jê re qerar danîn, bi qewlekî tam û dilekî sadîqane
 Gotin: “Tu deyne em li xwe kin postane
 Emê îşev herin bajarê Cizîra Botane
 Zînê çek kin tabûta şahê Perîyane
 Bidine ser piyên çend periyane
 Rakin ji bajarê Cizîra Botane
 Li xwe xînin per û bazikane
 Şeva li yasiyan be, qerara tev bi şorê jinane
 Em ji te re Zînê deynin di qonaxa Memê Alan, payitexta Mixîbiyane
 Emê binihêrin li cemala wan herdû lewend û eşqiyane.”
 Li ser wê Stêrbano danî postên her du xweyîngane
 Her siyan pev ra post li xwe kirin ketin şiklê kewane
 Firiyan ji kaniya Gulane
 Hatine bajarê Cizîra Botane

 Her sê qîzan xwe avêtine bajarê Cizîra Botane
 Di daîra Zînê de ketine devê pencere û kulekane
 Nihêrîn ku Zîn raketîye di nava nivînane
 Li bin lingan û ber serî pire pire meşele û çirane
 Her sê xwîşkan xwendine îsmê periyane
 Pif kirine ser Zînê, xatûna pişt perdane
 Kirine wexmê miriyane
 Textê Zînê rakirin, dane ser piyê cin û periyane
 Tevî wan çiran û meşelane
 Anîne bajarê Mixribiyane
 Danîne di daîra Memê Alane
 Memo ketiye xewa şevane

Her sê xwişkan xwe avêtin devê kulekan û pencerane
Nihêrîn ko herdiyan jî çavên xwe venekirine ji xewane
Xwendin sivik ayeteke periyane
Pif kirin ser Zîna Zêdan û Memê Alane
Mem hişiyar bû ji xewa şevane
Nihêrî ku di odê da, her şev textê wî yek bû, îşev bûne didiyane

Varyanta I.

Di varyanta yekemîn de, bi heman rengî sê kevokên li ezman ku bi eslê xwe perî ne, xweşikiya Zînê dibînîn û ji hev re dibêjin; gelo di cîhanê de xweşikiyeke wekî vê, layiqê vê heye. Û yek ji wan dibêje ku: Erê Memê Ala heye, ji Zînê bedewtir e. Li ser vê yekê perî biryar didin ku Mem û Zîn bînin cem hev. Perî ji Xweda daxwaz dikan ku Zînê jî wekî wan bike kevok da ku ew wê bi xwe re bibin koşka Memê Ala. Zînê di postê kevokekê de dibin, dixin nav cihê Memê Ala.

“Ay rebî tu bikî ferware,
Zîna Mîr Sêvdîn ser me bikî çare,
Post jor da tîn xware.

Hersê kevok çepilê Zînê digirin û digerînin,
Ser pencera Memê Ala datînin,
Memê xewa şîrîn da bûye.

Nişkêva yek Memê dihejîne
Ew cankeke bûkîn sera xwe da dibîne.”

Varyanta II.

Di varyanta duyemîn de, wekî varyantên dî, behsa sê perî an jî sê kevokan nayê kirin. Di vê varyantê de li şûna sê periyên, behsa du melayiketan tê kirin ku ew li ezman li ser xweşikiya Mem û Zînê bi hev re şert digirin. Li gorî vê varyantê, hevdiştina ewil a Mem û Zînê bi vî rengî ye:

Çi rojek ji rojane,
Du melayket şert girtine li esmana,

Yek got: "Zîn spahtire",
Ê dî got: "Memê Alane",
Ê dî got: "Em dê Zîn helgirin bibin lig Memê Alane".

Her du li ser textek dênandine,
Her du çavan êg ji van hêşyar nîne,
Paşê ra her du hêşyar bûne
Her du rabûne û rûniştine.

Varyanta IV.

Di varyanta çaremîn de, behsa hevdîtina Mem û Zînê, nêzîkî varyanta Lescot derbas dibe lê li vê derê her sê perî, ne di sûretê kevokan de, di sûretê sê qumriyan de derbas dibin û her wiha navên wan jî cudatirin. Navên wan; Qemer Taî, Şîrwan û Mahî Bêirûz in. Her sê periyên ku di postê sê qumriyan de ne, li ezmana xweşikiya Mem û Zînê dibînin û biryar didin ku, wan bînin cem hev. Her sê perî, Zînê ji koşka wê digirin û li ser baskên xwe dibin koşka Mem û dixin nav nivînên wî.

“Şêrwanê go: ‘Dilî min dilîkî we kir ismî e’zîm dixoand be ser Zînê û carîada piv kir dilî min debêye Zînê be carîya ketine xewê ye. Şêrwanî go: ‘Dilî min debêye, ban kir le pêriyaye, Zînê şidandin le qeînadê pêriyaye, ismî dixoandin. Dilî min le xane berî gerandin bajarî Muxribiane, saet le şeşa avîtin qonaxa qubba ser be tûnc le meqamî Memê Alane lê dekirin mîvane, qumrîa xe avîtin devî pencerane, le Memê Zînê kirin sêr û temaşeke girane.’”

Varyanta V.

Di varyanta pêncemîn de behsa hevdîtina Mem û Zînê nayê kirin lê ev varyant bi vî rengî dest pê dîke:

Erê lo lo ya bo! Min şevê çwînê xewnik di xewna xwe de dîtiye,
Ezê diçûme li mala Qeretajdîn dipirsiye,
Welleh ungilîska min û Zînê pevguhertiye.
Erê lao meke, tu kurê mîrê Alanî,
Dilê te kî dixwaze ji keçîka mîra û ji keçîka axa?

Varyanta VI.

Di vê varyantê de jî wekî varyantên dî, behsa sê periyan tê kirin lê mijara ku, Mem yan jî Zîn bêtir xweşik e, li jorê le ezmanan di nava perî û melyaketan de jî dibe mijara gengeşeyê û dawî Xizir û Eylas/Elyas, da ku vê meseleyê çareser bikin, biryar didin ku Mem û Zînê bînin cem hev û li ser vê yekê Zînê ji koşka wê digirin, tînin dixin nava cihê Memê Alan. Ev epîzot bi vî rengî ye:

Sê perî hene li ezmanan
Dayim digerin li cih û meknan
Werin bo me bikin behs û xeberdanan

Sê perî hene di nazenin
Ew carina li sehra meşînin
Evîna du dilan li yek dihebînin

Xişka mezin dibêjit, ey xişkane
Win geriyane li cî û mikane
Werin bo min behs û xeberane

Xişka navî dibêjit: ey xişkane
Min yek dîtiye li Cizîra Botane
Navê wê xatûn Zîn girane
Mislêd wê nînin li çî cî û mikane

Xişka biçûk dibêjit: ey xişkane
Min yek dîtiye li şehrê Yemenê
Navê wîye Memê Alane

Nîşan qesra sipîye li nav bendê du şetane
Çihar kenar hemî gul û rihane
Mislê di wê nînin li çu erdane

Wê li esmanan bûye behse
Hind dibêjin “Mem lawek xase”

Hind dibêjin: “Xatûn Zîn şîrîne”

Li yek maşiqin Mem û Zîne

Sebeb bûne Xidir û Eylase

Wê li esmanan bûye bîne

Bi şer çûn Xizir û Nebîne

Hind dibêjin Mem lawek tazeye

Hind dibêjin xatûn Zîn şîrîne

Li yek aşiqin Mem û Zîne

Sebeb bûne Xizir û Nebîne

Xizir çû Zîn ji Cizîrê înaîne

Da nav qonaxa Memê ca bibîne

Kê ji wan ciwane

Xizir û Eylasê di Zinda ye

Varyanta VII.

Di vê varyantê de, wekî varyantên dî ne sê perî, lê du perî derdikevin pêş me. Û ev her du perî biryar didin ku Zînê bînin koşka Memê Alan. Lê li vê derê Mem û Zîn cih guhartine; Mem kurê Mîrê Cizîra Botan e û Zîn xuşka Mîrê Muxrezemînê ye. Di hemî varyantên dî de Mem kurê mîr an jî padişahê Muxrezemînê ye û Zîn xuşk an qîza Mîrê Cizîra Botan e. Ev epîzot bi vî rengî ye:

“Dibêjin rûjekê dû perî gehîştine êk. Ekê gûte ya dî: “Tû dizanî kîş kurik ş-hemya lawtir e l-dinyayê, ya dî gûtê: Ma tû dizanî kîş kiçk ş-hemiya cantir e l-diyaê.

D-navbeyna xûda gelek axiftin û gehîştine hindê, kû, kûrê mîrê Cizîrê ş-hemî lawa lawtir e, û xişka mîrê Muxrezemînê ş-hemî cana cantir e. Êkê gûte ya dî: “Ma em bû cî nabeyna devik, da êk û dû bibînin”.

Tu-wê şevê da, hekû Zîn, xişka mîrê Muxrezemînê nivistî periya helgirt û îna dana ser textê kûrê mîrê Cizîrê, ber teniştî wî ve.”

Varyanta VIII.

Di vê varyantê de, hevnasîna Mem û Zîn, wekî di varyantên dî de pêk tê. Her sê perî, di vê varyantê de wekî sê horî derbas dibin û di destpêkê de tê gotin ku ew di postê sê kewan de ne lê dûre tê gotin ku ew dikevin postê sê kevokan. Di vê varyantê de dema ku behsa bajarê Muxurzemîn tê kirin, tê gotin ku ew li gorî Cizîra Botan li rojhelat e. Di varyantên dî de tesbîteke wiha nayê kirin. Lê di vê varyantê de Muxurzemîn cihekî wekî ku li rojhelat be hatiye hesabandin. Behsa hevdîtina ewil a Mem û Zîn wiha derbas dibe:

“Li rojekê ji rojan
Sê kew firîn ji hêlûnan
Firîn danîn ser xan û manan
Û xeber dan ji dil û dilberan.

Bi emrê xudavendê me sê xuşkêd horî ketine dilq û rengê kevokan, firîn, çûn geriyên li dewra dinyayê. Geriyên geriyên, êvar ser wan de hat, bû tarî û her sê xuşk li bajarê Cizîra Botan li ser banê koşk û sera malbavê Zîna xuşka mîr Zendîn danîn. Wî wextê Zîne bi cariyêd xwe ve çira û şemdan vêxistin, şewqa çira û şemdana dan nav herema wê, rengê Zîne ji ber wan çirûsî û horiya li pencerê ra dîtin.

Xuşka biçûk ji xuşkêd xwe re got: “Gelo li dinyayê da xortê layiqê vê qîzê hene?”.

Xuşka mezin got: “Yek heye, navê wî Memê ye, kurê Al Paşa ye, jê re dibêjin Memê Alan. Bajarê bavê wî li Muxurzemîn e, li dinyayê min xortê mîna Memê Alan rind, camêr û dilawer ne dîtîye”.

Xuşka biçûk got: “Memê layiqê vê qîzê ye, lê em çî bikin, ku ew ji hev dûr in, destê wan nagihîje hev, welatê Cizîrê li roava ye, Muxurzemîn li rohilat e”.

Xuşka ortê got: “Werin em ebatî xudavendê rehman bibin, ewî baskêd kotira li me kiriye, em vê zenaneke rind û nazik bidin ser baskêd xwe, bifirin, bibin koşk û sera malbavê Memê Alan li nav ciyê Memê”.

Bi emrê êzdanê me rehmanî
Kotiran Zîn ji xewê hilanîn
Firîn birin li nav ciyê Memê danîn.”

Varyanta IX.

Di varyanta nehan de, behsa hevdîtina ewil a Mem û Zînê wiha derbas dibe:

“Zînê cariya va diçe nava baxê torkirî. Çaxê digihîjine nav bax, Zînê îzna cariya dide, herin xwe re bigerin, lê ew jî diçe ser hewzê mermer. Wî wextê sê kevotk dibe pirîna wan tên serê darê datînin. Yek dibêje yekê. Dibê: “Xweê, gelo bedew, nazik qasî wê hene?” Ya dinê dibêje: “Te bedew ne dîtine. Memê, kurê Al-padşa, mala wiya li Muxurzemînê, wekî em wan bidin rex hevdu, ewaya wê avê destê wî ke”. Xuşka din dibêje: “Wekî usane, em qencê xudê ne, duaê me dua ne, nifirî me nifirin, em dua bikin, mirazê herdu bigîne hev. Dibê:

Tu bidî yalê keremê

Emê beyt û xezalekê bikin li vê demê

Tu were binêr, evîniyê çi kir serê Mem û Zînê

Ya rebî tu bikî ferware

Postekî kevotka jorda bikî xare

Em sisêne, şîrîn xatûn Zînê ser me bikî çare.

Emrê xwedê da postekî kevotka jorda hate xar, kete stûyê Zînê, Zînê jî firiya çû gihîşte wana. Gava her çar kevotk difiriyan welat ber bi welat digeriyan nava Muxurzemîn, ser pencera Memê Alan veniyan. Çûn gihîştine bajarê Muxurzemîn, warê bedew û cindiya, ser pencera Memê Alan danîn. Memê wî çaxî mala xwe de razayî bû. Horiya libsê stûyê Zînê derxistin, destê Zînê girtin birin kirne paşla Memê.”

Varyanta X.

Di vê varyantê de, rengê hevdîtina Mem û Zîn hema bêje mîna varyanta nehemîn e. Hevdîtina Mem û Zînê bi vî rengî ye:

“...Zînê jî çû razê. Ser cîê razana wê ra darek hebû. Sê kevotk hatine ser darê danîn. Kevotk bi xwe horî bûn: Dudu qîz bûn, yek jî diya wan bû.

Wextê qîz çav Zînê ketin, hiş aqilê wana ji serî çûn. Gotine diya xwe, go:

-Gelo dinyayê da meriv mîna Zînê bedew hene?

Dê got:

-Lawo, Memê Ala dimîne li şêherê Muxurzemînê, qet Zînê bi bedewiyê nave nîvê Memê.

Kevotka gilê xwe kirin yek, wekî Zînê bivin bigihîne Memê û dîsa bînin. Ewana dest pêkirin dua ji xadê xwestin, wekî postekî kevotka Zînê ra bînin, go:

Ya rebî, bikî ferware
Postekî kevotka bînî xare
Em bi xwe sisê ne
Zînê ser me bikî çar e
Xadê da bû ferware
Postek jorda hate xare
Sê horî bûne çare.
Memê di birca sipî da
Ketye xewa şîrîn da
Kes newêre here nav cî da
Şev çûye nîveka şevê
Memê Ala ketye xewê
Ew çi zane Zînê wê bê?
Ew her çar horîngê delal
Seheteke diçin riya yek sal
Teze wê biqewime hewal.
Herçar kevotk serê darê firîne
Wê xwe dane govekêd ezmîne
Ser pencera Memê Ala danîne
Ewana postê Zînê stû datînin
Fend û şemala ber serê Memê vêdisînin.
Zînê dikine orta Memê û cîne
Memê serê xwe ji xewa şîrîn hiltîne
Husul-cemaleke paşila xwe da divîne
Husul-cemal nîne, horîk e.”

Varyanta XI.

Di vê varyantê de jî hevdîtina ewil a Mem û Zînê, bi heman rengê varyantên di pêk tê lê cudahiyeke heye. Di varyantên di de kevok/perî pêşî Zînê dibînin û dipirsin ku, xortekî layiqê xweşikiya Zînê heye an na. Lê di vê varyantê de kevok/perî pêşî Mem dibînin û dûre dipirsin ku, keçeke layiqê vê xweşikiyê heye an na. Ev epîzot bi vî rengî ye.

“Rojeke delal sê kevotkêd bedew kirne pirîn, hatine ser pencera Memê danîn. Hersê kevotka bi hev re xeber dan. Kevotka çûk gote ya mezin: “Gelo di dinyayê da bedewê mîna Memê hene? Lazim e em yareke jê ra bibînin” Ya mezin got: “Min dîtiye, dîtiye, qîzeke letîve cindî ye”. Ew bi xwe ji malba Cizîra Bota dimîne.

Hersê kevotk firîn, çûn ber pencera Zîn xatûnê danîn, pencerê ra hundir nihêrîn, çi binihêrin, çil carî dest dane ber dest ber Zîn xatûnê sekinîne. Carî hindik hindik ji cem xatûnê kêmbibin, diçin malêd xwe.

Kevotka mezin got: “Ya min dîtiye, eva ye, hûn Memê ra layiq dibînin?”

Xûşka çûk got: “Belê, layiq e” û ji xwedê reca kir.

Xwedêyo tu bikî ferware,

Libsê kevotkekê bikî xare

Em sisê ne, Zînê bi me ra bikî çar e.

Post jorda hate xarê, kevotka morîa xewê avêtin guhê Zînê, post lê kirin û bi hevra firîn çûn.

Heq tu xwedayê keremê

Ezê niqlekê bikim vê demê

Çika nezer çi tîne ser Zîn û Memê.

Gava kevotka xatûn Zîn radikirin

Welat welat ra derbaz dikirin

Pencera Memê ra xar kirin.

Gava kevotka Zîn xatûn kirin xarin

Memê razay bû qet nizane

Çi derde çi hewal e.

Zenda Zînê Memê ra kirin,

Belgî û berpâl e.”

Her wiha di vê varyantê de Zînê ji Mem re gotiye ku, divê xwe di çil rojan de bigihîne wê. Eger Mem xwe di çil rojan de negihîne, ê Zînê bidin dergistiyê wê Çeko.

Mem û Zîna Ehmedê Xanî

Di *Mem û Zîna Ehmedê Xanî* de, hevdîtina yekem a Mem û Zînê bi tevahî ji ya varyantan cudatir derbas dibe. Bêguman ev reng hevdîtina Mem û Zînê, ji rastiye gelek dûr e lê uslûbê çîrok û destanên kevnar e. Her wiha sê perî yan jî sê kevok, di wêjeya

gelêrî de motîfeke girîng e ku carinan di çîrokan de jî derdikeve pêş me. Her çendî ku Ehmedê Xanî serî li rêyeke weha çîrokî nedabe jî, şêweya ku wî ji bo hevdiîtina Mem û Zînê seza dîtiye, şêweyeke orjînal e. Mem û Zîn hev di rojêke Newrozê de dibînin lê Mem di lîbasê keçikan de Zîn jî di lîbasê lawikan de ye. Newroza ku hingê tê pîrozkirin, wekî festîval an jî karnavalên îroyin, bi kêf û şahiyên, bi geşt û seyranan û bi taybet bi armanca gihastina hev a evîndaran yan jî dîtina hev a keç û lawan tê pîrozkirin. Xanî bi vî rengî behsa Newroza ku hingê tê pîrozkirin dike:

11/14 Danayê mu'ammerê kuhensal

Ev rengehe go ji bo me ehwal

Go: "Adetê pêşiyê zemanan

Ev bû li hemî cih û mekanan

Weqtê we ku şehsiwarê xawer

Tehwîli dikir di mahê Azer

Ye'nî ku dihate bircê sersal

Qet kes nedima di mesken û mal

Bîlcumle diçûne der ji malan

Heta digihîşte pîr û kalan

Roja ku dibûye îdê Newrûz

Te'zîmî ji bo dema dilefrûz

Sehra û çîmen dikirne mesken

Beyda û dîmen dikirne gulşen

Xasma 'ezeb û keçê di bakir

Elqîsse cewahirê di nadir

Têkda di muzeyyen û mulebbes

Vêkra li teferrucê murexxes

Lêkîn ne be tuhmet û be minnet
Belkî bi terîqê şer' û sunnet

Lewra ku ewan xered ji geştê
Meqsûd ji çûyina bi deştê

Ew bû ku çî talib û çî metlûb
Ye'nî du teref muhîbb û mehbûb

Ev her du celeb ku hev bibînin
Kufwê di xwe ew ji bo xwe bobînin

Xanî, piştî ku bi vî rengî behsa rengê pîrozkirina cejna Newrozê dike, bi berdewamî tê ser rewşa Mem û destbirakê wî Tacdîn.

13/1 Qendîlê munîrê deyrê ezreq
Mişkate Hemel ku kir murewweq

Sersal ku bû ji nû ve me'mûr
Mîr daye kurê di taze destûr

Destûrî ku bû ji bo wuşaqan
Rabûn hemî şubhetê uşşaqan

Têk çûne bi me'reda mezadê
Dildadeê meqsed û muradê

Ïlla ku tenê Memo û Tacdîn
Wan dane xwe duxterane tezyîn

Ye'nî di dema ku bûye tehwl
Ew her du bira di camê tebdîl

Xanî bi vî rengî behsa lîbasguhertina Mem û Tacdîn dike, dibêje ku meqseda wan ji lîbasguhertinê ew bû ku kes wan nas neke, kes têngihê ku ew law in û li wan teklîf neke. Piştî vê Xanî behs dike ku, di heman demê de Stî û Zîn jî bi heman armancê, yanî ji bo ku kes têngihê ku ew keç in û teklîf li wan nekin, lîbas diguhêrin û di lîbasê kuran de derdikevin tevli çosa Newrozê dibin. Lê dema ku xelkê Cizîrê, xort û keçên Cizîrê, Stî û Zîna di lîbasê kuran de dibînin, li xweşikiya wan heyran dimînin û bi gotina Xanî, aqil diavêjin. Mem û Tacdînê ku ji vê rewşê neagah digerin, dema ku wilo rastî sersemiya xort û keçên Cizîrê tên, meraq dikin vê yekê û dipirsin. Li ser vê yekê ew rastî Stî û Zînê tên.

14/15 Tacdîn sekinî û pirsiyar kir

Pirsa xwe bi yekê îxtiyar kir

Go: “Ey Xidirê rehê hîdayet!

Bêj ev çî belaye bê nîhayet?”

Wî got: “Du şehlewendê şeddad

Îro li vî xelqî bûne cellad

Herçî ku dibînin ew serxweş

Fîlhal dikin wiha muşewweş”

Wan go: “Te nedî ku ew çî reng in?”

Wî go: “Du kur in ziyade şeng in”

Wan go ku: “Bi şîr û şeşper in ew

Yanî bi xedeng û xençer in ew?”

Wî go ku: “Bi xemze û bi awur

Xelqê dikujin wekî bi keybur”

Wan pirs dikir ku ger bibînin

Da bo xwe bi merdî dest hilînin

Her du di wî karî bûn ku nagah
Dîtin ku ji mehdê qudretullah

Ew her du puser wekî du peyker
Tabende bi şeklê şahê exter

Yekhey'et û şikl û yeklîbas in
Emma di wî şehî rengnenas in

Sîretmelek in sûretperî ne
Ne baî'in ew ne muşterî ne

Xanî piştî ku bi vî rengî hevdîtina yekem a Mem û Tacdîn û Zîn û Stîyê neqil dike, behsa xweşikiya Zîn û Stîyê û sersembûna Mem û Tacdîn dike. Dawî ev her du xort diçin ba wan û wan ji nêz ve dibînin. Ji bo ku wan nas bikin, gustîlikê xwe û wan bi hev diguhêrin. Her çendî ku rengê hevdîtina yekem a Mem û Zînê ya Ehmedê Xanî, ne wekî destana kevînar a Memê Alan e jî, bi heman rengê destana gelêrî, di vê derê de jî bihevguhertina gustîlkan derbas dibe.

14/58 Wan vî ku bizanin çî esl in
Lewra ku nizanîn ew çî nesl in

Enguşteriyê di wan cuwanan
Kêşan ji esabî'ê di xwudanan

Xatem ji enamilêd xwe kêşan
Danîne cihan ji boy nîşan

1.3. Gihaştina Hev a Mem û Zînê

Varyanta R. Lescot

Li gorî varyanta R. Lescot, Zînê keça Mîr Zengîn e û qelendayiya pismamê xwe Çeko ye. Di vê varyantê de lehengê bi navê Hesên di varyantên dî de wekî Qeretajdîn derbas dibe. Di gelek varyantan de û her wiha di *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî de, navê her sê birayan wekî Tacdîn, Çeko û Arif derbas dibin. Tacdîn mezinê her sê birayan e û destbirakê Mem e. Lê di varyanta Lescot de navê her sê birayan wiha ye: Hesên, Çeko û Qeretacîn. Hesên birayê mezin e û destbirakê Mem e. Her wiha di vê varyantê de di destpêkê de di rûpela 29an de, dîsa di rûpela 106an de tê gotin ku Zîn keça Mîr Zengîn e û Mîr Zengîn waliyê Cizîr Botan e. Lê di destanê de dûre em têdigihên ku bavê wê ne li heyatê ye û mîrîtiya Cizîrê, di destê birayê wê ye bi navê Mîr Ezîn de ye. Ev tevlihevî carina di varyantên dî de jî derdikeve pêş me.

Li gorî varyanta Lescot, Mem berî ku bikeve nava bajarê Cizîra Botan, rastî qîza Bekoyê Ewan, a bi navê Zîn tê. Berî ku rastî wê bê, Xocê Xizir, ew di heqê Zîna Bekoyê Ewan de heşyar kiriye. Li gorî vê varyantê, Bekoyê Ewan di heman demê de remilvan e û dizane ku wê 'Padişahê Kurdan' Mem were Cizîrê bo Zîna Zêdan. Ji ber vê ew, qîza xwe ya bi navê Zîn, dişîne ber çemê Cizîrê, ji bo ku Mem bixapîne. Lê Mem, beriya ku bigihê Cizîrê, di rêwitiya xwe de li Xocê Xizir rast hatiye û Xizir, ew di vê mijarê de heşyar kiriye. Lewma, bi keça Beko naxape. Dûre Mem rastî gelek kesan ji Cizîrê tê, salixê bajarê Cizîrê ji wan digire, her wiha rastî Bekoyê Ewan tê. Lê dawî xwe diavêje mala her sê birayan; Hesên, Çeko û Qeretacîn. Çeko pismamê Zînê ye û her wiha Zînê qelendayiya wî ye. Piştî ku sedema hatina Mem tê fêmkirin, her çendî ku Çeko di destpêkê de li hember dertê jî dawî li ser soza birayê xwe ye mezin Hesên disekine û rewşê qebûl dike. Gihaştin û naskirina hev a Mem û Zînê, li ser Kaniya Qestelê pêk tê. Ev beşeke girîng a destanê ye. Li vê derê li hember keç û xortên Cizîra Botan, Mem û Zîn gotinan bi rengê helbestî diavêjin ber hev. Beşeke gelek dirêj e. Neha em ê epîzoteke kurt ji vê beşê neqil bikin.

Memî got: “Lê lê Zîn ez nizanim ku tu bi min ra rast î an derewîn î

Mîna kihêlên tewlan ên sor û zengû zêrîn î

Arekî mezin ketiye hundirê min û dûman li devê min diçe ma tu nabînî?

Tu nabê, ez carê berê xwe bidime Memî bêjim: “Tu î dilbirînî?

Tu niha bixwazî, dikarî vî arê di dil û hinavê min da vemirînî

Vê hêzarê li ser çavên reş û belek û eniya gewr hilînî

Ma tu kû da herî, tu dergistiya minî, herhal tu nikanî vê gustîrê di tiliya xwe da bider xînî

Ko tu vê nekî, dikarî min li pêş hezar û du sed qîzê Cizîrê bigerînî

Dinê û alemê bi mêvanê xwe yê şevan, Memê Alan û siwarê Bozê Rewan bikenînî.....

Zînê got: “Lolo, Memo dilê min bi kulan û bi jan e

Madam ko tu guh nadî ser şorê meriyane

Di berê da, xelkê kêmanî xistine derê me jinane

Dibêjin: “Jin parsiya kêmanî in, dibin ser hev de û rûreşiya dê û bavane”

Werê destê xwe bavêje destê min û min çek ke ser piştê Bozê Rewane

Berê xwe bide welatê xwe, Bajarê Mixribiyane....

Her çendî ku Mem û Zîn di vê merheleyê de rastî hev tên jî, gihaştina hev a her dûyan li baxçeyê Mîr, di koşka Mîr de pêk tê. Beko, dixwaze Mem bi rêya jehrîdayinê bikuje. Bi vê armancê planekê çêdike û bi fermaneke derewîn, Mem tevî hemî mêrên Cizîrê derdixe derveyê bajarê Cizîrê da ku ecem bi ser xaka kurdan de tê. Lê Mem xwe bi hîle birîndar dike û ji seferê vedigere. Ji ber ku tu mêr di Cizîrê de nemane, bê tirs diçe koşka Mîr û li wê derê ew û Zînê digihîjin hev û dû. Lê hingê Mîr û Beko û tevî destbirakê Mem, Hesên bi ser wan de tên. Mem, Zînê di binê kurkê xwe de vedişêre. Bi tenê guliyên porê wê nîşanî Hesên dide. Hesên rewşê têdigihê û bo ku Mem xelas bike mala xwe dide ber agir.

Varyanta I.

Mem piştî çil roj û çil şev digihê bajarê Cizîra Botan. Mem li kêleka çemê Cizîrê rastî qîza Beko ya bi navê Zîn tê. Qîza Beko remilvan e û bi rêya remlê haya wê ji hatina Mem heye. Ew xwe wekî Zîna ku ew lê digere bi Mem dide naskirin. Lê hespê wî yê bi navê Bor, wî heşyar dike ku ew qîza Bekoyê Ewîn e. Mem ji qîza Beko xelas dibê... Mem û Zîn li Bexçeyê Xas yê Mîr digihîjin hev. Beko hay ji rewşê heye. Mîr ji Beko re dibêje, em îro herin nêçîrê. Beko ji Mîr re dibêje ku: “Mîr bi serê te kim du karêd xezal xasbaxçê te da digerin, meriv hijmetkare li wan binihêre.” Li ser vê Mîr û Beko diçine nav baxçeyê xas. Zîn xwe dixê bin kurkê Mem. Beko di kêleka Mem de keziyê Zînê nîşanî Mîr dide. Mîr rewşê têdigihê û ji wê derê vediqetin.

Varayanta II.

Di vê varyantê de, behsa hevdîtina Mem û qîza Bekoyê Ewan nayê kirin. Mem di bajarên mîna Amêdiyê, Zaxo û Nehrewanê de derbas dibe û digihê Cizîrê. Berî ku bikeve nava Cizîrê, cotkarekî di heqê Cizîrê de agahiyan dide Mem... (Bi tenê di vê varayntê de ji bilî Cizîrê, hin navên diyar yên bajarên Kurdistanê derbas dibin. Her wiha balkêş e ku Mem ji aliyê rojhelat de tê.) Mem û Zîn li ser kaniyê hev û du dibînin. Qîza Bekoyê Ewan jî li wê derê ye, xizmetkara Zînê ye lê tu axaftin di navber wê û Mem de derbas nabe. Mem nîşanekê ji Zînê digire da ku bibe nîşanê Qeretajdîn bide... Hemî cindîyên Cizîra Botan tevî Mîr diçine nêçîrê. Mem dimîne. Piştî ku kes namîne li bajêr, ew diçe koşka Mîr da ku Zînê bibîne. Ew û Zînê li wê derê digihên hev. Beko berî her kesî ji nêçîrê vedigere. Dibîne ku Mem û Zîn li cem hev in. Dûre Mîr tê. Mem Zînê vedişêre. Mîr lê silav dide, Mem ranabe. Mem guliyên porê Zînê nîşanî Qeretajdîn dide. Qeretajdîn bo ku wî ji vê rewşa zor xelas bike, mala xwe dişewitîne, her kes tevî Mîr bi aliyê agir ve diçin, Mem û Zîn xelas dibin.

Varyanta IV.

Mem di çil roj û çil şevan de xwe digihîne bajarê Cizîrê. Mem li ber çemê Cizîra Bota rastî keçîkekê tê. Keçîk cariyeya Zînê ye. Keçîk dixwaze wî bixapîne, dibêje, ez Zîna Zêdan im. Lê Mem pê naxape. Dibêje, tu cariya Zînê yî. Keçîk ji Memê soz digire ku dê wê jî bigire cem xwe dema ku vegeheriya Muxurzemînê. Mem qebûl dike. Keçîk rêya ku dê Mem derbasî aliyê din yê avê bike nîşan didê... Mem dikeve nava bajarê Cizîrê, tê mala her sê birayan; Hesen, Çeko û Qeretajdîn... Mem û Zînê li ser kaniya Cizîra Botan hev dibînin... Mîr tevî Cizîriyan û Mem diçine nêçîrê. Mem ji nêçîrê vedigere. Diçe qonaxa her sê birayan. Mem û Zîn li wê derê digihîjin hev. Beko fesadiyê dike. Ji Mîr re dibêje ku: Mem ji bo xuşka te Zîn vegeheriya. Mîr ji nêçîrê vedigere û bi ser Mem û Zînê de tê koşkê. Mem, Zînê di bin kurkê xwe de vedişêre. Mem di tengaiyê de ye. Beko dil dike dest biavêje kurk û Zînê nîşanî Mîr bide. Hesen koşkê dide ber agir. Her kes tevî Mîr bi aliyê agir de diçin û Mem û Zîn xelas dibin.

Varyanta V.

Mem li bajarê Cizîrê dibe mêvanê Beko. Dibêje ez ji bo eşqa Zînê hatime. Beko jê re dibêje ku Zînê keça wî ye. Mem keça Beko ya bi nave Zînê dibîne, şaş dibe, wê naecibîne. Beko Mem dibe dîwana Mîr, Mem û Qeretajdîn hev dibînin. Mem derdê xwe jê re dibêje, Qeretajdîn dibêje ku Zîna ku tu lê digerî xwişka Mîr Sevdîn e... Mîr tevî gelê Cizîrê diçe nêçîrê. Mem dimîne tenê. Diçe dîwana Mîr. Evîndara xwe Zînê dibîne. Mîr ji nêçîrê vedigere. Mem û Zîn li cem hev in. Mem, Zînê di bin kurkê xwe de vedişêre. Her kes tevî Mîr li wê derê ye. Qeretajdîn qehweya dîwanxaneyê digerîne. Dema ku tê cem Mem, Mem guliyên porê Zînê di bin kurkê de nîşanî wî dide. Qeretajdîn dertê derve, tevî brayên xwe li hev dicivin da ku Mem ji vê rewşê xelas bikin. Qeretajdîn êrîşî jin û zarokên brayê xwe dike. Qîrîn dikeve nava wan. Her kes li ser vê yekê tevî Mîr, ji dîwanê radibin da ku rewşê têbigihên. Mem û Zîn xelas dibin.

Varyanta VI.

Xizir û Elyas bi regngêkî sêhrî, Mem û Bengîn, tevî hespên wan, ji bajarê Muxrezemînê digirin datînin ber bajarê Cizîrê. Mem li ser riya Cizîrê rastî xuşka Beko, Melek Rihan tê. Jê pirsra bajarê Cizîrê dike. Melek Rihan di heqê bajarê Cizîrê de agahiyên dide Mem. Xuşka Beko, Melek Rihan aşiqê Mem dibe (li gorî vê varyantê xuşka Beko Melek Rihan, dûre ji ber eşqa Mem dimire. Her çendî ku Beko berî ku xuşka wî bimire, ji Mem rica dike da ku were xuşka wî bibîne jî lê Mem vê yekê red dike)... Mem û Zîn li ser kaniya Cizîrê hev dibînin. Mem ji Zînê nîşanekê, bo ispata evîna wê digire û nîşanî Qeretajdîn dide.... Mîr hemî gelê Cizîrê kom dike da ku biçin nêçîrê. Mem nayê. Baran dibare û Mîr nêçîrê betal dike. Vedigere koşkê. Mem û Zînê li dîwanxaneya Mîr li cem hev in. Mem, Zînê vedişêre. Mîr lê silav dide lê Mem ranabe. Mem guliyê Zînê nîşanî Qeretajdîn dide. Qeretajdîn bo ku Mem ji vê rewşa zor xelas bike mala xwe dide ber agir. Hemî ehle dîwanê tevî Mîr, dev ji Mem berdidin û diçin bi hewara Qeretajdîn. Mem û Zîn xelas dibin.

Varyanta VII.

Mem kurê mîrê Cizîra Bota ye. Zîn xwişka mîrê Muxrezemînê ye. Mem dema ku tê bajarê Muxrezemînê rastî keça Beko tê. Navê wê jî Zîn e û remilvan e. Haya wê ji hatina Mem heye. Dixwaze Mem bixapîne. Xwe weke Zîna ku Mem lê evîndar e, pê dide naskirin. Mem gelek li ber xwe dikeve ku bi dû keçikeke wiha ketiye. Hespê Mem pê re diaxive û wî heşyar dike ku ev keça Beko ye. Mem xwe ji keça Beko xelas dike.

Mem diçe dibe mêvanê Tacidîn. Du birayên dî yên Tacidîn hene. Navê wan Qemerêdîn û Mîr Sêvdîn e. Qemerêdîn jî ji Zînê hez dike. Mem derdê xwe ji Tacidîn re dibêje... Mîr tevî xelkê Cizîre diçe nêçîrê. Bi tenê Mem û Beko dimînin. Mem derdikeve baxçeyê koşka Mîr. Zîn jî tê. Li wê derê her du digihên hev. Beko wan dibîne. Bi lez diçe xeberê dide Mîr ku, du pezkûvî di bexçeyê wî de ne. Mîr tevî xelkê Cizîrê vedigere da ku nêçîra pezkûviyan bike. Mem dibîne ku Mîr tê, Zînê di bin ebayê xwe de vedişêre. Du keziyên Zînê di ber eba de xuya dikin. Tacidîn rewşê têdigihê. Bang li her kesî dike ku, Memê nexweş tenê bihêlin. Her kes tevî Mîr ji wê derê vediqete. Mem û Zîn xelas dibin.

Varyanta VIII.

Mem li ser kaniya Cizîra Botan rastî xuşka Bekirê Ewan ya bi navê Zîn tê. Xuşka Bekirê Ewan remildar e û haya wê ji hatina Mem heye, dixwaze wî bixapîne. Hespê Mem, Bor pê re diaxive û dibêje ku, ew xuşka Bekirê Ewan e. Mem ji xuşka Beko xelas dibe. Mem dibe mêvanê Qeretajdîn. Mem û Zîn li ser kaniya Cizîrê hev dibînin... Mîr tevî xelkê Cizîrê diçe nêçîrê. Mem bi behaneya nexweşiyê dimîne li bajêr. Her kes diçe nêçîrê, Mem diçe bexçeyê Mîr, li wê derê ew û Zînê digihên hev. Mîr tevî xelkê Cizîrê ji nêçîrê vedigere. Tê nava bexçe. Mem fersend nabîne ku ew û Zînê biçin. Zînê di bin qapûtê xwe de vedişêre. Qeretajdîn guliyên porê Zînê dibîne. Rewşa ku Mem û Zîn tê de ne têdigihê. Bo ku wan xelas bike mala xwe dişewitîne. Her kes tevî Mîr ber bi agir ve diçin. Mem û Zîn xelas dibin.

Varyanta IX.

Mem li ser pira Cizîrê rastî qîza Bekoyê Ewan tê. Navê wê jî Zîn e û remildar e. Mem bi alîkariya hespê xwe Bor rewşê têdigihê û jê xelas dibe. Mem dibe mêvanê Qeretajdîn. Mem li ser kaniya Cizîra Bota Zînê dibîne. Jê nîşanekê distîne da ku nîşanî Qeretajdîn jî bide ku Zînê jî jê hez dike... Mîr tevî Qeretajdîn û xelkê Cizîrê dertê nêçîra salê. Mem dimîne bo ku here nava bexçeyê Mîr, Zînê bibîne. Beko hay ji rewşê heye. Ew jî Mem dişopîne. Dema ku Mem û Zîn li wê derê digihên hev, Beko wan dibîne û diçe ji Mîr re dibêje ku; karxezal ketine nav Baxçeyê Torkirî. Li ser vê yekê Mîr vedigere. Mem dema ku dibîne her kes bi ser wan de tê, Zînê di bin qapûtê xwe de vedişêre. Guliyê porê wê nîşanî Qeretajdîn dide. Qeretajdîn mala xwe dişewitîne û Mem û Zînê ji rewşa giran xelas dike.

Varayanta X.

Mem piştî çil roj û çil şev rêwîti digihê bajarê Cizîrê û li ser Pira Zembeliyê rastî qîza Beko ya bi navê Zîn tê. Qîza Beko remilvan e û haya wê ji hatine Mem heye. Çil roj û çil şev li ser Pira Zembeliyê li hêviya Mem e. Xwe wekî Zîna ku ew lê digere bi Mem dide naskirin. Mem dixwaze gustîlika wê bibîne. Lê gustîlik di destê qîza Beko de nîn e. Mem bi heşyariya hespê xwe Bor, wê nas dike. Mem soz dide qîza Beko ku ew bigihê miradê xwe ê wê jî bike cariya xwe... Mem dibe mêvanê Qeretajdîn. Mem û Zînê li ser kaniya Cizîrê hev dibînin. Tajdîn têdigihê ku Zînê jî ji Mem hez dike. Mîr tevî xelkê Cizîre dertê nêçîrê. Mem dimîne li bajêr. Piştî ku her kes dertê ew jî diçe nav baxê torkirî û ew û Zînê digihên hev. Beko wan dibîne. Ji Mîr re dibêje ku wî du karên xezalan li nav baxê torkirî de dîtiye. Li ser vê yekê Mîr tevî xelkê Cizîrê vedigere. Mem û Zîn hew karin ji baxçe derkevin. Mem, Zînê di bin qapûtê xwe de vedişêre. Guliyên porê wê nîşanî Tajdîn dide. Tajdîn xaniye xwe dişewitîne û Mem û Zînê ji rewşa giran xelas dike.

Varyanta XI.

Mem di çil rojan de xwe digihîne bajarê Cizîra Botan. Mem li ser pirê rastî qîza Beko ya bi navê Zîn tê. Qîza Beko remilavan e û haya wê ji hatina Mem heye. Xwe wekî Zîna Zêdan bi Mem dide naskirin. Mem jê dixwaze ku, gustîla ku dayê nîşanê wî bide. Lê gustîlik di destê qîza Beko de nîn e. Hespê Mem, Bor bi Mem re diaxive û rewşê jê re radigihîne. Mem soz dide qîza Beko ku, ew gihîşt miradê xwe, dê wê jî bigire cem xwe. Mem ji qîza Beko xwe xelas dike... Mem dibe mêvanê Qeretajdîn. Zîn tê ser kaniya Cizîrê. Mem wê dibîne. Diçe jê nîşanekê distîne da ku Qeretajdîn bibîne ku, Zînê jî jê hez dike. Mîr tevî xelkê Cizîrê diçe nêçîrê. Bi tenê Mem dimîne. Mem û Zîn li nava baxçeyê Mîr bi hev şa dibin. Baran dibare û Mîr ji nişka ve biryar dide ku ji nêçîrê vegere. Dema ku tên nava baxê koşkê, Mem û Zîn fersend nabînin ku birevin. Mem, Zînê di bin qapûtê xwe de vedişêre. Mîr silav li Mem dide, Mem ji bo ku Zînê neyê dîtin, li pêş Mîr ranabe. Beko rewşê têdigihê. Qeretajdîn guliyê porê Zînê dibîne. Bo ku Mem ji vê rewşa giran xelas bike, agir berî xaniyê xwe dide. Her kes tevî Mîr bi aliyê koşka Qeretajdîn ve diçin. Mem û Zîn xelas dibin.

Mem û Zîna Ehmedê Xanî.

Di *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî de jî rengê gihaştina hev a evîndaran bi heman rengî ye. Lê li gorî varyantên gelêrî berî ku Mem û Zîn li baxçeyê Mîr bigihên hev, li ser kaniya Qestelê jî hev dibînin. Lê di *Mem û Zîna* Xanî de tiştêkî wiha derbas nabe. Li gorî Xanî biryara Mîr a nêçîrê wiha pêk tê:

36/17 Mîrê ku felek mutî'ê ferman
Go: "Sibhê nebûyî qewmê Bohtan

Rabestî sîleh û gurz û şimşîr
Bîlcumle digel me bêne nêçîr

Hadir nebitin kesek di seydê
Ew dê bimirit di bend û qeydê

Wekî ku ji beytên jorî jî tê fêmkirin, Mîr fermana nêçîrê dide hemî Cizîriyan û dibêje ku kî neyê, ê bi cezayê mirinê bê cezakirin. Bi tenê Mem ji ber ku ji derdê evîna Zînê nexweş e, naçe nêçîra Mîr. Piştî ku her kes bajêr diterikîne, dilê wî jî di hundir de teng dibe û dixwaze derê derve. Dilê wî wekî ku 'Xizir' be, wî ber bi bexçeyê Mîr ve dibe. Hingê Zîn jî tê baxçe û her du evîndar li wê derê digihên hev. Her du evîndar ew çend bi hesret in û ew çend ji hev dûr mane ku hay ji wext namînin, hay ji derdora xwe namînin. Mîr li veqera nêçîrê dixwaze were nav baxçe û dema ku dibîne hemî derî vekirîne, şaş dibe. Zînê bi dengê Mîr li xwe heşyar dibe û hew rêya revê dibîne, xwe di bin ebuyê Mem de vedişêre. Mîr wilo bi ser Mem de tê. Hingê Tajdîn jî li wê derê ye. Û ji axaftina ku di navbera Mem û Mîr de derbas dibe, têdigihê ku Mem di rewşeke giran de ye. Mem di binê eba de guliyên porê Zînê nîşanî Tacdîn dide. Hingê Tacdîn biryar dide ku Mem ji vê rewşê xelas bike û biryar dide ku xaniyê xwe bide ber agir. Diçe mal û ji hevsera xwe Sitî re wiha dibêje:

41/10 Go: "Rabe Sitî ku min dereng e
Îro mi digel vê malê ceng e

Tiflê xwe xilas ke dê biçit mal
Mal bo min û ha ji bo te mindal

Sermayeê ‘umr û zîndeganî
Ye’nî Mem û Zîn bi dilgiranî

Mayîne di werteya belayê
Min qesd e ku ez bidim rehayê

Xel vedikujit agirî bi avê
Ez dê vekujim bi agir avê”

Mala xwe ji rengê qewmê Zerdeşt
Da agir û gaziya xwe raheşt

Agir ku digirte xan û manan
Wî girte bi gazî û fixanan

Eqwam û qebaîl û ‘eşair
Bîcumle bezîne def’ê agir

Agah ku bûn Emîr û xîlman
Xalî kirin ew sera û bostan

Wekî ku ji beytên jorî jî tê fêmkirin, Tacdîn mala xwe dişewitîne û hemî ehlê Cizîrê tevî Mîr bi hawara wî de diçin, bi vî rengî Mem û Zîn, bi gotina Xanî; ji werteya belayê xelas dibin.

1.4. Mirina Mem û Zînê

Varyanta Roger Lescot

Li gorî varyanta Roger Lescot, pêvajoya ku Mem û dûre jî Zînê dibe mirinê, bi vî rengî pêk tê:

Mîr haya wî ji evîna Mem û Zînê çêdibe. Hingê leşkerê ecem sefer davêjin ser welatê kurdan. Hesen serekê leşkerên Mîr e. Mîr wî dişîne seferê. Piştî ku alîkarê herî mezin ê Mem diçe, Beko bi fenan, Mîr li hember Mem sor dike. Planekê çê dike ku Mem û Mîr bi setrencê bilîzin û di dawiyê de, yê ku qezenc dike, her çî bixwaze bi yê dî bide kirin. Her du alî qebûl dikin. Di destpêkê de Mem zora Mîr dibe. Lê Beko cih bi wan dide guherandin û berê Mem dikeve aliyê Zînê. Hingê Mem lîstikê jibîr dike û Mîr zora wî dibe. Li ser vê yekê Beko li gorî şert, dest û lingên Mem girê dide û wî davêjin zîndanê. Mem demeke kin di zîndanê de derbas dike. Qîza Bekoyê Ewan, hinarekê peyda dike û jehrî berî navê dide. Diçe cem Zînê û jê re rewşa Mem dibêje. Ê hinarê didê da ku bide Mem. Zîn haya wê ji girtîbûna Mem nîn e. Radike hinarê û berê xwe dide zîndanê. Diçe cem Mem. Mem her çendî haya wî bi riya xewnan ji lîstika qîza Bekoyê Ewan çê dibe jî, dîsa jî hinarê ji destê Zînê digire û dixwe û bi vî rengî canê xwe dide. Zînê kehanet dike ku dê heft roj piştî Mem ew ê jî bimire. Piştî heft rojan Zînê jî dimire. Zînê jî li kêleka Mem defin dikin. Mîr di xewnê de dibîne ku Zînê lê bang dike ku bê ser gora wan û şahidî li evîna wan ya rast bike. Mîr ferman dide ku gorên wan ji nû ve vekin û dibînin ku di navbera gorên wan de cihekî vebûye û di wê derê de destê wan di hev de ye.

Varayanta I.

Mem û Mîr bi setrencê dilîzin. Ji ber ku bala Mem ji setrencê dikeve ser Zînê, Mîr zora wî dibe. Mem diavêjin zîndanê. Mem di zîndanê de dimire. Dûre Zînê jî li ser wî ji kerba dimire. Her duyan bi hev re di gorekê/çalekê de defin dikin.

Varyanta II.

Mîr, Qeretajdîn bo wezîfeyekê dişîne Mekkeyê. Piştî ku Qeretajdîn diçe Mîr Mem davêje hepsê. Mem heft sal di hepsê de dimîne. Dawî Qeretajdîn vedigere. Jina wî haya wî bi rewşê dixwe. Qeretajdîn ji Mîr dixwaze ku destbirakê wî Mem berde. Mîr qebûl dike. Beko pêşniyar dike ku Zînê here wî berde. Zînê diçe ku Mem ji zîndanê derbixe. Mem li ber sekrata ye. Hinek av ji Zînê dixwaze. Ji destê Zînê av vedixwe û

canê xwe dide. Mîr tê ser gora Mem. Memê mirî, jê re dibêje ku roja heştan ê ew û Zînê bi hev re li bihiştê bin. Di roja heştan de, Zîn jî ji kadera xwe dimire. Gorên her duyan li kêleka hev çêdikin. Dûre li ser fesadiyên Beko gorên wan ji nû vedikin û dibînin ku Zînê ji gora xwe derketiye çû ye nav gora Mem.

Varyanta IV.

Mem û Mîr bi setrencê dilîzin. Şertê wan; hev û dû girêdan e. Di encama hîleya Beko de Mem li hember Mîr têk diçe. Mem encax bi ‘dêlî bocî Bozê Rewan’ tê girêdan û Mîr wî davêje zîndanê. Haya her sê birayan, Hesên, Çeko û Qeretajdîn jê çêdibe. Diçin Mem ji Zîndanê xelas dikan, tînin malê. Zînê li ser gotina Beko diçe ku Mem bibîne. Dema ku Mem, Zînê dibîne can dide. Zînê kehanet dike ku, dê ew jî heft roj şûn de bimire. Zîn heft roj şûn de dimire. Gorên her duyan li kêleka hev in.

Varyanta V.

Li dîwana Mîr, Beko ji her kesî dixwaze ku her kes sond bixwe û yara dilê xwe bibêje. Mîr qebûl dike. Dema ku dor tê ser Mem, ew dibêje ku hezkiriya wî Zîn e. Mîr gelek aciz dibe. Qeretajdîn û birayên xwe ji Mîr dixeyidin diçine Şamê. Mîr şert davêje pêş Mem û dibêje ku; tu min di setrencê de têk bibî ez ê Zînê bidime te lê ku ez te têk bibim, ez ê te biavêjim zîndanê. Mem qebûl dike. Di encama hîleya Beko de Mîr, Mem têk dibe û wî davêje zîndanê. Zîn agahiya girtîbûna Mem ji destbirakê wî Qeretajdîn re dişîne. Qeretajdîn tevî brayên xwe ji Şamê vedigerin û ji Mîr dixwazin ku Mem ji zîndanê berde. Mîr qebûl dike. Bekoyê Ewan diçe cem Zînê jê re dibêje; xwe tevî cariyên xwe bixemilîne, Mîr biryara serbestberdana Mem daye, here wî ji zîndanê azad bike. Dema ku Zînê diçe da ku Mem ji zîndanê derxe, Mem jê re dibêje; tu nehatiyî ku min ji zîndanê bidêrînî, tu hatî rûhê Memê Alan ji qefesê biderînî. Mem li wê derê can dide. Heşt roj şûnde Zîn jî dimire. Wê li kêleka Mem defîn dikan. Dema ku dûre gora Mem ji nû vedikin, dibînin ku Zînê hatiye nav gora Mem û di navbera wan de şûrekî ji axê heye.

Varyanta VI.

Mem û Mîr bi setrencê dilîzin. Şertê wan ew e ku, yê ku têk biçe, ya di dilê xwe de bibêje. Mîr bi alîkariya hîleya Beko, zora Mem dibe. Mem ji Mîr re dibêje ku hezkiriya dilê wî Zînê ye. Mîr hêrs dibe û Mem diavêje zîndanê. Qeretajdîn jî tevî

birayên xwe ji Mîr dixeyide û mala xwe bar dike diçe Şamê. Piştî demeke dirêj Qeretajdîn vedigere û ji Mîr re dibêje ku yan Mem berde yan jî jê re derê meydana şer. Mîr daxwaza Qeretajdîn qebûl dike û biryara azadkirina Mem dide. Beko ji Mîr dixwaze ku Zînê biçe Mem ji Zîndanê derbixe. Mîr qebûl dike û Zînê diçe zîndanê bo ku Mem berde. Di heman demê de Beko diçe zîndanê ji Mem re dibêje ku Zînê biryar daye ku bi yekî dî re bizewice û wê kêliyêkê şûnde were cem te, xatirê xwe ji te bixwaze. Dema ku Zîn xwe xweş dixemilîne û diçe zîndanê cem Mem û hingê li nav Cizîrê dengê defan jî bilind dibe, Mem ji gotina Beko bawer dike. Dema ku Zîn tê wî xelas bike, Mem dibêje ku: 'Zînê tu hatiyî ku tu rûhê min ji min bistînî.' Bi vî rengî Mem serê wî li ser çoka Zînê dimire. Piştî sê rojan Zîn jî ji kerban dimire. Gora her duyan li teniştê hev in. Piştî ku li ser fesadiyên Beko, gorên wan ji nû vedikin, dibînin ku ew li kêleka hev in û destên wan di stûyên hev de ne lê bedenên wan ji hev dûr in.

Varyanta VII.

Mem û Mîr bi setrencê dilîzin. Şertê wan ew e ku Mem, Mîr bibe ê Mîr, Zînê bidê; ku Mîr, Mem bibe ê Mem biavêje hepsê. Mîr bi alîkariya leyistikên Beko, Mem têk dibe û wî diavêje zîndanê. Mem çar sal di zîndanê de dimîne. Destbirakê Mem, Tacidîn ji şer vedigere û Mîr ditirse, biryara serbestberdana Mem dide. Beko ji Mîr dixwaze ku Zînê here Mem ji zîndanê azad bike. Zîn diçe da ku Mem berde. Mem dema ku Zînê dibînin dimire. Zîn jî wê hingê li ber serê Mem canê xwe dide. Gorên her duyan li nik hev çêdikin.

Varyanta VIII.

Mem û Mîr bi setrencê dilîzin. Şertê wan ew e ku kî yê dî têk bibe, çi bixwaze ê yê têkçûyî bîne cih. Mîr bi plana Bekoyê Ewan, Mem têk dibe. Mîr, Mem diavêje zîndanê. Piştî ku Qeretajdîn tevî birayên xwe ji seferê vedigere, Mîr ji tirsê, biryara serbestberdana Mem dide. Beko diçe zîndanê cem Mem û jê re dibêje ku, Mîr, Zînê daye yekî dî û ê gavekê şûnde Zînê were xatirê xwe ji te bixwaze. Dema ku Zînê diçe zîndanê da ku Mem berde, dengê defan li nav Cizîrê lêdikeve. Mem ji gotinên Beko bawer dike. Ji Zînê re dibêje ku: 'Tu nehatiyî min ji zîndanê derbixî, tu hatiyî canê min bistînî.' Hingê Mem can dide. Zîn jî ji ber kederan piştî du sê rojan dimire. Mîr ferman

dide ku gora wê li kêleka ya Mem be. Piştî mirina wan, bi fermana Qeretajdîn gorên wan vedikin, dibînin ku her du di gorekê de li kêleka hev in û hev hemêz kirine.

Varyanta IX.

Mem û Mîr bi setrencê dilîzin. Ji ber ku berê Mem dikeve alî Zînê û haya wî ji lîstikê namîne, Mîr zora wî dibe. Mîr, Mem diavêje zîndanê. Qeretajdîn tevî birayên xwe di seferê de bi ser dikeve. Agahî tê Mîr ku, Qeretajdîn serkeftî vedigere. Mîr û Beko ji ber rewşa girtîbûna Mem ditirsin û Mîr biryara azadkirina Mem dide. Zînê tevî qîza Bekoyê Ewan diçin da ku Mem ji zîndane derbixin. Mem ji ber ku di zîndanê de pir bêqewet ketiye, piştî ku Zînê dibîne, jê re dibêje ku, tu nehatiyî min ji zîndanê derbixî, tu hatiyî canê min ji min bistî nî û di wê kêliyê de dimire. Zînê, ji Mîr re dibêje ku dê gavekê şûnde ew jî bimire û wesiyeta xwe dike ku, piştî ku mir, wê bixin gora Mem û piştî wan bidin hev. Zîn jî dimire û wê dixin gora Mem. Li ser fermana Qeretajdîn, gorên wan ji nû vedikin û dibînin ku berê wan li hev e û destê wan di histûyê hev de ye.

Varyanta X.

Qeretajdîn diçe seferê. Mem û Mîr bi pêşniyariya Beko bi setrencê dilîzin. Şertê wan; ku Mem Mîr bibê, wê Mîr Zînê bidê lê ku Mîr Mem bibe ê wî biavêje zîndanê. Beko bi alîkariya qîza xwe ya remilvan hîn dike ku berê Mem bikeve Zînê, wê dev ji setrencê berde û wê Mîr wî tîk bibe. Piştî ku Mem çend car Mîr tîk dibe, Beko cih bi wan dide guhartin û berê Mem dikeve Zînê û hişê wî ji setrencê diçe. Mîr, Mem tîk dibe. Mîr, Mem diavêje zîndanê. Beko ji qîza xwe ya remildar hîn dike ku Qeretajdîn ji seferê vedigere. Qîza Beko dibêje ku, mîr herin Mem ji zîndanê derbixin ê xelas bibe lê ku jin herin ê Mem bimire. Beko ji Mîr dixwaze ku Mem serbest berde. Mîr qebûl dike. Beko diçe ji Zînê re dibêje ku, biçe Mem ji zîndanê derbixe. Zînê tevî cariyên xwe diçe zîndanê da ku Mem derbixin. Şirît davêjin û Mem dikişînin. Piştî Mem dişikê û Mem dimire. Zînê, ji Mîr re dibêje ku dê gavekê şûn de ew jî bimire. Wesiyeta xwe dike ku di gorê de piştî wê û Mem bidin hev. Zîn li ser tirba Mem can dide. Li ser wesiyeta wê Mîr wê dixin gora Mem û piştî wê û Mem dide hev. Piştî ku li ser fermana Qeretajdîn, gorên wan ji nû vedikin, dibînin ku berê wan li hev e û destên wan di histûyê hev de ye.

Varyanta XI.

Qeretajdîn tevî brayên xwe diçe şer. Li ser şîretên Beko, Mîr bi Mem re bi setrencê dilîze. Şertê wan, eger ku Mem têk biçe, dê Mîr wî biavêje zîndanê, ku Mîr têk biçe dê Zînê bide Mem. Mem qebûl dike. Beko, Zînê dixapîne, tîne ber pencerê. Ji Mîr dixwaze ku ew û Mem cih biguhêrin. Dema ku bala Mem diçe ser Zînê, Mîr wî têk dibe. Mîr, Mem diavêje zîndanê. Agahî tê ku Qeretajdîn ji seferê vedigere. Beko ditirse û diçe ji Zînê re dibêje ku biçe Mem ji zîndanê derbixe. Zînê diçe ben davêje binê zîndanê da ku Mem derbixe. Lê hingê ji ber ku pir lewaz ketiye, Mem dimire. Zînê, ji Mîr re dibêje ku dê gavekî şûn de ew jî bimire. Wesiyeta xwe dike ku di gorê de piştî wê û Mem bidin hev. Zîn li ser tirba Mem can dide. Li ser wesiyeta wê Mîr, wê dixwe gora Mem û piştî wê û Mem dide hev. Piştî ku li ser fermana Qeretajdîn, gorên wan ji nû vedikin, dibînin ku berê wan li hev e.

Mem û Zîna Ehmedê Xanî.

Li gorî Xanî, Mîr li ser şîretên Beko, Mem vedixwîne lîstika setrencê lê bi şertê ku hezkiriya dilê xwe bibêjin. Mem vê yekê qebûl dike.

43/17 Mîr gote Memê bi kîn û kerbe

“Îro me digel te ceng û herbe

Rabe ji me ra were muqabil

Bêşek bi ter a ez im mucadil

Şertê me digel te ey serefrax

Herçî te divê ji bo me dilxwaz

Di destpêka lîstikê de Mem zora Mîr dibe. Lê dema ku Beko dibîne ku Zîn di piştî pencereyê de seyra Mem dike û Mem ji vê bêhay e, Beko tevdirekê dike û radibe ji Mîr û Mem dixwaze ku cih bi hev biguhêrin. Dema ku ew cih bi hev diguhêrin, berê Mem dikeve aliyê Zînê û hew haya wî ji setrencê dimîne. Lewma Mîr wî têk dibe. Li ser vê Mem li gorî şertê ku girtine, navê heskiriya xwe, yanî navê Zînê dibêje. Hingê Mîr gelek hêrs dibe û wî diavêje zîndanê.

43/66 Mîr rabû û dest û pê Memê best
Tacdîn mirina xwe wê demê xwest

Emma çî bikît, ji bo ne'ar e
Celladî Emîr e xwundekar e

Mem girt û şihande pêşê seheng
Go: "Hebsî bikin di qulleya teng"

Mem di demên xwe yên zîndanê de, ji taybetmendiyên xwe yên beşerî xelas dibe û evîna wî digihîje radeyeke bilind, radeya tesewûfî. Zîn jî ji ber zîndanîbûna Mem, pir bi keder û bêhêvî ye. Piştî ku Tacdîn û birayên xwe, xwe li hember Mîr ji şer re amade dikin û ji Mîr dixwazin ku Mem berde, Mîr li ser şîretên Beko, ji Tacdîn re xeber dişîne ku ê Zînê bide Mem. Mîr ji Zînê dixwaze ku here Mem ji zîndanê derbixe. Beko jê re gotiye ku Memê jar, ê bi dîtina Zînê yekcar ji xwe ve here û bimire. Zîn diçe zîndanê da ku Mem azad bike. Li wê derê di navbera her duyan de li ser evîn û evîna rast diyalogekê derbas dibe. Mem li wê derê, li zîndanê, li cem Zînê can dide. Li gorî Xanî xelkê Cizîrê ew çend li ber mirina Mem ketine ku, hingê hemiyar cil û bergên reş li xwe kirine û dûre ev bûye adet û dê heya qiyametê ev adet bidome. Dûre Zîn xwe davêje ser gora Mem û dimire. Mîr tabûta Mem ji nû ve vedike û Zînê jî di gora wî de di yek tabûtê de defin dikin.

55/51 Ew her du guher di durcekê da
Ew şems û qemer di burcekê da

Bê wasîte wan kirin muqarîn
Bê fasîle ew bi hev siparîn

Hasil vekirin ji nû ve sendûq
Mîr gote Memê: Ji bot e me'şûq

Sê carî ji qalibî seda hat
Awazî bi lefzê "merheba" hat.

1.5. Kuştina Bekoyê Ewan

Varyanta Roger Lescot

Li gorî varyanta Lescot; piştî ku Mem û Zîn dimirin, Mîr ji kirinên xwe pir poşmam dibe û fermana mirina Bekoyê Ewanê ku bûye sedemê mirina Mem û Zînê, derdixe. Beko ditirse û direve. Mirina wî bi vî rengî pêk tê:

Rojekê yekî baxçevan baxçe av didane
Nihêrî kol i bin darekê raketiye sebê Memî û Zînê, Bekoyê Awane
Bexçevan got: “Ma ne Mîr bi der xistî bû di heqê wî da fermane
Ko kî wî bikuje, wê çavê wî têr bike ji zêr û perane?”
Micirfa xwe girt, çû yek dawîşande serê Bekoyê Awane
Serê Beko qelişî, xwîn pêda rêz bû û rabû revî, berê xwe da malane
Bexçevan da pê, heya gihan tirbane
Beko derbas bû di nav tirba Zînê û Memê Alane
Çilkek ji xwîna Beko dilopiya, kete navbera tirba her diyane
Dibên ji wê çilka xwînê stiriye kî mezin hişîn bû, ji hev kirin destê wane
Çawa li dinê nehişt bigihêne hev, di tirbê da jî, wan ji hev veqetane
Baxçevan gihêste Bekoyê Şeytane
Serê wî da ber devê micirfane
Li wir kuşt, cendekê wî bir, avête newalane

Varyanta I.

Li gorî vê varyantê bavê Mem, padîşahê Muxurzemînê, Al Paşa, li ser xebera mirina Mem tê bajarê Cizîrê.

“Al paşa pê dihisînin, wekî sebebê Memê û Zînê Beko biye. Gazî Beko û Mîr dikin, tèn ser mezel, cenazê herda tînin bi hev ra dikin çal.

Al paşa serê Beko difirîne, çilkê xûna Beko dikeve orta Memê û Zînê, navda digihêje, dibe diryan. Usa jî Qeretajdîn serê Mîr difirîne. Alîkî Cizîrê ava dibe, yê din xirab.”

Varyanta II.

Piştî mirina Mem û Zînê jî, Beko li fesadiya xwe dewam dike. Ji Mîr re dibêje ku Mem çûye nava gora Zînê. Mîr gora Mem û Zînê dide vekirin. Dibînin ku, Zînê çûye nava gora Mem. Dilê Mîr pir bi halê wan dişewite, lenet li Bekoyê Ewan tîne.

“Qeretajdîn rabû ser xwe, destê xwe avêt gehpera stoê Bekoê ne’letî, xencer ji ber piştî xwe kişand, Beko da ber xencera. Dilopeke xwînê çu li navbeyna herduya şîn bû. Her wê gavê Zîn çu li qebra xwe da, Memê Ala ma li cih da.”

Varyanta IV.

Di vê varyantê de behsa mirina Bekoyê Ewan nayê kirin.

Varyanta V.

Piştî mirina Mem û Zînê, roja îne Mîr Sevdîn ferman dide ku qebra Memê Alan vekin. Dema ku Qeretajdîn qebra Mem vedike, dibînin ku Mem û Zîn bi hev re di nav qebrê de ne û di nava wan de şûrekî ji axê heye.

“Qeretajdîn ban kir: “Erê, Beko Ewano, were binêre li qudreta xudê, çu li vira ye.”

Beko Ewan hat, ji jor dinere, eceb bû. Qeretajdîn destê xwe avêtibû Beko Ewan û kişand qebrê go: “Çu ye ev?”

Qeretajdîn xencerê xwe kişand, wî bikuje. Mîr Sevdîn ban kir: “Qeretajdîn, wî mekuje, de qebrê xwîna wî dibe ezeb.” Qeretajdîn guhê xwe neda Mîr Sevdîn û sebir nebû. Bîst û yek xencer li dora Beko Ewan da, kuşt. Biderketin ji qebrê, ax danî li ser qebrê û çûn. Xwîna Beko Ewan dibû de qebrê Mem û Zînê darkî istrî, biderket ji fitnê Beko Ewan.”

Varyanta VI.

Piştî mirina Mem û Zînê, Beko hîn jî li fesadiyên xwe dewam dike. Ji Mîr re dibêje ku, Mem û Zînê di qebrê de ketine hemêza hev. Mîr ferman dide ku qebra wan vekin. Dema ku vedikin, dibînin ku her du li kêleka hev in, serê wan nêzikî hev, destê wan li ser stûyê hev in lê bedenên wan dûrî hev in. Mîr hingê ji kirinên xwe gelek poşmam dibe.

“Wê gavê Qeretajdîn şûrek hilgira Bekrok da, stûyê wî ji nav milan firandiye, got: “Te bi saxiya Mem û Zîn ji wan ne ve bûyî, li ziyaretê jî te nehêla ca rihet bibin.” Gotiye di wî wextî du çepik xîn ji stûyê Bekrok ketine mabeyna ziyareta Memê Alan û

Xatûn Zîn. Ew du çepikê di xîn şîn bûn û bûne dirîkê mezin li mabeyna her du ziyareta û wiha reng Bekrok ne hêla ca Mem û Zîn li nav ziyaretê jî bigihîne yek û du.”

Varyanta VII.

Piştî mirina Mem û Zîn jî Bekoyê Ewan hîn jî li fesadiyên xwe dewam dike.

“Ligel hindê Tacidîn gelek eçiz bû, şîrê xûş-kavlanî helkêşa û dana nîveka serê Bekrûkî, heta kiriye du ker.

Belê cilikeka xîne vepeşî, kefte nabeyna herdû xûştiviya. Wan veşartin Mem û Zîn l-wî erdî, ewê lê hatine mirîn, belê hemî havîna du gulêd sûr l-ser qebrêd wan şîn dibin, nabeyna wan ra stiriyek şîn dibît ê wenaket her du gul bigehne êk û dû.”

Varyanta VIII.

Mem û Zîn dimirin lê Bekirê Ewan hîn jî iffîrayan li wan dike. Ji Mîr re dibêje ku ew di mezê de ketine hemêza hev.

“Bi vê gotinê ra hêrsa Qeretajdîn hat, ewî şûrê xwe kişand û got: “Bekirê Ewan, li dunya zêndî tu bibûyî sebebê bêmiraziya evîna Mem û Zînê, tu dixwezî ew li wê dinê jî bêmiraz bin, bi te xweş nayê ku li wê dinê berê wan li hevda ye?” Qeretajdîn awa got û şûrek li stûyê Bekirê Ewan da, serê wî firand, çilkek xûna wî kete nav gora Mem û Zînê. Gilî dikin, ku ew çilka xûn bû dirî û li ser gora wan gihişt. Dibêjin hersal ew dirî hêşîn dibe, li alîkî wê gula sor digihîje, li alîkî wê din jî gula spî digihîje. Hergav rêwî tèn li ber gora Mem û Zînê ra derbaz dibin, çirpîyêd dirîyê dişkênin, lê dirî her sal li nav her du gulan da hêşîn dibe.”

Varyanta IX.

Qeretajdîn ji şerê bi Mîr Elî Şaşan re serkeftî vedigere. Beko hîn jî di heqê Mem û Zîn de li fesadiyên xwe dewam dike.

“Qeretajdîn hukim kir mezêl vekin. Mezêl vekirin, bala xwe danê: Mem û Zîn wê dest stûyê hevra birine, xudanê zîpik-zîpik ser wan ra avêtiye, meriv tirê razane. Beko ku çav pêket gote Mîr: “Her du razane, ne mirine.” Qeretajdîn go: “Beko, hela tamîz lê binêre, mirine yan razane.” Wexta Beko stûyê xwe dirêj kir, ku lê binêre, Qeretajdîn şûr kişand avîte stûyê wiya, serê wiya ber bi cenemê kir. Niqtikek xûna wiya, rijîya kete orta Mem û Zînê.

Gitina gotiye ew niqtika xûnê bûye dirîkî û her sal orta Memê û Zînê da hêşîn dibe.”

Varyanta X.

Qeretajdîn ji seferê vedigere û mirina Mem û Zînê dibihîze. Gora wan vedike. Hingê dibînin ku Mem û Zîn di mezel de, berê wan li hev in û xwîdan ji wan tê. Hingê Beko îda dike ku ew sax in, ne mirî ne.

“Wextê ewî usa got, Qeretajdîn şûrek li sitûyê Bekir da, serê wî firî aliyê tîrbê dinê, cendekê wî ma cîda. Lê niqtika xûna wî kete tîrbê, orta Memo û Zînê. Nav herda da ew niqtika xûnê bû dirîke uncuz, şîn bû. Heta niha jî divêjin: Ser tîrba Memo û Zînê du gulê bedew û bîn hêşîn dibin, lê dirîkê nepak û tûj orta her du gula da nahêle ew gulana nêzîkî hev bin.”

Varyanta XI.

Qeretajdîn di şer de bi ser dikeve û vedigere Cizîrê. Mîr û Beko xwe davêjinê, ji ber mirina Mem û Zînê, jê daxwaza bexşandinê dikin. Qeretajdîn wan dibexşîne lê Beko hê jî li fesadiya xwe dewam dike.

“Sibetirê Beko çû ser mezelê Mem û Zînê, ku dewrkê bêje. Beko derê mezel vekir, ewî ji tirê Memê û Zînê zîpik-zîpik xwîdane, elamî Mîr kir, wekî Memê û Zînê sax in.

Cimaeta Cizîrê çûne ser mezelê herda. Qeretajdîn, Çekîn, Erfîn Memê û Zînê bîr anîn. Fikirîn, ne be ewana em xapandine, Memê Zînê ne mirine. Ewana jî çûne ser mezel, Memê û Zînê mirî dîtin, berê herda hevda kirî.

Beko jî serê mezelê dinê sekinî. Qeretajdîn şûrê xweyî kêr kişand û li sitûyê Beko xist, qetand.”

Mem û Zîna Ehmedê Xanî

Li gorî Xanî, Beko piştî mirina Mem, ji alî Tacdîn ve tê kuştin. Lê di navbera varyantên gelêrî û *Mem û Zîna Ehmedê Xanî* de cudahî hene. Yek jê ev e ku, di varyantên gelêrî de Beko piştî mirina Mem û Zînê, ji aliyê Tajdîn ve tê kuştin. Lê di *Mem û Zînê* de, dema ku Tacdîn Beko dikuje, Zînê hê nemiriye. Her wiha Zîn, di heqê Beko de tiştên balkêş dibêje. Çunkî li gorî Xanî, Beko bûye alîkar ku evîna Mem û Zînê bigihê radeyeke tesewûfî. Her wiha wî bi tenê peywira xwe bi cih anîye. Dîsa cudahiyeke di ev e ku, di piraniya varyantên gelêrî de, piştî ku Beko li ser mezelê Mem û Zînê tê kuştin, çilkekê ji xwîna wî dikeve navbera Mem û Zînê û ji wê çilka xwîne dirihêkî şîn dibe û nahêle Mem û Zîn bigihên hev. Lê di *Mem û Zîna Xanî* de bûyer bi

vî rengî derbas nabin, her wiha Tacdîn, Beko ne li ser qebra Mem, li derekî dî dikuje.
Behsa kuştina Beko bi vî rengî derbas dibe:

53/8 Tacdîn û Bekir bi îttîfaqî
Bûn her du li erdekî mullaqî

Go: “Ey sebebê fesadê ‘alem
Şeytansîfetê li şekê Adem

Ey ba’îsê fitne û fesadan
Wey manî’ê meqsed û miradan

Ey perdederê Memê û Zînê
Wey daxkeşê li ser birînê

Îblîsê xebîsê pîrnedamet
Bes nîne te li min kir qiyamet?

Derheqê Memê seqet xeber da
Heta ku li min te Mem bi der da

Ev çende minafîq û neyar î
Hêja tu bi çavê min diyarî!

Mem dê bimirit tu dê bimînî!
Hêj xweş bigerî li rû zemînî!”

Hadir wî Bekir di erdê ra kir
Cismê bi bela ji can cuda kir

BEŞA DUYEM

LI GORÎ AVAHÎSAZIYA MOTÎFAN MUQAYESEYA MEMÊ ALANA FOLKLORÎ Û MEM Û ZÎNA EHMEDÊ XANÎ

Di berhemên zarogtinê de motîf, hêmanên herî biçûk in ku avahîsaziya çîrokê li ser wan rûdinê. Ev hêman, bi dirûvên curbecur û bi naverokên ku li gorî çand û erdnîgariyên cuda diguherin lê di prosesa çîrokê de bi heman wezîfeyê, di zargotina hemî cîhanê de derdikevin pêş me.

Di tesbîkirina motîfan de, min xebata Stith Thompson, ‘*Motif Index of Folkliterature*’ (Indeksa Motîfên Wêjeya Gelêrî) û xebata Zeynelabidîn Zinar, ‘*Di Çanda Kurdî de 37 Şaxên Zanistiyê*’ esas girtin. Zeynelabidîn Zinar di vê xebatê de, ne bi navê motîf lê wekî ‘*hevbeşiyên çîroka kurdî*’ 133 xalên hevbeş yên di çîroka kurdî de tesbît kirine. Di xebata Stith Thompson de, hemî motîfên çîrokan, di binê 23 sernavan de hatine qeydkirin.

Di vê beşa teza xwe de, min li gorî avahîsaziya motîfan di navbera Memê Alana folklorî û *Mem û Zîna* Xanî de muqayese kiriye. Di vê beşê de pêşî min hewl daye ku ez motîfên hevbeş ku hem di Memê Alana folklorî de û hem jî di *Mem û Zîna* Xanî de derketine pêş me tesbît bikim.

Di destpêka her motîfê de, min herf û sernava vê motîfê ku di Motif Indexa Stith Thompson hatiye qeydkirin daye. Dûre eger ku di xebata Zeynelabidîn Zinar ya bi navê ‘*Di Çanda Kurdî De 37 Şaxên Zanistiyê*’ ev motîf wekî hevbeşiyeye çîroka kurdî hatibe qeydkirin, min sernav û hejmara wê motîfê jî daye. Di destpêka her beşê de, ji bo ku mûhtevaya motîfê baş bê têgihîştin, min nîqaşeke kurt ya teorîk kiriye û der bareyê wê motîfê de pênaseyên hin folklornasan daye û her weha di dawiyê de şîroveya xwe ya li ser wê motîfê kiriye. Dûre min ji aliyê Memê Alana folklorî ve li vê motîfê kolaye. Di vê beşê de min hejmara vê motîfê ya ku di indeksa Thompson de ye daye û piştî ku min pênaseya kurt ya Thompson tevî zimanê wê yê orjînal daye, min mînakên vê motîfê ku di Memê Alana folklorî de derketine pêş me li gorî varyantan daye. Di vê beşê de ji bo ku ez cardî dubare nekim, min mînakên di *Mem û Zîna* Xanî de jî tevî varyantan daye. Di vê beşê de eger ku ez lê rast hatibim bo ku naveroka motîfê baş bê têgihîştin, min ji destanên dî yên navdar û yên kurdan mînakên vê motîfê daye. Di dawiyê de min wekî sernava sisêyan ya vê beşê ji alî *Mem û Zîna* Xanî ve li vê motîfê kolaye.

2.1. MOTÎFA XEWNÊ

Motîfa xewnê, di Motif Indexa Stith Thompson de, di beşên **T: Cinsiyet, D: Sêhr, M: Tayinkirina Pêşerojê** de hatiye nîşandan.

Di xebata Zeynelabidîn Zinar a bi navê Di Çanda Kurdî de 37 Şaxên Zanistiyê de, ev motîf wekî hevbeşiyê çîroka kurdî, di binê sernava **Xewn** de, di hejmarê **85**an de hatiye qeydkirin.

Ji ber ku bi gelek zanyariyan ve peywendiya wê heye, di heqê xewnan de pênaseyên gelekî berfireh hatine kirin. Em ê li jêrê çend pênaseyên ku bi çanda gelêrî re têkildar in bidin.

Lêkolîner Doğan Kaya ji bo xewnê weha nivîsiye:

“Motîfa xewnê; di cureyên mîna destan, çîrokên gelêrî, çîrok û efsaneyan de derdikeve pêş me û der bareyê bûyinên dahatû de nîşaneyan dide.”⁷¹

Folklornas Umay Günay, der bareyê xewnê de weha dibêje:

“Ji dewrên herî kevnar û vir ve mirov bi xewnan re mijûl bûne. Bi pênaseya herî hêsan em dikarin xewnan wekî; rêzexeyalên ku di halê xewê de di hîşê mirov de derbas dibin, tarîf bikin.”⁷²

Zanyar Erman Artun jî ji bo xewnan, pênaseyêke wiha berfireh kiriye:

“Civakê, li derdora xewnan bawerî ava kirine. Mirov, ji xewnên ku dibînin, di heqê jiyana rastîn û pêşerojê de hin wateyan derdixin û şîroveyan dikin. Dema ku di xewnê de, rengên kesk û sipî tîn dîtin, ev wekî nîşaneyêke baş tê nirxandin û dema ku rengê reş tê dîtin, ev wekî nîşaneyêke nebaş tê şîrovekirin. Dema ku mirovekî di xewna xwe de mar bibîne, wilo tê bawerkirin ku wê ji dijminên xwe zerarekê bibîne. Ku di xewnê de ben bê dîtin, ev wekî nîşaneyê rêveçûnekê tê hêlengandin. Di xewnê de zarokên keçik dîtin; nîşaneyê xebereke nexweş e û zarokên kur dîtin, wekî nîşaneyê hatina xebereke xweş tê şîrovekirin. Dîsa wilo tê bawerkirin ku kesekî di xewna xwe de bigirî, wê di jiyana rastîn de bikene.”⁷³

⁷¹ D. Kaya, *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*, Weş. Akçağ, Ankara., 2007, r. 621

⁷² Umay Günay, *Folklor Mahsullerinin Tabiatı, Milletlerarası Türkoloji Kongresi*, Tebliğler, C. II. İstanbul, 1999, r. 78

⁷³ Erman Artun, *Türk Halk Bilimi*, Weş. Kitabevi, İstanbul, 2005, r. 259

Wekî ku em ji van pênaseyan jî têdigihên xewn, di çanda gelêrî de hêmaneke pir kompleks e û di nava jiyane de bandoreke wê ya gelekî bi fonksiyon heye.

Umay Gunay, motîfa xewnê ya ku di çîrokên gelêrî de derbas dibe wekî motîfeke kompleks dinirxîne û wiha dibêje:

“Di çîrokên gelêrî de, xewna ku lehengan ber bi evîne ve dibe, motîfeke kompleks e. Hêmanên ku di hin çandên dî de bi rengên cuda derdikevin meydanê, di folklorê de, di nava motîfa xewnê de bi rengêkî têkel û bi hev re derdikevin pêş me.”⁷⁴

Di zargotinê de carina em lê rast tên ku xewnek dikare jiyana mirovan bi taybet a padîşahan, hukumdaran serûbin bike. Wekî mînak di çîroka Hz. Mûsa, di çîroka kralê Akadê Sargon û di çîroka Nemrûd û Hz. Îbrahîm de, kral di xewnê de dibîne ku zarokêkî kur tê dinyayê û wî ji text û taca wî dike. Lewma ew jî ferman dide ku hemî zarokên kur bîn kuştin.

Bi piranî ji bo lehengên çîrokê xewn, di wateya pozîtîf de derdikeve pêş me. Lê dema ku di çîrokan de zalimekî an jî padîshahekî zalim hebe û ew xewn bibîne, ev bi piranî ji bo wî weke xewneke ne bixêr e. Her wekî çîrokên Hz. Mûsa û Sargon.

Der bareyê xewnên ku di çîroka kurdî de dertên, lêkolîner Zeynelabidîn Zinar wiha gotiye:

“Di bingeha Çîroka Kurdî de xewn, umîdeke mezin e ku ji mirovan re çêdibe. Pir tiştên dema pêşê hene ku lehengê çîrokê, bi dîtina xewnan pêzan dibe û li wê gorê dimeşe, diçe heta ku li armanca xwe sererast dibe.”⁷⁵

Di berhemên zargotinê de, carina dibe ku pîrekî an jî derwêşekî were xewna leheng û pirsgirêkên ku ew pê re rûbirû ye û nikare ji nava wan derê, çareser bike û rêya ku divê ew bimeşîne, nîşanî wî bide. Wekî ku di varyanta IVan a Memê Alan de, *Şêxê Hunkarî* di xewna xwe de rêya çareserkirina kordûndebûna bavê Mem, ji melayiketan hîn dike.

⁷⁴ Umay Günay, *Türkiyede Aşık Tarzı Şiir Geleneği Ve Rüya Motifi*, Weş. Akçağ, Ank., 1999, r. 90-91

⁷⁵ Zeynel Abidîn Zinar, *Di Çanda Kurdî De 37 Şaxên Zanistiyê*, Weşanên Pencînar, r. 129

2.1.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Xewnê

Di destana folklorî a Memê Alan de, her çendî ku bi tevahî wilo nehatiye nîşnadan jî, hevdiîna Mem û Zînê, cureyeke hevdiîna di xewnê de ye. Mem li nava cihê xwe, li koşka xwe ye û dema ku di xew de ye Zînê tê cem wî. Piştî ku ew radizên û radibin, cardî dibînin ku her yek li koşka xwe ye.

Li gorî kataloga Stith Thompson, di varyantên folklorî yên Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî de motîfa xewnê, bi van rengan derdikeve pêş me:

T11.3: Love through dream/Evîndarbûna bi rêya xewnê: Mem û Zîn di cureyeke xewnê de evîndarê hev dibin; Varaynt I, II, IV, VI, VII, VIII, IX, X, XI, R. Lescot.

T11.3.1: Meet in their dreams/Di xewnên hev de lihevraştatin: Mem û Zîn di cureyeke xewnê de li hev rast tên; hemî varyantên di hejmara jorîn de.

D1814.2: Advice from dream/Şîretên di xewnan de hatine girtin: Şêxê Hunkarî di xewna xwe de ji çar melayiketan agahî digire ku dê bavê Mem çawa bikaribe bibe xwedî zarok; varyanta IV.

D1812.3.3: Information received through dream/Agahiyên ku bi rêya xewnê tên bidestxistin: Mem di xewna xwe de dibîne ku heft roj piştî wî dê Zînê jî bimire; varyanta R. Lescot. Piştî ku Zînê dimire, Mîr sê caran di xewnê de dibîne ku Zînê bang lê dike da ku were ser gora wê û Mem û li evîna wan ya rast şahidî bike. Pîr di xewna xwe de dîtiye ku Mem û Zîn, tevî Beko û Tacdîn li bihiştê ne; *Mem û Zîna* Xanî.

D1819.2: Deception revealed in dream/Di xewnê de aşkerabûna dek û hîleyan: Mem di xewna xwe de dibîne ku qîza Beko ya remildar hinara bi jehrî jê re dişîne; varyanta R. Lescot.

M302.7: Prophecy through dreams/Bi rêya xewnê kehanet: Mem di xewna xwe de dibîne ku dê bimire û Zînê jî çend roj li dû wî bimire; R. Lescot.

Ji bilî lihevraştatina Mem û Zînê ya di xewnê de ku di hemî varyantên folklorî de derdikeve pêş me; di varyanta IIyan de, Mîr di xewnê dibîne ku, ‘*malê Kabeyê bi ser wî ketiye*’ û Qeretajdîn dişîne Kabeyê. Di varyanta IVan de, Şêxê Hunkarî, di xewnê de çar melekan dibîne û ew melek jê re dibêjin ku wê çawa Rîcal Hesen bikaribe bibe xwedî zarok. Di varyanta R. Lescot de Mem di xewnê de dibîne ku qîza Beko hinara bi jehrî jê re dişîne. Di heman varyantê de Mem di xewna xwe de dibîne ku wê heft roj

şûn de Zînê jî li dû wî bimire û ew ê li bihiştê bigihên hev. Di heman varyantê de, piştî mirina Zînê, Mîr Ezîn wê di xewnê de dibîne ku, jê daxwaz dike ku bê ser gora wê û Mem û rastiya evîna wan bibîne.

Di destanên evînê de motîfa xewnê gelekî girîng e. Evîndar carina berî ku hev bibînin, her du jî di heman demê de hev di xewnê de dibînin û bi vî rengî hev nas dikin û evîndarê hev dibin.

Di destana navdar a Yûsuf û Zuleyxayê de, motîfa xewnê pir balkêş e. Fîrewnê Misrê xewnekê dibîne û tu kes nikare xewna wî şîrove bike. Bi tenê Yûsuf xewna wî şîrove dike û bi saya vê hunera xwe, ji zindanê azad dibe.

2.1.2 Di Mem û Zînê de Motîfa Xewnê

Di *Mem û Zîna* Xanî de motîfa xewnê di derekê de derdikeve pêş me. Her çendî ku ev bi qandî xewnên ku di çîrokan de û di destana folklorî a Memê Alan de derdikevin pêş me, ji aliyê zargotinê ve ne bi hêz û di prosesa çîrokê de ne bi fonksiyon be jî; divê ew wekî motîfa xewnê bê hêlsengandin.

Piştî ku Mem û Zîn dimirin, Xanî neqil dike ku *kalemêrekî* ku ji halê dewr û heyaman agahdar, jê re neqil kiriye ku; wî ji *pîrekî* ku, di xewna xwe de serencama Mem û Zînê dîtiye, hîn kiriye (an jî bi rêya îlhamê hîn kiriye) û *pîr* neqil kiriye ku, Mem û Zîn, tevî Beko û Tacdîn hemî li bihiştê bûne. Ev beş bi vî rengî derbas dibe:

57/1 Agahi ji halê dewr û eyyam
Ev rengehe gote min serencam

Go: “Pîrekî mihirdarê aşiq
Qewlê wî ji rengê subhê sadiq

Weqtê we ku ew dibû muraqib
Rûha wî dibû le cismê xalib

Esrar dibûn li wî diyarî
Nêçîr dikir li ‘Erşê Barî

57/8 Wî pîrî bi xewn eger bi îlham

Ev renga he kir heqîqet î'lam:

Go: “Çûme diyarê baxê Ridwan

Min dî du hezar ji hûr û xilman

Divê em vê yekê destnîşan bikin ku, motîfa xewnê, çi di nava çanda gelêrî de çi jî di nava zargotinê de, gelek caran motîfên derasayiyê di hundirê xwe de dihewîne. Yanî ew tiştên ku di xewnê de tên dîtin an jî ew rastiyên ku di xewnan de tên dîtin, ne pêkan e ku di nava çarçoveya sînorên jiyana rastîn a civakê de bên dîtin an jî zanîn. Ji ber vê taybetmendiya xwe, wekî ku li jorê di beytên Xanî de jî em dibînin, motîfa xewnê, bi rêya derasayiyê, merheleyeke girîng bi çîrok an jî destanê dide buhartin. Lewma em dikarin bibêjin ku, ev motîf bi giştî, di nava prosesa destanê de merheleyekê teşkîl dike û bi fonksiyon e.

2.2. MOTÎFA DERASAYÎ Û SÊHRÊ (PERÎ, CIN Û CADÛ)

Di Motif Indexa Stith Tohmson de, **Sêhr û Sêhrbazî** di herfa **D**'yê de hatine qeydkirin. Ev beş hemî bi sêhrê û sêhrbaziye re têkildar e. Her weha di beşa **F**'yê de di binê sernava '**Derasayi**'yan de jî heyinên derasayî wekî perî û cin hatine qeydkirin.

Ev motîf, di xebata Zeynelabidîn Zinar de, bi vî awayî hatine qeydkirin: **70: Efrît, 72: Cin, 73: Perî, 74: Dêw** (Di çîrokên kurdan de wekî temsîla xerabiyê an jî şeytan, em ji cadû an jî xûlanan bêhtir, rastî motîfa dêw tên) **77: Pîrhevok-Pîrelk**.

Ev motîf, bi piranî di çîrok û çîrokên gelêrî de derdikevin pêş me.⁷⁶ Her wiha em dikarin di çarçoveya baweriyên gel de jî van motîfan/heyinan binirxînin. Lewma di baweriyên berê yê kevna de û di efsaneyên civakan de, gelekî ji van heyinan hatiye behskirin. Bi taybetî baweriya bi hebûna cinan di nava dînên mezin de jî cih girtiye. Li gorî nêrîna îslamî; çawa ku xweda mirov afirandine, wilo jî cin afirandine. Dîsa di nava qewmê yahûdî de wilo hatiye bawerkirin ku, artêşeke ji cinan di xizmeta pêxemberê yahûdîyan Hz. Suleyman de bûye.

Pertev Naili Boratav der bareyê cadûyan de wiha gotiye:

“Motîfa cadû û periyê, hem di çîrokan de hem jî di hikayeyên gelêrî de bi berbelavî tê dîtin. Cadû û perî hêzên dijber in. Yek başiyê ya dî xerabiyê dike. Jina cadû her tim xerab e û navbera hezkiriyên xera dike. Her tim li fersendekê digere ku li lehengê çîrokê xerabiyê bike. Carina vê yekê bi rêya sêhr, carina jî bi rêya derew û hîleyan dike.... Cadû, miriyên ku ji mezêlê xwe rabûne ne. Li ser wan gelekî çîrok hatine gotin. Bi piranî tê bawerkirin ku cadû jin in.”⁷⁷

Saim Sakaoğlu der bareyê periyên de wiha nivîsiye:

“Ew, lehengên xweşik û baş ên çîrokan in. Dikevin dirûvên curbecur û alîkariya kesên ku ketine tengayiyan dikin. Hinek jê carina di dirûvê masî an jî beq de dertên meydanê û di encama karên ku dikin de hebûna wan, perfbûna wan eşkere dibe. Ew, dûre bi xortên ku wan qefaltine re dizewicin.”⁷⁸

Lêkolîner Abdülbasit Sezer taybetmendiyên cadû û periyên de wiha rêz kiriye:

⁷⁶ P. N. Boratav, *H. Hikayeleri Ve H. Hikayeciliği*, Weşanên Adam, ist, r.105

⁷⁷ H.b., r.68, 105

⁷⁸ Saim Sakaoğlu, *Gümüştane Masalları Metin Toplama ve Tahlili*, Ankara, 1973, r. 250-251

1. Cadû xerabiyê, perî başiyê temsîl dikin.
2. Cadû bi piranî wekî jin hatine tesewirkirin.
3. Carina cadû û perî di hin objeyan de îfadeya xwe dibînin, di bunyeya hin objeyan de dertên pêş me.
4. Her du jî xwedî taybetmendiyan derasa ne.
5. Her du jî xwedî ew hêz in ku di çîrokê de seyra bûyeran biguhêrin. (Bandor li ser prosesa çîrokê bikin)⁷⁹

Di folklorê civakê kurd de, em bi berbelavî rastî motîfên cin û perî tîn. Lê di çîrokên kurdan de em pir kêr li motîfa cadû/xûlan rast tîn. Di şûna cadûyê de wekî temsîla xerabiyê di çîrokan de pîrebok hene de lê ew bi piranî sembola tirsê ne.

Zeynelabidîn Zinar, ji bo van motîfan wiha nivîsandiyê:

“Perî: Ango horî, yanî ew qîzikên di bihiştê de, ku wek diyarî dide zilaman. Gava ku di Çîroka Kurdî de navê perîya tê gotin, armanca bîngêhîn jê qîzeke pir delal e ku di şûfê horiyên bihiştê de ye û hemtayê wê di delalî û bedewiyê de nîn in. Ew perîya ku di çîrokê de tê xuyakirin, her tim digîje lehengê Çîroka Kurdî.

Cin: Di çîrokê de, cin tebayên xirabiyê ne û hertim teşqeke ji mirovan re derdixin. Lê ew hin caran alîkarî jî bi mirovan dikin. Yekcaran keçeke cinî dibe evîndarê lehengê Çîroka Kurdî û pê re dizewice.

Pîrhevok-Pîrelk(Pîrebok): Ji dêwan û cinan zêdetir, di çîrokan de pîrhevok û pîrelk jî hene. Ev pîrelk zêdetir xwe di çîrokên tirsê de nîşan didin û xasma ji bo tirsandina zarokan tîn gotin ku ew bi tenê negerin û bi rêyên xeter ve neçin.”⁸⁰

Ev cure motîf, di nava atmosfereke derasa de dertên pêş me. Wekî mînak dema ku ji aliyê maddî û xwezayî ve, ne pêkan be ku lehengê karekî bi ser bixe, an jî dema ku prosesa çîrok yan jî destanê bo ku merhele bibuhure, bi rêyên xwezayî yên di çarçoveya hêz û sînorên mirovî de, vê merheleyê li çîrok û destanê buhartin ne pêkan be, hingê ev hêzên derasa dikevin dewrê û bi vî rengî di avahîsaziya çîrok û destanê de wezîfeyêke bi fonksiyon bi cih tînin.

Wekî mînak, dema ku em di nava sînorên hêza mirovî de lê binihêrin, ne pêkan e ku Mem û Zîn hev nas bikin. Lê li gorî mantiq û sazgeriya destanê divê ev merhele were buhartin. Lewma di vê kêliya girîft de, hêzeke derasayî wekî perî dikeve dewrê û

⁷⁹ A. Sezer, *M. Mungan ve H. Bilimi*, r. 69

⁸⁰ Z. Zinar, *Şaxên Zanistiyê*, r. 127-128

di teşekila vê prosesa destanê de, roleke girîng dilîze. Yan jî dema ku di çîrokê de, leheng ji her alî ve dikeve tengayiyê û eger di encama vê tengayiyê de ew têk biçe an jî bimire, wê çîrok di merheleyeke bêwate de biqede; hingê ev hêzên derasa wekî cin an jî periyên an jî wekî Xizir, dikevin dewrê û di tamamkirina vê prosesa çîrokê de roleke girîng dilîzin.

Lewma ew di berhemên zargotinî de, her tim wekî surprîzekê derdikevin pêş lehengan. Vêca ku ew cadû an jî pîrebok be, ev ji bo leheng surprîzeke ne baş e. Lê dema ku ew perî be, ji bo leheng ew surprîzeke baş e. Ji ber ku, cadû û pîrebok, di çêkirina tengayiyên li dora leheng de dertên pêş me û perî jî di buhartina van tengayiyên de derdikevin pêş me.

2.2.1. Di Destana Memê Alan de Motîfên Derasayî û Sêhrî

Di destana folklorî a Memê Alan de, em bi rengekî pir bi fonksiyon rastî motîfa periyên tên. Li vê derê perî, ne wekî ku Z. Zinar dibêje, sembola xweşikiyê ne. Ew heyinên bi fonksiyon in û li ser prosesa destanê, bandoreke wan a bi hêz heye. Bi rastî, di hemî varyantên Memê Alan de, destan bi her sê periyên dest pê dike. Ew di navbera hev de diaxivin û li ser qedera Zînê û Mem biryar didin. Her weha bi rengekî derasa, Zînê ji nava cihê wê digirin û dibin datînin nava cihê Mem.

Li gorî kataloga Stith Thompson, motîfên derasayî yên ku me di Memê Alana folklorî û *Mem û Zîna* Xanî de tesbît kirine bi vî rengî ne:

F200-399: Fairies/Perî: Varyantên Memê Alan; I, II, IV, VI, VII, VIII, IX, X, XI, R. Lescot, *Mem û Zîna* Xanî

F260: Behavior Of Fairies/Helwestên Periyên: Di hemî varyantên hejmarê jorîn de, helwesta perî an jî melekên li ser qedera mirovan bandoreke mezin dike. Perî û melek biryar didin ku Mem û Zînê bînin cem hev, wan bi hev bidin naskirin.

G302.3.3: Demon as old woman/Cadûyên di libasê pîrejînê de: Di varyantên folklorî de qîz an jî xuşka Beko ya ku remilvan e û di *Mem û Zîna* Xanî de Heyzebûn, cureyeke cadû ne; varyant I, IV, V, VI, VII, VIII, IX, X, XI, R. Lescot û *Mem û Zîna* Xanî

D2031.0.2: Fairies cause illusions/Perî dibe sebebê îluzyonan: Di varyantên I, II, IV, VI, VII, VIII, IX, X, XI û vayranta Lescot de, perî an jî

melek, bi rêya cureyeke sêhrê, Mem û Zînê tînin cem hev lê ew, wekî ku vê xewnê bi rastî jiyabin di nava cureyeke îluzyonê de ne. Di varyantên I, VIII û XIan de perî ‘moriya xewê’ diavêjin guhê Mem û Zînê.

- D150 :** Magic transformation to bird/Veguherîna sêhrî ya mirovan wekî çivîkan: Her sê perî Zînê vedigerînin kevokekê û wilo bi hev re difirin, diçin koşka Mem; varyant I, IX, X, XI.
- D530:** Transformation by putting on skin, clothing/Veguherîn, bi rengê post an jî lîbas guhartinê: Her sê perî, postê kevokan li Zînê dikin û wê vedigerînin kevokekê; varyant I, IX, X, XI.
- D670:** Magic flight/Firîna Sêhrî: Zînê bi fireke derasa an jî sêhrî diçe koşka Mem a li Muxurzemînê; varyant IV, VIII, IX, X, XI, R. Lescot.
- D1960:** Magic sleep/Xewa sêhrî: Hem Mem hem jî Zîn di xew de ne û yekcar dibînin ku li nava cihê hev in; Varyant I, II, IV, VI, VII, VIII, IX, X, XI û varyanta Lescot.
- D2120:** Magic transpotation/Veguhezina sêhrî: Zînê bi renekî sêhrî ji bajarê Cizîrê neqlî bajarê Muxurzemînê tê kirin; varyant I, II, IV, VI, VII, VIII, IX, X, XI, R. Lescot. Mem û Bengîn bi renekî derasa, ji bajarê Muxurzemînê, tevî hespên xwe ji aliyê Xizir ve neqlî bajarê Cizîrê tên kirin; varyant VI. Perî ‘îsmê êzîm’ an jî ‘îsmê periyan’ dixwînin û Zînê ji Cizîrê neqlî Muxurzemînê dikin. Varyant I, IV, R. Lescot.

Di hemî varyantên Memê Alana folklorî de, em dibînin ku perî bi renekî derasa an jî bi sêrbaziyê, di şevê de Zînê dibin koşka Memê Alan. Her çendî ku di tu varyantê de ji vê bûyerê wekî sêhr behs nehatibe kirin jî, ev cureyeke sêhrê ye. Hem awayê pêkhatina bûyeran û hem jî derasabûna bûyeran û wekî lehengên sereke mudaxilbûna periyan a li prosesa destanê, nîşanê me dide ku ev cureyeke sêhrbazî ye. Di varyantên I, IV û R. Lescot de, em dibînin dema ku perî vê bûyera sêhrî pêk tînin, bo ku Zînê daxilî nava vê prosesa sêhrî bikin, ‘îsmê ‘ezîm’, ‘îsmê xweda’ an jî li gorî varyanta Lescot, ‘îsmê periyan’ dixwînin. Li vê derê ev têgih, wekî teknîkên taybet yê sêhrê derdikevin pêş me. Her wiha, li dû hin rîwayet an jî baweriyan, ‘navêkî xweda’, ji bilî 99 navên ku tê zanîn heye ku, her kî yê ku wî navî bizane, di heman demê de dibe xwediyê şiyana biserxistina gelek karên derasa. Li dû rîwayetê de jî, ev navê xweda

yanî 'îsmê azam' ku tu kes pê nizane, li ser Gustîlika Suleyman nivîsandî bûye -ku vê gustîlikê ji aliyê Hz. Adem ve ji bihiştê hatiye anîn- û Hz. Suleyman bi vê gustîlikê karîbûye her karê derasa bi ser bixe. Li vê derê, di van her sê varyantên ku me li jorê dayî de, xwendina 'îsmê xweda' an jî 'îsmê periyân' û bi rêya vê yekê vî karê derasa pêkanîn, pir muhtemel e ku bingeha xwe ji wê bawerî an jî rîwayetê digire.⁸¹

Di varyantên I, VIII û XIan de, em dibînin ku, perî 'moriya xewê' diavêjin guhê Mem û Zînê da ku wan bi rengekî sêhrî bixin xewê an jî 'wexmê miriyan'. Divê ev taybetî jî wekî rêbazeke sêhrî bê dîtin.

Ji ber ku di Destana Memê Alan de, motîfa periyân ji alî prosesa destanê ve gelekî girîng e, em ê yek bi yek di varyantan de lê binihêrin ku ev epîzot çawa pêk hatiye.

Varyant I. Sê kevok, bêyî ku behs ji perîbûna wan bê kirin, li ser dîtina xweşikiya Zîn û Mem biryar didin ku wan bînin cem hev. Ev her sê kevok ji Xweda daxwaz dikin ku Zînê jî wekî wan bike kevok da ku ew wê bi xwe re bibin koşka Memê Ala. Zînê di postê kevokekê de dibin, dixin nav cihê Memê Ala.

Varyant II. Li ezmanan du milyaket, li ser xweşikbûna Mem û Zînê şert digirin. Dure biryar didin ku wan bînin cem hev. Zînê li ser textê wê heldigrin dibin koşka Mem, li kêleka Memê Alan datînin.

Varyant IV. Sê perî, di postê sê qumriyan de pesnê xweşikiya Mem û Zînê didin. Navên wan; Qemer Taî, Şîrwan û Mahî Bêirûz in. Ev her sê perî biryar didin ku, wan bînin cem hev. Her sê perî, Zînê ji koşka wê digirin û li ser baskên xwe dibin koşka Mem û dixin nav cihên wî.

Varyant VI. Sê periyên li ezman li ser xweşiktirbûna Mem an jî Zînê nagihîjin biryarekê. Ji bo vê ew diçin cem Xidir û Elyas. Dûre Xidir û Elyas biryar didin ku Mem û Zînê bînin cem hev û li ser vê yekê Zînê ji koşka wê digirin, tînin dixin nava cihê Memê Alan.

Varyant VII. Du perî li ezman, li ser xweşikiya Mem û Zînê şert digirin. Ev her du perî biryar didin ku Zînê bînin koşka Memê Alan. Lê li vê derê Mem û Zîn cih guhartine; Mem kurê Mîrê Cizîra Botan e û Zîn xuşka Mîrê Muxrezemînê ye.

⁸¹ Kadîr Yıldırım, Mem û Zîn-Çeviri ve Kavramsal Tahlili, Weş. Avesta, İstanbul, 2010, r. 179

Varyant VIII. Sê horî, di postê sê kevokan de bi emrê Xwedawend, Zînê datînin ser baskên xwe û tînin nav cihê Memê Alan.

Varyant IX. Sê perî, di postê sê kevokan de, xweşikiya Mem û Zînê dibînin û biryar didin ku wan bînin cem hev. Ji Xweda daxwaz dikin ku Zînê jî wekî wan bibe kevok da ku bi wan re bifire. Li ser daxwaza wan ji ezmana postê kevokê tê xwarê û li Zînê dikin û Zînê dibe kevok û tevî her sê kevokên dî difire diçe koşka Memê Alan.

Varyant X. Sê horî, di postê sê kevokan de, biryar didin ku Mem û Zînê bînin cem hev. Ji Xweda daxwaz dikin ku Zînê jî wekî wan bibe kevok û bi wan re bifire. Li ser daxwaza wan ji ezmana postê kevokê tê xwarê û post li Zînê dikin û Zînê dibe kevok û tevî her sê kevokên dî difire diçe koşka Memê Alan.

Varyant XI. Sê perî, di postê sê kevokan de, biryar didin ku Mem û Zînê bînin cem hev. Ji Xweda daxwaz dikin ku Zînê jî wekî wan bibe kevok û bi wan re bifire. Li ser daxwaza wan ji ezmana postê kevokê tê xwarê û her sê kevok ‘morîa xewê’ diavêjin guhê Zînê, post lê dikin û bi hev re difirin û diçin koşka Memê Alan.

Varyant. R. Lescot. Sê periyên ku qîzên Padîşahê Periyên in, di postê sê kewan de ne û navê wan Tavbanû, Heyvbanû û Stêrbanû ne, biryar didin ku Zînê bibin koşka Memê Alan. Ew tevî çira û meşaleyan tînin ber textê Zînê. Bi ser de ‘îsmê periyên’ dixwînin û pif dikin û wê dikin ‘wexmê miriyên’. Cin û Perî, wê tevî textê wê didin ser milên xwe û dibin koşka Memê Alan.

Her çendî ku di varyantên destana folklorî de wekî cadû/xûlan nehatibe binavkirin jî, qîza Beko ya ku remilvan e, di rola cadû/xûlan de derdikeve pêş me. Lewma ew hem sêrbaz e û hem jî naxwaze ku Mem û Zîn bigihên hev. Dema ku digihên hev jî dixwaze ku navbera wan xera bike, heta li gorî varyanta Lescot, di mirina Mem de, bi rêya dayina jehriyê di nava hinarê de, rola wê sereke ye. Dîsa di varyantên dî de jî, ew bi rêya remlê dibîne ku jin (an jî Zînê) herin Mem ji zindanê derbixin, wê Mem bimire. Lewma ew di Destana Memê Alan de, bi her awayî cadûya/xûlana folklorî ye.

Di hin varyantên Siyabend û Xecê de, çawa ku di çîrokên kurdan de pir dertê pêş me, em rastî motîfa cinan tîn. Siyabend bi heyinek re şer dike (li gorî hin varyantan Siwarê Felekê) û piştî ku wê têk dibe, jê hîn dibe ku, ew qîza Mîrê Cinan e.⁸²

Her wiha li ser cinan gelek mesele, efsane û çîrok di nava civaka kurdan de hene. Bi taybetî kesên ku ji aliyê aqil ve ne li rê ne, yanî bi vegotina civakê “dîn” in, wekî kesine ku bi cinan re têkiliyeke wan heye, hatine dîtin. Lewre pir “dîn” hene ku, îdîa dikin ku ew bi cinan re zewicandî ne. Carina tê dîtin ku, hin kes di nava civakê de dev ji hevsera xwe berdane û goya ku bi cinakê re zewicîne. Bi kurtî wekî mexlûqatekî baweriya ji cinan, di nava civakê de berbelav e û her wiha di zargotina civakê de wekî motîfeke derasayiyê, motîfa cinan gelekî tê dîtin.

2.2.2. Di Mem û Zînê de Motîfên Derasayî û Sêhrî (Perî, Cin û Cadû)

Xanî di *Mem û Zînê* de, ev her sê motîf, carina bi temsîla wan a folklorî carina wekî teşbîhek di çarçoveya hunerên wêjeya klasîk de û carina jî hebûna wan wekî heqîqetêke dînî, perçeyeke rastiya xwedayî, bi kar anîne. Di *Mem û Zînê* de motîfa cadû/xûlan di çend cihan de bi wateya xwe ya folklorî dertê pêş me. Xanî di beşa 17an de, dayîna Sitî û Zînê, Heyzebûnê bi taybetmendiya xwe ya hîlekariyê şibandiye cadûyan. Her wiha motîfê cadû û remlê jî bi hev re bi kar anîne. Ev yek nîşanî têkiliya sêhr û cadûyan jî dike.

17/26 Wê şehleê hîlekar û cadû

Go: “Bîne ji bo me ra xateman zû

Da îşeve remlekê birêjim

Heta sibe sahiban bibêjim

Di beşa 18an de em dibînin ku Xanî, cadû angû xûlan, wekî heyinên ku mirov ji rê derdixin û dîn dikin nîşan dane.

18/5 Rabûne ve her du çûne geştê

Xûlan xelitandibûn li deştê

⁸² Bnr., Celîlê Celîl, Zargotina Kurdan, r. 104

Îro he dema ku bûne peyda
Dîn in, teles in, cunûn û şeyda

Di beşa 50yî de Xanî, motîfa xûlan di wateya xapandin, bi xwe ve dînkirin, an jî bi xwe ve girêdanê de, bi kar aniye.

50/19 Toqa te li gerdenê wî danî
Dava te veda li qelb û canî

Çawa vekirin te her du ahû
Berdane feqîrî her du cadû

Dîsan tu here digel xeber de
Qeydan tu veke ji bo xwe berde

Xanî di *Mem û Zînê* de, di gelek cihan de motîfa periyê bi kar aniye. Di hin cihan de ew wekî sembola xweşikiyê ne lê di hin cihan de jî ew wekî heyinên temsîla başiyê hatine dîtin. Çend mînak bi vî rengî ne:

8/31 Yek esmer û ya duwî zerî bû
Yek hûrî û ya duwî perî bû

8/32 Ew hûr û perî di bêbedel bûn
Lewra ku ji nûra “Lem Yezel” bûn

16/29 Herçî we hebandî ey perîzad
Husan we diket ji bo we munqad

43/42 Herçî periya te dil li bal e
Horîsîfet e, melekîmîsal e

Di van beytên jêrîn de Xanî, motîfa periyên bêtir di wateya heyinên ku temsîla başiyê dikin de, bi kar aniye.

16/42 Tehqîq ku melek û yan perî bûn
Lewra ku ji av û gil berî bûn

18/15 Eshabê nigîn bêje kî ne?
Cinnî ne, Perî ne, Ademî ne?

23/36 Ye'nî ku 'emareta Sitî tê
Qesra periya bi rastî tê

34/20 Ew dîl periyan ji min reva ye
Ev pêleke ew ji min cuda ye

24/38 Ger qismê muhibb û ger hebîb in
Elbette bi dijmin û reqîb in

Hin dêw û hinek ji wan perî ne
Hindek di munafîqê Ademî ne

Bi taybetî ji vê beyta dawîn jî, em tesewira Xanî ya der bareyê periyan de fêhm dikin. Wî, dêw û perî, wekî du hêzên dijberên hev ku yek xerabiyê û ya dî jî başiyê temsîl dike, bi kar anîne. Ev form; ev reng bikaranîna dêw û periyan, di zargotina civaka kurd de gelekî berbelav e.

Xanî motîfa cinan, di çarçoveya fikirîna dînî de, wekî beşeke ji mexlûqatên cîhanê ku xweda ew afirandine, bi kar aniye. Bi taybetî têgihên îns û can/cin bi hev re bi kar anîne.

2/4 Ey xaliqê erd û asîmanan
Wey Faliqê cumle îns û canan

3/48 Elqisse di erd û asîmanan
Hasil di cemî'ê îns û canan

18/15 Eshabê nigîn bêje kî ne?
Cinnî ne, Perî ne, Ademî ne?

31/14 Fikra xwe dikir ji îns û canan
Sirra xwe digote bêzebanan

54/8 Lewra ku Xwedanê îns û canan
Wî xaliqê erd û asîmanan

Di *Mem û Zîna* Xanî de, di beşa 8an de bi sêhrê re têkildar, behsa **Efsaneyaya Harût û Marût** tê kirin. Ev efsane an jî rîwayeta ku di gelek kitêbên pîroz de derbas dibe, di heman demê de perçeyeke efsaneyên miletan e jî. Ev efsane di nava sumerî û akadiyan de her wiha di nava çanda îranî de jî hatiye dîtin. Bi rengê xwe yê herî fireh di Avestayê de derbas dibe.⁸³

Li gorî forma Avestayê, navê wan Haûrvatat (Hordad) û Ameratat e (Mordad). Li gorî Avestayê, Hordad melekê Ahûramazda ye ku parêzvanê avê ye û Mordad jî parêzvanê hêşinahiyê ye. Hordad temsîla mukemeli û tendurustiya Ahûramazda û Mordad jî temsîla nemirî û bêdawîtiya Ahûramazda dike.⁸⁴ Ev her du melek, bi ser rûyê cîhanê ve hatine şandin da ku ji qewman re behsa xerabiya sêr û sêrbaziyê bikin lê ew bi xwe dikevin nav vî karê ku Ahûramazda qedexe kiriye. Lewma hatine cezakirin û bi ser serî di bîra Babîlê de hatine daleqandin. Bi kurtî navê Harût û Marût, di wêjeyê de bi sêr û sêrbaziyê re peywendîdar tê bikaranîn. Ji bo xweşikiyê wekî sêhrê, Harûtî tê gotin.⁸⁵ Xanî jî di nava vê peywendiyê de ev motîf bi kar anîye. Dema ku behsa xweşikiya Stî û Zînê dike, vê têgihê bi kar tîne û têkiliya Harût û sêrbaziyê bi bîr tîne.

8/38 Husna xettê rux ji xettê yaqût
Çaha zeqenê ji sîhrê Harût

Goya kiribû ji mişkê bîzî
Remmalê felek nuqati rîzî

⁸³ Kitêba pîroz ya dînê Zerdüştiyê.

⁸⁴ Nimet Yıldırım, *İran Mitolojisi*, Weş. Pinhan, İstanbul, 2012, r. 490

⁸⁵ K. Yıldırım, *Mem û Zîn, Çeviri ve Kavramsal Tahlili*, Weşanên Avesta, r. 175

2.3. MOTÎFA EVÎNÊ

Motîfa evînê di tesnîfa Stith Thompson de motîfeke sereke ye. Di Motif Indexa Stith Thomson de, di binê sernava **Cinsiyetê** de, li binê herfa **T**'yê hatiye qeydkirin.

Di xebata Zeynelabidin Zinar de, evîn wekî xaleke hevbeş ya çîroka kurdî nehatiye nîşandan. Lê bi motîfa cinsiyetê ve girêdayî, di hejmarên **37** û **38**an de behsa **Zewac** û **Şertên Zewicandinê** hatiye kirin.

Di beşa destpêkê de, di mijara li ser çîrokan de jî me destnîşan kiribû ku, di çîrokan de evîn ne mijareke bingehîn e. Jixwe yek ji cudahiya ku di navbera çîrok û çîroka gelêrî û destanê de jî ew bû ku, di çîrokan de em pir bi berbelavî rastî motîfa evînê nayên. Eger ku derê pêş me jî ew bi piranî evîneke hêsan e û mijara çîrokê li derdora meseleya evînê nayê honandin. Lê di çîrokên gelêrî û destanan de evîn mijara bingehîn e. Bi piranî honaka destan an jî çîroka gelêrî li derdora evînê teşekil dike.⁸⁶

Li cîhanê destanên herî mezin û bi bandor bi piranî li dora mijara evînê pêk hatine. Di destanên Leyla û Mecnûn, Ferhad û Şîrîn, Romeo û Juliet û Memê Alan de em dibînin ku motîfa evînê motîfa herî diyarker e.

Di çîrokên gelêrî û destananê kurdan de jî evîn, tevî lehengiyê mijara bingehîn e. Di Memê Alan, Siyabend û Xecê (Siyabendê Silîvî), Binefş û Cembelî, Derwêşê Evdî û Edûlê û Zembilfiroş de evîn mijara sereke ye. Bêguman her yek ji van destan û çîrokên gelêrî xwedî taybetmendiyeke orjînal in. Wekî mînak di destana Zembilfiroş de evîn mijara bingehîn e lê ev evîneke yek alî ye. Di destanên Siyabendê Silîvî û Derwêşê Evdî de lehengî jî di radeya evînê de mijareke bingehîn e. Di Destana Memê Alan de evîn bi trajediyê bi encam dibe lê di Binefşa Narîn û Cembelî de her du leheng dizewicin û bi dilgeşî dijîn.

Lêkolîner Zeynelabidîn Zinar der bareyê zewicîna lehengên çîroka kurdî de wiha nivîsiye:

“Zewaca di çîroka kurdî de, hin caran toreya kurdî serobin dike û dijberiya xwe pê re didomîne. Ji ber ku di çîrokan de kêman caran dê û bavên xortan diçin keçan ji kurê xwe re dixwazin, piranî xort bi tena serê xwe diçin cem bavên keçan û keçên wan ji xwe re dixwazin. Yan jî keç diçin xortan ji xwe re dibînin û pêşniyariya zewaca xwe bi wan re dikin.”

Di çîrokên gelêrî û destanan de, hin formên cuda yên evîndarbûnê bi vî rengî ne:

⁸⁶ Bnr., r. 13, 17,

1. Di dîtina ewil de evîn. (Mem û Zîn, Siyabend û Xecê, Zembîlfiroş, Yûsuf û Zuleyxa, Ferhad û Şîrîn)
2. Bi rêya dîtina resmên hev û du evîn. (Wamiq û Ezra)
3. Di xewnan de hev û du dîtîn û evîndarê hev bûn. (Memê Alan)
4. Xweşikî û çelengiya hev bihîstin û evîndarbûn. (Perwîz û Şîrîn)
5. Ji zarokî de bi hev re mezinbûn û evîndarê hev bûyin. (Leyla û Mecnûn, Mîhr û Muşterî, Tahir û Zuhre)⁸⁷

2.3.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Evînê

Di Destana Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî de, li gorî kataloga Stith Thompson, xalên ku me bi motîfa evînê re têkildar tesbît kirine bi vî rengî ne:

T0-T99: Love/Evîn

T10: Falling in love/Evîndarbûn: Li gorî hemî varyantên Memê Alan, Varyant I, II, IV, V, VI, VII, VIII, IX, X, XI û R. Lescot, Mem û Zîn an bi rengekî sêhrî an jî di cureyeke xewn de hev dibînin û evîndarê hev dibin. Li gorî *Mem û Zîna* Xanî Mem û Zîn bi rengekî libasguhertî çawa ku hev dibînin, di dîtina ewilîn de evîndarê hev dibin.

T30: Lovers meeting/Hevdîtina evîndaran: Ji bilî varyanta Van di hemî varyantên Memê Alan de, perî an jî melayiket Zînê ji koşka wê dibin koşka Mem. Ew bi vî rengî hev dibînin û evîndarê hev dibin. Li gorî *Mem û Zîna* Xanî ew di rojê Cejna Newrozê de, di nava atmosfera kêf û şahiyê de, li hev rast tên û evîndarê hev dibin.

T80: Tragic love/Evîna trajîk: Hem di hemî varyantên Memê Alan de hem jî di *Mem û Zîna* Xanî de evîn, bi mirina her du aliyan diqede. Lewma evîneke trajîk e.

T11.3.1: Meet in their dreams/Di xewnên hev de lihevraştatin: Mem û Zîn her du jî di xewnê de ne û yekcar dibînin ku li cem hev in. Hevdîtina wan di cureyeke xewnê de pêk tê lê yên ku vê yekê bi rengekî sêhrî pêk tînin, perî ne; hemî varyantên Memê Alan. Di varyanta Van de bêyî ku behs ji periyên bê kirin, tê gotin ku wan hev di xewnê de dîtine.

⁸⁷ A. Basit Sezer, *Murathan Mungan ve Halkbilimi*, Weş. Maya, Ankara, 2010, r. 100

Di navebera varyantên folklorî ên Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî de, ji aliyê rengê evîndarbûnê ve cudahî heye. Di hemî varyantên Memê Alan de, lihevraştatin an jî evîndarbûna Mem û Zînê, bi rengekî derasa pêk tê. Sê ferîşteyên ku wekî sê kevokan xuya dikin, li ezmana biryar didin ku Mem û Zîna ku tu kes li ser rûyê cîhanê wekî wan xweşik nîn e, bînin cem hev û bi hev bidin naskirin. Ev motîf, di heman demê de motîfeke mîtolojîk e. Ji ber ku, di mîtolojiya sumerî û yewnaniyan de jî em lê rast tên ku xwedayên li ezmana, carina rasterast mudaxele li jiyana rojane ya mirovan dikin û li ser qedera wan biryaran didin. Her wekî ku di çîroka Gilgamêş û Enkîdû de jî derdikeve pêş me.

Ji aliyekî dî ve, ji ber ku ev motîf, motîfeke pir kevnar e û hem jî ji ber ku bêşik di hemî varyantên folklorî de derbas dibe; pir muhtemel e ku di varyantên herî kevnar yên Memê Alan de ev taybetmendî hebûye û ev yek nîşaneyeke bo kevniariya destanê ye.

Ji aliyê termînolojiya zargotinê ve, em dikarin hevdîtina bi vî rengî, li motîfa xewnê jî şîrove bikin. Jixwe di varyanta pêncan (V) de bêyî ku behsa periyên an jî kevokan bê kirin, tê gotin ku Mem, Zînê di xewna xwe de dibîne. Lewra dema ku Mem bi şevê di nava cihê xwe de ye, dibîne ku Zîn li cem wî ye. Lê dema ku radizên û şevqê Mem şiyar dibe, Zîn nîn e. Jixwe ew bi xwe vê yekê wekî xewnekê dihesibîne.

2.3.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Evînê

Di *Mem û Zîna* Xanî de, dirûvê hevdîtina Mem û Zînê, ne wekî destana folklorî ye. Heye ku Xanî evîndarbûneke bi vî rengî li derveyê baweriya xwe ya dînî û merheleya ku civak gihîştîyê dîtiye û lewma ew guhartiye. Di *Mem û Zîna* Xanî de, her du evîndar jî ji bajarê Cizîrê ne. Her du leheng, di nava atmosfera şahiyên Newrozê de li hev rast tên. Lê her du alî jî libasguhertî ne. Yanê Mem bi cilên keçikan derketiye derve û Zîn jî bi cilên kuran. Lê ew di kêliya ku hev dibînin de evîndarê hev dibin.

Xanî vê hevdîtina Mem û Zînê wiha teswîr kiriye:

14/23 Her du di wî karî bûn ku nagah

Dîtin ku ji mehdê qudretullah

Ew her du puser wekî du peyker

Tabende bi şeklê şahê exter

Yekhey'et û şikl û yeklîbas in
Emma di wî şehî rengnenas in

Sîretmelek in sûretperî ne
Ne baî'in ew ne muşterî ne

Wan her du biran ku ew du ewbaş
Dîtin dil û can weh dan bi şabaş

Ewreng geriyan cunûn û waleh
Êdî venebûn ji 'eqlî ageh

14/49 Ye'nî ewna kurê di xwûnxwar
Gava wehe dîtin ew birîndar

Ew her du bi sed dilan hebandin
Rûniştin û her du wergerandin

14/56 'Îşqê kiribû wisa nehişyar
Qet'a nedibûn ji xwe xeberdar

14/59 Enguşteriyê di wan cuwanan
Kêşan ji esabi'ê di xwudanan

Xatem ji enamilêd xwe kêşan
Danîne cihan ji boy nîşan

14/66 Reh şubhetê murxê nîmbismil
Bêquwwet û bêtewan û bêdil

Sersam û duwar û ser' û mehrûr
Sewda û fuad û xebl û mexmûr

Wekî ku em di van beytên jorîn de jî dibînin, bandora dîtina pêşîn li ser her du aliyan jî wilo mezin e ku, her du alî jî di wê kêliyê de dil berdidin hev, evîndarê hev dibin. Her wiha di van beytên jorîn de em dibînin ku, her çendî ku Xanî dirûvê hevdîtina lehengan guhartiye jî, hin tişt bi heman rengî mane. Wekî motîfa gustîlkê. Di varyantên folklorî de jî dema ku Zînê bi şevê hatiye cem Mem, wan gustîlik bi hev guhartiye. Wextê ku Mem şeveqê ser û çavê xwe dişo, gustîlika Zînê ya di tiliya xwe de ferq dike û bawer dike ku ew ne bi tenê xewn bûye.



2.4. MOTÎFA ASTENGÊR

Motîfa astengêr, di Motifa Indexa Stith Thompson de di beşên **Hîle** û **Cinsiyetê** de hatiye tesbîtkirin. Ev beş, di heman xebatê de, di bin herfên **K** û **T** de hatine qeydkirin.

Di xebata Zeynelabidîn Zinar de, wekî hevbeşiyeye çîroka kurdî, behsa vê xalê nehatiye kirin.

Di çîrokên gelêrî, destan û çîrokên ku mijara wan evîn e de, her tim di navbera evîndaran de, astengiyek peyda dibe ku li pêş gihaştina wan dibe asteng û xaçerêya pêşîn a drama destan an jî çîrokê hazir dike. Bi rastî ev motîf, motîfeke wilo jênager û bi hêz e ku dînamîka herî sereke, hêza dafdêr a destan û çîrokan e. Eger ev motîf nîn be, çîrok yan wekî çîrokeke ji rêzê û hêsan dimîne û yan jî jixwe ji wê bûyerê çîrok an jî destan dernayê. Lewre, bi taybetî di destan û çîrokên gelêrî de, dram an jî trajedî temaya sereke ye û bêtî vê temayê ne mumkun e ku destan bi xwe pêk were.

Bergeha motîfa astengêr gelekî fireh e. Ji ber ku di xwezaya xwe de, bi reng û peywirên pir cuda derdikeve pêş me, qada ku ew di nava çîrokan de dagir dike jî gelekî fireh e. Yanî ev astengî dibe ku cin û periyek be, dibe ku pîrebok û cadûyek be, dibe ku mirovek nebaş be, dibe ku dê û bav an jî xizmên cuda yên keçik û lawikî bin, dibe ku erkarek, rêveberek bi hêz be, dibe ku çiya, çem an jî deryayekê be, dibe ku heywanek, hûtek, dêwek, ejderhayek an jî hêmaneke dî ya xwezayî be jî, dibe ku baweriyek, dînek, an jî qaîdeyeye civakî be jî. Vêca dema ku em bala xwe bidin çîrok û destanan, ev motîf di kîjan radeyê de mezin be, teqez be, hingê trajediya çîrok an jî destanê jî di wê radeyê de mezintir dibe, kûrtir dibe.⁸⁸

Di vê kêliyê de pêkhatina motîfa astengêr, di prosesa destan an jî çîrokê de, wiha tezahur dike: Leheng yan li dû armanek, îdealek an jî bi armanca gihaştin an jî dîtina hezkirya xwe dikeve rê, lê hê di destpêkê de bi astengiyê re rû bi rû dimîne.⁸⁹ Leheng, van astengên ku bi piranî jêdera wan xweza û civak e, ji pêş xwe radeke û di evîna xwe de bêtir dikemile. Leheng di rêya gihaştina hezkirî an jî îdeala xwe de, rastî curbecur zehmetiyên tê ku, dibe ku ev zehmetî ji tebîeta mirovbûnê jî bîn. Leheng hemî astengiyan li dû xwe dihêle û digihîje hezkirî an jî îdela xwe. Leheng hezkiriyaya xwe dibîne lê vîcarê hin kes (wekî Beko) an jî tişt an jî bawerî di navbera her duyan de dibin asteng û nahêlin ku ew bigihên hev. Leheng carina van astengiyan derbas dike û

⁸⁸ Ş. Elçin, Halk Edebiyatına Giriş, r.

⁸⁹ Çîroka navdar ya bi navê Sîmurg ku di pirtûka Feriddun Attar de derbas dibe, mîna keke balkêş ya motîfa astengêriyê ye.

carina nikare derbas bike û dimire. Her du leheng dimirin lê giyayekî an jî dirihekî di navbera wan de dertê û di halê mirîbûnê de jî nahêle ew bigihên hev.

Hem di çîrokên hemî cîhanê de û hem jî di çîrok û efsaneyên civaka kurd de em pir bi berbelavî rastî motîfa dêw tîn. Her çendî ku li gorî tesnîfa Stith Thompson dêw bi serê xwe motîf e jî, tîkiliya wê bi motîfa astengêriyê re jî heye. Ji ber ku ew di çîrokan de pirî caran di rola astengêriyê de derdikevin pêş me. Di çîrokên Mîrze Miheme de jî em dibînin ku dêw, keçika xweşik an jî banûya welat direvînin û Mîrze Miheme bi wan re şer dike. Dîsa carina di hin çîrokan de em lê rast tîn ku, îdeal an jî armanca ku leheng dixwaze bigihîjê, yan di binê esareta dêwan de ye yan jî leheng ji bo ku bigihê wê armancê divê dêwan tîk bibe. Bi giranî rola dêwan di temsîla hêza xerab de wicûd dibîne.

Balkêşiyêke dî ya vê motîfê jî ev e ku, Xanî jî di *Mem û Zînê* de dema ku behsa Bêko kiriye, di gelek deran de ew şibandiye *şeytan* an jî ji bo wî *dêw* gotiye. Tîkiliya di navbera vê motîfê û *şeytan* de, tîkiliyêke balkêş e. Di tesewira dînî de wekî ku tê zanîn; *Şeytan* li hember *Xweda* îdîa kiriye ku wê mirovan ji rêya *Xweda* dûr bixe û li dû xwe bibe. Yanî wateya hewla *Şeytan* ew e ku, ew di navbera *Mîrov* û *Xweda* de, wekî astengekê, wekî bendekê diqewime. Û carina bi hîleyan, carina bi xapandinan, carina bi hin rêyên dî li dû tebîtetê xwe, mirovan ji *Xweda* dûr dixê. Bi rastî li vê derê motîfa astengêr, gelekî nêzî rola ku *şeytan* dilîze, bûye. Vêca ev *dêw*, di baweriya zerduştî de wekî *daîva*; di wateya *şeytan* de hatine binavkirin. Yanî li vê derê, wekî ku Xanî jî wilo teşbîh pê dike, di navbera *şeytan/dêw* û motîfa astengêr de nêziyêke berbiçav derdikeve pêş.⁹⁰

Hem di Memê Alana folklorî û hem jî di *Mem û Zîna* Xanî de, bi motîfa astengêriyê re tîkildar, dirik (dirika kinêrê an jî *dara 'uncuz*) dertê pêş me ku ev xusûsiyet gelekî balkêş e. Piştî ku Mem û Zîn li kêleka hev tîn definkirin, dilopeke xwîna Bêko li navbera wan dinuqite. Ji ser cihê ku Zînê lê ye, giyayekî hêşîn dibe û ji ser cihê ku Mem tê de ye giyayekî dî hêşîn dibe û ev her du giya ber bi hev de tîn da ku li hev bilefin. Lê ji cihê ku xwîna Bêko nuqtiyê, giyayekî mîna diriha kinêrê hêşîn dibe û xwe li her du giyayên dî dilefîne, dikeve navbera wan, nahêle ew bigihên hev. Li vê derê rola motîfa astengêr, piştî ku leheng dimirin jî didome. Di destanên Arzû û Kamber û Tahir û Zuhre de jî em rastî motîfa dirikê tîn.

⁹⁰ Nurettin Albayrak, *Ansiklopedik Halk Edebiyatı Sözlüğü*, Weş. Kapı, İstanbul, 2010, r. 136

2.4.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Astengêr

Li gorî kataloga Stith Thompson, di Memê Alana folklorî û *Mem û Zîna Xanî* de, motîfa astengêrî û pêve girêdayî motîfa dara kinêrê di van hejmarên jêrîn de hatine tesbîtkirin.

K2200-K2299: Villains and Traitors/Mirovê xerab û xayin: Di hemî varyantên Memê Alan û *Mem û Zîna Xanî* de, Beko wekî kesekî xayin û bi hemî kirinên xwe xerab, derdikeve pêş me.

K2100-K2199: False accusations/Sûcdarkirinên xelet: Bi kirinên neheq yê Bekoyê Ewan an jî Bekir re têkildar e ev beş. Beko, Mem tawanbar dike ku dilê wî heye bikeve dewsa Mîr; Varaynta R. Lescot û *Mem û Zîna Xanî*.

D213.5: Transformation man to thorns/Veguherîna mirov a dirike: Yek bi yek ne ev motîf be jî, di hemî varyantên Memê Alan de, dirîk ji xwîna Beko çêdibe an jî xwîna Beko vedigere dirîkê; varyant I, II, V, VI, VII, VIII, IX, X, R. Lescot.

D958, D976, D1393.1: Magic Thorn/Dirîka bi sêhr: Dirîka ku ji ser gora Beko an jî ji çilka xwîna Beko şîn dibe, nahêle ku Mem û Zîn bigihên hev; varyant I, II, V, VI, VII, VIII, IX, X (dirîka uncuz), R. Lescot, *Mem û Zîna Xanî*. (Hem nahêle ku gulên ku ji ser gorên wan bilind bûne bigihên hev hem jî dema ku ew dirîk şîn dibe Mem û Zîna ku di heman gorê de ne, ji hev cuda dibin û her yek diçe gora xwe; varyant II, R. Lescot)

Di destana folklorî a Memê Alan de, motîfa astengêr motîfa herî bi hêz e ku, di hemî rewşan de dertê pêş me. Yanî di şertê têkiliyên malbatî (bav û dêya Mem an jî di destpêkê de dergistîbûna Zînê û Çeko jî astengiyekê teşkîl dike ji bo Mem), di şertên zehmetiyên xwezayî (pir dûrbûna Cizîrê ji Muxrezemîn û zehmetiyên rêwîtiya wî), di şertên tesîra kesan de (wekî Beko) û dûre di şertên efsaneyî de (wekî derketina dirihêkî di navbera Mem û Zînê de) dertê pêş me.

Di hemî varyantên folklorî ên Memê Alan de, motîfa astengêr Beko, bi heman rengî dertê pêş me. Lê ji bilî Beko, di gelek varyantên Memê Alan de, (Varyant; I, II, IV, VII, VIII. Di varyanta VIan de navê wê Melek Rihan e) qîzeke Beko, bi navê Zînê heye ku di heman demê de remilvan e. Dema ku Mem tê bajarê Cizîrê, qîza Beko, pêşî

dixwaze wî bixapîne û dema ku bi ser nakeve, li gorî hin varyatan naxwaze ku ew bigihê bajarê Cizîrê û rêya şaş nîşanê wî dide, li gorî hin varyantên dî, di heqê bajarê Cizîrê û xelkê Cizîrê de agahiyên girîng dide Mem. Dûre Beko ji ber ku Mem qîza wî tercîh nekiriye, bi hemî hêza xwe dixwaze li pêş gihaştina wî û Zînê bibe asteng. Heta li gorî varyanta dehan (X) a Memê Alan, Beko dizane an jî bi rêya remlê ji qîza xwe hîn bûye ku, jin herin Mem ji zindanê derbixin wê Mem bimire. Li gorî varyanta Roger Lescot, dema ku Zînê diçe zindanê da ku Mem xelas bike, qîza Beko ya bi heman navî, hinareke bi jehrî hazir dike û dide Zînê da ku bide Mem. Mem wê hinarê dixwe û dimire.

Di destanên mezin yên cîhanê de jî, wekî Leyla û Mecnûn, Ferhad û Şîrîn, Tahir û Zuhre, Cembelî û Binevş, Siyabend û Xecê de em li vê motîfê rast tên. Di Destana Leyla û Mecnûn de, diya Leyla motîfa astengêriyê teşkîl dike. Çunkî dema ku ew fêr dibe ku meyla Leyla û Mecnûn ber bi hev ve heye, ew, Leylayê ji dibistanê digire û nahêle ku Mecnûn wê bibîne; li pêşiya hevdîtina evîndaran dibe asteng. Di Destana Ferhad û Şîrîn de, Çiyayê Bêstûn, motîfeke astengêr e. Ferhad ji bo ku bikaribe bigihê Şîrîn, mecbûr e ku wî çiyayî kun bike û avê tê de derbas bike. Di çîroka Tahar û Zuhre de, Erebê Reş û Dêya Zalim motîfa astengêriyê teşkîl dikin. Di Destana Cembelî û Binevş de, Faris Axa motîfa astengêr e. Ew bi zorê Binevşê ji xwe re digire û nahêle ku Cembelî û Binevşê bigihên hev. Di Destana Siyabend û Xecê de, Pezkûvî motîfa astengêriyê teşkîl dikin. Çunkî li gorî hin varyantên vê destanê, piştî ku Siyabend û Xecê di kortalê de dimirin, du giya li cihê wan hêşîn dibin û bilind dibin digihên heya ber devê kortalê. Bawerî ew e ku, eger ew her du giya ji ser kortalê bibihurin wê Siyabend û Xecê ji nû vejin û bigihên hev. Lê her sal di biharê de pezkûvî tên û wan giyayên li ber devê kortalê dixwin û diçin. Û bi vî rengî nahêlin ku Siyabend û Xecê ji nû vejin û bigihên hev.

2.4.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Astengêr

Di Mem û Zînê de Beko, ji her alî ve motîfa astengêriyê teşkîl dike. Hê ji destpêkê ew, di heqê evîna Mem û Zînê de agahiyên şaş dide Mîr û her wiha bi rêya hîleyan, dike ku Mem li hember Mîr, bi rengê ne rewa evîna xwe ya li Zînê aşkera bike û ji aliyê Mîr ve bê hepiskirin. Ev hepsîbûn, dibe sedema mirina Mem û dûre mirina Zînê. Her wiha wekî ku me li jor jî got, li dû mirina wan jî, Beko wek dirihekî dertê û nahêle ku giyayên li ser gora wan şînbûyî bigihên hev. Lewma motîfa

astnengêriyê, yanî Beko, hem di varyantên Memê Alan de hem jî di *Mem û Zînê* de, motîfeke pir bi hêz e.

Di van beytên jêrîn de em dibînin ku Xanî, Beko bi çi awayî dide nasîn.

26/15 Elqisse bi îqtîdayê xîlqet
Mîrê bi kemal û ‘îzz û rif’et

Ragirt ji bo xwe dergevanek
Fettanê zemanê seyê pisanek

Daîm li derê wî qapûcî bû
Qella’ û qelaş û qawecî bû

Emma bi neseb ne merdê Bohtan
Belkî mutewellidê ji buhtan

Eslê wî dibên ji “Mergewer” bû
Mehda wî beşer bi şor û şer bû

Navê wî munafiqî Bekir bû
Belkî ji Belûqiya betir bû

Menna’ û muzebzebîn û îblîs
Xedda’ û xeberbezîn û telbîs

Şagirtê şeameta wî şeytan
Şermende ji gotina wî Bohtan

Bedçehre ji rengê dêwê kabûs
Bedfê’l û stîzekar û salûs

Ji vê danasînê em têdigihên ku Xanî, Beko ji xelkê Botanê nabîne. Digel ku di hemî varyantên Memê Alan de, Beko wekî yek ji xelkê Botanê, ji bajarê Cizîrê hatiye dîtin jî, (heta li gorî varyanta IVan Beko, tevî Qeretacdîn, Çeko û Hesên, pismamê Zînê

ye); balkêş e ku Xanî, wekî memleket jê re Mergeverê destnîşan kiriye. (Mergever, bajarekî li aliyê Kurdistana Rojhelat e ku hingê di binê hukmê Safewiyên de bû) Xanî ew şibandiye Belûqiyayê cihû ku, bi fesadiya xwe navdar e. Bêguman em pê nizanin ku di dewra Xanî de, di varyantên Memê Alan de, tiştekî bi vî rengî derbas dibû an na. Lê bi ihtîmaleke mezin, di varyantên folklorî de, tevî yên dewra Xanî jî, tiştekî bi vî rengî derbas nedibû. Ev bi tevahî tercîheke Xanî bû ku, wî dixwest hemî başiyan li xelkê Botanê mal bike û jêdera hemî xerabiyan jî wekî derveyê Botanê, derveyê welatê kurdan bibîne. Heman helwest di meseleya memleketê Mem de jî dertê pêş me. Digel ku di hemî varyantên folklorî de, Mem yan ji bajarê Muxurzemîn/Mixribiyan e yan jî ji Yemenê ye; di *Mem û Zîna* Xanî de, Mem ji bajarê Cizîra Botanê ye.

Roger Lescot der bareyê vê mijarê de gotiye ku, bi ihtîmal e ku Destana Memê Alan, pêşî ne li Cizîrê, lê li deverê dî ya welatê kurdan belav bûbe. Ji ber ku Mem, di encama fesadî û neheqiyên Cizîriyan de, bi taybet di encama kirinên Bekoyê Cizîrî de miriye û di hin varyantên Memê Alan de di heqê xelkê Botanê û Cizîrê de em li hin pênaseyên nexweş rast tên; mumkun nîn e ku, varyantên pêşîn yên vê destanê li Cizîrê derketibin û belav bûbin. Yanî, rast e ku destan li Cizîrê qewimiye lê li dereke dî gihastiye forma destanê; wekî destan derketiye meydanê. Nuqteyê balkêş jî ev e ku; li hin derên Kurdistanê hin şikeft an jî cihên taybet hene ku, navê wan *Şikefta Mem û Zînê* an jî *Warê Mem û Zînê* ne.⁹¹ Muhtemel e ku, erdnîgariyên dî yên Kurdistanê, xwestine bi vî rengî li Mem û Zîna ku ji aliyê Cizîriyan ve neheqî li wan hatiye kirin, xwedî derên, ew biparêzin. Bêguman ev yek tenê faraziye ye.⁹²

Lê xala bingeş ew e ku; di destana folklorî û *Mem û Zîna* Xanî de, teswîra Mem, Beko û xelkê Cizîrê ne wekî hev in. Her wiha divê em vê yekê qeyd bikin ku, Xanî, ev destan li gorî fikrên xwe yên neteweyî û civakî ji nû ve saz kiriye û di hin motîfan de hin guhertin pêk anîne.

Ji aliyê motîfa astengêriyê ve cudahiyeke dî ya di navbera destana folklorî û *Mem û Zîna* Xanî de ev e ku, di varyantên folklorî de motîfa astengêr yanî Beko hê di destpêka destanê de, tevli nava bûyeran dibe û rola xwe dilîze lê di *Mem û Zînê* de, encax piştî daweta Tacdîn, wekî hem dergevan hem jî şewirmendê Mîr derdikeve pêş me. Di varyantên folklorî de wekî sedem ji astengêriya wî re, tercîhnekirina Mem a qîza wî û di *Mem û Zîna* Xanî de, wekî sedema astengêriya wî, hem karakterê wî yê

⁹¹ Li Şikeftên Hesûnê (bajarê Farqînê), şikeftek bi navê Şikefta Mem û Zînê heye.

⁹² Roger Lescot, *Memê Alan*, Weşanên Avesta, r. 10

fesad û hem jî tirsî wî ya jî Tacdîn û Mem ku, ew her du bibin zavayê Mîr wê erk bikeve destê wan û wê Beko ji karê xwe bibe, tê nîşandan.

Bekoyê ku li ser nêzîkbûna Tacdîn û Mem a ber bi Mîr ve, ji pêşeroja xwe dikeve gumanê; dest pê dike ku di navbera wan û Mîr de nakokiyê derbixe. Xanî di van beytên jêrîn de, li ser vî karê wî yê fesadî û xayinî, wî bi peyva ‘*Ezazîl*, dişibîne şeytan.

26/45 Xef ji ademiyan wekî ‘Ezazîl
Mehda xereda wî kîzîb û teswîl

Tenha wehe gote Mîr di xef da:
Mîrim te Sitî qewî telef da

26/67 Mîrim, te nedî kurê Sikender
Daye te nezer ji heddî çû der?

Roja ku Sitî te daye Tacdîn
Wî ji alî xwe dayiye Memê Zîn

Di van beytan de Beko, hem ji bo navbera Mîr û Tacdîn û Mem xerab bike, hem jî ji bo ku li pêşiya zewaca mutemel a Mem û Zînê bibe asteng, dikeve nava tevgerê.

Di beşa 42yan de, Beko bi evîna di navbera Mem û Zînê de dihesê û xwe digihîne Mîr û her tiştî jê re dibêje. Di vê beşê de Xanî, cardî Beko şibandiye şeytan.

42/20 Heta Bekirê ji rengê îblîs
Sahibxeredê xebîsê telbîs

Ew jî ji wî halî bû xeberdar
Rabû ji cihê xwe ew xereddar

Tenha xwe gihande xelweta Mîr
Elqîsse kir ewqediyê teqrîr

Piştî ku Beko bi vî rengî Mîr li dijî Mem sor dike, vêcarê plan çêdike da ku Mem bê hebsîkirin û Mîr jî vê plana wî qebûl dike. Li vê derê motîfa astengêr, di dûrxistina ji hev a evîndaran de dertê pêş me.

42/26 Go: “Emir bike Memê bixwûnin
Hûn her du di xelwetê ku rûnin:

Mem aşiqê sadiq e bizan qenc
Vê ra bileyîze tu setrenc

Şertê xwe ji wî bixwaze dilxwaz
Dê keşif bibit heqîqera raz

Gava ku ewî dikî tu mexlûb:
Bê: Rasti bibê, kî ye te metlûb?

Mem fêris û betl û sînesaf e
Xasma bi te ra bêxîlaf e

Hubba di dilê xwe nakit înkâr
Sirra xwe dikit ji bo te îqrar

Sabitqadem e di vê evînê
Dê bêjit ku aşiqim li Zînê

Motîfa astengêriyê, çawa ku bi avêtina zîndanê ya Mem, dibe asteng li pêşiya gihaştina hev a evîndaran, wilo jî di mirina Mem de rola wê sereke ye. Hem di *Mem û Zîna* Xanî de, hem jî di destana folklorî de wilo derbas dibe ku di mirina Mem de rola Beko sereke ye. Xanî vê yekê di beşa 49an ji devê Beko bi vî rengî vegotiyê:

49/5 Go: “Xem mexwe ey çiraxê dewlet
Ger ‘umrî bidit ji bo me muhlet

Ev kerb û elem eger te navê

Zînê û Memê ji dil xwe bavê

Ew her du ne ba'îsê fesadê

Ew bûne sebeb ji bo 'înadê

Ger îzni bidit ji bo mi ra Mîr

Ez dê bikujim Memê bi tedbîr

Tacdîn û biran bi şerbetek zehr

Tu dişî demekî ewan bikî qehr

Emrê ku dibit tedarik asan

Ageh meke pê tu xelq û nasan

Mîrim tu here bibêje Zînê

“Mem sohtiye agirê evînê

Mem teşne tu abê zîndeganî

Mem murde tu canê cawîdanî

Bêje ku: Here Memê derîne

Min daiye te ji bo xwe bîne

Min zaniye Mem ziyade jar e

Perwane ye meqседа wî nar e”

Gava ku nezer bikit li Zînê

Tehqîq e ku naketin çu jînê

Xanî di beşa 56an de rewşa astengêriya Beko û derketina li ser gorên Mem û Zînê a du daran û peydabûna dara dirihê ji ser gora Beko, wiha vegotiye:

56/1 Hîkmet ew e ew ji darê dinya

Çûn seyr kirin serayê ‘uqba

Wan terk neda cîbîlleta xwe
Her yek xuliqîn li xîlqeta xwe

Ye'nî ku li ser Memê û Zînê
Şîn bû ji zîra'eta evînê

Riskîn du 'edêd nîhalê serkêş
Rabûn bi hewa ve her du serxweş

Yek serwê sehî û yek senewber
Sersebz û letîf û sayeguster

Wan dest di gerdenê di yek ra
Qedda xwe dirêj kirin bi yek ra

Şîn bû ji ewê bêrî ji xêrê
Darek li qiyafeta kinêrê

Ew darî ji rahetê bêrî bû
Manendê xwudanî, bi istirî bû

Rabû xwe gîhande her du daran
Bû mani'ê weslê her du yaran

Rahet wî neşî bikit mudara
Xesmanê kir wî aşîkara

Dîsan xwe gîhande wan hebîban
Ew lê pêçiya wekî reqîban

Hasil li furû' û eger usûlan
Ew lê fetilî wek fudûlan

2.5. MOTÎFA JEHRIYÊ

Motîfa Jehriyê, di Motif Indexa Stith Thompson de, di beşên muxtelîf wekî; **H: Îmtîhan**, **M: Tayinkirina Pêşerojê**, **S:Zulmên Anormal**, **Q: Ceza û Xelat** de derdikeve pêş me.

Ev motîf di xebata Zeynelabidîn Zinar de, di binê sernava **Fîncana Jehrê**, di hejmara **45**an de hatiye qeydkirin.

Lêkolîner Ensar Aslan der bareyê motîfa astengêriyê de wiha dibêje:

“Motîfa jehriyê, bi epîzota astengkirina gihaştina hev a evîndaran re têkildar derdikeve meydanê. Motîfeke ku ji motîfa astengiyê derdikeve ye.”⁹³

Di zargotinê de motîfa jehriyê, bi rengekî berbelav derdikeve pêş me. Ew, wekî ku ji pênaseya Ensar Aslan jî xuya ye, wekî navgîneke ku pê, hezkirî ebediyen ji hev tên cudakirin, dertê meydanê.

Carina dibe ku evîndar bi xwe jî jehriyê vexwin. Lewra ew bi zorê bo kesekî ku jê hez nakin tên dayin. Û li ser vê, bi mebesta dawî li jiyana xwe anînê, jehrî vedixwin.

“Hin caran di Çîroka Kurdî de zewaca qîzan bi zorê çêdibe. Gava keç dil dikeve xortekî, lê berî zewicadinê siqûmatek tê serê xort û ew bi hev re nazewicin, îcar birayê xort an yekî din ku dixwaze bi keçikê re bizewice û dest bi kirina dawetê dikan, yan keçê bi zor dane xortekî ku ew jê hez nake, yan jî keçikê dane kalekî kertoxî, hingê keçik fîncaneke ku tê de jehr heye, bi destên xwe digire û nahêle kes nêzî wê bibe. Çi kesê/kesa ku nêzî keçikê dibe jî, keçik hema fîncana jehrê dide ber devê xwe da ku vexwe û xwe bikuje”⁹⁴

Balkêş e ku di çîrok an destanan de, motîfa jehriyê li gorî lehengên jin û mêt bi du rengên cuda derdikeve pêş me. Eger leheng jin be, piranî car ew bi destê xwe jehriyê vedixwe, wekî nîşaneyê girêdayina wê ya bi evîna wê re ye. Lê eger leheng mêt be, hingê piranî car jehrî bêyî ku haya wî jê hebe ji aliyê dijminên wî an jî reqîban ve bi dizî pê tê vexwarin. Jehrî, bi piranî di nava xwarin an jî vexwarinekê de ye.

⁹³ E. Aslan, *H. Hikayeleri İnceleme Yöntemleri*, Yarali Mahmut Hikayesi, r.55

⁹⁴ Z. Zinar, *Şaxên Zanistiyê*, r.122

2.5.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Jehriyê

Di Destana Memê Alan de motîfa jehriyê, di varyanta R. Lescot de derdikeve pêş me. Li gorî vê varyantê, mirina Mem di encama vexwarina jehriyê de ye. Piştî ku Mîr destûr dide Zînê da ku biçe Mem ji zindanê derîne, qîza Beko ya ku di xizmeta Zînê de ye, jehrî berdide nava hinarekê û hinarê dide Zînê da ku bide Mem. Her çendî ku Mem, di xewna xwe de ev yek dîtiye jî, ji ber ku ew hinar ji destê Zînê hatiye, ew wê digire û dixwe. Di encamê de dimire

Li gorî kataloga Stith Thompson, di Destana Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî de motîfa jehriyê bi van rengên jêrîn derdikeve pêş me:

S111: Murder by poisoning/Mirina bi jehrîdayinê: Mem di encama xwarina hinara bi jehrî de dimire; varyanta R. Lescot.

Q418: Punishment by poisoning/Cezakirina bi jehrîdayinê: Beko plan dike ku Hesên û birayên wî bi hîle bişîne şer û Mem jî bi Axûya Silêmanî/jehriyê bikuje; varyanta R. Lescot. Beko li Mîr pêşniyar dike ku Mem û Tacdîn û birayan bi jehrîdayinê bikuje; *Mem û Zîna* Xanî.

H592.2: Poison in nectar/Jehriya di nava nektarê de: Qîza Beko hinara bi jehrî ji Mem re dişîne; varyanta R. Lescot. Beko hewl dide ku Mem û Tacdîn bi jehriya di nava qehweyê de bikuje; *Mem û Zîna* Xanî.

M341.2.8: Prophecy: Death by poison/Kehanet: Mirina bi jehriyê: Mem berî ku hinara bi jehrî bixwe, ji Zînê re kehaneta xwe dibêje ku wî, xwarina hinara bi jehrî û mirina xwe ji pêş de dîtiye; varyanta R. Lescot.

H1515: Attempt to kill hero by feeding him poisoned food/Hewldana dayîna xwarina bi jehrî bo leheng: Beko hewl dide ku bi Axûya Silêmanî/jehriyê Mem bikuje; varyanta R. Lescot. Beko hewl dide ku di nava qehweyê de jehriyê bide Mem û Tacdîn û birayan; *Mem û Zîna* Xanî.

Di nava çîrokên cîhanê de jehrî, bi taybetî di çîroka Romeo û Juliet de, bi rengê pir zindî rol dilîze. Lewra her du leheng jî di encama vexwarina jehriyê de dimirin.

2.5.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Jehriyê

Di *Mem û Zînê* de motîfa jehriyê di du deran de derdikeve pêş me. Lê ne bi rengê ku di Memê Alan de derbas dibe. Di *Mem û Zînê* de motîfa jehriyê, di berterefkirina tehdîda Tacdîn û birayên wî Arif û Çeko de, ji devê Beko, derdikeve pêş me. Lê nayê bikaranîn.

48/9 Xesmê ku neşî bibî muqabil
Derman çi ye? Şerbeta helahil

Lew lazim e hakimî du fîncan
Yek xasê xirab û yekê qencan

49/8 Ger îznê bibit ji bo mi ra Mîr
Ez dê bikujim Memê bi tedbîr

Tacdîn û biran bi şerbetek zehr
Tu dişî demekî ewan bikî qehr

2.6. MOTÎFA ÎMTÎHANÊ

Motîfa îmtîhan an jî testkirinê, motîfeke sereke ye di Motif Indexa Stith Thompson de. Ev motîf di beşa **Îmtîhanê** de, di binê herfa **H**'yê de hatiye qeydkirin. Ev beş hemî bi îmtîhanên lehengên çîrokan re eleqedar e.

Di xebata Zeynelabidîn Zinar de, wekî hevbeşiyê çîroka kurdî behs ji motîfa îmtîhanê nehatiye kirin.

Ev motîf di berhemên zargotinî de, bi rengê berbelav dertê pêş me. Forma wê ya herî otantîk, di çîrokan de bi vî rengî tezahur dike: Padişah, hezkirî an jî erkdarek, ji leheng dixwaze ku karekî giran bi cih bîne; ango pêşbaziyekê dide pêş wî da ku ew evîna xwe îspat bike.⁹⁵ Di vê îmtîhanê de her tim îhtîmala mezin, binketina leheng e. Çunkî ew bi karekî ku, sînorê hêza mirovî derbas dike re rûbirû ye. Jixwe ev daxwaz bi piranî bi armanca mirina leheng dertê meydanê.⁹⁶ Di taybetmendiya vê motîfê de şertekî heye ku, girêdayî serketin an jî binketina leheng diguhere. Eger ku leheng li dû vî şertî, karê li pêş xwe bi ser bixe yan bi rengê tê xelatkirin, yan kral, padişah yan jî erkdar, keçika ku ew jê hez dike dide wî an jî ew çî dixwaze ji bo wî tê bicihanîn. Lê ku di îmtîhanê de têk here, ew, jixwe yan di prosesa îmtîhanê de dimire, yan jî ku nemire jî li dû şert mecbûr e ji îdîaya xwe vegere.

Aliyê girîng a vê motîfê ew e ku, ew di teşekila çîrok an jî destanê de prosesekê îfade dike. Yanî ew ji bo berhema zargotinî wekî xaçerêyekê ye. Li dû îmtîhanê û li gorî encama îmtîhanê, qedera leheng û lehengan bi rengê bêveger diguhere. Yanî motîfa îmtîhanê li ser qedera lehengan xwedî bandoreke diyarker e. Her wiha kêliya ku em li motîfa îmtîhanê rast tên, di destan û çîrokê de kêliya ku tansiyon herî bilind e ye, kêliya şikestinê îfade dike. Çunkî leheng li ber deriyekî ye; bi vebûna derî re, ê qedera wî bi rengê pozîtîf ku ew her li bendê bû biguhere. Lê ku derî venebe, hingê trajedî pêk tê.

Motîfa îmtîhanê her tim bi diyardeya evînê re ne têkildar e. Carina dibe ku li hemberî tiştekî an jî zehmetiyê derasa, pêdiviya xwe îspatkirina leheng derkeve meydanê. Mesela di çîrokên mîna *Eliyê Newêrek* û *Mîrze Mihemed* de, dêw her tim îmtîhanekê didin pêş Eliyê Newêrek da ku ew îspat bike ku, ew çend bihêz e an na; an

⁹⁵ Her wekî ku di destana Ferhad û Şîrîn de derdikeve pêş me. Her weha di çîrokên Mîrze Miheme de jî em rastî vê taybetmendiya motîfa îmtîhanê tên.

⁹⁶ Bi rastî mirov di vê nuqteyê de dikare cudahiyeke çîrok û destanan jî destnîşan bike ku, di çîrokan de leheng bi piranî ji vê îmtîhanê serketî dertên û çîrok bi dilgeşî bi dawî dibe. Lê di destanan de her çendî ku leheng di rêya îmtîhanê de fedekariyên mezin dikin jî, heta digel ku carina di îmtîhanê de bi ser dikevin jî, ew îmtîhan bi rengê dibe sebebê mirina wan û bi vî rengî destan bi trajediyê bi dawî dibe. Lewma ji aliyê encamê ve hêmana esas a çîrokan dilgeşî, ya destanan jî trajedî ye.

jî *Mîrze Mihemed*, civakê ji dêwên ku zirarê dide wan xelas dike, bi wan re şer dike, wan têk dibe. Dema ku leheng bi ser dikevin, carina dibe ku hemî dêw bikevin xizmeta wî. Dîsa di Destana *Siyabend û Xecê* de, şerê *Siyabend* ê bi *Qeregêtran* re, şerê wî yê bi qîza *Mîrê Cinan Ereb Zincar/Siwarê Felekê* re, di çarçoveya motîfa îmtîhanê de ne. Lewra kî bi ser bikeve wê yê di bikeve xizmeta wî.⁹⁷

Ji bo Ferhad, kunkirina *Çiyayê Bêsîtûn* û di wê derê de avê anîn, îmtîhan e. Lewra, ku ew di vê îmtîhanê de bi ser bikeve wê Şêrîn bo wî bê dayîn. Ji bo Mecnûn, (di wateyêke dînî-tesewûfî de be jî) *Çol*, îmtîhan e. Lê li vê derê şert ne Leyla ye, çol îmtîhana di rêya evîna îlahî de ye. Di destana *Derwêş û Edûlê* de, li ser banga Edûlê, Derwêş, bo ku malbata wê û eşîra wê biparêze, li hemberê êlên ereb şer dike. Ev şerê Derwêş, di çarçoveya motîfa îmtîhanê de ye. Lewra hezkirî di bin xetereyê de ye. Leheng dema ku wê xelas bike, dê bi girtina hezkiriyê, bê xelatkirin.

Di berhemên zargotinî de, di çarçoveya motîfa îmtîhanê de, carina hin leyistik û carina jî hin pirsên ku bersivên aqilane jê re divên dertên pêş me. Yanî wekî mînak, pirseke hêsan lê bersiva wê girîft tê pirsîn û tê gotin ku, kî bersiva wê zanibe dê bi rengêkî bê xelatkirin. An jî carina hin leyistikên di çanda gelêrî de tên kirin, wekî pêşbaziya hespan. Wekî ku di Memê Alan de dertê pêş me, setrenc an jî curbecur leyistikên bi vî rengî tên leyistin û kî bi ser bikeve ji bo wî xelat tê dayin.

2.6.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Îmtîhanê

Motîfa îmtîhanê di varyantên folklorî yên Destana Memê Alan de, bi rengêkî pir dînamîk rol dilîze. Lîstika setrencê ku divê di çarçoveya motîfa îmtîhanê de bê nirxandin, di hemî varyantên Memê Alan de, epîzoteke hevpar e. Ji ber vê hevpariya berbelav, îhtîmaleke mezin e ku ev epîzot, di varyantên herî kevnar yên destanê de jî hebûye.

Li gorî kataloga Stith Thompson, di Destana Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî de, motîfa îmtîhanê bi van rengên jêrîn derdikeve pêş me:

H500: Tests of cleverness or ability/Îmtîhanên jîrî û qabiliyetê.

⁹⁷ Bnr, Celîlê Celîl, Zargotina Kurdan, r.

H509: Chess game as test/Lîstika setrencê wekî îmtîhan: Mem û Mîr li ser şertê dilxwaziyê bi setrencê dilîzin; hemî varyantên Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî. Di gelek varyantan de şert li ser Zînê ye; varyant I, V, VII, X

H300-H490: Mariage tests/Testên zewacê: Di encama îmtîhana setrencê de ku Mem bi ser bikeve wê Zînê bo wî bê dayin û ku di îmtîhanê de têk biçê, wê li qedera xwe ya ku Mîr ji bo wî destnîşan dike, razî bibe; varyant I, V, VII, X.

Di hemî varyantên Memê Alan de, bûyera lîstina setrencê dertê pêş me. Bi tenê di varyanta çaran (IV) de lîstik ne setrence lê dama ye. Li gorî hemî varyantan, Mem di encama hîleya Beko de têk diçe û li dû şertê ku berî lîstikê li serê li hev kirine; wî diavêjin zindanê. Lê di varyanta dehan (X) de qîza Beko ya remilvan, bi destê Beko hîleyê li Mem dike. Ew bi rêya remlê dibîne ku, berê Mem bikeve Zînê, wê di setrencê de têk biçê. Vê yekê ji Beko re dibêje û Beko bi rêya guhartina cihê Mem û Mîr, dibe sebeb ku berê Mem bikeve bi aliyê Zînê de û di encamê de têk biçê.

Lê di heqê şertê setrencê de, li gorî varyantan hin cudahî hene. Li gorî hin varyantan, Mîr şik dike ji evîna Mem û Zînê û ji bo ku rastiya vê rewşê hîn bike (li ser plana Beko), Mem vedixwîne lîstina setrencê. Şertê lîstikê ew e ku, yê ku têk bibe, ji yê têkçûyî çî bixwaze, wê bike. Yanî li ser daxwaza dil e. Li gorî hin varayantên dî; jixwe Mîr haya wî ji evîna Mem û Zînê heye û lewma şertê lîstina wan a setrencê ew e ku; Mîr, Memo têk bibe, ê wî biavêje zindanê lê ku Mem, Mîr têk bibe wê Mîr Zînê bide wî. (Varyant I, V, VII, X)

Dema ku em li her du forman jî dinihêrin em bi rengê bêkêmahî li pêkhatina motîfa îmtîhanê rast tên. Di her du forman de jî şertekî heye ku, wê bi pêkhatina wî şertî, qedera leheng biguhere. Her wiha di encama îmtîhanê de wê dînamîzma destanê jî biguhere.

Hem di Destana Memê Alan de û hem jî di ya Ferhad û Şîrîn de, digel ku leheng di îmtîhanê de bi ser dikevin jî ew bi rêya hîleyê têk diçin an jî dimirin.

Li gorî varyanta VII û XIan, piştî ku Mem û Zîn di cureyeke xewnê de hev dibînin û gustîlikan bi hev diguhêrin, Zînê şertê çil rojan dide ber Mem (ev şert li ser gustîlika ku daye Mem nivîsandî ye; varyant VII); ji ber ku, eger Mem di nav çil rojan

de xwe pê negihîne, ê wê bidin dergistiyê wê Çekîn. Lewma di nava çil rojan de xwe gihandina Zînê, ji bo Mem cureyeke îmtîhan e û Mem tê de bi ser dikeve.⁹⁸

2.6.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Îmtîhanê

Di *Mem û Zîna* Xanî de, motîfa îmtîhanê bi heman rengê ku di destana folklorî de derbas dibe, derdikeve pêş me. Wekî ku di hin varyantên folklorî de jî em dibînin, Mîr li ser fesadiyên Beko, ji evîna Mem û Zînê dikeve gumanê û Beko pêşniyariyeke wiha li Mîr dike:

42/26 Go: “Emir bike Memê bixwûnin

Hûn her du di xelwetê ku rûnin:

Mem aşiqê sadîq e bizan qenc

Vê ra bileyîze tu bi setrenc

Şertê xwe ji wî bixwaze dilxwaz

Dê keşif bibit heqîqeta raz

Gava ku ewî dikî tu mexlûb:

Bê: Rasti bibê, kî ye te metlûb?

Wekî tabîrekî *dilxwazî*, di çanda şertgirtinê de hê jî di nava civakê de heye. Dema ku şert *dilxwazî* be, tu sînor ji daxwazê re nîn e. Lewma yê serketî çî bixwaze, divê bê bicihanîn.

Li ser vê plana Beko, Mîr, Mem vedixwîne lîstina setrencê

43/17 Mîr gote Memê bi kîn û kerbe

“Îro me digel te ceng û herb e

Rabe ji me ra were muqabil

Bêşek bi te ra me ez mucadil

⁹⁸ Bnr., Beşa Muayese, Epîzota Hevdîtina ewil ya Mem û Zînê.

Şertê me digel te ey serefraz
Herçî te divê, ji bo me dilxwaz”

Piştî ku her du alî jî li ser cureya listikê û şertê encamê li hev dikin, listik an jî îmtîhana Mem dest pê dike. Mem di listina setrencê de pispor e. Lê wekî ku di qedera hemî lehengan de heye; ku ew bi piranî yan ji ber zêfîyeke xwe ye mirovî, yan jî ji ber durustiya xwe têk diçin; Mem jî ji dilê xwe yê evîndar re têk diçe, lê di encama plankirina hîleyeke ji aliyê Beko ve. Ev yek bi vî rengî pêk tê:

43/29 Sê destî ji Mîr birin temamî

Mufsid fikirî ji wî meqamî

Zîn dî ku li pencerê diyar e

Mîhr e li mehê dikit nezare

Bedxwahî binê çî hîle ra kir

Ev rene behaneyek eda kir:

Go: “Bend û leyîz û cih bi dor in

Hûn her du cihan bi hev bigorin

Mem dê bibitin vê carê mexlûb

Hasil bibitin ji bo te metlûb”

Mîr rabû û çû cihê Memê jar

Mem hate cihê ji pêş ve dildar

Dema ku berê Mem dikeve Zînê, ew leyistikê jibîr dike. Lewre ew ji qelsiya xwe ya ku di xwezaya evîndaran de heye re, têk diçe. Lê wekî ku di van beytên jorîn de derbas dibe, ev di encama fikirîna bi hîle ya Beko de pêk tê.

Ev cure qelsiyên mirovî yên lehengan, za’afên wan ên mirovî, û bi vî rengî têkçûna wan, di gelek berhemên zargotinî de derdikeve pêş me. Lewre civak dixwaze wê mesajê bide ku; tu her çendî pispor, bihêz û mafdar bî jî, dijminê te hîç ranazê û her

tim bi aqil tevdigere û li fersendê dinihêre da ku kêmahiyeye te bibîne û di wê nuqteyê de te têk bibe. Em dikarin bibêjin ku, ev yek hêmaneke heşyarker/perwerdekar a xwezaya çîrok û destanan e.

Piştî ku berê Mem dikeve ser Zînê û ew motîvasyona xwe hunda dike, yanî ji prosesa îmtîhanê vedîqete, Mîr, wî şeş car li ser hev dibe û li dû şertê wan, jê dixwaze ku ew navê hezkiriya xwe jê re bibêje.

43/41 Şerê min ew e bikî tu îqrar
Kanê di dinê kî ye te dildar

Herçî periya te dil li bal e
Horîsîfet e, melekmişal e

Ger laîqê te ewê bibînim
Malê bidim ez ji bo te bînim

Lîstik qediyaye û dor hatiye ser bicihanîna şertan. Şertê Mîr ew e ku, Mem navê hezkiriya xwe jê re bibêje. Di vê kêliyê de, Beko dikeve dorê û li ser hezkiriya wî ji aliyê pîvanên xweşikiyê ve, gotinên bi heqaret dibêje û Mem tehrîk dike da ku ew navê hezkiriya xwe bibêje. Mem cardî li tebîetê xwe yê mirovî têk diçe û li pêş Mîr, bi rengê ku di çanda gel de dernayê pêş me, navê Zînê dibêje û Mîr wî diavêje zîndanê.

43/49 Go: “Qet ne we ye wekî wî gotî
Mîrim, periya dilê min sohtî

Şehzade ye, şehnişîn mekan e
‘Enqa ye bilindiaşîyan e

Mîranî ye ew ji neslê pak e
Nûranî ye ew ji ab û xak e

Serdefterê hûr û nazenîn e
Her çendî melek, bi navê Zîn e

43/68 Mem girt û şihande pêşê serheng

Go: “Hebsî bikin di qulleya teng”

Wekî ku em ji van beytan jî dibînin îmtîhan, bi têkçûn û hebsîbûna Mem bi dawî dibe.



2.7. MOTÎFA HÎLEYÊ

Motîfa hîle an jî xapandinê yek ji motîfên sereke ye ku di Motif Indexa Stith Thompson de di binê sernava **Xapandin** de, bi herfa **K**'yê hatiye nîşandan.

Di xebata Zeynelabidîn Zinar de, wekî hevbeşiyêke çîroka kurdî behs ji vê motîfê nehatiye kirin.

Hîle an jî xapandin, wekî ku bala lêkolînerên zargotinê jî kişandiye, di çîrokan de motîf an jî hevbeşiyêke gelekî girîng e. Heta di wê radeyê de ku, hin cure çîrok hene ji serî heya dawî li ser bingeha vê motîfê hatine avakirin. Di çîrokên civaka kurd de jî heman tişt heye. Wekî çîrokên li *ser Eliyê Newêrek*, wekî çîrokên li *ser Rovî* û hwd.

Di berhemên zargotinê, bi taybet di çîrokan de, motîfa hîle an jî qurnaziyê, bi du rengên cuda derdikeve pêş me. Yek jê ew e ku, lehengên sereke yên çîrokê bi xwe serî li vê rêbazê didin da ku problemên ku ew pê re rûbirû mane çareser bikin. Di vê formê de, ji diyardeya hîle an jî qurnaziyê bêhtir, wekî peyameke civakî, “aqil” tê pesinandin. Hîle an jî qurnazî di van çîrokan de, ne wekî motîfeke neyênî lê wekî rêbazêke ku carina divê mirov serî lê bidin, tê nîşandan. Bi piranî leheng bi problemeke ku ji hêza wî ya maddî dibuhere re rû bi rû ye. Bo ku vê problemê çareser bike, divê ku aqilê xwe bixebitîne.

Em di çîrokên mîna *Eliyê Newêrek* yan jî *Keloğlan* (ji zargotina civaka turk) yan jî çîrokên li *ser Rovî* û hin cure heywanên dî de, rastî vê motîfê tên. Di çîrokên bi vî rengî de mijara esas ev motîf e.

Di vê formê de, hîle û qurnazî di destê hêza baş de ye. Enstrumaneke ku hêza baş bi kar tîne ye.

Ev cure çîrok, dikarin li ser hêmana, “*aqil û bêaqilî*” bên dîtin. Çunkî her çendî ku aliyekî bi hêza kêr lê bi aqil derdikeve pêş jî, aliyê dî bi hêza zêde lê bê aqil derdikeve pêş. Û her tim aqil bi ser dikeve.

Forma duyem a motîfa hîleyê, forma wê yê negatîf e. Ev form jî di destan û çîrokan de derdikeve pêş me. Li vê derê bi piranî peyama “*her tim hişayriyê*” ji leheng re tê dayin. Leheng, bi hêz û cesareta xwe pir karan digihîjîne serî. Leheng wekî ku di gelek lehengên dî yên çîrokan de tê dîtin, xwedî zeafên mirovî ye. Vêca dijminên wî an jî hevrikên wî, ji bo ku bikaribin wî têk bibin; bi regekî serî li hîle, xapandin û qurnaziyê didin.

Di van çîrokan de, berevajî ya ku me di destpêkê de destnîşan kiribû; hîle û qurnazî di destê hêza nebaş de ye. Enstrumaneke ku hêza nebaş bi kar tîne ye.

Leheng carina, bi van hîleyan an jî qurnaziyan dixapin û qedera wan diguhere. Yan dimirin yan esîr dikevin yan jî hin karên nebaş dikin. Çawa ku di destana *Zembilfiroş* de, Xatûn bo ku Zembilfiroş jî li wê meyl bike, curbecur hîleyan dike, heta dikeve nava cilên jina wî û dikeva nava nivînên Zembilfiroş jî lê leheng pê naxape. Lê li aliyê dî, di Destana Ferhad û Şîrîn de, pîrejina ku ji bo reqîbê Ferhad, Perwîz dixebite, bi rêya hîleyê/xapandinê, Ferhad têk dibe. Ê di encama vê hîleyê de leheng dimire. Di Destana Bîjen û Menîje de, Bîjen bi hîleyê tê têkbirin û dîl dikeve destê dijminan.

2.7.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Hîleyê

Dema ku em bala xwe didin varyantên folklorî ên Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî jî, em bi regekî zelal rastî vê motîfê tên. Bi taybet teşekila vê motîfê ya di lîstika setrencê ya di navbera Mem û Mîr de, ew çend karakterîstîk e û bê kêmahî di hemî varyantan de heye ku; mirov dikare bibêje ku di formên herî kevnar ên destanê de jî ev motîf bi heman rengî hebûye

Li gorî kataloga Stith Thompson, di Destana Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî de motîfa hîleyê di van xalên jêrîn de derdikeve pêş me:

K0-K99: Contests won by deceptions/Pêşbaziyan ku bi hîleyê tên qezenckirin:

Di hemî varyantên Memê Alan de û *Mem û Zîna* de; hîleya Beko an jî qîza Beko ku di lîstika setrencê de derdikeve pêş me.

K713.1. Deception into allowing one to be tied/Hîleya di destûrdayina yekî de ku, rê didê bê girêdan: Mem bi xwe agahî dide Beko ku ew bi tenê bi mûyê Bozê Rewan dikare bê girêdan û Beko bi hîle wî girê dide û diavêje zindanê; varyanta R. Lescot.

K1000-K1199: Deception into self injury/Xwe bi xwe birîndarkirina bi hîleyê: Mem li ser banga şer a Mîr, bo ku neçe şer xwe bi xwe birîndar dike; varyanta Roger Lescot. (Di hin varyantan de bi hîle xwe li nexweşîna datîne)

K1825.1.1: Masks as doctor to reach his sweetheart/Ji bo bigihê yara xwe ketina lîbasê bijîşkan: Heyzebûn bo ku xwe bigihîne Mem û Tacdîn bi hîle xwe wekî bijîşkan girêdide; *Mem û Zîna* Xanî.

K1839: Deception by disguise or illusion/Hîleya bi rêya lîbasguhertin an jî îluzyonê: Qîza Beko ya remildar xwe wekî Zîna ku Mem lê digere

dide naskirin lê Mem bi alîkariya hespê xwe Bor an jî bi şîreta Xocê Xizir jê xelas dibe; varyant I, IV, V, VII, VIII, IX, X, XII, R. Lescot.

K1840: Deception by substitution/ Hîleya bi rêya xwe xistina dewsa yekî dî: Qîza Beko an jî li gorî hin varyantan xuşka Beko, xwe dixwe dewsa Zînê û dixwaze Mem bixapîne; di hemî varyantên ku me di hejmeta jorîn de destnîşan kirine de.

K2100-K2110: False accusations and Slanders/Sûcdarkirinên xelet û îffîra: Beko, Mem bi çavberdana li cihê Mîr sûcdar dike, lê îffîra dike; Beko li Mem îffîra dike ku ew ji keçikeke ereb a deqreş hez dike; *Mem û Zîn*.

Di Destana Memê Alan de jî, em di hin cihan de dibînin ku leheng bi hîleyê naxape lê di hin cihan de dixape. Wekî mînak, dema ku Mem ji Muxurzemînê/Mixribiyanê tê û digihê bajarê Cizîrê, qîza Beko ya ku navê wê jî Zîn e, dixwaze wî bixapîne û xwe wekî Zîna ku ew lê digere, dide naskirin. Hingê Mem gelek li ber halê xwe dikeve û xemgîn dibe. Çunkî ev Zîn ne xweşik e. Lê di wê kêliyê de, hespê Mem, Bozê Rewan, wî ji rewşê haydar dike û bi vî rengî Mem pê naxape. Lê di beşa lîstina setrencê de, Mem ji ber zeafên xwe yên mirovî û halê evîndariyê, ji hîleya Beko re têk diçe û di encama vê hîleyê de dikeve zindanê.

Di hin varyantên folklorî ên Memê Alan de, mirina Mem jî di encama hîleya Beko an jî qîza wî ya remilvan de pêk tê. Li gorî varyanta VI û VIIIan, Beko beriya Zînê diçe zindanê cem Mem û jê re dibêje ku; Mîr, Zînê daye yekî dî û wa Zînê tê zindanê da ku xatirê xwe ji te bixwaze. Mem li ser vê agahiya Beko ji êşa evîne dimire. Dîsa li gorî hin varyanta Xan, qîza Beko ji Beko re dibêje ku; mêr herin Mem ji zindanê derbixin wê bi saxî bifilite lê ger ku jin herin wê Mem bimire. Li ser vê, Beko plan çêdike ku Zînê here Mem derbixe ji zindanê û di encama vê yekê de Mem dimire.

2.7.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Hîleyê

Di *Mem û Zînê* de motîfa hîleyê bi formeke karakterîstîk (bi forma hîleyên di lîstik an jî pêşbaziyên de) di lîstina setrencê de derdikeve pêş me. Li vê derê Mem, di destpêkê de Mîr têk dibe lê Beko li rewşê mudaxele dike. Çunkî ew dibîne ku Zînê di pencereyê de li Mem temaşe dike. Lê piştî Mem lê ye. Mem wê nabîne. Beko bo ku

berê Mem jî bikeve Zînê, û konsantrasyona wî ya li listikê xera bibe, ji Mîr û Mem dixwaze ku cih bi hev biguhêrin.

43/30 Zîn dî ku li pencereyê diyar e

Mîhr e li mehê dikit nezar e

Bedxwahî binê çî hîle rakir

Ev renga behaneyek eda kir

Go: “Bend û leyiz û cih bi dor in

Hûn her du cihan bi hev bigorin

Piştî ku Mem û Mîr, cih bi hev diguhêrin, berê Mem dikeve Zînê û haya wî ji listikê diçe. Lewma ew têk diçe û di dawiya vê hîleyê de dikeve zindanê.

Di *Mem û Zînê* de di beşa 18 û 19an de em rastî hîleyên Heyzebûnê tên. Ew bo ku halê ku Sitî û Zînê ketinê keşif bike, diçe cem remilvan lê rewşê bi rengê dî jê re dibêje. Di beytên 18/1-18/15 de Heyzebûn ji remal re, li cihê ku behsa du keşan bike behsa hebûna du kurên xwe dike û dibêje ku, cadûyan di cejna Newrozê de ew ji rê derxistine. Lê remilvan dema ku li remlê dinihêre, rewşa rast têdigihê û wiha dibêje ji Heyzebûnê re:

19/5 Ev renga got Qasida Pîr

“Meqsûdi bi mekr û kîzb û tezwîr

Ma qet dibitin ji bo te hasil?

Bê rastrewî muhal e menzil

Te digo ku kurê di min di dîn in

Nabêjiye min Sitî û Zîn in

Ji bilî vê, motîfa hîleyê, dema ku Heyzebûn diçe da ku Mem û Tacdîn bibîne, dikeve nava cilên tebîban û bi vî rengî xwe vedişêre, derdikeve pêş me.

19/33 Rabû ve ‘ecûze şubhê Luqman

Ser ta bi qedem dewa û derman

Qarûre û huqqe, nişter û kîs

Hilgirtin ewa xebîsê telbîs

Dayî paxila xwe çend kitêbek

Dinima bi hekîmekî ‘ecêbek

Di *Mem û Zînê* de wekî ku em ji van mînakan jî dibînin, motîfa hîle û qurnaziyê di wateyeke negatîf de derdikeve pêş me.



2.8. MOTÎFA QEDEXE Û CEZA

Di Motif Indexa Stith Thompson de motîfên **Qedexe** û **Cezayê** di binê herfa **C** û **Q**'yê de hatine qeydkirin.

Di xebata Zeynelabidîn Zinar de ev motîf wekî hevbeşiyekê nehatiye nîşandan lê wekî hevbeşiyekê çîroka kurdî behsa “**Zindan**”ê hatiye kirin û ev di hejmarê **08**an de hatiye qeydkirin.

Eger em çîrok û destanan wekî resmeke avahîsaziya maddî û manewî ya civakê bibînin, di çarçoveya peywendîya bi vê motîfê re, sazûmana kevin a civakê bi rêya hukmên teqez û qedexeyên ku tu kes nikare xwe nêzî wan bike, tê parastin. Vêcar leheng ew kes e ku, vê hînbûna civakê ya bê lêpîrsîn, nas nake û bi meraqeke mirovî (her wiha pêşewayî), dixwaze wê cîhana ku li dû wê qedexeya kevneşopî veşarî ye, bibîne, keşif bike.

Lêkolîner A. Sezer der bareyê motîfa qedexeyê de weha nivîsiye:

“Herêma an jî odeyê ku ketina wê qedexe ye, qedexeya li ser aşkerakirina siran, cezakirina bi şikandina tabûyan re têkildar, qedexeyên çînî (qedexeyên di navbera statuyên civakî de), qedexeya axaftinê û hwd. Ev hemî hêmanên qedexeyê ne ku di vegotinên gelêrî de derdikevin pêş me.”⁹⁹

Ev motîf bi curbecur dirûvan derdikeve pêş me. Di çîrokan de em carina li rewşeke wiha rast tên ku, wekî mînak padîşah an jî mîr an jî kesek, yekê/î digire koşka xwe û jê re dibêje ku: “Hemî der li te serbest in lê bi tenê nekeve filan odeyê an jî derê bêvan cihê zînhar veneke.(yan jî nekeve odeya çîlan)” Lê di wê kêliyê de digel ku her der li leheng serbest e jî ew ji her derê bêhtir dixwaze bikeve wê ode an jî wî cihê ku lê hatiye qedexekirin. Li vê derê çîrok, balê dikişîne ser meraqa bêdawî ya mirovan. Di encama vê meraqê de, carina cezayên mezin hene ji bo lehengan û carina jî leheng piştî bînpêkirina vê qedexeyê di wî cihê qedexekirî de rastî surprîzeke mezin tên.

Yan jî carina em li rewşeke wilo rast tên ku wekî mînak, cihekî, warekî an jî heyinekî bi zîrar ji berê de ji aliyê civakê ve wekî tabûyekê hatiye dîtin û kes nakeve wê derê an jî newêre xwe nêzî wî tiştî bide, digel ku jê zîrar jî dibînin. Ev tirs an jî tabû, di serencama dehan an jî sedan salan de derketiyê meydanê. Lê wextê tê û ji nava civakê kesek radibe û vê tabûyê an jî tirsê dişkêne. Bi pîranî di destpêkê de astengiya herî

⁹⁹ A. Sezer, *M. Mungan ve H. Bilimi*, r. 94

mezin, civaka ku ji vê tabû û tirsê zîrar dibîne bi xwe, nîşan dide. Ew vê tabûyê ji xwe re wekî pîroziyekê dibînin. Lê leheng, vê qedexeya ku li dû wê tabûyê pîroz heye, nas nake û nîşanê civakê dide ku tu wateyê wê tabûyê û tirsê nîn e êdî. Di bînpêkirinê bi vî rengî de ji bo leheng tu ceza nîn e.

Motîfa bînpêkirina qedexeyê her tim ne di wateya erênî de ye. Carina dibe ku bi bînpêkirina hin pîroziyan, îmajêke negatîf ya lehengan jî çêbibe û her wiha bînpêkirinê cezakirinê. Wekî mînak di nava civakê de hin heywan an jî hin tiştên pîroz hene ku, kî dest bide wan, ew bi regekî tîpî cezakirin. Lewma cezakirinê her tim ne bi destê padîşah, mîr an jî erkdarê ye. Carina xweza, carina jî hin cure heywan ceza didin lehengan.

2.8.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Qedexê û Ceza

Di hemî varyantên folklorî yên Memê Alan de, em rastî avêtina zindanê ya Mem tîpî ku ev di en encama cezadayîna Mîr de pêk tê. Her weha hin cureyên dî yên vî motîfê jî derdikevin pêş me.

Li gorî kataloga Stith Thompson, xalên ku me di varyantên folklorî yên Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî de tesbîtkirine bi vî rengî ne:

C550-C599: Class Tabu/Qedexeya Çînî: Li pêşberî Mîr bi regekî dijî edet û statuyên civakî, aşkerakirina evîna xwe ya ji bo Zînê şikandina tabûyê ye. Di hemî varyantan de û *Mem û Zînê* de bi heman rengî ye. Digel fermana teqez tevli merasîma nêçîrê nebûyî û bêyî destûra Mîr ketina nava bexçeyê wî, li koşka wî bi Zînê re hevdîtin, şikandina qedexeyê ye. Di hemî varyantan û *Mem û Zînê* de bi heman rengî ye.

C900: Punishment for breaking tabu/Cezakirina bi bînpêkirina qedexeyê re tîkildar: Mem di encama bînpêkirina qedexeyê de bi cezayê zindanê tîpî cezakirin. Hemî varyantên Memê Alan û *Mem û Zînê*

Q400-Q599: Kinds of punishments/Cureyên cezakirinê.

Q200-Q399: Deeds punished/Karên-Tevgerên ku tîpî cezakirin

Q300: Contentiousness punished/Cezakirina xerabkariyê: Beko (di hin varyantan de Mîr jî) ji ber kirinê xwe yê nebaş tîpî cezakirin. Di varyanta I. de bavê Mem, cezayê Beko dide û wî dîkuje.

Qeretajdîn jî cezayê Mîr dide û wî dikuje. Di varyantên dî de û Di *Mem û Zînê* de Qeretajdîn, ji ber kirinên wî, Beko bi kuştinê ceza dike.

Q320: Evil personal habits punished/Xususiyetên nebaş ên şexsî tîn cezakirin: Cezakirina Beko û Mîr di vê çarçoveyê de ne.

Q430: Abridgement of freedom as punishment/Cezakirina bi astengkirina azadiyê: Mem bi zindanê tê cezakirin.

Q570: Punishment and remission/Ceza û bexşandin: Mem pêşî tê cezakirin dûre li gorî hemî varyantên Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî, Mîr wî dibexşîne û destûr dide Zînê ku wî ji zindanê derbixe.

Di varyantên folklorî ên Memê Alan de, dema ku Mem dixwaze here bajarê Cizîrê û Zînê bibîne, bavê wî vê yekê lê qedexe dike.¹⁰⁰ Hemî deriyên bajêr digire, ferman dide ku Mem dernekeve derveyê bajêr, lingên hespê wî Bozê Rewan girêdide lê digel hemî qedexeyan jî, Mem qedexeya ku bavê wî daniye binpê dike û li dû armanca xwe diçe.

Her çendî bi formeke cuda be jî, di Destana Gilgamêş de xwedavend Îştâr ji Gilgamêş dixwaze ku pê re bizewice. Ev hukmeke dînî ye û ne pêkan e ku mirov vê red bikin an jî binpê bikin. Lê Gilgamêş wê red dike. Ji ber vê redkirinê, ew ji aliyê xwedayan ve tê cezakirin û *Boxeyê Ezmanî* bi ser wî de wekî bela tê şandin.¹⁰¹

Di Destana *Zembilfiroş* de, Zembilfiroşê kurê Mîr, dixwaze dev ji her tiştî berde û terkiserê dinyayê bibe. Lê bavê wî vê yekê jê re qedexe dike. Zembilfiroş vê qedexeyê binpê dike û li dû armanca xwe diçe.

Pir balkêş e ku di gelek varyantên Siyabend û Xecê de, em hê ji destpêkê de dibînin ku, Siyabend li gelek kesan zulum kiriye, li gelek kesan neheqî kiriye. “*Dinya kire êxir dewr û qetil xwîne/Gunê evda û însana tev hiltîne*”,¹⁰² ji vê îfadeya ku di destanê de bo Siyabend tê gotin, em têdigihên ku, ji aliyê pezkûviyek ve hatina kuştina Siyabend, wekî cureyeke cezakirinê xuya dike. Lê di vê mînakê de ceza ji aliyê heywanekî û xwezayê ve tê dayin.

¹⁰⁰ Di vê prosesa destanê de bav wekî motifê astengêriyê jî dikare bê hêlsengandin.

¹⁰¹ Wergêr. Kawa Nemir, *Gilgamêş û Çend Mîtosên Din*, Weşanên Jiyana Rewşen, r.58

¹⁰² Celîlê Celîl-Ordîxanê Celîl, *Zargotina Kurda I.*, r. 143

Di çîrok û destanên civaka kurd de, em li hemî formên vê motîfê rast tên. Lê bi taybetî di destanan de, hin qedexeyên dînî di bûyerên evînê de derdikevin pêş me. Ev qedexeyên dînî, bi piranî di têkiliyên navbera civakên musulman û xirîstîyan an jî di têkiliyên di navbera êzîdî û musulmanan de rû didin.

Di destanên mîna Derwêşê Evdî û Edûlê, Şêxê Sen'an de, em rastî vê motîfa qedexeya dînî tên.

2.8.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Qedexe û Ceza

Di *Mem û Zînê* de motîfa bînpêkirina qedexeyê di du deran de derdikeve pêş me. Yek jê, dema ku Mîr biryara çûyina nêçîrê dide û ferman dide hemî xort û mêrên Cizîriyan ku tevli nêçîrê bibin bi tenê Mem tevli merasîma nêçîrê nabe. Yanî bi hênceta nexweşîna fermana Mîr bi cih nayne.

36/17 Mîrê ku felek mutîê ferman

Go: “Sibhe nebûye qewmê Bohtan

Rabestî sîleh û gurz û şimşîr

Bîcumle digel me bêne nêçîr

Hadir nebitin kesek di seydê

Ew dê bimirrit di bend û qeydê

Digel fermana Mîr jî, Mem naçe nêçîrê û piştî ku her kes ji nava bajêr derdikeve, ew bêyî destûra Mîr, diçe nava Bexçeyê Xas ê Mîr û piştî ku ew û Zînê hev dibînin, bi Zînê re diçe nava koşka Mîr; bi vî rengî qedexeyeke di bînpê dike. Lewre tu kes bê destûra Mîr, nikare bikeve nava bexçeyê wî û koşka wî. Piştî ku Mîr ji nêçîrê vedigere û Mem li nava koşka xwe dibîne (Zînê xwe di binê kulavê Mem de veşartîye), li vê rewşê hêrs dibe.

40/30 Mîr go: “Kî ye ev di vî zemanî

Bê ruxsetê min di vî mekanî

Mem ji ber ku di rewşeke giran da ye, li ber Mîr ranabe piya. Lê li ser ketina navberê ya Tacdîn, Mem ji cezayê giran xelas dibe. Dûre Tacdîn mala xwe dide ber agir û bala Mîr û maiyeta wî dikşîne ser bûyera agir û bi vî rengî Mem xelas dibe. Mem li vê derê hem bi ketina nava koşka Mîr û hem bi hevdîtina bi Zînê re, qedexeyekê bînpê kiriye hem jî li dijî rê û resmên ku divê di huzûra Mîr de bîn nîşandan tevgeriyaye û bi vî rengî qedexeyê bînpê kiriye.

Di beşa 43yan de, piştî ku Mem û Mîr bi setrencê dilîzin û Mem têk diçe, li ser tehrîkên Beko, ew cardî li dijî rê û resmên huzûra Mîr tevdigere û li pêşberî Mîr bi rengê ne rewa, evîna xwe ya ji bo Zînê, eşkere jê re dibêje. Lê Mîr ji berê de diyar kiriye û sond xwariye ku wê Zînê bi jinîti nede tu kesî. Lewra qedexeyekê heye li ser Zînê.¹⁰³

43/47 Te'nê li Memê we reng eser kir
Yekcarî ji 'eqlî bêxeber kir

Behra dilê perde lê bi cûş hat
Nakami bi gazî û xurûş hat

Li vê derê Xanî jî diyar kiriye ku Mem dûrê aqil tevgeriyaye, yanî helwesteke wilo nîşan daye ku divê li pêş Mîr wilo helwest neyê nîşandan. Lewma ev yek jî di çaroveya bînpêkirina qedexeyên li huzûra Mîr de ye.

Encama vê bînpêkirinê bêguman ceza ye. Lewma Mîr ferman dide ku Mem biavêjin zindanê.

43/68 Mem girt û şihande pêşê serheng
Go: "Hebsi bikin di qulleya teng

Di van mînakên jorîn de, motîfa bînpêkirina qedexeyê û ceza, hinekî ji forma xwe ya çîrokî cudatir, di nava peywendiya bi rê û resmên fermî yên mîran û digel tebaya wan û rê û resmên huzûra mîran de, derketiye pêş me.

¹⁰³ Mem û Zîn, beşa 26an, beytên75-77

2.9. MOTÎFA CIVAKÊ

Li gorî tesnîfa Stith Thompson, di berhemên zargotinî de motîfa civakê, motîfeke bingehîn e ku di nava 23 motîfên sereke de cihê xwe digire. Ev motîf di binê sernava **Civakê** de, di herfa **P'yê** de hatiye qeydkirin.

Motîfên civakê di xebata Zeynelabidîn Zinar de, di beşên muxtelîf de hatine qeydkirin. **07: Qiral û Paşa, 18: Wezîr, 24: Xan, 30: Kole, 35: Axe, Beg û Mîr, 36: Rîspî.**

Dema ku em bala xwe didin destan û çîrokan û berhemên dî yên zargotinî; der bareyê avahîsaziya civakî ku hîmên maddî û manewî li ser wan hatine avakirin, em rastî gelek nuweyan tên. Bi rastî eger ku em, çîrokan weke navgîna sereke ya sîstema perwerdeya xwezayî ya civakê bibînin, em bi aşkerayî dibînin ku, di van berhemên de, der bareyê çînên civakê û çanda van çînan û sînorên wan ên di nava jiyana rojane de û her wiha der bareyê heq û huqûqa van çînan de, gelek agahî dertên pêş me ku, civakê bi rêya ev agahî, endamê xwe yên nûhatî ji qaîde û usûlên jiyana civakî re hazir kirine.

Xaleke balkêş ev e ku, di çîrok û destanan de her çendî leheng wekî kes an jî takekes dertên pêş me jî, bi rastî hemî karakterên di çîrok û destanan de, temsîla beşeke civakê, çîneke civakê yan jî meslekekî dikin. Vêca ku em bi awirekî dî li van berhemên zargotinî binihêrin; em di wan de rastî çîroka van çînan û beşên civakê tên.

Di çîrok û berhemên dî yên zargotinî de, ev temsîlên/çînên civakî, wekî gundî-bajarî, cotkar-zenetkar, padîşah-mirovê feqîr, padîşah-cotkar, mîr-parsek, tucar-cotkar, deştî-çiyayî, derwêş-mirovê feqîr, padîşah-derwêş, şêx, mela, dergevan, xizmetkar û hwd. derdikevin pêş me. Bêguman bi lêgerînên kûrtir mirov dikare vê tesnîfê firehtir bike.¹⁰⁴

Wekî ku em ji van nasnav û temsîlên civakî yên jorîn jî dibînin, her beşa civakê bi rengekî û li dû xwezaya karê xwe, di çîrok û berhemên zargotinî de cihê xwe digire. Ev çînên civakî jî, di çîrokên kurdan de, teqabulê sîstemekî statîk û neguhêrbar nakin bêguman. Yanî wekî ku li hin deran heye, di navbera van çînan de têkilî an jî bêtêklyeke tûj nîn e. Her wiha em di çîrokên kurdan de zêde rastî koleyan nayên. Ji ber ku ev sazûman di nava milletê kurd de rûneniştiye, em di çîrokan de jî rastî nuweyên wê nayên.

Dema ku em li van temsîliyetên civakî dinihêrin, bi giştî em dikarin wan ji aliyê statuya siyasî ve wekî rêveber û reaya, ji aliyê statuya civakî ve wekî zengîn û feqîr, ji

¹⁰⁴ Şukru Elçîn, Halk Edebiyatına Giriş, r.

aliyê pozîsyona dînî ve wekî şêx, mela û derwêş, ji aliyê meslekan ve wekî zenetkar, karker, cotkar, ji aliyê cinsiyetê ve wekî jin û mêr-xort û keç ji aliyê tecrubeya jiyane ve/temen ve wekî ciwan û kalemêr li hev dabeş bikin.

Di çîrokên li ser heywanan de, her çendî ku ne wekî van cure çîrokan be jî, statu heye. Wekî mînak tesewira şêr, rûvî, gur, qijak, hirç a di çîrokan de ne wekî hev in. Mirovan dema ku bi rêya çîrokan behsa wan kiriye, bêguman ji aliyekî ve li gorî tebîetê wan û tevgerên wan, lê ji aliyekî dî ve li dû tesewira xwe ya jiyana civakî, ew tesnîf kirine; hinekan kirine rêveber, hinekan kirine şêwirmend, hinekan bi karên wan ên nebaş, hinekan bi aqil û qurnazî û hinekan jî bi hêz û bêaqiliyê derxistine pêş.

Her wiha divê em bibêjin ku ev çîrok û berhemên zargotinî, bi giranî berhemên dema feodalîteyê ne. Civaka ku ew behsa wê ji me re dikan, bi giştî civaka feodal e.

Taybetmendiyeke vê motîfê ew e ku, ew li gorî çand û civakên cuda dibe ku di hin forman de biguhere. Lewra sîstemên civakî ji alî naveroka xwe ve pir bişibin hev jî, her civak li dû çanda ku jê hatiye, xwedî sazûmanên taybet e. Ali Berat Alptekin, li binê tesnîfa Thompson a civakê, çend tesnîfên dî jî dike.

1. Kraltî û esîlzadetî
2. Saziyên civakî yên dî (şêxî, ulemayî, begîtî)
3. Malbat
4. Merivantiyên dî yên civakî (eşîrî, êlî)
5. Kar û meslek
6. Îdareya desthelatdariyê
7. Adet û kevneşop
8. Curbecur motîfên dî yên civakê¹⁰⁵

2.9.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Civakê

Motîfa civakê an jî motîfên civakî, di destana folklorî ya Memê Alan de, bi curbecur rengan derdikevin pêş me.

¹⁰⁵ Ali Berat Alptekin, *Halk Hikayelerinin Motif Yapısı*, Weşanên Akçag, 1997

Li gorî kataloga Stith Thompson, di Destana Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî de xalên ku bi motîfa civakê re têkildar derketine pêş me, bi vî rengî ne:

- P0-P99:** Royalty and nobility/Kralî û esîlzadetî: Di hemî varyantên Memê Alan de Mem kurê Paşa an jî Padîşah e. Zîn jî xuşk an jî qîza Mîr e. Mem Prens e û Zîn jî Prens e. Her du jî hem ji nijada padîşahan in û hem jî esilzade ne; çînen herî jor ên civakê temsîl dikin.¹⁰⁶
- P10:** Kings/Padîşah: Bavê Mem padîşah an jî paşayê Muxurzemîn, Mixribiyan an jî Yemenê ye. Hemî varyantên Memê Alan.
- P30:** Princes/Prens/Mîrza: Mem prens e. Hemî varyantên Memê Alan.
- P40:** Princess/Prens: Zîn prenses e. Hemî varyantên Memê Alan.
- P250:** Brothers and sisters/Xuşk û bira: Mir Zeydîn û Stî û Zîn xuşk û bira ne. Gelek varyantên Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî
- P210:** Husband and wife/Jin û Mêr: Tacdîn û Sitî. Gelek varyantên Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî.
- P310:** Friendship/Hevaltî: Mem û Tacdîn/Hesen/Qeretajdîn; hemî varyantên Memê Alan û *Mem û Zîn*. Mem û Bengîn hevalê sadîq in; varyanta VI, R. Lescot.
- P320:** Hospitality/Mêvanperwerî: Mêvanperweriya Qeretajdîn/Hesen a ligel Memê Alan; hemî varyantên Memê Alan
- P710:** Nations/Netewe: Di varyanta R. Lescot û *Mem û Zîna* Xanî de xusûsiyetên netewebûna kurd, ereb, ecem û tirkan.
- Z210:** Brothers as heroes/Lehengên Bira: Qeretajdîn, Çekîn, Erfan sê birayên leheng in; hemî varyantên Memê Alan û *Mem û Zîn*.

Karakterên di destana folklorî a Memê Alan de û yên di *Mem û Zîna* Xanî de, digel ku bi nav û fonksiyonên xwe yek in, heman karakter in jî, di temsîla civakî ya van karakteran de, yanî di beşa civakê ku ev karakter temsîl dikin de, heman hevsengî nîn e. Wekî mînak, Tacdîn an jî Qeretajdîn, di varyantên folklorî de carina wekî serekê/pêşkêşê malbateke bi bela ku her kes ji wan ditirse, carina wekî serfermandarê Mîr, carina wekî giregirekî bajarê Cizîrê derbas dibe lê di *Mem û Zîna* Xanî de, ew wekî kurê wezîrê Mîr dertê pêş me.

¹⁰⁶ Bnr. Li Epîzota Mekan û Statuya Civakî Ya Lehengan.

Dîsa di mijara lehengên sereke yê destanê de jî, heman tevlihevî heye. Xanî di *Mem û Zînê* de, Mem wekî kurê katibê dîwana Mîr derdixe pêş me lê di tu guhertoyên Memê Alan de, agahiyeke bi vî rengî nîn e. Meseleya kîbûna Mem, di Destana Memê Alan de xaleke girîng e. Li gorî gelek varyantan; ew kurê Padîşahê Muxrubzemînê ye (Muxurzemîn, Muxrezemîn, Mixrîbiyan). Yanî ew lawê padîşahekî ye û ji derekî derveyê Cizîrê, ji dereke ji Cizîrê pir dûr hatiye. Di temsîliyeta Mem de, li gorî destana folklorî û varyanta Xanî cudahiyekê heye. Di destana folklorî de, ew ji çîna padîşah an jî kralan e lê di *Mem û Zîna* Xanî de ew bi tenê kurê katibekî ye. Lewma ev yek pozîsyona wî ya li hember Mîr diyar dike.

Yek ji jêdera nakokiya di navbera Mem-Tacdîn û Mîr de ev e ku, hem di varyantên folklorî de hem jî di *Mem û Zîna* Xanî de, Mîr bi kişekişên Beko, li ser gotinên Beko, ditirse ku Mem an jî Tacdîn (di *Mem û Zînê* de ji Tacdîn ditirse ku bikeve dewsa wî, di hin varyantên folklorî de ji Mem ditirse, ji ber ku ew lawê padîşahekî ye jê ditirse ku wê bikeve dewsa wî), wê statuya ku ew lê xwediye, ji dest wî bistînin. Mîr bi aşkerayî ditirse ku Mem an jî Tacdîn wê bikevin dewsa wî û mîranî ji dest wî biçê. Divê mirov vê yekê tesbît bike ku, di gelek destan û çîrokên de ev cure şer/nakokî dînamîkên girîng in û di heman demê de nuqteya tansiyonê teşkîl dikin. Her wiha di dîroka civaka kurd an jî mîrekiyên kurdan de, şerên bi vî rengî gelek in. Lewma, tezahurbûna vê yekê di destanan de, ne xerîb e.

Di destana folklorî de Zîn û Stî pirî caran wekî xuşkên Mîr, carina wekî qîzên Mîr û carina bi tenê Zîn yan xuşka Mîr yan jî qîza Mîr e, lê di hin varyantên folklorî de tu eleqeya hevsera Tacdîn (carina navê hevsera wî ne Sitî ye) bi Mîr re nîn e. Di *Mem û Zîna* Xanî de, Zîn û Sitî xuşkên Mîr in. Lê di her du halan de jî, di temsîliyeta Zînê de guhertineke mezin nîn e. Yanî ew di hemî varyantan de ji çîna esîlzadeyan e.¹⁰⁷

Yek ji girîngtirîn mijar, meseleya Beko û temsîliyeta wî ya civakî ye. Ji ber ku Xanî di vê mijarê de guhertineke mezin pêk aniye, ev yek tevlihevtir bûye. Li gorî nêrîna Xanî, Beko beşeke ji civaka kurdan (Botiyan) temsîl nake. Xanî, ew li derveyê civaka kurdan, wekî kesekî li ser zemînê karekî xerab rûniştî, daye nasandin û diyar kiriye ku hem Mîr ji vê yekê agahdar e û hem jî Tacdîn. Li gorî nêrîna Xanî, Beko ji *Mergeverê* ye ku hingê ev bajar di nava sînorên Sefewiyan de bûye. Her çendî ku îro li vê herêmê kurd dijîn jî, em nizanin ku di dewra Xanî de rewşa demografîk bi çi rengî bû. Bêguman em nizanin ku, Xanî bi kîjan saîkan ew ji wê derê nîşan daye. Belkî ev

¹⁰⁷ Bnr., Li beşa Muayese, epîzota Mekan û Statuya Civakî Ya Lehengan.

nêrîneke konjokturî a dewra Xanî be lê dîsa jî em nikarin ji sedî sed vê yekê bipeyitînin.¹⁰⁸ Divê em bibêjin ku di varyantên folklorî de, behsa şerên di navbera mîrekîyên kurdan û Sefewîyan de tê kirin. Tacdîn û birayên xwe, di van şeran de fermanarên artêşa Mîr in. Li hember ‘*Qizilbaşan*’ şer dikin. Her wiha di *Mem û Zîna* Xanî de jî di beşa 26an beyta 53yan de, Xanî balê kişandîye ser mêraniya Tacdîn û Mem a di şerê li dijî Qizilbaşan de. Heye ku sedema ku Xanî, Beko ji Mergewerê nîşan daye, ji hişmendîyeke bi vî rengî be jî.

Di guhertoyên destana folklorî de Beko, beşeke ji civaka kurdan temsîl dike. Di hin guhertoyan de, ew dewlemendekî bajarê Cizîrê ye, yanî ji çîna qatên jorîn e. Di hin varyantan de, ew bi tenê dergevan an jî şewirmendê Mîr e. Lê di hemî guhertoyan de jî Beko beşeke civaka kurdan temsîl dike. Heta li gorî varyanta IVan, ew bi navê *Qumsî Beko*, tevî Hesên, Qeretacdîn û Çeko, pismamê Zînê ye.

Di guhertoyên Memê Alan de, ji bilî van xalên ku me li jorê nîşan dan, mijareke dî ya ji aliyê motîfa civakê ve girîng ev e ku; di hin varyantên Memê Alan de (Varyant I, IX, XI, R. Lescot) Zînê, dergistiya/qelendayîya Çeko/Çekan ê birayê Qeretacdîn an jî Hesên e.¹⁰⁹ Lê di *Mem û Zîna* Xanî de rewşeke wiha nîn e. Ev yek xaleke girîng e û pir muhtemel e ku di varyantên herî kevnar de ev hebûye. Çunkî xusûsiyeteke wiha, li dû mantiqa zargotinê, dûre daxilê destanê nabe. Divê ev di varyantên herî kevnar de hebe. Lê ev yek di temsîla lehengê sereke Mem de, kêmahiyekê an jî nerewatiyekê peyda dike. Di nava civaka kurdan de, bi dergistiya yekî dî re eleqedarbûn, an jî li dû wê çûyin, ji aliyê exlaqî ve hem eybeke gelekî mezin e û hem jî dibe sedema şerên giran. Digel ku di varyantên folklorî de Çeko, di destpêkê de vê yekê, pir bi tabî’î; bi dijwarî û hêrseke mezin a li hember Mem pêşwazî dike jî, dûre li ser daxwaza birayê xwe yê mezin Qeretajdîn/Hesên, li hember vê yekê bêdeng dimîne, dipejirîne. Di destaneke wiha de, di şexsê lehengê sereke de (*Mem û Zîn*), rastî xusûsiyeteke wiha derveyê exlaqê civakê hatin, xaleke gelekî balkêş e. Ji aliyekî de siyekê dixê ser temsîliyeta wan a di destanê de û karaktera wan zêf nîşan dide, lê ji aliyê dî ve hêza evîna wan, an jî rewatiya evînê (ya di her halî de) bilind dike. Her wiha di varyantên folklorî de, em li derdora vê bûyerê, bêtir şahidî li têkiliyên malbatî û nav birayan dikin ku, di motîfa civakê de cihekî wan ê girîng heye. Mem ji ber ku xerîbê bajarê Cizîrê ye, Tacdîn berê soz dayê ku, dê her daxwaza wî bi cih bîne. Lewma dema ku hîn dike, daxwaza wî,

¹⁰⁸ Ji konjoktura wê demê mebesta me, konjoktura dijminahî û şerên mezhebî ye.

¹⁰⁹ Li dû varyanta Lescot navê wî Hesên e.

qelendayiya Çeko, Zînê ye jî ew jî pir li ber vî halî dikeve lê tu car teredud nake û ji soza xwe nayê xwarê.

Ji aliyê têkiliyên malbatî ve, yek ji ferqiyeta di navbera Memê Alana folklorî û *Mem û Zîna* Xanî de ev e ku; di hîç varyanteke destana folklorî de behsa hebûna lawekî Mîr nayê kirin lê li gorî *Mem û Zîna* Xanî, lawekî Mîr heye bi navê Gurgîn û ew hem dostekî zexm ê Mem e û hem jî serdarê xortên Cizîrê ye. Bi rastî digel ku Xanî pir behsa Gurgîn nekiriye jî, ew hinekî dişibe Begliyê ku di varyanta Roger Lescot û Bengînê ku di varyanta Vlan de derbas dibe û hevalê yekta yê Mem e, di heman demê de li bajarê Muxrezemîn serdarê xortan e. Di varyanta VIIIan de, du xortên ku hevalbendê Mem in hene û navê wan Bengîn û Gurgîn in. Heye ku Xanî ji Beglî/Bengîn, feyz girtibe û bi navguhartinê, ew kiribe Gurgîn û ji seraya padîşahê Muxrezemîn, anîbe seraya Mîrê Botan.

2.9.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Civakê

Li gorî tesewira Xanî, di pîramîda herî jorîn a civakê de padîşah û mîr rûdinên. Xanî dema ku behsa dewra ku ev destan pêk hatiye dike, ji bo hakimê Botanê hem têgiha padîşah bi kar tîne û hem jî têgiha mîr. Xanî ev çîna civakî, yanî padîşah û mîran bi giştî wekî, *hukkam* yanî yên ku hukum dikin, bi rê ve dibin, bi nav kiriye. Di tesewira Xanî ya civakî de, padîşah her tim ne tenê motîfeke civakî yê ku hukum dike ye; ew her wiha di wateya siyasî de wekî sembola azadbûna milletê, serdestbûna milletê ye jî.

5/8 Rabit ji me jî cîhanpenahek
Peyda bibîtin me padîşahek

Şîrê hunera me bête danîn
Qedrê qelema me bête zanîn

5/14 Ger dû hebûwa me padîşahek
Laiq bidiya Xwedê kulahek

Te'yîn bibûwa ji bo wî textek
Zahir vedibû ji bo me bextek

Hasil bibûwa ji bo wî tacek
Elbette dibû me jî rewacek

Xemxwarî dikir li me yetîman
Tînane derê ji dest leîman

Ev reng tesewira Xanî, bêguman tesewireke konjokturî ya wê demê nîşanê me dide. Her wiha em têdigihên ku Xanî, bi têgiha padîşah, ne tenê serfiraziya kesekî; ya miletekî û hemî beşên miletê qesd dike. Li gorî nêrîna wî, padîşah di radeya herî bilind de, temsîla hemî civakê dike.

Her wiha Xanî, nînbûna padîşahekî wekî eyba rêveberên civaka kurd dîtiye û gotiye ku, tu tawanê gel û rewşenbîran di vê yekê de nîn e.

5/20 Emma ji ezel Xwedê wisa kir
Ev Rom û Ecem li ser me rakir

Teb'îyetê wan eger çî 'ar e
Ew 'ari li xelqê namidar e

Namûs e li hakim û emîran
Tawan çî ye şa'ir û feqîran

Li gorî nêrîna Xanî, ji bo ku em civaka kurd wekî civakeke bêkêmahî bibînin, diviya ku padîşahekî vê civakê jî hebûya. Eger ku padîşahekî nîn be, ev tê wê wateyê ku kêmahiyeye vê civakê heye. Lewma Xanî, ji bilî nînbûna padîşahekî, dema ku hemî xusûsiyetên civaka kurd û ya miletê dî dide ber hev, dibîne ku tu kêmahiyeye miletê kurd nîn e, berevajî vê ew bi gelek aliyên xwe ji civakên dî zêdetir e. Lê dema ku 'padîşah' nîn be, ev hem di pîramîda civakê de valamayina beşeke girîng teşkîl dike û hem jî dibe sebab ku hemî başiyên dî jî hunda bibin an jî tune bîn hesabandin. Lewma divê 'padîshahek' hebe.

Belkî ji ber fikirîneke bi vî rengî be ku, Xanî dema ku behsa dewra pêkhatina Destana Mem û Zînê dike, hakimê wê dewrê wekî padîşah binav dike, digel ku dûre di gelek cihan de, em têdigihên ku ew ne padîşah e lê mîr e jî.

8/3 Go: “Padîşahek zemanê sabiq
Rabû di hukûmeta xwe faiq

Ecnasê milel mutî’ û munqad
Nesla wî ‘Ereb, emîrê Ekrad

Textê wî Cizîr û bexti mes’ûd
Tali’ qewî û meqami mehmûd

Rom û ‘Ereb û ‘Ecem di ferman
Meşhûri bi navê Mîrê Bohtan

Divê em vê yekê destnîşan bikin ku motîfa padîşah ku di çîrokan dertê pêş me, bi piranî di nava wateya ‘ew kesê ku an jî ew meqamê ku, di karîna bicihanîna her cure karî de tu sînor jê re nîn e, temsîla hêz û qudreta herî bilind e û temsîla dewelemendiyê ye’, de dertê pêş me.

Her wiha wekî ku di civakên dî de jî tê dîtin, hakimê welat di heman demê de xwedyê hemî mulk û malan jî tê hesibandin. Xanî jî di beşa 22yan de, dema ku pêşewayên Cizîrê diçin pêş Mîr, vê yekê ji devê wan bi vî rengî tîne ziman:

22/14 Kî ey waliyê mulk û mal û millet
Wey hamiyê dad û dîn û dewlet

Digel ku Xanî, wan xwedyê her tiştê li welat dibîne jî, ji aliyekî dî ve wan rexne dike û di heqê tebîeta vê çîna civakê de, wiha dibêje:

26/36 Ev ‘adete nîne xasê mîran
Nabînî li ber derê feqîran

Wan jî hemî paseban ji sa nin
Ew jî hemî qismê dergevan in

26/79 Hukkamî bi batin û bi zahir
Bê şubhe muşabih in bi agir

Zahir di sipahî û bi nûr in
Batin ji mudareê bi dûr in

Rehmê ku dikin ji rengê roj in
Qehrê ku dikin cîhan disoj in

Zînharî bi wan nekî tu bawer
Ger bab û pis û ger birader

Xasma ku meqrebê di bedxwah
Nêzîk-i bibin neûzû bîllah!

42/35 Hukkami ji cinsê şahimar in
Eshabê sumûm û muhredar in

Muhran ku didin bizan zehr e
Mihre ku dikin bizan qehr e

Xanî civaka kurd ji aliyê sazûmana wê ve, wekî ji êl û eşîran û qebîleyan pêkhatî dîtiye ku ev di heman demê de, di zanyariya civaknasiyê de jî îşareta dewra feodalîte û civaka feodal dike.

5/34 Her du terefan qebîlê Kurmanc
Bo tîrê qeda kirine armanc

Goya ku li serhedan kilîd in
Her taîfe seddek in sedîd in

5/39 Ev xetm e ji bo qebîlê ekrad
Wan dane bi şîrê hîmmedê dad

41/17 Eqwam û qebail û ‘eşair
Bîlcumle bezîne def’ê agir

Xanî di rengê niştecihbûnê de jî civaka kurd li du beşan veqetandiye; bajarî û gundî. Xanî di beşa pîrozbahiyên Newrozê de, vê yekê tîne ziman ku hem bajarî û hem jî gundî heman cejnê, bi heman formê pîroz dikin. Yanî ew xwedî çandê hevpar in.

12/2 Mebna li wî adetê mubarek
Şehrî û sîpahiyan bi carek

22/76 Alem hemî bûye ‘îşretabad
Şehrî, bedewî, ‘ebîd û azad

Her çendî ku Xanî di vê beyta jorîn de behsa koleyan kiriye jî (ebîd), di dîrokê de em rastî çîneke bi vî rengî di nava civaka kurdan de nayên. Belkî li vê derê ji ‘ebîd, mebesta Xanî, yên ku di xizmeta mîran û began de ne, ye.

Xanî di curbecur beşên *Mem û Zînê* de, di çarçoveya îdeala xwe ya wekheviyê de, civaka kurd bi renekî gelekî zindî teswîr kiriye. Ev taybetmendiya ramana Xanî, di gelekî beşên *Mem û Zînê* de, bi taybet di demên merasîmên civakî wekî, Cejna Newrozê, dawet, merasîma nêçîrê û şîna *Mem û Zînê* û di nêrîna wî ya li evînê de, dertê pêş me. Li jêrê em ê çend mînak ji vê yekê re bidin.

8/62 Ger şêx in û ger mela û mîr in
Derwêş û xenî û ger feqîr in

Kes nîne ne talibê cemalê
Kes nîne ne raxibê wîsalê

Di van beytên jorîn de Xanî behsa curbecur çînen civakî kirine û xwestiye bibêje ku; ku mebesta jiyanê, hezkirin an jî gihaştina xweşîkiyê be, di rastî de her kes di heman radeyê de vê dixwaze. Lewma di meseleya evînê de, çîneyetî nîn e; her kes wekhev e.

10/16 Emma ji cumle xas û ‘aman
Ji ew çend bira û bab û maman

Lawek kiribû bira ji bo xwe
Nê ez xelet im çira ji bo xwe

19/17 Begzade ne ew, ‘elî meqam in
Cundî neseb in ew ya ‘ewam in

19/21 Begzade ye yek ji neslê mîran
Yek jî bi neseb kurê debîran

Di van beytan de Xanî behsa nesebiyetê dike ku, di sazûmana feodalîteyê de ev faktor, di statuya civakî de xwedî wateyeke girîng bû. Esîlzadetî, begzadetî faktora herî sereke ya diyarker bû di statuya civakî de. Em têdigihên ku Xanî, ji têgihên *Xas* û ‘*Am*, (bijarte/elîf û ji rêzê) xwestiye ku, vê nesebiyeta feodalîteyê bi bîr bîne. Her wiha ji beytên jorî em dibînin ku, di nava civaka kurdan de, tiştên ku têkiliya di navbera du kesan de diyar dikin, ne ev faktor in. Yanî nesebiyet, esîlzadetî û elîtbûn, ne asteng in li pêş têkilî pêşxistina bi beşên curbecur ên civakê re. Dîsa têgiha ‘biratî’ (ne biratiya nesebî; ya manewî) an jî bi pênaseyeke di ‘destbirakî’, di wê dewrê de jî eynî mîna îro, têkiliyeke bi qîmet bû û hurmet lê dihate kirin. Lewma têkiliya Tacdîn û Mem, ku Xanî wê weke têkiliyeke îdeal nîşan dide ji bo civakê, ji hemî berjewendiyan bêrî, li derveyê hemî prensîbên nesebiyet û feodalîteyê, bi tenê xwe dispêre têgihên mîna durustî, fedekarî û sêdaqetê. Jixwe Xanî dûre, di beşên ku Mem di zindanê de ber bi mirinê ve diçe, cardî tîne bîra me ku ev hemî statuyên civakî, ku civak di zahirî de pir rêz û îhtîram nîşanî wan dide, di rastiye de weke leyistikekê ne û tu hukma wan nîn e. Hemî ‘*betal û bêbeqa ne*’. Yanî ew bi awayekî dijayetiya xwe ya li hember sazûmana feodalîteyê û prensîbên nesebiyetê nîşan dide.

Di van beytên jêrîn de, em bi teswîra Xanî, di heqê civaka wê demê û hin xusûsiyetên taybet ên hin beşên civakê de; wekî mîran, wekî dergevanan û hwd. digihên agahiyan. Di nava civaka kurdan de beşên wekî mîr, ulema (pêşewayên dînî), umera (rêvber), bajarî, gundî, koçer, şêx, mela, derwêş, feqîr, zengîn, parsek, dergevan, leşker, cindî, esîlzade û yên ji rêzê, qewraş, xizmetkar, xulam, jinperest û lawperest dertên pêş me.

19/25 Şêxê tu dizanî ev Cizîr e
Têk de kubera û girdemîr e

22/12 Hindek ‘ulema û hin di ‘adil
Hindek umera û hin di cahil

Rabûne ve cumle çûne nik Mîr
Ev reng e kirine qediyîye teqrîr

22/27 Mecmû’ê mela û şêx û mîran
Axa û ekabir û feqîran

Vêkra bi devê xwe sena kir
Têkda bi dilê xwe wan du’a kir

23/64 Xêzan û geda we bûne mun’em
Muflîs bûne zenperest û muxlem

Xêzan û geda, xenî û zengîn
Şadan û hezîn û şa û xemgîn

Êdî nedibûn ji hev muşexxes
Te digo hemî mîrek in murexxes

Têkda di munasib û muwafîq
Vêkra di musafih û mu’aniq

26/30 Hindî bi hukûmetê dikin dewr
Geh ‘edl e ji bo kar û geh cewr

Her çendî Bekir weledzîna ye
Aşê me bi wî fetl û ba ye

Ev zumre ku zalim û ‘ewan in
Sûbaşî û şehne, dergevan in

Aşê di me zaliman digêrin
Dexlê di mezaliman digêrin

43/54 Wî gote qebîleya xulaman
Win bo çi gelf nemekheraman

48/10 Lew lazim e hakimî du fincan
Yek xasê xirab û yekê qencan

49/18 Mîrin hene 'aql in 'ezîz in
Lê sadedil in û bêtemîz in

49/31 Ev mîr û wezîriya cîhanî
Ev begmekizîriya zemanî

52/74 Ez naçime hezreta tu mîran
Ez nabime bendeê esîran

Ev mîr û wezîriya mecazî
Ev şe'bede û xeyalibazî

Bîlcumle betal û bêbeqa ne
Bêaqîbet in hemî fena ne

55/13 Cindî û sîpahî û emîran
Derwêş û re'îye û feqîran

2.10. MOTÎFA MIRINÊ

Motîfa mirinê di Motif Indexa Stith Thompson de, di nava motîfên esasî de, di bin herfa **E: Mirin**'ê de hatiye qeydkirin. Lê di beşên **F: Derasayî**, **M: Tayinkirina Pêserojê**, **N: Siûd û Qeder**, **S: Zulmên Anormal** de jî derdikeve pêş me.

Ev motîf di xebata Zeynelabidîn Zinar de, wekî hevbeşiyê sereke ya di çîroka kurdî de, di hejmara **133**yan de, bi sernava **Mirin** hatiye qeydkirin.

Motîfa mirinê, di xelesa *zayin*, *zewicîn* û *mirinê* de xelesa dawîn teşkîl dike. Ev her sê xaçerê, di zargotinê de wekî *Dewrên Derbasbûnê* hatine binavkirin. Mirin, xelesa dawîn a vê sêyemê ye.¹¹⁰

Lêkolîner Abdulbasit Sezer ji bo van her sê xaçerêyan wiha nivîsiye.

“Di jiyana mirovan de sê demên derbazî hene. Ev sê dewr, welidîn, zewicîn û mirin in. Her yek ji van di zikê xwe de li hin beş û pêlikên jêrîn vediqetin. Li derdora van her sê serdeman, gelekî bawerî, kevneşop, tore, merasim, ayin, hin karûbarên dînî û efsûnî kom dibin. Ev her sê xaçerê, li gorî qalib û hêviyên ku ji çandên ku bi wan ve girêdayîne, bi rêbazeke seza tên birêxistin.”¹¹¹

Di çîrokên gelêrî û destanan de, di encama bûyeran de du rewşên cuda derdikevin pêş me. Yek jê gihastina hev a evîndaran û zewicîna wan e. Ya duduyan jî mirin e. Ji van her du encaman yek jê “muqedder”e, cureyeke çarenûsa jênager e. Di encama lêkolînan de, em lê rast nehatine ku ji evîndaran yek jê miribe û yê dî an jî ya dî sax mabe.¹¹² Bi piranî eger ku evîndar ji hev dûr bin, dema ku agahiya mirina hezkerî tê bihîstin, ê/a dî jî dimire.

Di nava çîrokên cîhanê de çîrokên mîna Leyla û Mecnûn, Mîhr û Muşterî, Romeo û Juliet ji bo vê yekê mînak in. Mecnûn li ser agahiya mirina Leyla tê ser gora Leyla û ew jî li wê derê dimire. Mîhr nexweş dikeve û dimire û Muşterî pir li ber mirina wî dikeve û ew jî dimire. Cenazeyê her duyan bi hev re radikin. Li ser mirina Jûliet, Romeo jî jehrî vedixwe û dimire.

Di destanên civaka kurdan de jî em rastî van her du rewşên cuda tînin. Di hin destanan de leheng digihîjin hev û dizewicin; wekî Cembelî û Binevşa Narîn. Lê di

¹¹⁰ A. Sezer, Murathan Mungan ve Halk Bilimi, r.

¹¹¹ A. Sezer, *M. Mungan ve H. Bilimi*, r, 258

¹¹² Bi tenê li dû hin varyantên Ferhad û Şîrîn, piştî mirina Ferhad, Şîrîn bi Perwîz re dizewice lê ev bi tenê varyanteke vê çîrokê ye. Her wiha di hin varyantên Destana Zembilfiroş de jî ev rewş heye.

gelek destanan de jî leheng an bi hev re dimirin an jî li dû hev dimirin. Wekî Memê Alan, Siyabend û Xecê, Derwêşê Evdî û Edûlê.

Dema ku em bala xwe didin van her sê destanan û hin varyantên Destana Zembifiroş, balkêş e ku di hemiyana de jî pêşî lehengê mêr dimire û dûre lehenga jin wekî nîşaneyê girêdayina wê ya bi wê evînê re, ew jî dimire. Di Memê Alan de, pêşî Mem dimire û dûre Zîn li ser gora wî dimire. Di Siyabend û Xecê de, pêşî Siyabend dimire û dûre Xecê jî xwe diavêje wê kortala bêbinî û ew jî dimire. Di Derwêşê Evdî û Edûlê de, pêşî Derwêş dimire û dûre bi bihîstina agahiya mirina wî re, Edûlê jî xwe dikuje.

Lêkolîner Zeynelabidîn Zinar, der bareyê mirina ku di çîroka kurdî de derdikeve pêş me de weha gotiye:

“Di Çîroka Kurdî de devera dawîn mirin e. Çawa ku mirin zagona jiyane ye, lehengê çîrokê jî her tim xwe ji mirinê re amade dike. Pir îş hene ku ew dizane jî dê jiyana wî tê de bigihîje dawiyê, dîsa jî ew bê tirsê ji mirinê dike. Ji vê yekê jî zêdetir ev yek jî pir balkêş e ku dema lehengê çîrokê diçe rêyeke dûr, diya wî yan bavê wî yan jî yeke/yekî din jî ku pir çavênîya wî dike û ji bo wî nexweş dikeve, heta ku dimire jî, leheng nayê. Lê dema ku leheng tê, pêşî diçe serdana gora wan miriyên xwe û tiştêkî xêra wan li jar û belengazan belav dike.”¹¹³

Wekî ku em ji pênaseya Zinar jî têdigihên, mirin; prosesa dawîn a çîrokê teşkîl dike. Wekî ku me li jorê jî gotibû; sê dewrên esasî hene di çîrokan de. I. Hatina dinyayê ya leheng. II. Zewaca (an jî evîna) leheng. III. Mirina leheng.

2.10.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Mirinê

Li gorî kataloga Stith Thompson, di Destana Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî de xalên ku bi motîfa mirinê re têkildar derketine pêş me bi vî rengî ne:

S111: Murder by poisoning/Mirina bi rêya jehrîdayinê: Mem bi jehriya di nava hinarê de dimire; varyanta R. Lescot.

¹¹³ Z. Zinar, *Şaxên Zanistiyê*, r. 139

N343.4: Commits suicide on finding beloved dead/Li ser dîtina hezkiriya/ê mirî xwekuştin: Zînê dema ku dibîne Mem miriye, xwe bi ser de davêje û dimire: varyant; VII.

F1041.1.2.1: Dies beside dying sweetheart/Li kêleka xoşevîstê/a mirî mirin: Zînê li ser gora Mem dimire (Li gorî varyanta VIIan li ber cenazeyê Mem dimire); hemî varyant û *Mem û Zîna* Xanî.

E419.6: Buried apart found in one grave/Ji hev cuda definkirin lê di yek gorê de ew dîtin: Mem û Zîn di gorên cuda de tîn definkirin lê dema ku gora wan vedikin tê dîtin ku, Zînê di gora Mem de ye; varyanta V, VII.

M369.2.2: Not destined to meet in life, faithful after death/Di jiyânê de negihaştina hev lê piştî mirinê gihaştin; hemî varyanên folklorî û *Mem û Zîna* Xanî.

E631.0.1: Twining branches grow from graves of lovers/Bilindbûna du şaxan ji ser gora evîndaran; *Mem û Zîna* Xanî.

E631.1.2: Rose, from grave/Gul, li ser gorê hêşîn dibe: Piştî mirna Mem û Zînê du gul li ser gora wan hêşîn dibe; varyant: VII, VIII, X.

Di gelek destan û çîrokan de lehengê jin û mêr, yanî evîndar li kêleka hev hatine binaxkirin. Çawa ku di destanên Leyla û Mecnûn û Mîhr û Muşterî de wilo ye, di destana folklorî a Memê Alan û *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî de jî rewş bi heman rengî ye.

Di Destana Memê Alan de, cudahiyeke vê motîfê heye ku di destanên dî de pir dernakeve pêş me. Li gorî hin varyantên Memê Alan, Mem û Zîn di du gorên cuda de lê li kêleka hev hatine definkirin. Lê li gorî hin varyantan, pêşî Mem dimire û dûre dema ku Zîn li ser gora wî dimire, gora wî ji nû ve vedikin û Zînê jî di gora wî de defin dikan.

Şînbûna du giya an jî du daran ji ser gora evîndaran bi motîfa mirinê re têkildar e. Di destana Siyabend û Xecê de jî em rastî heman motîfê tîn. Piştî ku Siyabend û Xecê dimirin, du giya an jî dar ji cihê ku ew lê dimirin hêşîn dibin. Di destanên Anatoliyayê de jî ev rewş heye. Di destanên *Tahir û Zuhre* û *Arzû û Kamber* em rastî heman motîfê tîn.

2.10.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Mirinê

Di *Mem û Zînê* de, balkêşiya herî girîng a vê motîfê ev e ku, her du leheng, yanê Mem û Zîn, di heman gorê de hatine definkirin. Ev yek di beşa 51an de bi wesiyeta Zînê derdikeve pêş me. Li gorî *Mem û Zîna Xanî*, hê berî ku Mem bimire, Zînê bi cureyeke kehanetê, vê yekê ji pêş de dîtiye; yanî dîtiye ku wê Mem bimire û dûre wê ew jî bimire. Lewma ji Mîr xwestiye ango lê wesiyet kiriye ku, her duyan di gorekî de li kêleka hev, bê perde veşêre.

51/62 Der heqqê min û Mem nekî ‘ar
Gava dimirit Memê birîndar

Ez dê bi cenazeê wî ra bim
Heta vige meqberan teba bim

Weqtê dimirim bidî tu destûr
Da min bikin digel wî mestûr

Min j’alî wî derbider negêrî
Bêperde digel wî min veşêrî

Piştî mirina Zînê, li ser wesiyeta wê Mîr, gora Memê ji nû vedike û Zînê di gora wî de, li kêleka wî defin dike.

55/51 Ew her du guher di durcekê da
Ew şems û qemer di burcekê da

Bê wasîte wan kirin muqarin
Bê fasîle ew bi hev siparin

Hasil vekirin ji nû ve sendûq
Mîr gote Memê: Ji bo te me’şûq

Sê carî ji qalibî seda hat
Awazî bi lefzê “merheba” hat

Em dikarin vê taybetmendiya motîfa mirinê ji aliyekî dî ve, li trajediya giran a Mem û Zînê û evîna wan a xurt şîrove bikin. Lewra li hemberî neheqîya ku li wan hatiye kirin, civakê helwesteke wilo nîşan daye ku, digel ku di nava baweriyên dînî û civakî de cih ji tiştêkî wilo re nîn be jî, di hafîzeyê civakî de, yanî di destana ku civakê li dû evîna wan a xurt û trajediya wan a mezin afirandiye de, ew bi rengêkî ku hêç jî hev û du veneqetin, gihandine hev û di gorekê de, di hemêza hev de defînkirî, tesewir kirine.



2.11. MOTÎFA KORDÛNETÎ Û YEKZAROKIYÊ

Ev motîf, di Motif Indexa Stith Thompson de, di beşên **Sêhr û Cinsiyetê** de di binê herfên **D û T**'yê de hatine qeydkirin.

Motîfa Kordûnetî, di xebata Zeynelabidîn Zinar de, wekî hevbeşiyêke çîroka kurdî, di hejmarên **90 û 91**an de, di binê sernava **Zilamê Kordûnde û Dermanê Zarokanînê** de hatiye qeydkirin.

Folklornas Şükrü Elçin, ji bo vê motîfê weha nivîsiye:

“Bi piranî çîrokên evînê bi vî rengî dest pê dikin: Padişah an jî Xanekî-Mîrekî di nava endîşeya bêzarokî an jî bêkuriyê de ye ku, wê piştî mirina wî tac û textê wî û mal û mulkê wî ji kê re bimîne.”¹¹⁴

Lêkolîner Zeynelabidîn Zinar, li ser vê motîfa ku di çîroka kurdî de derdikeve pêş me wiha nivîsiye:

“Di gelek çîrokan de (çîrokên kurdan) tê gotin ku paşayekî, kralekî an jî zilamekî pir dewlemend heye ku kurdûnde ye; ji dola wî ne zarok çêbûne û ne jî pismamekî wî heye. Ha ew bi wî awayî jiyana xwe domandiyê heta ku ew kal bûye û jina wî jî pîr bûye.

Ji bo dermanê anîna zarokan sêv, dermanekî pir girîng e. Ew di heman demê de nîşana xweşî, şadî û evîndariyê ye.”¹¹⁵

Di zargotina gelekî civakan de her wiha di zargotina civaka kurdan de jî, ev motîf, motîfeke pir berbelav e. Di hundirê vê motîfê de, peyamên pir ziravbihîstiyar ên çanda civakî hene. Balkêş e ku her tim, ê ku nikare bibe xwedî zarok an jî kur, yan kral e yan padişah e yan mîr e û yan jî dewlemendekî ye. Li vê derê, di navbera du rewşên jêknegir de, peyama civakê ew e ku; tu her çendî mezin, dewlemend û bi qudret dibî bibe, lê car heye ku xweda an jî xweza dikare te ji karînekî herî asayî jî bêpar bihêle. Lewma ne di îdîaya mezinahiyeke vala û bêkêr de be.

Wekî ku li jorê em ji pênaseya Şükrü Elçin jî têdigihên, di bingeha vê motîfê de, tirsê ku wê tac û text an jî mal û mulk ji kê re bimîne, heye. Vêca di piraniya çîrokên bi vî rengî de, dema ku ew extiyar dibin, bi rêyeke derasa dibin xwedî zarok. Carina Xocê

¹¹⁴ Ş. Elçin, *Kerem ile Aslı Hikayesi*, Weşanên Akçag, Ankara, 2000, r. 20

¹¹⁵ Z. Zinar, *Şaxên Zanistiyê*, r. 130

Xizir dertê pêş wan û sêvekê dide wan, carina derwêşekî dertê pêş wan û tarîfeke bi efsûn dide wan û ew wilo bi rengêkî mûcîzeyî dibin xwedî zarok. Wekî mînak di dîroka dîn de, çîroka Hz. Îbrahîm jî bi vî rengî ye. Ew digel ku ew çend kal bûye jî nebûye xwedî zarok. Piştî sedsaliya xwe bi rengêkî mûcîzeyî dibe xwedî zarok.

Her çendî ku Şükrü Elçin behs nekiriye jî, endîşeyeke dî ya ku di tezahurkirina vê motîfê de xwedî roleke girîng e; endîşeya berdewamkirina neslê xwe an jî mayendekirina zuriyeta xwe ye ku ev meyleke bingehîn a xwezaya mirov e. Vêca sedema trajîkbûna vê motîfê jî ew e ku, ew di çîrokan de di mirovê ku herî zêdetir nesla xwe an jî nijada xwe pak û bilind dibîne de, dertê pêş me. Yanî ew mirovê ku, xwedî mal û mulk e û nesla xwe, nijada xwe wekî bijarte û bilind dibîne, yekcar ji îmkana berdewamkirina vê nesla ji wî tirê pak, bêpar dimîne. Lewma gera wî ya çareserkirina vê problemê bi zehmet e û çareya wê jî pirî caran derasa an jî mûcîzeyî ye.

Jixwe yek hêmana ku di trajîkbûna çîrok û destanên bi vî rengî de rol dilîze jî, ev motîfa destpêkê ye. Ji ber ku ew kur di encama lêgerîneke bi zehmet û çareyeke derasa de hatiye dinyayê; ew lawê xweşdivî ye. Ew ne yekî ji rêzê ye. Sedemên lehengbûna wî, hê berî ku ew bê dinyayê, peyda bûne. Û dema ku ev leheng, wekî Memê Alan, dixwaze bikeve rêyeke ku encama wê ne diyar e û tije xetere ye, rastî astengiyên pir mezin tê ji aliyê kral an jî padîşahan ve.

Di destanên Wamiq û Ezra û Mîhr û Muşterî de em rastî vê motîfê tên.

2.11.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Kordûndetî û Yekzarokî

Di Destana Memê Alan de motîfa kordûndetî û yekzarokiyê, wekî ku folklornas Şükrü Elçin jî gotiye; di destpêka destanê de, di nava endîşeya ku wê text û tac û mulk ji kê re bimîne de, derdikeve pêş me.

Li gorî kataloga Stith Thompson, xalên ku bi vê motîfê re têkildar, di Destana Memê Alan de derketine pêş me bi vî rengî ne:

D1500.1: Barrenes removed by charms/Kordûndetîya ku bi rêya sêhran derbas dibe: Xocê Xidir sêva bi efsûn dide bavê Mem da ku bixwe û ew wilo ji kordûndebûnê xelas dibe û dibe xwedî zarok; varyanta R. Lescot. Şêx di xewnê de çar melayiketan dibîne û ji wan rêya xwedî zarokbûna bavê Mem ê kordûnde hîn dike; varyanta IV.

D1925.1: Barrenness removed by eating or drinking/Kordûndetiya ku bi rêya xwarin û vexwarinê derbas dibe: Bavê Mem bi xwarina sêvê ji kordûndebûnê xelas dibe; varyanta R. Lescot

D2161.3.11: Barrenness magically cured/Kordûndebûna ku bi sêhrê tê başkirin: Kordûndebûna bavê Mem ji aliyê Xocê Xizir ve bi rengê sêhrî tê tedawîkirin; varyanta R. Lescot

T500-T599: Conception and births/Hemîletî û welidîn.

T510: Miraculous conception/Hemîlebûna derasa: Diya Mem kefa ava behrê dixwe û jê hemîle dimîne; varyanta X.

T512.3.1: Conception from drinking holly water/Bi vexwarina ava pîroz hemîle mayin: Diya Mem ji kefa ava behrê hemle dimîne; varyanta X.

Di hemî varyantên dî de û di *Mem û Zîna* Xanî de Mem kurê tekane ye lê di *Mem û Zînê* de behsa welidîna wî nehatiye kirin.

Li gorî varyanta Roger Lescot, Elî Beg û Emer Beg û Elmaz Beg sê birayên ku Mîrên bajarê Mixribayan in. Digel ku hemî welat ê wan e jî, tu yek ji wan xwedî zarok nîn e. Rojekê, Xocê Xidir li wan rast tê, dilê wî bi halê wan dişewite û sêvekê ji paşila xwe derdixe û dide mezinê birayan Elî Begê. Li ser vê yekê zarokê Elî Begê çêdibe ku dûre navê Mem lê dikan.

Di varyanta çaran (IV) de, bavê Mem Şîrîn Alman û apên wî Rîcal Hesen û Şêx Îbrahîm, her sê jî kordûnde ne. Bavê Mem piçûkê her sê birayan e. Li ser xewna Şêxê Hunkarî, ew bi qîza Şêxê Qureyşîyan re dizewice û encax wilo zarokê wî çêdibe.

Dema ku em bala xwe didin çîrokên bi vî rengî, em dibînin ku li dû motîfa kordûndebûnê, bi alîkariya Xocê Xizir an jî Derwêşekî, zarokê tê dinyayê ku ew lehengê destan an jî çîrokê ye. Yanî li pey motîfa kordûndebûnê, motîfa yekkuriyê tê. Û jixwe hem derasabûna destan û jiyana leheng û hem jî bingeha trajediya destanê bi vî rengî dest pê dikan. Di hemî varyantên dî yên Memê Alan de, rewş li gorî guhertoyan kêr zêde, bi vî rengî ye. Lê di *Mem û Zîna* Xanî de, em rastî motîf kordûndetiyê nayên. Di *Mem û Zîna* Xanî de, motîfa yekkuriyê dertê pêş me.

2.11.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Yekzarokiyê

Di *Mem û Zîna* Xanî de, em di beşên destpêkê de têdigihên ku Mem, wekî ku di varyantên otantik de derbas dibe, hê ji hatina dinyayê de serboriyeke wî ya derasa nîn e.

Tacdîn wekî ku di destana folklorî de jî derbas dibe, yek ji giregirên bajarê Cizîrê ye, heta li gorî hin varyantan, ew serfermandarê artêşa Mîr e jî. Her wiha du birayên wî yên dî jî hene bi navê Arif/Erfan û Çeko/Çekan. Di *Mem û Zîna* Xanî de jî em bi heman rengî rastî giraniya Tacdîn tî. Ew dîsa yek ji mezinên Cizîrê ye û du birayên wî hene bi navê Arif û Çeko. Yanî ew sê bira ne ku ev yek ji aliyê folklorê û motîfên çîrokên ve, xwedî wateyeke taybet e.

Lê di rewşa Mem de, li gorî varyantên folklorî û *Mem û Zîna* Xanî, cudahiyeke berbiçav heye. Mem dîsa lawê xweşdivî ye, yê tekane ye lê ji ber ku Xanî ew ji bajarê Mixribiyan aniye bajarê Cizîrê, wekî ku malbata wî jî li wê derê hiştibe, di prosesa destanê de, ne di destpêkê de û ne jî di encamê de, em tu mudaxeleya malbata Mem nabînin. Xanî bi tenê bi vî rengî, di beytekê de behsa malbata Mem kiriye:

10/23 Tacdîn weledê wezîrê dîwan
Mem jî xelefê debîrê dîwan

Wekî ku em ji van beytan têdigihên, Mem kurê katibê dîwana Mîr e. Ew kurê tekane ye, tu birayên wî nîn in. Lê dûre di prosesa ketina Mem a zindanê de û di pêvajoya şîna wî û piştî mirina wî jî em bi tu rengî rastî nîşaneyê ji malbata wî nayên. Lê di varyantên folklorî de, di destpêka hemî varyantan de em malbata wî dibînin û li gorî hin varyantan, piştî agahiya mirina wî digihê bajarê Mixribiyan, bavê wî tevê artêşa Mixribiyan tê, Tacdîn jî xwe dide aliyê wî û bi hev re heyfa Mem ji Beko û Mîr distînin.

Dema ku em motîfa kordûndetî û yekzarokiyê bi wateya wê ya di nava prosesa destan an jî çîrokê de destnîşan bikin, em dikarin proseseke bi vî rengî formule bikin:

Kordûndebûn, li Xocê Xizir (li Derwêş) rasthatin, sêveke bi efsûn (an jî tarîfeke dî ya bi efsûn) jê girtin û xwedî zarok bûn, prosesa pêkhatina vê motîfê teşkîl dikin. Ev hemî, di heman demê de îşaret dikin ku, leheng di nava şertên derasa de hatiye dinyayê. Lewma ev derasayî hem sedema lehengbûna wî û hem jî jêdera trajediya wî ye.

2.12. MOTÎFA GUSTÎLIKÊ

Ev motîf di Motif Indexa Stith Thompson de di beşên muxtelîf wekî **H: Îmtîhan**, **F: Derasayî**, **T: Cinsiyet** de hatiye qeydkirin.

Motîfa gustîlikê, wekî hevbeşiyêke çîroka kurdî, di xebata Zeynelabidîn Zinar de, di binê sernava **Gustîl** de, di hejmarê **61**an de hatiye qeydkirin.

Di berhemên zargotinî de motîfa gustîlikê bi çend rengên cuda dertê pêş me. Carina ew wekî nîşaneyê evîn û sêdaqetê, carina wekî navgîneke ku hezkirî pê hev nas dîkin û carina jî ew temsîla hêz û qudretê ye. Di çîrokan de carina em gustîlikên bi efsûn dibînin ku ew hêzeke derasa didin xwediyê xwe. Di çîrokên bi vî rengî de gustîlik, motîfa hêz û derasayiyê ye.

Li ser taybetmendiyê gustîlika ku di çîroka kurdî de derdikeve pêş me, Zeynelabidîn Zinar wiha gotiye:

“Ji bo lehengê çîrokê, bûjeneke/maddeyêke pir nirxdar û bikêrhatî ye. Çi dema ku leheng dikeve tengasiyan, gustîla di tiliyê xwe de badide, pêre pêre du efrît li ber wî hazir dibin û çî tiştê ku ew bixwaze, mîna daxwaza wî çêdikin”¹¹⁶

Dema ku serekeşîrê Şikakan, Xecê direvîne û wê mecbûrê bi xwe re zewicîne dike, Siyabend bi rêya pîrejînekê gustîlika xwe di nava taseke şîr de jê re dişîne û Xecê pê haydar dibe ku Siyabend li nêzî wî ye.¹¹⁷ Di gelekî varyantên Memê Alan de, qîza Beko ya remilvan xwe wekî Zîna hezkirîya Mem bi Mem dide naskirin lê dema ku Mem gustîlikê di tiliya wê de nabîne têdigihê ku ew ne Zîn e.

Di mînakên jorîn de gustîlik wekî nîşaneyê ji hezkiriyê û navgîneke naskirinê dertê pêş me. Lê motîfa gustîlikê di tîgîha ‘Xatema Suleyman’ de, bi taybetî di berhemên klasîk de, bi wateyêke dî derdikeve pêş me. Ew wekî motîfa dewlemendî û bêbuhayiyê derdikeve pêş me.

Li ser ‘Xatema Suleyman’ curbecur efsane hene. Li dû hin rîwayetan, Xweda, ev gustîlik wekî xelatekê daye Hz. Suleyman. Hz. Suleyman bi saya vê gustîlikê li artêşa cinan, li bayê û li teyran hukum dike. Li dû efsaneyêke dî, li ser vê gustîlika bi navê Xatema Suleyman, ‘*Îsmê Azam*’ ê xweda heye, yanî navê herî mezin ê xweda

¹¹⁶ Z. Zinar, *Di Çanda Kurdî De 37 Şaxên Zanistiyê*, Weşanên Pencînar, r. 125

¹¹⁷ Bnr., Celîlê Celîl-Ordîxanê Celîl, *Zargotina Kurdan*, r. 118-149

heye û Hz. Adem ev gustîlik ji bihiştê aniyê. Suleyman bi saya vê gustîlikê li her tiştî hukum kiriye.¹¹⁸

Li gorî baweriyekê, cihê ku Mîhrê Suleyman, yanî Gustîlika Suleyman lê ye, ji şeytan an jî xerabiyên hatiye paqijkirin. Şeytan an jî xerabî nikare xwe nêzî wî cih û warê ku gustîlik lê ye bike.

Li gorî hin varyantên Memê Alan, dema ku perî biryar didin ku Zînê ji Cizîra Botan bibin bajarê Mixribiyan, vî navê xweda, 'îsmê 'ezîm' dixwînin û encax bi wî rengî dikarin wî karê sêhrî pêk bînin.

Ji bilî van wateyên xwe, motîfa gustîlikê di çanda gelêrî de hê jî zindî ye. Dema ku du ciwan bînin merheleya zewacê, berî ku bizewicin, di wateya *nîşanîbûnê* de, her du alî gustîlik dixin tiliyên hev.

Ev hemî mînak nîşan didin ku, motîfa gustîlikê hem ji aliyê çanda gelêrî ve ham jî ji aliyê zargotinê ve xwedî girîngî ye. Ew hem motîfeke efsaneyî ye, hem motîfeke çîrokî ye û hem jî motîfeke çanda gelêrî ye.

2.12.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Gustîlikê

Motîfa gustîlikê di hemî varyantên Memê Alan de derdikeve pêş me. Di destana folklorî de gustîlik, carina nîşaneyê sêdaqetê ye, carina navgînekê ye ji bo naskirina hezkiriyê û carina jî hêmaneke derasa ye ku li dû bûyereke sêhrî ji hezkiriyê hatiye girtin.

Li gorî kataloga Stith Thompson, xalên ku bi vê motîfê re têkildar di Destana Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî de derketine pêş me bi vî rengî ne:

T61.4.5: Betrothal by gold ring/Nîşaniya bi gustîlika zêr: Mem û Zîn gustîlikan dixin pêçiyên hev (cureyê nîşanî); hemî varyantên Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî.

H86.3: Ring with inscribed names as tokens/Gustîlika ku nav li serê nivisandî ye: Her du gustîlikên Mem û Zînê navê wan li ser nivisandî ne; varyant I, varyant R. Lescot.

H94: Identification by ring/Bi rêya gustîlikê naskirin: Yek bi yek ev motîf nîn e lê di hin varyantan de dema ku qîza Beko, Zînê, derdikeve pêş Mem,

¹¹⁸ Kadîr Yıldırım, *Mem û Zîn-Çeviri ve Kavramsal Tahlili*, Weş. Avesta, İstanbul, 2010, r. 179

da ku Mem bixapîne ku ew Zîna rastîn e, Mem dibîne ku gustîlika wî di destê wê de nîn e û pê naxape; varyant I, VII, IX.

F1068.1: Tokens from dream/Sembol an jî yadîgarên di xewnan de wergirtî: Mem û Zîn di cureyeke xewn de gustîlikan bi hev diguhêrin; hemî varyantên Memê Alan ên folklorî.

Di Destana Memê Alan de, dema ku perî Zînê bi şevê tînin nav cihê Mem, ew wê şevê gustîlikên hev bi hev diguhêrin. Mem dema ku şevêqê radibe û Zînê nabîne, dikeve şikê ku ew bi tenê xewn bûye ku wî dîtiye. Lê dema ku ser û çavê xwe dişo û gustîlika Zînê di destê xwe de dibîne, hingê têdigihê ku ew ne bi tenê xewn bûye, Zînê bi rastî jî bi şevê li cem wî bûye.¹¹⁹

2.12.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Gustîlikê

Di *Mem û Zîna* Xanî de bi du wateyên cuda em rastî vê motîfê tîn. Yek jê Xatema Suleyman e ku, wekî ku me li jor jî got, di wateya dewlemendî û bêbuhayiyê de hatiye bikaranîn. Xanî dema ku behsa xweşikiya Sitî û Zînê dike, dibêje ku xweşikiya wan ji buhayê Xatema Suleyman jî derbas dîkir.

9/2 Mecnû'ê xezaîne di Qeyser
Heta weke dexmeya Skender

Durrê di defaîne di Xaqan
Le'la ku di Xatema Suleyman

Herçende ziyadetir buha bin
Bîlcumle bi cuz'ê husnê nabin

Hunsa li ruxê Sitî û Zînê
Bû behreke ateşê evînê

17/32 Zînhari eger dibî nigînê

¹¹⁹Bnr., Li beşa Muqayeseyê, li epîzota Hevdîtina ewil ya Mem û Zînê.

Zû bîne ve bo min dilhezînê

Lewra bi wê ye mi sebr û saman

Ew bo min e Xatema Suleyman

Di beytên pêşîn de, Xatema Suleyman bi buhayê xwe yê maddî hatiye bibîranîn. Lê di beytên dî de, bal bi wateya wê ya ku, xerabî nikare xwe nêzî cîwarên wê bike ve, hatiye kişandin. Lewra cihê ku Xatema Suleyman lê ye, li wê derê hizûr û aramî heye. Zînê jî bi vê wateyê, gustîlika Mem wekî Xatema Suleyman dîtiye.

Di beşên 14, 18, 19 û 20an de motîfa gustîlikê bi têkiliya wê ya bi evînê re derdikeve pêş me. Wekî varyantên folklorî, di *Mem û Zîna* Xanî de jî, piştî ku hezkirî hev nas dikin û ji hev vediqetin, beriya vê veqetînê, gustîlikan bi hev diguhêrin.

14/59 Enguşteriyê di wan cuwanan

Kêşan ji esabiê di xwudanan

Xatema ji enamilêd xwe kêşan

Danîne cihan ji boy nîşan

20/23 Ev xatema e îsm e ger tilisma e

Min can ew e, qalibê me cisma e

Ey daye tu qasidê hebîb î

Bêşubhe li derdê min tebîb î

Sedqeê serê Zilcemalê, Zînê

Mestîne ji destê min nigînê

Di beytên pêşîn de gustîlik, wekî ku hatiye îfadekirin, di wateya nîşanê de hatiye bikaranîn. Lê di beytên dawîn de, çawa ku Zînê pîroziyek û wateyeke derûnî li gustîlika Mem kiribû, Mem jî bi heman rengî bi wê gustîlikê ve hatiye girêdan û nexwestiye ew derbixe, bide Heyzebûnê.

Di beşa remlê de jî gustîlik derdikeve pêş me. Dema ku Heyzebûn diçe cem Şêxê Remmal, gustîlikên Tacdîn û Mem jî bi xwe re dibe û dibêje ku razek heye di van

gustîlikan de. Her wiha mirov dikare bibêje ku, cureyên gustîlikan di heman demê de, nîşana statuya civakî jî bûn. Ji ber ku, Remmal ji gustîlikan pê derdixe ku ew esîlzade ne.

18/13 Ey murşid û pêşwayê muqbil
Hellalê ‘uqûd û hellê muşkil

Sirrek heye wê di van nigînan
Peyda ye li nik we dûrebînan



2.13. MOTÎFA FAL Û REMLÊ

Di Motif Indeksa Stith Thompson de, wekî motîfek em rastî fal û remilê nehatine.

Di lêkolîna Zeynelabîdîn Zinar de ev motîf, di binê sernava **Remil û Fal** de, di hejmara 86an de hatiye qeydkirin.

Fal û remil, di nava baweriyên gel de cihekî girîng digirin. Her çendî ku bi taybetî ji aliyê dînên mezin ve ev reng bawerî, wekî derveyê baweriyên dînî, wekî baweriyên batil hatibin hêlsengandin jî; em ji hêz û berbelaviya wan a di nava hemî civakan de fêhm dikin ku, demeke dirêj di nava jiyana civakî ya miletan de roleke wan a girîng hebûye. Her çendî ku di dewra nûjen a îroyin de, ev diyardeyên dînî, di wateyêke ‘bisînorkirî’ de tên nixandî jî, dîrokzan, civaknas û antropolog li ser vê yekê hemfikir in ku, ev cure diyardeyên dînî, bermaya rengê dînên pêşîn, baweriyên pêşîn ên civakê ne.¹²⁰

Ji zanyariya dîrokê em têdigihên ku, dînên berê ku di nava klan û qebîleyên piçûk de serdest bûn, bi giranî xwe dispartin zanîna sêhr û falê. Ango dînên dewrên ewilîn, têkeliyêke ji baweriyên giştî yên civakê û sêhrbaziyê bûn. Lewma Falbaz û Sêrbaz, di heman demê de cureyekî rahîb-pêşewayên dînî bûn. (Gelek balkêş e ku di *Mem û Zînê* de Xanî, nasnava ‘Şêx’ ji bo remilvan bi kar tîne) Çunkî klan û qebîleyên ku her tim di binê xetereya xweza û dijminan de dijîyan, pêdivî pê hebûn ku bizanîbin dê pêşeroj ji wan re çî bîne. Lewma ev cure rêberên civakî, der bareyê guherînên xwezayê û tevgerên klan û qebîleyên di de, bi rêya fal û sêrbaziyê agahiyan didan wan.

Ji kitêbên herî kevnar ên dîrokê wekî Dîroka Herodotos¹²¹ û Ksenophon,¹²² em dizanin ku, berê dema ku kral derdiketin seferan an jî dema ku koçên girseyî pêk dihatin; kralan bangî falbazên xwe yên taybet, ku cureyek şewirmendê kralan bûn, dikirin û ji wan dixwestin ku li falê binirên da ku wê çî biqewimin. Lewra, ew kesên ku bi vî îlmî re mijûl dibûn, di qada civakî de xwedî statû bûn.

Pertev Naili Boratav ji bo falê pênaseyêke gelek berfireh kiriye û wiha gotiye:

“Di wateya bêtir teng û berbelav de, em dikarin falê wekî, “zanyariya şîrovekirinê” ya ku teknîkên wê, navgînên wê û pisporên wê yên taybet hene, tarîf

¹²⁰ Li dû hin agahiyan ku di kitêbên pîroz de jî derbas dibin, avakarê van zanînan ê bi navê Danyal, di heman demê de ji alî dînên mezin ve jî wekî pêxember hatiye dîtin.

¹²¹ Herodotos, *Herodot Tarihi*, Weşanên Remzi

¹²² Ksenophon, *Anabasis*, Weşanên Sosyal

bikin. Mirov, bi armanca ku pêşoroja xwe bizane, bi armanca hînkirina rewşa nasekî xwe yê li dûr, dîsa bi armanca dîtina tiştêkî xwe yê ku hunda kiriye an jî jê hatiye dizîn, serî li falbaz an jî remilvan dide da ku tiştê ku ew bi serê xwe nikare hîn bike, ji wî/wê hîn bike.^{»123}

Dema ku em li vê pênaseya Boratav dinihêrin, em dibînin ku ew ajoya ku li serîlêdana fal an jî remlê dibe sebeb; meraq an jî daxwaza hînkirina hin rewşên nepenî ye. Bi rastî ev ajo îro jî di bingeha meyla falê de bi cih e.

Der bareyê baweriya bi fal û stêrnasî ya di nava civaka kurd de, Mela Mehmûdê Bayezîdî, di kitêba xwe ya bi navê ‘Adet û Rusûmatnameya Ekradiyê’ de, wiha gotiye:

“Di nav Kurdan de taybetiyên nezaniyê hene. Bi fal û stêrnasan û hindek tiştan bawer dikin, hindekan bextewarî û hindekan wek şûm û bedbextî dizanin û bi berbejnên û hicab û niviştan baweriyê dikin. Bi wê dereceyê ku çawan miletê Ifrenc bê hekîm nabin, ew jî bê nivişt nabin. Herçi nexweşî û derd dibin bila bibin, bi niviştan derman dikin.”^{»124}

Her çendî ku di nava dînen mezin de, ev cure kar hatiye qedexekirin jî, dema ku em li dîroka dînan dinihêrin, bi rengêkî em bi vê rastiyê re rûbirû dimînin. Mînak, Hz. Danyal ku me di beşa baweriyên de jî jê behs kiriye, wekî avakarê îlmê falê hatiye qebûl kirin.

2.13.1 Di Destana Memê Alan de Motîfa Fal û Remilê

Di hemî varyantên folklorî ên Memê Alan de em rastî remilvaniyê tên. Li gorî piraniya varyantan, qîz an jî xuşkeke Beko heye û navê wê jî Zîn e. Ev qîz an jî xuşka Beko, di heman demê de remilvan e. Dema ku Mem ji bajarê Muxurzemînê dertê rê, ew bi rêya remilê ji vê yekê haydar dibe û bo ku Mem bixapîne, li derveyê bajarê Cizîrê, li ber çemê Cizîrê dertê pêş wî û xwe, wekî Zîna ku ew lê digere, pê dide naskirin. Lê di piraniya varyantan de, hespê Mem, Bozê Rewan/Bor pê re diaxive û wî ji rewşa rastîn haydar dike. Lê li gorî varyanta Lescot, berî ku Mem bigihê Cizîra Botan, Xocê Xizir, wî di heqê qîza Beko ya remilvan de heşyar dike û di encamê de Mem pê naxape. Ev yek li gorî varyantan bi vî rengî ye. Di varyantên VII, IX, Xan de

¹²³ P. N. Boratav, *100 Soruda Türk Folklorü*, K.. Kitaplığı, İstanbul, 2003, r. 130-131

¹²⁴ Mela M. Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameya Ekradiyê*, Lêkolîn J. Dost, Weşanên Avesta, r. 147-148

qîza Beko ya bi heman navê Zînê, remildar e û bi rêya remlê dizane ku Mem ji bajarê Mixribiyan an jî Muxurzemîn tê. Di varyanta pêncan (V) de qîzeke Beko heye bi navê Zînê û Beko dixwaze Mem bixapîne ku, Zîna ku Mem lê digere qîza wî ye, lê di vê varyantê de behsa qîza Beko û remilvaniyê nayê kirin. Di varyantên I, VI, VIII û XIan de xuşka Beko ya bi heman navê Zînê remilvan e û haya wê ji hatina Mem heye. (Di varyanta VIan de navê wê ne Zîn e, Melek Rihan e û xuşka Beko ye.) Di varyanta IVan de ev keçik cariya Zînê ye û bi rêya remlê haya wê ji hatina Mem heye. Di varyanta Roger Lescot de, Beko bi xwe remilvan e û haya wî ji hatina Mem heye. Qîzeke wî heye bi heman navê Zînê. Ew qîza xwe dişîne pêş Mem da ku wî bixapîne. Di varyanta dehan de (X) dema ku Mem û Mîr bi setrencê dilîzin, ev qîza Beko ya remilvan, li remlê dînihêre û dibêje ku berê Mem bikeve Zînê, dê Mîr wî tîk bibe. Dîsa di heman varyantê de (X) qîza Beko bi rêya remlê hîn dibe û ji Beko re dibêje ku, mêr herin Mem ji zindanê derbixin wê Mem xelas bibe lê, jin herin wê Mem bimire. Lewra Beko ji Mîr daxwaz dike ku Zînê tevî cariyên xwe here Mem ji zindanê derbixe.

Ev qîz an jî xuşka Beko ya bi navê Zînê ku, di heman demê de remilvan e, bi rengê balkêş di *Mem û Zîna* Xanî de hîç dernakeve pêş me lê Xanî di şûna wê de karaktereke dî ya bi navê Heyzebûn bi cih kiriye ku ew jî remilvan e. Hem di *Mem û Zîna* Xanî de hem jî di hemî varyantên folklorî de, ev remilvan, nasnameya Mem bi rêya remlê teşhîs dike. Xanî, ev remilvana ku di *Mem û Zînê* de wekî dayîna Sitî û Zînê derdikeve pêş me, wekî cureyeke cadû an jî *pîrejîna* ku di hin çîrokên kurdan de heye, teswîr kiriye.

2.13.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Fal û Remilê

Di *Mem û Zînê* de di beşa 16, 17, 18 û 19an de, piştî ku dayîna bi navê Heyzebûn, halê ku Sitî û Zîn tê de ne dibîne, bo ronahîkirina tiştên ku li wan qewimiye, serî li remilê dide. Bi rastî ji pênaseya Xanî, pêşî em zen dikin ku, Heyzebûn bi xwe remilvan e. Her wiha Heyzebûn bi xwe jî xwe wekî remilvan daye nasîn. Lê dûre em dibînin ku ew jî bi rêya kesekî bi navê Şêxê Remmal, her tiştî hîn dike. Her wiha balkêş e ku Xanî, wî her tim bi pênaseyên negatîf dide naskirin lê di encamê de karên ku ew dike, xizmet li başiya Mem û Tacdîn û Sitî û Zînê dike. Dibe ku sedema nebaşkirina Xanî ya Heyzebûnê, ji gunehbûna sêhr û falê ya di dîn de tê ku Heyzebûn serî li van rêbazan dide û dibe ku ji ber wê sedema dî be ku, Xanî bi îlhama ji qîza Beko ya

remilvan a di destana folklorî de, karaktereke wiha afirandiye ku ev karakter di destana esil de karaktereke nebaş e.

Divê em vê yekê destnîşan bikin ku, tiştê ku hatiye serê Sitî û Zînê (Her wiha Mem û Tacdîn) hinek jî dişibe cureyeke xewna têkel ku pêdiviya wê bi tabîrê heye. Lewma Sitî û Zîn, di kincên lawan de derketine pîrozbahîya cejna Newrozê û Mem û Tacdîn jî di kincên keçan de derketine. Lê her du alî jî dema ku li hev rast hatine, di wê kêliyê de bêyî ku xerîbiya rewşê ferq bikin, aşîqê hev bû ne. Li vê derê Xanî, serî li leyistikeke girîft daye ku, yên ku tûşî vê leyistikê jî bûne, encax bi rêya remlê dikarin ji navê derên. Bi îfadeyeke dî, motîfa remlê di destpêkê de, ji bo şîrovekirina vê rewşa bi esrar dikeve dewrê û dûre bi tesbîta nasnava her du aliyan û bi diyarkirina hukmê xwe li ser pêşeroja wan, vedigere wezîfeya xwe ya esasî. Dayîna Heyzebûn, ku ji vê rewşa bi esrar tişteki ténagihê, gustîlikên Mem û Tacdîn ji Sitî û Zînê dixwaze û bê rawestan xwe diavêje Şêxê Remmal.

16/19 Hûn bêjne min ku bû qediyê?

Kengê xef dibit li me xebiyê?

Ez dê nihe remlekî birêjim

Îsmî û demîrî ez bibêjim

Yan şûşe û mendela xwe danim

Mahiyyetê halî dê bizanim

Di van beytên jorîn de em dibînin ku, Heyzebûn xwe wekî remmal dide nasîn û her wiha hin tégihên bi îlmê remilê re peywendîdar, wekî Şûşe û Mendel (kad, kûre) bi kar tîne.

Piştî ku Heyzebûn, ji devê wan, maceraya wan a bi esrar dibihîze, tişteki fêm nake lê xwe li wan hêrs dike. Li ser vê yekê Sitî û Zîn, lê gazinan dikin ku çima wê xwe ji wan re wekî remilvan daye nasîn û neha tu tişteki ji rewşê fêm nake.

17/20 Ev rengehe gote Dayeya pîr

“Xalib ten emaye ‘eql û tebdîr

Te digo ku ‘bi de’wet û ‘ezaim

Halê ku xefî bitin dizanim’

17/24 Enguşteriyê di wan eva ne
Înane me ew ji bo nîşan e

Remlê tu bi rast eger dizanî
Xatem ev dê bizan xwudanî

Wê şehleê hîlekar û cadû
Go: “Bîne ji bo me ra xateman zû

Da îşevê remlekê birêjim
Heta sibe sahiban bibêjim”

Di beytên jorîn de em dibînin ku, di îlmê remlê de, îşaret an jî hin objeyên wekî gustîlikan, di têgihîştina rewşê de girîngiyekê teşkîl dikin. Dema ku Heyzebûn fêr dibe ku, wan gustîlikên keçikan (bi rastî Mem û Tacdîn) ji wan girtine, derhal gustîlikan ji wan digire da ku bigihîne Şêxê Remmal û bi rêya vê îşaretê, bikaribe xwediyê gustîlikan hîn bibe.

18/1 Wê delleê bêfesalê muhtal
Subhê xwe gîhande pêşî remmal

Zêreke du birin di dest xwe bo pîr
Ev rehngê kir demîrî teqrîr

Di van beytên jorîn de em têdigihên ku, remmalî di wê demê de cureyeke kar an jî meslek e û her wiha bi peran, bi muqabilê faydeyeke maddî tê kirin. Çunkî Heyzebûn, dema ku diçe cem Remmal, bi xwe re zêr dibe da ku bidê.

Piştî vê yekê, em dibînin ku remmal çawa li remlê dinihêre û çawa vê rewşê şîrove dike.

19/1 Ew warisê ‘îlmê Daniyalî
Gava fikirî di şiklê fa’lî

Fîlhalî di rehmê ummehatan
Bêwed’’ê tewelluda benatan

Lihyan û Niqî bi yek ve dîtin
Tacdîn û Sitî pêkve dîtin

Şiklê ferehê digel xemê dî
Bêperde wî Zîn digel Memê dî

Di van beytên jorîn de, rengê îfadeya Xanî ya li ser falê, ji beytên dî hinekî cuda ye. Ji îfadeya; *Gava ku fikirî di şiklê falî*, mirov dikare bibêje ku Xanî, şîrovekirina remlê an jî falê bi xwe, wekî cureyeke fikirîn an jî rengê fikirînê dibîne. Kesê remmal jî, di ev reng fikirînê de pîspor e. Yanî bi şîroveyeke dî, em dikarin bibêjin ku, li vê derê Xanî xwestiye bibêje ku; ne ku ew li ser şiklên falê yên wekî Lihyan (şeklê elîfê ye û temsîla bêoxiriyê ye) û Niqî (şiklê giloverok e û temsîla oxirê ye) difikire; lê di şiklê fikirîna falî de difikire. Lewma fal, rengê fikirînê ye; çawa ku civaknas dema ku li tiştekî dinihêrin li dû prensîbên îlmê xwe difikirin; an jî çawa ku stêrnas dema ku li ezmana dinihêrin li dû prensîbên îlmê xwe tevgerên ezmanî şîrove dikin, wilo jî falbaz dema ku li bûyerekê dinihêrin li dû prensîbên îlmê xwe difikirin û şîrove dikin.

Piştî ku Remmal bi giştî rewşê ji Heyzebûnê re aşkera dike, Heyzebûn bi vê yekê têr nabe û jê hin detayên dî dixwaze.

19/15 Pîrê wehe gote şêxê remmal

“Min şubhe nema di keşfê ehwal

Lêkî tu bibêje ew çi esl in?

Qenc keşif bike ku ew çi nesl in?

Begzade ne ew, ‘elîmeqam in

Cundîneseb in ew ya ‘ewam in?

Her çendî ku Remmal bersiva Heyzebûnê dide û dibêje ku ew ji nesla mîran û debîran in jî, Heyzebûn bi vê yekê jî têr nabe û hîn bêtir detayan jê dixwaze. Her wiha li muqabilê van agahiyên jî soza heqekî zêdetir bi zêran didê.

19/25 Şêxê tu dizanî ev Cizîr e
Têkda kubera û girdemîr e

Îhsan bike perdeyê hilîne
Ew her du melek bibêje kî ne

‘Ehda me we bit tenê bibînim
Çil zêrî biçim ji bo ter a bînim

Piştî ku Heyzebûn agahiyên ku dixwestî digire, ji cem Şêxê Remmal vediqete. Di beşa 21an de dema ku Heyzebûn vedigere cem Sitî û Zînê, ew jê re wiha dibêjin:

21/7 Remla te çi go, perî te zanîn?
Yan her du di şûşeyê te anîn

Ev reng îfade, yanî ‘*di şûşeyê de ew anîn*’ ji remlê bêhtir, dikeve mijara sêhrê. Wekî ku tê zanîn di sêhran de, ji şûşeyê cin derxistin, an jî tiştêkî dî derxistin, îfadeyeke berbelav e di kevneşopa sêhrê de.

Di *Mem û Zînê* de, bi motîfa fal û remlê re peywendîdar, navê **Danyal** derdikeve pêş me ku ew di heman demê de rêberekî dînî ye.

Danyal an jî li gorî hin rîwayetan Danîel, nebiyekî ye ku bi piranî bi tebîra xewnan û îlmê remlê re têkildar di çîrok û efsaneyan de derbas dibe. Li gorî hin rîwayetan, ew pêxemberekî ye ku ji milletê yahûdî re hatiye şandin. Lê li gorî hin rîwayetên dî, ew ne pêxember e, bi tenê nebî ye. Lê ew di nava dîroka dînan de şexsiyetekî girîng e. Li dû rîwayetan, di dema kralê Babîlê, Nebûqednazer de (Bz: 605-562) jiyaye û ji aliyê vî kralî ve wekî esîr ji Qudusê tê girtin û wî dibin Babîlê. Li derdora jiyana wî hem bi îlmê remlê re hem jî bi dîroka qewmê cihû re têkildar gelek çîrok hene. Tê rîwayetkirin ku ew, ji ber zanîna xwe ya tebîrvaniya xewnan, ji aliyê

Nebûqednazer ve ji zindanê hatiye derxistin û bûye şêwirmendê wî. Her wiha gelekî cihûyan ji kuştinê xelas kiriye.¹²⁵ Tê rîwayetkirin ku li Babîlê bi navê Danyal bîrekê hebûye ku dîsa li dû rîwayetan Hz. Adem hemî zanîn û hîkmetên ji aliyê Xweda ve jê re hatî dayin, di vê bîrê de veşartîye.

Danyal di wêje û zargotina rojhelatî de, wekî sembola îlim û hîkmetê her wiha wekî avakarê îlmê falê (remil) hatiye bikaranîn. Xanî jî di *Mem û Zînê* de, di beşên ku behsa remlê dike de, bi vê motîfê re têkildar, navê Danyal bi kar aniye. Di vê beşê de dayîna Stî û Zînê, Heyzebûn, bo ku sedema halê ku ew ketinê fêr bike, diçe cem Şêxê Remmal. Xanî, Şêxê Remmal, wekî warisê îlmê Danyal ku remilvanî ye, daye nasandin.¹²⁶

19/1 Ew warisê 'îlmê Daniyalî
Gava fikirî di şiklê fa'îlî

Fîlhalî di rehmê ummehatan
Bêwed''ê tewelluda benatan

Lihyan û Niqî bi yek ve dîtin
Tacdîn û Sitî pêkve dîtin

Şiklê ferehê digel xemê dî
Bêperde wî Zîn digel Memê dî

¹²⁵ Ev çîroka li ser Danyal û hikayeya Hz. Yûsuf gelekî dişibin hev. Ew jî di encama tebîrvaniya xewnan ji zindanê tê berdan û dibe şêwirmendê kralê Misirê û gelek cihûyan ji mirinê (ji ber xelayê) xelas dike.

¹²⁶ K. Yıldırım, *Mem û Zîn, Çeviri ve Kavramsal Tahlili*, Weşanên Avesta, r. 217

2.14. MOTÎFA TAYINKIRINA PÊŞEROJÊ

Motîfa tayinkirina pêşerojê, di Motif Indexa Thompson de di binê herfa **M'** yê de hatiye qeydkirin.

Di xebata Zeynelabidîn Zinar de, wekî hevbeşiyêke çîroka kurdî behsa tayinkirina pêşerojê nehatiye kirin lê bi vê motîfê re têkildar, di binê sernava **Sonda Bi Erd û Asîman** de, di hemara **60**an de behsa sondê hatiye kirin.

Motîfa tayinkirina pêşerojê, di nava xwe de grûbên cuda yên motîfan dihewîne. Ev, wekî kehanet, biryar û hukmên fermî û sondxwarinê ne.

Di motîfa tayinkirina pêşerojê de, cihekî girîng a sondê heye. Çunkî dema ku sond tê xwarin, di heman demê de, li ser pêşeroja lehengan jî, hukmekî teqez tê dayin. Yanî pêşeroj, di wê kêliyê de tê tayinkirin. Wekî ku di *Mem û Zîna* Xanî de jî tê dîtîn; li ser sondxwarina Mîr ya der bareyê Zînê de, qedera lehengan jî li gorî wê hukmê diguhere.

Der bareyê sonda ku di çîroka kurdî de derdikeve pêş me, Zeynelabidîn Zinar wiha nivîsiye:

“Sonda ku di çîroka kurdî de heye, ne mînaye sondên vê sedsala Bîstî ya buhurî. Ew sondên di çîroka kurdî de bi piranî bi xwezayê û bi mirovan tîn kirin, ango bi gora filankes tîn kirin. Gava bêbaweriyek dikeve nava kesên di çîroka kurdî de, ji bo bawerkirina hevûdu sond tê xwarin.”¹²⁷

Sondxwarin di heman demê de, hêmaneke jiyana civakî ye ku bi çanda manewî û baweriyên civakê re têkildar e. Dema ku em li formên sondxwarinê yên civakê dikolin, ne tenê li renekî vegotina mirovî dikolin; her wiha li bawerî û pîrozîyên civakê jî dikolin.

Di nava civakê de sond li ser navê Xweda, li ser navê bav û kalan, li ser nan an jî li ser navê hin pêşewayên dînî wekî şêx, seyid, li ser navê avê li ser navê axê û li ser navê agir jî sond tîn xwarin.

Mela Mehmûdê Bayezîdî ji bo sondxwarina di nava civaka kurdan de wiha gotiye:

¹²⁷ Z. Zinar, *Şaxên Zanistiyê*, r. 125

“Piraniya cahilên Kurdan, me’azellah nan pîroz dibînin û pê sondê dixwin. Ew dibêjin ku eger mirov sondê bi nan nexwe, êdî dîn û îmana wî ne tamam e. Weke ku dîn û îman bi nan sererast û durust dibe... Piraniya sondên wan bi gora bav û bira û kuran e. Yan na jî, bi serê bav û bira û kur e. Lê sondê wan î rast ku ew jê ditirsin û bi derewan wê sondê naxwin, sonda wan î ku bi derewan naxwin ew e ku tînin mista wî mirovê ku divê sondê bixwe tijî xwelfî dikin û dibêjin ku ewê xweliyê li ber bayê belav bike û bide bayê bibêje: Ku bila nirx û îtibara min jî wiha ber ba bibe (eger ez derewan bikim). Kurd ewê sondê bi derewî naxwin. Baweriya wan ew e ku eger ewê sondê bi derewî bixwin mala wan li mîratê digere.”¹²⁸

Wekî ku em ji van agahiyên ku Mela Mehmûdê Bayezîdî jî dide têdigihên; sondxwarin ne bi tenê dayina soza tiştêkî an jî vegotîneke teqez a di heqê rewşekê de ye. Di heman demê de di nava çanda sondxwarinê de, gelekî hêmanên dînî, bawerî û mîtolojîk hene.

2.14.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Tayinkirina Pêşerojê

Di varyantên folklorî ên Memê Alan de em bi berfirehî rastî vê motîfê tîn. Bi taybetî motîfa kehanetê di gelek varyantan de derdikeve pêş me.

Li gorî kataloga Stith Thompson, xalên ku bi vê motîfê re têkildar di Destana Memê Alan û di *Mem û Zînê* de derbas dibin, di van hejmaran de hatine qeydkirin:

M0-M99: Judgement And Decrees/Biryar û Hukmên Fermî: Mîr biryar dide ku dê Zînê nede tu kesî; *Mem û Zîna Xanî*

M100-M199: Vows And Oaths/Sond: Mîr sond dixwe li ser rûhê bav û kalên xwe ku dê Zînê bi jinîti nede tu kesî; *Mem û Zîna Xanî*

M300-M399: Prophecies/Kehanet: Di gelek varyantên Memê Alan de, dema ku Zînê diçe zindanê da ku Mem derbixe, Mem jê re dibêje ku ew ê demekê şûn de bimire; varyant II, IV, V, VI, VIII, IX, X, XI. Piştî mirina Mem, di gelek varyantan de Zînê kehaneta mirina xwe jî dike; varyant IV, VII, X, XI, R. Lescot, *Mem û Zîna Xanî*. Memê di gorê de mirî, ji Mîr re dibêje ku, heft roj piştî mirina wî, wê ew û Zînê bi hev re li bihiştê bin; varyant II.

¹²⁸ M. M. Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiyê*, Lêkolîn J. Dost, r. 165-166

Di gelek varyantên Memê Alan de em dibînin ku Mem hem mirina xwe ji pêş de dibîne û hem jî berî ku bimire ji Zînê re dibêje ku (li gorî hin varyantan, heft roj şûnde û li gorî hin varyantan jî sê roj şûnde) ew ê jî bimire. Dîsa di *Mem û Zîna* Xanî de berî ku Mem bimire, dema ku agahiya mirina wî ji zindanê tê û piştî ku Mem dimire jî, her wiha bi heman rengî di Memê Alana folklorî de jî, Zînê vê kehanetê dike ku dê ew jî li dû Mem bimire. Di heman demê de wesiyeta xwe jî ji Mîr re dike ku ev yek jî ji alî çanda civakî û bawerî ve girîng e.

2.14.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Tayinkirina Pêşerojê

Di *Mem û Zîna* Xanî de em hem rastî motîfa kehanetê tîn û hem jî rastî motîfa sondê tîn. Di beşa 51an de, piştî ku agahiya mirina Mem tê, Zînê ji Mîr re dibêje ku wê ew jî li dû Mem bimire û ji Mîr daxwaz dike ku her duyan li kêleka hev binax bike.

51/63 Ez dê bi cenazeê wî ra bim
Heta vige meqberan teba bim

Weqtê dimirim bidî tu destûr
Da min bikirin digel wî mestûr

Min j' alî wî derbider negêrî
Bê perde digel wî min veşêrî

Di beşa 26an de, dema ku Beko bi evîna bi dizî ya di navbera Mem û Zînê re tîkildar, Mîr li hember Tacdîn û Mem tîhrîk dike û îdîa dike ku, Tacdîn û Mem plan dikin ku wî ji mîrîtiyê dûrbixin; Mîr li ser vê pir diqehire û sond dixwe ku wê Zînê bi jinîftî nede tu kesî. Ev sonda ku Mîr dixwe, hem bi motîfa tayina pêşerojê re tîkildar e; çunkî Mîr li kêleka sondê, biryareke teqez jî aşkera dike û hem jî bi motîfa qedexeyê re jî tîkiliya wê heye ku em di beşa Qedexe û Ceza de li serê sekinîne.

26/45 Sondê dixwim ez bi rûhê walid
Hetta bigihîte ceddê Xalid

Mehda bi zukûrê neslê Adem

Zînê bi jinîti ez qe nadem

Li vê derê ji aliyê kevneşopa sondê ve tiştê balkêş ew e ku, wekî ku Mela Mehmûdê Bayezîdî û Zeynelabîdîn Zinar jî gotine, kurd sondên wan yên herî mezin, li ser nan an jî rûhê bav an jî xizmên wan yên ji bo wan bi qedir in.



2.15. MOTÎFA AVA HEYATÊ Û AVÊN PÎROZ

Motîfa ava heyatê û avên pîroz, di Motif Indexa Stith Thompson de, di beşên muxtelîf de derdikeve pêş me. Di beşên mîna **V: Dîn, E: Mirin, D: Sêhr, F: Derasayî** de ev motîf hatine qeydkirin.

Ev motîf di xebata Zeynelabidîn Zinar de, di binê sernava **Ava Şifayê** de, di hejmara **87**an de û di binê sernava **Ava Reş û Ava Sipî** de, di hejmara **88**an de hatiye qeydkirin.

Ev motîfa kevnar, di folklorê civakan de, ji dewrên dêrîn û heya niha di nava çîrok, destan û efsaneyên civakê de cihê xwe girtiye. Ew ne tenê motîfeke aydê çandek an jî miletekî ye; ew di çanda gelekî miletan de weke hêviyeke giştî an jî lêgerîneke giştî ya mirovan ku, ji ezel de heye û heya ebedî wê her hebe, cihê xwe girtiye.

Ava heyatê ku, wilo hatiye bawerkirin ku nemiriyê dide an jî ciwaniyê tîne, her tim ne di forma ava heyatê de; carina wekî *giyayê nemiriyê* jî derdikeve pêş me.

Forma herî kevnar a vê motîfê, di Destana Gilgamêş de em dibînin. Gilgamêş, piştî mirina hevalê xwe yê yekta Enkîdû, pir li ber vê mirinê dikeve û ji xweda dixwaze ku, Enkîdû ji nû vejîne. Lê ev ne pêkan e. Li ser vê Gilgamêş bo ku çareya mirinê bibîne, dikeve ser rêyan. Ev lêgerîna efsaneyî, temsîla lêgerîna nemiriyê ya mirov e. Ev lêgerîn ezêfî û ebedî ye. Li gorî Efsaneya Gilgamêş; Gilgamêş, li Ûtnapîştîmê ku ji Tofanê filitiye û bi sira nemiriyê dizane, digere. Gilgamêş wî dibîne û Ûtnapîştîmê giyayê ku nemirî û ciwaniyê tîne, dide Gilgamêş. Li gorî guhertoyeke efsaneyê, Gilgamêş dixwaze vî giyayî bi gelê xwe re bi hev re bixwe lê di rê de mar giya jê didize û çareya mirinê ebediyen hunda dibe. Li gorî guhertoyeke dî, Gilgamêş giya ji Ûtnapîştîmê digire û dema ku li çemekê xwar dibe da ku avê vexwe, mar giya jê didize û çareya mirinê edediyen hunda dibe.¹²⁹

Em di mîtolojiya Aryanî de jî li vê forma *giyayê nemiriyê* rast tên. Li gorî mîtolojiya Aryanî, giyayê bi navê *homa*, giyayê ku nemiriyê dide ye; temsîla jiyana û ciwaniyê ye.¹³⁰ Di Avestayê de ji bo vî giyayî, ‘giyayê ku ji mirinê dûr dixê’ hatiye gotin.¹³¹

Lêkolîner Ensar Aslan, motîfa ava heyatê, di nava mîtolojiyê de û bi hin şexsiyetên dînî wekî Hz. Nûh û Xocê Xizir re têkildar nixandiyê.

¹²⁹ Wer.K. Nemir, *Gilgamêş û Çend mythosên Din*, weşanên jiyana rewşen

¹³⁰ Sıraç Bilgin, *Yazatlar ve Homa, Aryan Mitolojisi*, Weş. Doz, İstanbul, 1996

¹³¹ Nimet Yıldırım, *İran Mitolojisi*, Weşanên Pinhan, İstanbul, 2012, r. 465

“Li gorî mîtolojiyê; yek ji neviyên Nûh, Qerneyn ji mirovekî zana cihê Ava Heyatê dipirse. Ew mirov jê re dibêje ku, Ava Heyatê li bakûr, li welatê taristaniyê ye. Her çendî ku ew diçe û welatê tarsitaniyê ji serî heya dawî serûbin dike jî rastî tu sopeke vê avê nayê. Hingê Qerneyn têdigihê ku ji mirinê xelasi ne mumkun e. Li dû efsaneyê mirovekî bi navê Xizir, Ava Heyatê dîtiye û jê vexwariye.”¹³²

Zeynelabidîn Zinar, wekî hevbeşiyêke çîroka kurdî, wiha behsa Ava Şîfayê kiriye.

“Di piraniya çîrokan de kaniyek heye ku, ava wê şîfa ye û kesên ku jê vedixwin, nexweş nakevin, jiyê wan dirêj dibe û zû bi zû namirin.”¹³³

Bêguman fonksiyona vê ava şîfayê ku Zinar tarîf kiriye, bi piranî bi fonksiyona ava heyatê re, heman e. Zinar, di hejmarê 88an de, di behsa Ava Sipî û Ava Reş de jî wiha gotiye:

“Di Çîroka Kurdî de du cure av hene ku ji yekê re Ava Reş tê gotin: Mirovê delal gava xwe pê bişo, ne delal dibe. Ava din jî Ava Sipî ye: Mirovê ne delal gava xwe pê bişo, delal dibe. Ev her du cure av, di newaleke bêav de hema wisa ji nişka ve derdibin û wisa gur diherikin. Îcar qîzên ne delal yên ku sêwî ne, bê kes û bê mal in û xort wan ji xwe re nabin, gava xwe bi ava sipî dişon, pir delal dibin û dilê xortan dikeve wan, piştî ew ji xwe re dibin û bi wan re dizewicin. Hin caran jî gava sihûd û şans ji qîzekî tê sitandin, ew bi şaşî diçe xwe bi Ava Reş dişo û di mala bavê de dimîne.”¹³⁴

Di hin varyantên destana navdar, Evdalê Zeynikê de ev motîf derdikeve pêş me:

“Li gorî hin varyantên Evdalê Zeynikê, Kaniya Heyatê/Evdilheyatê li serê Çiyayê Sîpanê ye. Gava ku qulingekê li serê Çiyayê Sîpanê avê vedixwe û bi dûre difire, wê gavê Evdalê Zeynikê li derve bûye û ev quling di ber wî re derbas dibe, bayê baskên qulingê li rûyê Evdêl dide, çavên Evdêl bi demekê şûn de pak dibin.”¹³⁵

¹³² E. Aslan, *T. H. Edeb.*, r. 73

¹³³ Z. Zinar, *Şaxên Zanistiyê*, r. 129

¹³⁴ H.b., r. 129-130

¹³⁵ M. Zahir Kayan, *Gilgamêş/Enkîdû û Siyabend/Qedegêtra*, Kovara Jiyana Rewşen, Avrêl 2003, r. 80

2.15.1. Di Destana Memê Alan de Ava Heyatê û Avên Pîroz

Di Destana Memê Alan de ev motîf pir dernakeve pêş me. Bi tenê di varyanteke Memê Alan de, behsa aveke sêhrî hatiye kirin. Di *Mem û Zîna* Xanî de ev motîf bi wateyên curbecur derbas dibe.

Hem di Memê Alana folklorî hem jî di *Mem û Zîna* Xanî de, li gorî kataloga Stith Thompson, ev motîf di van xalên jêrîn derdikeve pêş me:

D1242: Magic elxsir/Îksîra efsûnî: Cureyeke ava heyatê an jî aveke derasa ye ku hem di varyanta dehan (X) a Memê Alan de hem jî di *Mem û Zîna* Xanî de, bi formên nêzîk dertê pêş me.

E80: Water of life/Ava jiyane: Avên ku di *Mem û Zîna* Xanî de ji wan tên behskirin.

E80.4: Resuscitation by holy water/Vegeriyana jiyane ya bi ava pîroz: Di *Mem û Zîna* Xanî de, avên ku ji wan tên behskirin bi vê fonksiyona xwe ya jî mirinê vegerandina jiyane, derdikevin pêş me.

F162.6.2: Water of life/Ava jiyane: Avên ku di *Mem û Zîna* Xanî de ji wan tên behskirin.

Di varyanta dehan (X) a destana folklorî de, tê gotin ku Mem bi rastî ne kurê Al Paşa an jî Padîşahê Muxrezemînê ye. Ew kurê jinikeke feqîr e ku ji aliyê hin hêzên derasa ve tê revandin û dema ku di ser behrê de derbas dibin, ew kefa ava behrê vedixwe û ji vê bi hemle dibe û Mem tê dinyayê. Piştî ku Mem tê dinyayê, jinik ji tirsê civakê ku, wê bipirsin ka bavê wî kî ye; Mem datîne ber behrê û Paşayê Alan wî li wê derê dibîne û digire koşka xwe, wekî lawê xwe mezin dike.

2.15.2. Di Mem û Zîna de Motîfa Ava Heyatê û Avên Pîroz

Xanî di *Mem û Zîna* de, di gelek cihan de behsa ava heyatê kiriye. Xanî geh *Abi Heyat* gotiye, geh *Abi Heyewan*, geh *Abi Zîndeganî* û geh jî *Kaniya-Çeşmeya Heyatê* gotiye. Xanî, di pirî cihan de ev motîf, bi wateya wê ya ku nexweşan baş dike, miriyan sax dike û aveke pîroz e, bi kar aniye. Li kêleka motîfa ava heyatê, Xanî behsa hin avên pîroz wekî ava kewser û ava zemzemê jî kiriye. Li gorî baweriyên ava kewserê, aveke ji çemekî bihiştê ye ku tu av bi tehma xwe wekî wê xweş nabe. Ava zemzemê jî wekî

ku me di beşa motîfên dînî de jê behs kiriye, aveke pîroz e ku li dû serboriya jiyana Hz. Îsmâîl û diya wî Hacer, ji çolê derketiye û heya îro jî heye.

Xanî dema ku pesnê xweşikiya Sitî û Zînê kiriye ev motîf bi kar aniye.

8/47 Gerden te digo di destê Saqî
Qarûre ye pir şerabê baqî

Yan şubhetê şîşeya nebatê
Yan menbe'ê **kahniya heyatê**

Xanî di beşa gihaştina hev a Sitî û Tacdîn de, motîfên ava heyatê û ava kewserê bi hev re bi kar anîne.

25/34 Înzalê legen, nuzûlê îbrîq
Tes'îdî kirin bi qer'î inbîq

Memzûcê şebîhê şîr û şeker
Mexlûtê wekî **Heyat û Kewser**

Di beşa derketina nêçîrê de, Xanî dema ku pesnê xwezaya Botanê ku dişibe bihiştê dide, motîfa ava kewserê bi kar tîne.

36/6 Her rewde riyadê xuldê ekber
Her çeşme ji 'eynê **Abê Kewser**

37/3 Bo şuştinê dest û pê û çavan
Kewser kiribû sebîlê Ridwan

Di beşên ku Mem di zindanê de ye û Zîn diçe ku wî derbixe de, Xanî di wateya başkirina nexweşan û saxkirina miriyan de, motîfa ava heyatê bi kar aniye.

49/9 Mem teşne tu **abê zîndeganî**
Mem murde tu canê cawîdanî

50/23 Ew t hne tu **kahniya furat **
Ew xesteye tu ** e meya heyat **

50/24 Ew te ne tu **ab  z ndegan **
Ew murde tu can  caw dan 

52/40 Ewwel ew  kir bi sidq der dem
Tecd d  wud ' bi **ab  Zemzem**

52/57 Ger te ne y  ev he **ab  heyewan**
Wer xeste y  hate ser te Loqman



2.16. MOTÎFA XOCÊ XIZIR

Di Motif Indexa Stith Thompson de, ev motîf di beşa **Dîn** de, di binê herfa **V**'yê de hatiye qeydkirin.

Di xebata Zeynelabidîn Zinar de, wekî hevbeşiyêke çîroka kurdî, behs ji vê motîfê nehatiye kirin.

Xocê Xizir di dîroka dînan de û di kevneşopa zargotinî ya gelek civakan de, motîfeke girîng e. Ev motîf di çîrok, efsane û destanan de xwedî roleke ew çend girîng e ku, di xaçerêyên şikestinê de dertê û hem meyla hîkayeyê û hem jî çarenûsa leheng diguherîne.

Wekî ku tê zanîn di kevneşopa dêrîn de, ku hê vegotina mîtolojîk serdest bû, mirov ji bo ku karibin bi hin zehmetiyan re serî derkevin, pêdivî bi alîkariya xwedayan didîtin. (Bêguman ev, renekî vegotina zargotinî ya wan dewrên dêrîn bû.) Dema ku lehengên civakê an jî civak bi xwe, diketin tengayiyê, xweda dihatin û aliyê wan dikirin û bi vî rengî ew bi ser diketin. Bêguman ev lîterator, ev cure fikirîn, ji wê bendewariya civak û kesan a ji xweda dihat e. Piştî ku dewra vegotina mîtolojîk derbas bû, hin motîfên aydê wê demê her wilo man lê bi rengine dî ku dikarîbûn di nava çanda nû de ji xwe re cih bibînin, berdewam kirin. Xocê Xizir jî yek ji van motîfan e ku, bi rastî motîfeke mîtolojîk e lê di nava çanda nû ya dînen mezin de jî ji xwe re cih dîtiye. Belkî sedema vê yekê ew be ku, di nava zargotinê de cihekî wî yê ku nikare bê dagirtin hebû û her wiha roleke wî ya gelekî bi fonksiyon hebû.

Di kevneşopa çandî ya civakan de û di zargotina civakan de, hin taybetmendiyên dî yên vê motîfa girîng hene. Ev motîfa ku di piraniya civakên rojhelatî de, jê re Xidir an jî Xizir hatiye gotin, carina dibe ku wekî '*mirovekî zana*', '*kalemêrekî rîhsipî*', '*kalemêrekî alim*', '*derwêşekî*' jî derê pêş me. Ji ber ku erka wan a ku di berhemên zargotinî de pêk tê, heman e.

Di berhemên zargotinî de, peywira herî karakterîstîk a Xocê Xizir ew e ku, ew di xaçerêyên ku hem qedera hîkayeyê û hem jî qedera leheng diguhere de, dertê û meyleke nû didê hîkayeya ku di cihekî de tengav bûye. Ya rast eger ku Xocê Xizir peyda nebe, hîkaye bi xwe pêk nayê jixwe. Yanî mînak dema ku em li destana folklorî a Memê Alan dinihêrin, di dema ku bav û apên Mem, êdî ji her tiştî bêhêvî ne û eger ku çîrok li wê derê biqede wateya wê ya çîrokbûnê nîn e, Xocê Xizir dertê meydanê û bi

tilsimekê ji kordûndebûna bavê Mem re çare dibîne û bi vî rengî rê li çîrokê vedike.¹³⁶ Yanî eger ku ev motîf nîn be, hingê hatina dinyayê ya Mem bi xwe ne mumkun e.

Xocê Xizir û kordûndetî du motîfên girîng in ku di çîrokan de li dû hev tên. Yanî dema ku em di çîrokekê de rastî kordûndebûna padişahê an jî mirovekî tên, bi piranî diyar e ku wê kêliyêkê dûre Xocê Xizir peyda bibe û meseleya kordûndebûnê çareser bike.

Motîfa Xocê Xizir carina di çîrok û destanan de bi motîfa ava heyatê re têkildar jî hatiye bikaranîn. Yanî wilo hatiye bawerkirin ku cihê ava heyatê, bi tenê Xocê Xizir dizane.

2.16.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Xocê Xizir

Li gorî kataloga Stith Thompson, xalên ku bi vî motîfê re têkildar, di Destana Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî de derketine pêş me weha ne:

V200-V299: Sacred Persons/Mirovên Pîroz: *Pîr*; *Mem û Zîna* Xanî.

J152.2: Advice from dervish/Şîretên derwêş: Nêzî rola Xocê Xizir e; varyant V, VI, R. Lescot.

N844: Dervish as helper/Derwêşê alîkar: Xocê Xizir jî heman alîkariyê dide Mem; varyant V, VI, R. Lescot, *Mem û Zîna* Xanî.

Di destpêka varyanta şeşan (VI) a Memê Alan de, di gihandina hev a Mem û Zînê de, motîfa Xizir derdikeve pêş me. Xizir û Elyas û perî, Zînê ji bajarê Cizîrê digirin û bi rengêkî sêhrî, dibin koşka Mem. Di heman varyantê de, dema ku Mem û Bengîn dikevin rê da ku bigihên Cizîra Botan, Xizir wan tevî hespên wan, bi rengêkî sêhrî, ji bajarê Muxurzemînê digire, datîne ber bajarê Cizîra Botan. Di varyanta Roger Lescot de di çend xaçarêyan de derdikeve meydanê (berî ku Mem bê dinyayê dertê pêş bavê Mem, dema ku Mem tê dinyayê derdikeve û navê wî lê dike, dema ku Mem ji bajarê xwe dertê da ku Zînê bibîne, Xocê Xizir derdikeve pêş wî û wî di heqê hin tiştan de hişyar dike). Di *Mem û Zîna* Xanî de, ne wekî karaktereke çîrokê lê bi rengine dî, bi rêya teşbîh û bibîranînan carina navê Xocê Xizir derbas dibe. Di varyantên dî yên Memê Alan de em rastî motîfa Xocê Xizir nayên. Lê li şûna wî di varyanta pêncan (V) de behsa *Şêxê Hunkarî* hatiye kirin ku bi îlhama ji xewnan, ji kordûndebûna bavê Mem

¹³⁶ Bnr. Roger Lescot, *Memê Alan*, r.22

re çareseriyekê dîtiye. Di varyantên dî de jî hertim behsa *cotkarekî* hatiye kirin ku berî ku Mem bigihê bajarê Cizîrê, lê rast tê û di heqê Cizîriyan de jê agahiyan digire. Lê têkiliya vî *cotkarî* ya bi Xocê Xizir re baş ne zelal e. Varyant II, VIII, IX, X, XI.

Di destana mezin a Mîhr û Muşterî de jî motîfa Xocê Xizir derdikeve pêş me. Bavên Mîhr û Muşterî jî kordûnde ne lê li çolê *'derwêşek'* rastî wan tê û tilsimekê dide wan û bi vî rengî ew dibin xwedî zarok yanî Mîhr û Muşterî tînan dunyayê. Li vê derê tiştê ku *'derwêş'* pêk tîne û rola *'Xocê Xizir'* heman tişt e. Lewre her du heman motîf in di zargotinê de. Li vê derê divê bê destnîşankirin ku ev tilsim, bi piranî sêvek, fêkiyek, hêşnahiyek û carina jî tarîfekê ye.

Divê em destnîşan bikin ku, dema ku di hîkayeyên bi vî rengî de, Xocê Xizir dertê pêş lehengan, bi piranî ew tînahîyan ku ew Xocê Xizir e, encax dûre vê fêm dikin. Xocê Xizir jî bi piranî di şeklê *derwêş*, kalemêrê rûhsipî, mirovekî zana de dertê pêş lehengan.

2.16.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Xocê Xizir

Di *Mem û Zîna* Xanî de jî di çend cihan de navê Xocê Xizir derbas dibe. Balkêş e ku çawa di Memê Alana folklorî de Xizir, dema ku Mem di rêya gihaştina Zînê de rêya xwe şaş dibe, dertê; di *Mem û Zîna* Xanî de jî Xizir, dema ku Mem di nava wê atmosfera karnavalî ya Cizîrê de pê dihesse ku kesekî pir xweşik li meydana bajêr e û dixwaze here wî bibîne, yekî wek Xizir dertê pêş wî û Tacdîn û ew pirsê wî kesî jê dikin û ew kesê ku Xanî wî dişibîne Xocê Xizir, rêya Mem ber bi Zînê ve rast dibe. Yanî di her dû berheman de jî Xocê Xizir dibe wesîle ku Mem bigihê Zînê û destan bikeve nava aktîvasiyoneke nû.

14/15 Tacdîn sekinî û pirsîyar kir

Pirsê xwe bi yekê îxtiyar kir

Go: “Ey Xidirê rehê hîdayet

Bêj ev çî belaye bê nihayet?”

Wî got. “Du şehlewendê şeddad

Îro li vî xelqî bûne cellad”

Di beşa 39an de dema ku hemî xelkê bajêr û Mîr diçine nêçîrê û Mem dimîne, Xidir dikeve dilê Mem û wî derdixe derve û ber bi rêyekê ve dibe. Ev rê, wî ber bi Koşka Mîr ve, ber bi Zînê ve dibe. Yanî li vê derê Xidir dîsa bi fonksiyona gihandina hev a evîndaran derketiye pêş me.

39/10 Naçarî ji xdanî ew bi der ket

Ew da'iyê Xidrî bû bi ber ket

Ew Xidrî çi bû? Teşewwuqa dil

Ew şewqî çi bû? Te'eşşuqa dil

Di *Mem û Zîna* Xanî de, di hin deran de *kalemêrekî zana*, derdikeve pêş me ku, ew hin caran dişibe Xocê Xizirê ku haya wî ji hemî rewşên penî û nepenî heye û di hin deran de jî wekî çîrokbêjekî ku serencama Mem û Zînê ji Xanî re neqil dike dertê meydanê. Xanî ji bo vî kesî pênaseyên mîna, *Danayê Kuhensal*, *Pîrê Aqil*, *Rawî*, *Pîr*, *Matemî*, (Kesê) *Agahdarê ji halê dewr û eyyam*, *Neqqaşê sahîfeyê hîkayet*, *Seyyadê Şîkar* bi kar anîne. Vî mirovê ku Xanî teswîr dike, carina bi tenê çîroka Mem û Zînê neqil dike lê carina em dibînin ku wî bi renegekî derasa li matema Mem û Zînê şahidî kiriye û carina jî em dibînin ku ew bi rêya *îlham* an jî *xewnan* ji dinyaya dî jî agahiyan digire. Lewma ew carina bi tenê çîrokbêjekî folklorî ye û carina jî wekî Xocê Xizirê ku di heqê her rewşê de agahiya wî heye, derdikeve pêş me. Ev motif di *Mem û Zînê* de bi van rengan derdikeve pêş me:

8/1 Neqqaşê sehîfeê hîkayet

Neqqadê sebîkeê riwayet

Kêşa bi vî terzî resm û ayîn

Lê da bi vî terzî derb û tezyîn

8/29 Rawî wehe gote min mu'emma

Ew hûrî bi navê Zîn musemma

36/1 Seyyadê şîkarê husnê exbar

Kir bo me ku serguzeştî îzhar

Go: "Rojeke xweş bi fesl û eyyam

Dewra felekê fena serencam

54/5 Rawî wehe gote min rîwayet
Zînê ku bihîstin ev hîkayet

Di van mînakên jorîn de, ev kalemêr wekî çîrokbêjê folklorî derdikeve pêş me û çîroka Mem û Zînê ji Xanî re neqil dike.

Lê di van mînakên jêrîn de ew hem çîrokbêjê folklorî ye û hem jî bi rengekî derasa hem di matema Mem û Zînê de hazir bûye hem jî haya wî ji gelek zanînên vê cîhanê û cîhana piştî mirinê hene.

11/4 Danayê mue'mmerê kuhensal
Ev renge he go ji bo me ehwal

50/1 Tedbîrkunendê pîrê 'aqil
Ev rengehe bû ji bo me naqil

53/1 Ew me'temîyê ku baxeber bû
Ev renge ji bo newheker bû

Go: "Can ku ji hebsê ten cuda bû
Feryad û fixan ji şehî rabû

57/1 Agahi ji halê dewr û eyyam
Ev rengehe gote min serencam

Go: "Pîrekî mihirdarê aşiq
Qewlê wî ji rengê subhê sadiq

57/8 Wî pîrî bi xewn eger bi îlham
Ev renge he kir heqîqet î'lam:

Go: "Çûme diyarê baxê Ridwan
Min dî du hezar ji hûr û xilman

2.17. MOTÎFA XEBERGUHÊZ Û PÎREJINA XEBERGUHÊZ

Motîfa xeberguhêzî û pîrejina xeberguhêz, di Motif Indexa Stith Thompson de di beşa **Siûd û Talih** de, di hejmara N'yê hatiye qeydkirin. Ji bilî vê di beşa **Motîfên Heywanan** de jî di binê herfa B'yê de heywanên xeberguhêz hatine qeydkirin

Ev motîf wekî hevbeşiyêke çîroka kurdî, di xebata Zeynelabidîn Zinar de, di binê sernava **Pîrejin** de, di hejmara 81an de hatiye qeydkirin

Têgiha xeberguhêzî an jî qasidiyê, hem ji alî motîfên çîrokan ve hem jî ji aliyê çanda gelêrî ve xwedî girîngî ye. Qasid, carina di navbera du evîndaran de ye, ku ew ji aliyê zargotinî ve forma herî otantîk û girîng e; carina di navbera du dijminan de ye, carina di navbera du dewletan de û carina jî di navbera Xweda û civakê de ye; her wekî ku hemî pêxemberan navê qasid/resûl li xwe kirine.

Qasid, di hin rewşan de mêr in û di hin rewşan de dibe ku jin bin. Bi piranî di qasidiya çanda gelêrî de, qasid an jî xeberguhêz mêr an jî kalemêr e. Lê xeberguhêzê ku di çîrok û destanan de wekî xeberguhêzê navbera evîndaran dertê pêş me, jin e an jî pîrejin e.

Di çîrokan de, çi çîrokên evînê û çi jî di çîrokên dî de, her wiha di destanan de, carina *pîrejinek* derdikeve pêş me ku di rewşa ku ne pêkan e her du evîndar ji hev agahdar bibin de, an jî di rewşa ku leheng dixwaze xwe bi kesekî ve bigihîne lê ji ber hin qedexeyên civakî û curbicur qedexeyên dî nikare xwe pê bigihîne, ev *pîrejin* derdikeve û di navbera her du lehengan de agahiyan dibe û tîne.

Lêkolîner Zeynelabidîn Zinar, li ser vê motîfa ku di çîrokên civaka kurdan de gelekî tê dîtin, wiha gotiye:

“Karê pîrejinê di Çîroka Kurdî de, birin û anîna peyaman e. Ew deverên ku mêr nikarin xwe bigihînine wirê, pîrejinekê dişînin. Xasma di gihandina keç û xortan de, pîrejin dilqekî mezin dide nîşandan. Lê hin caran pîrejin ji bo fesadî û xirabiyan jî tê bikaranîn, hin caran ji bo ji rê derxistina jin û qîzan tê bikaranîn û hin caran ji bo kuştina hin kesên xuyanî jî tê bikaranîn.”¹³⁷

Di destana Siyabend û Xecê de em rastî vê motîfê tînin. Li gorî hin varyantan, dema ku Xecê ji aliyê serekeşîrê Şikakan ve tê revandin û haziriyên daweta wê tînin kirin; Siyabend xwe bi rêya pîrejinekê digihînin û wekî peyama gustîlika xwe jê re dişînin.

¹³⁷ Z. Zinar, *Şaxên Zanistiyê*, r. 128

Di vê kêliyê de peyam her tim ne şerte ku agahiyek be. Ew wekî ku di Siyabend û Xecê de derdikeve pêş me, dibe ku nîşanek be ji leheng. Dema ku hezkirî vê nîşana bi pîrejîne re dibîne; têdigihê ku leheng li nêzî wê ye an jî li dor û bera wê ye.

Di destanên evîne de, vê rola ku bi rêya motîfa pîrejîne tê bicihanîn, carina di forma dayîna lehengan de derdikeve pêş me. Wekî ku di Destana Wamiq û Ezra de û *Mem û Zînê* de em lê rast tên. Li vê derê dayîn/daye, di navbera evîndaran de agahiyan dibe û tîne.

Carina dibe ku ev wezîfeya qasidiyê ne ji aliyê kesekî/mirovekî ve lê ji aliyê heywanek ve jî bê kirin. Ev heywan dibe ku kevokek an jî heywaneke dî be. Di varyanta yekem (I) û dehan (X) de, piştî mirina Mem, hespê wî Bor diçe welatê wî Muxurzemîne û her tiştî ji bavê wî re radigihîne.

2.17.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Xebêrguhêziyê

Di Destana Memê Alan de, motîfa xebêrguhêziyê bi rengekî cuda derdikeve pêş me. Dema ku Mem dimire, hespê wî Bor, agahiya mirina wî ji bavê wî yê ku li Mixribiyane re dibe. Di hin varyantan de jî em dibînin ku, ji bo ku agahiyan di navbera evîndaran de bibe û bîne, Sitî, an jî qewraşên Zînê derdikevin pêş me. Lê behsa pîrejîneke xebêrguhêz nayê kirin.

Li gorî kataloga Stith Thompson, xalên ku di Destana Memê Alan û di *Mem û Zîna Xanî* de, bi vê motîfê re têkildar derketine pêş me weha ne:

N825.3: Old woman as helper/Pîrejîna alîkar: “Heyzebûna Zemanê” di navbera Mem û Zînê de, wezîfeya alîkariyê bo evîna wan dike; *Mem û Zîna Xanî*.

B290: Animals as messenger/Heywanên xebêrguhêz; varyant I, X.

B291.2: Horse as messenger/Hespa xebêrguhêz; varyant I, X.

Di hin varyantên folklorî ên Memê Alan de motîfa xebêrguhêziyê dertê pêş me. Dema ku Tacdîn li seferê ye û Mîr, li dû lîstika Beko, Mem avêtiye zindanê, Sitî an jî Zîn bi rêya qasidan xeberê ji Tacdîn re dişîne; varyant IV, V, XI.

2.17.2. Di Mem û Zînê de Motîfa Xeberguhêz û Pîrejina Xeberguhêz

Di *Mem û Zîna* Xanî de, em tevî hemî taybetmendiyên xwe yên ku di teşekila vê motîfê de xwedî cih in, rastî motîfa pîrejina xeberguhêz tên. Her wiha balkêş e ku di tu varyantên folklorî de behsa karaktereke wiha nehatiye kirin. Her çendî ku Xanî, ew wekî dayîna Sitî û Zînê dabe naskirin jî, geh navê Ecûzeyya Zemanî û geh jî navê Heyzebûn lê kiriye. Di *Mem û Zînê* de ew, di beşa ku evîna Mem û Zînê dest pê dike de derdikeve pêş me, her du lehengan bi hev dide naskirin û piştî vê jî wekî ku hîç nebûbe, hunda dibe. Yanî di prosesa berdewamiya destanê de em hîç lê rast nayên.

Xanî di beşa 16an de wiha tarîf bi dayîna Sitî û Zînê dike:

16/5 Dayîneke wan hebû, zemanî
Teşbîhê belayê asîmanî

Zala felekê li ber zebûn bû
Wê navi ji pîrî Heyzebûn bû

Di beşa 19an de Xanî, Heyzebûna ku çûye cem Şêxê Remmal, wekî qasid bi nav kiriye. Xanî, ji bo vê pîrejînê di wateya pîrî, pîrejînî de; Heyzebûn û Ecûzeyya Zemanî jî gotiye. Her çendî ku li vê derê Heyzebûn serî li hîleyekê daye jî (li hember Sitî û Zînê), bi rastî ew qasidiyê dike di navbera Sitî û Zînê û Şêxê Remmal de.

19/5 Ev rengehe got Qasida Pîr
“Meqsûdi bi mekr û kîzb û tezwîr

Di beşa 20, 21 û 22yan de em Heyzebûnê, di rola pîrejina ku di çîrok û destanan derdikeve pêş me de dibînin. Ew di navbera evîndaran de diçe û tê û agahiyên wan ji hev re dibe.

20/5 Wê go: “Bi serê Sitî û Zînê
Mehda ji we ra dikim girînê

Mexsûsi ji nik Sitî û Zînan
Hatim li we xweş bikim birînan

Enguşteriyê de we eva ne
Înane mi ew ji bo nîşan e

Hûn helgirin û bidin nigînan
Bednamî mekin Sitî û Zînan

Ez qasid û hûn ji bo mi meqsûd
Hûn min mekin ê miradimerdûd”

20/18 Da ez vegerim bi van nigînan
Tesxîrî bikim Sitî û Zînan

Te’cîlf bikim ji bo sewabê
Zû bême ve ji bo cewabê

Piştî ku Heyzebûn wiha xwe bi wan dide naskirin sozê dide Mem û Tacdîn ku ew ê ji bo wan ji Sitî û Zîne xeber bîne, ew vê yekê wekî mizgînekê qebûl dikin û Mem bi rêya qasida pîr, wiha xeber ji Zîne re dişîne.

20/24 Ey Daye, tu qasidê hebîb î
Bêşubhe li derdê min tebîb î

Sedqeê serê Zîlcemalê, Zîne
Mestîne ji destê min nigîne

Gava tu diçî ey wefadar
Ev rene ji min bibêje dildar:

Ew şah e eger çi ez geda me
Eltafe şehînşehan e ‘am e

Ez bende ne laîqê wîsal im
Xursende bi sûretê xeyal im

Radî me ji ew qeder cemalê
Min bînite xelweta xeyalê

Her gahî ji ahê dil bitirsit
Gehgahî li halê min bipirsit

Heyzebûn bi van agahiyên ji cem Mem û Tacdîn vediqete û digihê cem Sitî û Zînê. Piştî ku agahiyên ji Mem û Tacdîn neqlê wan dike, vêcarê Sitî û Zînê pê re xeber dişînin ji Mem û Tacdîn re.

21/32 Rabe here zû bibêje Tacdîn:

Ger dê te Sitî bivê, Memê Zîn

Mizgîn ji we ra me hûn qebûl in
Em jî ji we zêdetir melûl in

Işqa we celew ji me reva ye
Manî' li me perdeya heya ye

Ew perde ji bo we ra 'edîm e
Bêperdeyî ji bo we ra qedîm e

Xwazgîn û wesaît û wesîle
Herçî ku ji bo wa bên cemîl e

Ev renga bibêje wan hebîban:
Mecmû'ê mewalî û xetîban

Hindek ji we ra bibin ricaçî
Hindek ji me ra bibin dua'çî

Belkî kiribit xwedê muqedder
Wesla me û we bibit myesser”

Di vê kêliyê de xeberguhêz roleke jiyanî dilîze û dibe wesîle ku ew evîn bi rêya gihaştinê (zewacê) bigihê encamê.

Dayîn li ser vê daxwaza Sitî û Zînê, derhal xwe digihîne cem Tacdîn û Mem û wê mizgînê ji wan re radigihîne. Li ser vê mizgînê, Tacdîn hazirî bo xwestina Sitiyê dike.

22/4 Ew daye ji rengê Erestetalîs
Ser ta bi qedem lîbasê telbîs

Dîsan ketî sûretê tebîban
Hadîr xwe gîhande nik hebîban

Ew mujde wekî me gotî, gotin
Ew sotî wekî nesotî sotin

22/11 Gava ku ewan bihîstî mizgîn
Hay dan bi tebayî xelq û xwezgîn

Ji van beytên jorîn em têdigihên ku xeberguhêz, karê xwe bi dizî dike. Ji bo ku ney naskirin, cilên xwe diguhêre û diçe cem evîndaran. Veşartin û bi dizî çûyin û hatin bi vê motîfê re têkildar, di gelek berhemên dî yên zargotinê de jî dertê pêş me.

Piştî ku Heyzebûn an jî Ecûzeyya Zemanî, vî karê xwe ber bi serî ve dibe, wekî ku Xanî, bi tenê ji bo vê pêdiviyê ew daxilê nava avahiya destanê kiribe, êdî heya dawiya destanê hew behs jê tê kirin.

Di *Mem û Zînê* de, motîfa xeberguhêziyê di dereke dî de jî derdikeve pêş me lê vê carê foksiyon û peywira xeberguhêz, ji xeberguhêziya ku Heyzebûn dike cudatir e.

Piştî ku Mîr, Mem diavêje zindanê û di ser de gelek wext derbas dibe, Tacdîn û birayên xwe ji ber vê rewşê, hew di ber xwe didin û radibin da ku yan Beko ji Mîr teslîm bigirin yan jî şerekî li hember Mîr bikin. Lê wekî ku di kevneşopa bûyerên bi vî rengî de heye, ew jî *qasidekî* dişînin ji Mîr re, da ku giranî û cîdiyeta rewşê bînin bîra Mîr.

47/9 Tacdîn ji tewabi'ê xwe yek pîr
Te'yîn kir û zû şihande pêş Mîr

Gotê: “Here bêje mîr û axan
Bînende venakujin çiraxan

Di van beytên jorîn de em dibînin ku vê carê qasid, mêr e, kalemêr e. Her wiha di qasidiya bi vî rengî de, veşarîbûn, karê xwe bi dizî kirin, nîn e. Her tişt aşkera li pêş her kesê pêk tê. Lewma dema ku *qasid* dertê pêşberî Mîr, Xanî destnîşan dike ku *qasid*, her tiştê ku Tacdîn jê re gotî, bi heman rengî bêyî ku yek kêma an jî yek zêde bike, ji Mîr re dibêje.

48/1 Teqrîrî ku kir tamamî qasid
Waqif geriye bi halî hasid

Zanî ku ji bo wî re xirab e
Go: “Efwi ji bo Memê sewab e

Li ser vê rewşê, Mîr jî li dû şîretên Beko, bi *qasid* re xeberê dişîne ji Tacdîn re.

48/24 Mîrê we ku dil bi kerbê sotî
Herçî ku Bekir ji bo wî gotî

Bawer kir û gote merdê qasid:
“Ey pîr meke tu fikrê fasid

Ger fewtî bikim cemî’ê ferzan
Tacdîn ku didim ji dest xwe erzan?

Min şewket û seltenet bi wî ne
Ev şuhret û şan min ji wî ne

Ev nam û nîşan û ev meqame
Bê xatirê wî li min heram e

Ew Rustemê Gîw e, lendeha ye

Gencîne me ez ew ejdeha ye

Bêje: Bi dilê xwe min Mem û Zîn

Her du bi helalî dane Tacdîn

Dema ku *qasid* bi van agahiyan vedigere cem Tacdîn û birayan û ji wan re hemî tiştên ku Mîr gotî neqil dike, hingê her sê bira jî ve yekê bi dilgeşî pêşwazî dikin.

48/33 Qasid ku rewane bû ji pêşi Mîr

Teqrîrî ku kir tamamî te'bîr

Şêrê di li şer we bûn mulaîm

Gotin: “Dem û dewleta wî qâim

2.18. MOTÎFÊN MÎTOLOJÎK

Ev motîf, di Motif Indexa Stith Thompson de, di beşên **A: Motîfên Mîtolojîk**, **B: Heywanên Mîtolojîk** û **F: Derasayîyan** de, di hatine qeydkirin.

Di xebata Zeynelabidîn Zinar de, wekî hevbeşiyêke çîroka kurdî bi navê motîfên mîtolojîk behs ji van motîfan nehatiye kirin lê behsa hin heyin û cihên derasayî hatiye kirin ku em di beşa Motîfên Derasayî de li ser wan sekinîne.¹³⁸

Wekî ku me di destpêka vê tezê de jî diyar kiribû, bi zimanên grekiyan mîtos an jî mît û bi zimanê rojhelatîyan efsane, di zargortina miletan de cihekî gelek girîng digirin. Her çendî tê zanîn ku, ew bi pîranî piştî xwe naspêrin rastîyan jî, ji ber ku ev cure berhemên zargotinî, sînorên texeyula civakan an jî bêsnoriya texeyula civakan nîşan didin, her wiha der bareyê dîn û baweriyên wan ên arkaîk de agahiyên girîng didin; xwedî girîngiyêke zanyarî ne jî. Her wiha ev cure berhem, yanî efsaneyên miletan; di heman demê de xeyalên wan ên kolektîf, tirsên wan ên kolektîf, tesewira wan a di heqê paşeroj û pêşeroja cîhanê de nîşan didin û rê didin zanyarên îroyin ku, ew li ser atmosfera manewî ya miletan bigihîjin hin fikran, li ser psîkolojiya civakê, li ser cîhana rûhî ya civakê bikaribin hin tehlîlan bikin.

Lêkolîner Doğa Kaya derbarê mîtan de wiha nivîsiye:

“Mît; ji wan çîrokên pîroz re tînan gotin ku; mijarên wan bûyerên ku beriya dîrokê qewimîne ne û leheng û tîpên wan derasa ne.”¹³⁹

Folklornas Nurettin Albayrak jî ji bo mîtan pênaseyêke wiha kiriye:

“Mît; hikayeyên serboriyên derasa, yê der bareyê mirovên dewra pêşîn û xwedayan de ne. Di vegotina wan de îlaweyên dînî û efsaneyî hatine kirin û bi rêya çanda devkî, derbasî neslên dî dibin.”¹⁴⁰

Bandora mîtolojîyê ya li ser folklorê civakan, mijareke gelekî fireh e bêguman. Ji çîrokê em bigirin heya bi destanan, ji baweriyên civakê bigirin heya bi kevneşop û adetan, di pir waran de bandora efsaneyan heye. Her wiha tesîra van efsaneyan carina li ser jiyana rojane ya civakan jî çêdibe. Ev cure fikirîn ku, bi rastî cîhana xeyalî ya civakan temsîl dike, bi hêmanên mîna Teyrê Enqa (heyin) yê xeyalî heya bi Çiyayê Qaf

¹³⁸ Bnr., Motîfên Derasayî, r.

¹³⁹ D. Kaya, *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*, Weş. Akçağ, Ankara., 2007, r. 528

¹⁴⁰ Nurettin Albayrak, *Ansiklopedik Halk Edebiyatı Sözlüğü*, Weş. Kapı, İstanbul, 2010, r. 409

(mekan) ê xeyalî, ji efsaneyên li ser bûyinê (Efsaneya Hz. Nûh) heya bi efsaneyên li ser rabûna miletan (Efsaneya Kawa), ji heyinên mîna dêwan (temsîla xerabiyê) heya bi heyinên mîna periyên (temsîla başiyê) pêk tên. Wekî ku tê dîtîn, cîhana mîtolojiyê bi gelek hêmanên cihêreng tijî ye ku ev hemî hêman, di rastî de bi jiyên û baweriyên civakê re têkildar in. Her wiha em dikarin bibêjin ku ev cure fikirîn hê jî di nava civakê de bi rengê berbelav heye, digel ku vegotina nûjen di nava civakê de rûniştîye jî.

Di folklorê kurd de, ji aliyê hêmanên mîtolojîk ve dewlemdiyeke berbiçav heye. Wekî ku tê zanîn, jêdera mîtolojiya kurd û farisan yek e. Heta em dikarin heya merheleyekê mîtolojiya hîndûyan jî bigihînin heman jêderê. Bêguman ev jêdera hevpar, jêdera Aryanî ye. Çanda Aryanî, ji nava xwe dînen mezin wekî mîtraîzîm û zerduştîyê derxistîye. Ev her du baweriyên kevnan, bi gelek hêmanên mîtolojîk tijî ne ku, dûre di folklorê gelekî miletan de cih girtine. Wekî mînak, di baweriyên zerduştî de ‘*daîva*’ hene wekî temsîla xerabiyê. Li dû baweriyên zerduştîyê, hêzên baş û *daîva* her tim bi hev re di nava şerekî de ne. Em dikarin jêdera motîfa dêw, bigihînin heya vê derê. Ji ber ku em berî wê nizanin, em nikarin bibêjin ku teqez ev e lê em dikarin bibêjin ku, dêwên ku hem di berhemên zargotinê yên kurdan de hem jî di zargotina hemî cîhanê de cihêkî pir fireh û taybet digirin, bi ‘*daîva*’yên zerduştî re heman heyin in ku, li aliyê hêza nebaş in.¹⁴¹

Her wiha Rustemê Zal/Kurd ku, lehengekî efsaneyî ye, ne tenê di nava zargotina miletê kurd û faris de, di nava zargotina gelek miletên rojhelatî de cihêkî gelek berfireh digire; wekî temsîla başî û hêz û cesaretê. Ji bilî van hêmanan, Efsaneya Newrozê heye ku piştî xwe dispêre Efsaneya Kawa an jî Dehaq ku dûre ev efsane wekî cejnêkê hatiye pîrozkirin û di nava çanda piraniya civakên rojhelatî de cihê xwe girtiye. Her wiha balkêş e ku hêmaneke wiha mîtolojîk, bi rengên civakî û siyasî jî li ser gelek miletan tesîr kiriye. Dîsa efsaneyên li derdora lehengên/kralên mîna Cemşîd û Ferîddûn, efsaneyên gelek kevnan in.

Bêguman em gelek ji van hêmanan û kevneşopa mîtolojîk a îranî, bi rêya Şehnameya Fîrdewsî û Şerefnameya Şerefxan dizanin. Lê divê neyê piştçavkirin ku, di kevneşopa gelêrî ya miletê kurd de, pirî ji van destan û efsaneyan hê jî zindî ne û tên zanîn. Bi taybet efsaneyên li derdora jiyana Rustemê Zal û Efsaneya Newrozê, di nava civakê kurd de baş tên zanîn. Yanî miletê kurd, bi rêya kevneşopa devkî, ev efsane heya îro anîne.

¹⁴¹ Christina Allison, *Yezidi Sözlü Kültürü*, r. 39

2.18.1 Di Destana Memê Alan de Motîfên Mîtolojîk

Di Destana Memê Alan de, ji bilî destpêka destanê ku bi perî û melean dest pê dike, motîfên mîtolojîk kêma in. Di beşa Motîfên Derasayî de em li ser van sekinîne. Lê di gelek varyantên Memê Alan de behsa hespê Mem, Bor an jî Bozê Rewan tê kirin ku ew heywanekî mîtolojîk e.

Li gorî kataloga Stith Thompson, di Destana Memê Alan û *Mem û Zîna Xanî* de, motîfên mîtolojîk di van xalên jêrîn de derdikevin pêş me:

- A1000-A1099:** World calamities and renewals/Felaketên dinyayê û xwe nûhkirin: Efsaneya Tofanê û avakirina jiyaneke nû.
- A1010:** Deluge/Tofan: Efsaneya Tofanê: *Mem û Zîna Xanî*
- A1020:** Escape from deluge/Ji tofanê revîn: Keştiya Nûh; *Mem û Zîna Xanî*
- A1610:** Origin of various tribes/Esliyeta curbecur qebîleyan: Efsaneya Nûh, Efsaneya Bejn û Boht; *Mem û Zîna Xanî*.
- F500-F599:** Remarkable persons/Kesayetên Derasa: Cemşîd, Rostem, Bîjen, Guhderz; *Mem û Zîna Xanî*.
- F600-F699:** Persons with extraordinary powers/Kesên xwedî hêza derasa: Rustem, Cemşîd; *Mem û Zîna Xanî*
- B0-B99:** Mythical animals/Heywanên mîtolojîk: Bozê Rewan ji behrê dertê; varyant: IV, R. Lescot. Şebdîz û Gulgûn; *Mem û Zîna Xanî*.
- B100-B199:** Magic animals/Heywanên Efsaneyî: Bor, Bozê Rewan; hemî varyantên Memê Alan. Rexşê Belek; *Mem û Zîna Xanî*. Teyrê Sîmurg, Teyrê Enqa, Teyrê Hûma; *Mem û Zîna Xanî*.
- B120:** Wise animals/Heywanên Jîr: Bor an jî Bozê Rewanê Mem; hemî varyantên Memê Alan.
- B170:** Magic Birds/Teyrên Efsaneyî: Teyrê Hûma, Teyrê Sîmurg, Teyrê Enqa; *Mem û Zîna Xanî*.
- B210:** Speaking animals/Heywanên diaxivin: Bor an jî Bozê Rewanê Mem, pê re diaxive, wî li hember xetereyan heşyar dike; varyant: I, VII, VIII, IX, X, XI, R. Lescot. Li ser mirina Mem, hespê wî Bor vedigere Muxurzemînê û tiştên ku hatine serê Mem ji bavê wî re radigihîne; varyant I, X.

2.18.2. Di Mem û Zînê de Motîfên Mîtolojîk

Xanî di *Mem û Zînê* de, ji van motîfên mîtolojîk gelek sûd wergirtiye. Hem ji mîtolojiya ku, jêdera wê çanda devkî ya civaka kurdan e û hem jî ji mîtolojiya ku jêdera wê Şehnameya Fîrdewsî ye, gelek hêman di *Mem û Zînê* de bi kar anîne. Her wiha di berhema folklorî Memê Alan de ku Xanî ji bo berhema xwe kiriye bingeh, hin motîfên mîtolojîk hene. Wekî destpêka destanê; hevdîtina ewil a Mem û Zînê, wekî hespê Memê Alan ê ku ji behrê dertê û hwd.¹⁴² Bêguman ji ber ku Xanî xwestiye destana folklorî li dû şertên demî û mekanî realîze bike; ew ji gelek motîfên bi vî rengî paqij kiriye. Lê di şûna van de, hin motîfên dî yên nû bi kar anîne ku ev cure motîf, heya radeyekê jî girêdayî kevneşopa helbesta klasîk bûn. Yanî Xanî ne ku berhema *Mem û Zîn* bi tevahî ji hêmanên mîtolojîk paqij kiriye, lê hêmanên ku dewra wan derbas bûye derxistiye û li şûna wan hin hêmanên nû yên mîtolojîk û bi rêbazeke nû bi cih kiriye. Em ê di vê beşa teza xwe de, li ser van hêmanên mîtolojîk bisekinin.

2.18.2.1. Efsaneyên Afirînê

2.18.2.1.1 Efsaneya Tofanê

Efsaneya Tofana Nûh, hem di kevneşopa çanda civakan de hem jî di kevneşopa dînî de, di kitêbên pîroz de wekî bûyereke qewimî, di nava miletê de gelek berbelav e. Têkiliya di navbera efsane û baweriyên dînî de têkiliyeke girîng e. Çunkî gelek bûyer an jî qewimîn hene ku, hem di nava gel de ji metnên dînî bêrî, tînan zanîn û hem jî bi heman rengî yan jî bi hin nuansan, di kitêbên pîroz de derbas dibin. Li ser rûyê cîhanê Efsaneya Tofana Nûh jî yek ji wan efsaneyan e ku, di radeyêke pir fireh de tê zanîn. Ev efsane, hem di zargotina gelek civakan de cih digire û hem jî di kitêbên pîroz wekî Qur'an û Tewratê de jî ji vê efsaneyê hatiye behskirin. Li vê derê tiştê balkêş ji alî termînolojîyê ve ev e ku, em ê baweriyên dînî di kîjan radeyê de efsane bihesibînin. Bêguman ev mijareke cuda ye ku divê bê tesbîtkirin. Dîsa hin bawerî hene ku di kitêbên pîroz de derbas nebûne lê wekî ku efsane bin di nava gel de ji wan tê behskirin û bawerkirin. Li vê derê divê em vê yekê bibînin ku, di navbera efsane û bawerkirinê

¹⁴² Bnr. Li beşa Muqayese, Epîzota Hevdîtina Ewil Ya Mem û Zînê

de, t kiliyeke gelek  aşkera heye. Ev yek di curey n d  y n zargotin  de dernay  p ş me.

Xan  di *Mem   Z n * de di beşa 23yan, wiha behsa Keştiya Hz. N h dike.

23/35 Nageh geriya bi C d  meft h
Dergah  Kerem li Keştiya N h

Yan  ku ‘emareta Sit  t 
Qesra periya bi rast  t 

Her texte ji ‘ d  sendel s 
Textek xetebend  aben s 

‘Erşek ji cewahiran muresse’
Belq s cel s   l  murebbe’

Dest best  ji p ş ve p şekaran
Z r nkemer   guherguharan

Sed “Asef Berxiya” wek  ba
Hemmal  dikir bi ‘erş  dilşa

Hilgirtine ser ser  xwe ew mehd
Dest dest direvan ji hev bi sed cehd

Ew texterevan wek  gem  b 
Behra ku bi serket Adem  b 

Di van beyt n jor n de, xuya dike ku, Xan   end  li  anda efsaneyan, baweriy n d n    kevneşopa zargotin  serdest e. Xan  dema ku behsa dawetan dike an j  ş niya di daweta Tacd n   Stiy  dide, ji periy n di qesran de m nak dide. Per    Qesir, term nolojiyeke gir ng a  frok   efsaneyan e.

Li gor  r wayetan, digel hem  hewldanan j  Hz. N h qewm  xwe nikare  kna bike da ku ji xerab    r ya xerab vegerin, Xweda ferman dide w  ku ew keştiyeke mezin

çêbike û her cure heywan û nebatan bixê û tevî bawermendên xwe- ku li gorî efsaneyan ew heştê kes in- bikevinê. Lewra wê di demeke nêz de tofanek, lehiyêke mezin rabe ku dê hemî cîhan di bin avê de bimîne. Her wiha pêk tê û li gorî efsaneyê, ew bi rojan li ser avê digerin û di dawî de, Hz. Nûh kevokê difirîne da ku reşahiyê bibîne. Kevok dema ku vedigere, di nava nikulên wê de darikekî heye û Hz. Nûh bang dike, dibêje: ‘*Cî dî!*’. Lewma navê cihê ku wan lê daniye yanî navê çiyayê ku wan li serê daniye, maye ‘Cîdî’ an jî ‘Cûdî’.¹⁴³ Bêguman ev efsaneyekê ye li ser navê Çiyayê Cûdî, lê bi Efsaneya Tofanê re têkildar e. Lê li gorî Tewratê, keştiya Hz. Nûh li çiyayê Araratê, Agiriyê daniye.

Xanî şeniya ku di daweta Stî û Tacdîn de ne, bi qelebalixa xwe û piriya xwe dişibîne lehiya ku di Tofanê de radibe û textê ku Stî li ser e jî dişibîne Keştiya Hz. Nûh. Xanî tenê di beytekê de balê dikişîne ser ‘Keştî!’, ‘Hz. Nûh’ û “Çiyayê Cûdî” ku di rastî de her sê jî ji nêz ve bi hev re têkildar in.

2.18.2.1.2 Efsaneya Newrozê

Di nava civaka kurdan de ev efsane carina bi navê “Efsaneya Kawa”, “Efsaneya Dehaq” jî tê binavkirin. Her çendî ku ji alî zanyarî ve ne pêkan e ku bê ispatkriin jî, di nava civaka kurdan de Efsaneya Kawa û Newroz bi hev re têkildar hatine dîtin. Lewma ev her sê têgih, yanî Dehaq, Kawa û Newroz di prosesa efsaneyê de beşên girîng teşkîl dikin. Û heman efsaneyê pêk tînin.

Ev motîfa mîtolojîk-efsaneyî di tu varyantên Memê Alan de derbas nabe lê di *Mem û Zîna* Xanî de derdikeve pêş me.

Girîngiya vê efsaneyê ew e ku; gelê kurd ew ji bo xwe wekî cureyeke efsaneya afirînê dîtiye. Ev bawerî îro jî di nava gel de berbelav e ku, wekî miletê derketina ser rûyê cîhanê ya miletê kurd, bi vê efsaneyê re têkildar e.

Cejna Newrozê, motîf û kevneşopeke gelege kevnar e di nava miletê kurd de. Her wiha ne bi tenê di nava miletê kurd de, di nava gelek miletên Rojhelata Navîn û Asyaya Navîn de, wekî cejnê bi wateyên curbecur tê pîrozkirin. Çanda maddî û manewî ya miletê kurd, çandekî gelekî kevnar û her wiha mayinde ye di nava hemî rojhelat de. Em nîşaneyên vê yekê, ne bi tenê di nava çanda miletê kurd de dibînin; her wiha dema ku li çanda gelek miletên rojhelat bê lêkolîn, bi rihetî ê bê dîtin ku,

¹⁴³ H. Mem, Xani'den Platon İki Demet Çiçek

bandorên çand û zargotina miletê kurd çendî bi regekî berbelav di nava van çandên cîran de hene.

Her çendî ku ji aliyê zanyarî ve ne pêkan e ku bê îspatkirin jî, di nava miletê kurd de, Cejna Newrozê û Efsaneya Kawa bi hev re têkildar hatine dîtin. Her wiha di dîrokê de Efsaneya Kawa jî bi helweşandina dewleta Asûriyan û avakirina dewleta Medan re têkildar e. Di berhemên nivîskarên mîna Fîrdewsî, Sadî, Şerefxan de carina rasterast wekî Newroz, carina jî bi Efsaneya Kawa re têkildar jê hatiye behskirin.¹⁴⁴ Di heman demê de, di vê cejnê de wekî kevneşopê, vexistina agir, di ser agir de xwe avêtin, -ji ber ku peywendiyê xurt a agir bi dînê zerduştî heye- wekî taybetmendiyeke zerduştîyê hatine dîtin. Her wiha Ajî Dahaqqa yê ku di Efsaneya Kawa de derbas dibe, di Avestaya zerduştî de jî wekî mexlûqateke şeytanî jê hatiye behskirin.¹⁴⁵ Dîsa ji aliyê xwezayî ve jî, 21ê adarê teqabulê bidawîbûna dirêjîya şevan û yekbûna şev û rojan jî dike. Yanî bi kurtî ev cejn, cejneke ew çend girîng e ku hem bi dîroka miletê kurd ve, hem bi baweriyên dêrîn re, hem bi efsaneyan re û hem jî bi veguherîna xwezayî re têkiliyê wê ji nêz ve heye. Lewma ku ev destan bi xusûsiyetên xwe yê cihêreng, rê vekirîye ku her miletê rojhelat xwe di navê de bibîne, lê xwedî derê. Bêguman ev yek mezinbûn û firehbûna çanda miletê kurd nîşan dide.

Wekî ku me di beşên dî de jî destnîşan kiribû, di varyantên folklorî ên Memê Alan de, hîç behsa Cejna Newrozê nayê kirin. Li gorî varyantên folklorî, Mem û Zîn, li ser biryardayîna periyên li ezman, hev û du bi regekî ku di jiyana rastîn de ne pêkan e, dibînin. Xanî, ev motîfa derasa ku di çîrokan de dertê pêş me, ji destanê derxistiye û motîfeke jiyânî û kurdewar xistiye dewsa wê. Ev tercîh, bêguman meyla fikrên Xanî jî dide nîşandan. Her wiha em ê di beytên jêrîn de jî bibînin ku, Xanî dema ku teswîra Newrozê kiriye, ew bi rengê karnavaleke nûjen teswîr kiriye.

Xanî Newrozê wekî Sersalê, an jî destpêka biharê dibîne û behsa têkiliya wê û Efsaneya Kawa nake. Lê gelek balkêş e ku Xanî têgiha “Destana Newrozê” bi kar aniye û “Kurdistanî” gotiye bo vê destanê. Newrozê wekî destanekê dîtin –her çendî ku em baş pê nizanin ku Xanî têgiha destanê di wateya îroyin de bi kar aniye an na- nîşan dide ku Xanî, wê destana ku li dû vê cejnê ye dizane. Her wiha tercîha Xanî ya bi ser Newrozê, ji aliyekî dî de jî watedar e ku, gelek alimên ereb, Newrozê bi zerduştîyê re têkildar dîtin û pîrozkirina wê di cih de nedîtin an jî guneh dîtin. Cejna Newrozê bi vî rengî bi pêş de derxistin û wê di xaçerêyên destanê de di cihekî gelekî watedar de

¹⁴⁴ Şerefxanê Bedlîsî, Şerefname, r. 99-101

¹⁴⁵ K. Yıldırım, *Mem û Zîn, Çeviri ve Kavramsal Tahlili*, r. 349

bicihkirin, cuda nihêrîna Xanî û xwerûbûna wî ya bi ser çanda miletê xwe ve nîşan dide.

Xanî di beşa 11an de behsa Newrozê dike û di sernava xwe de wiha dibêje:

Dastana beyan Newroza sultanî/ Tesmiyeê mewsimê surûr û şadimanî/ Bi mersûmê qedîmê Kurdistanî/ Ku wan digotê sersal/ ‘Ed dikirin bi ‘îdê wîsal

Xanî di heman beşê de, wekî ku di gelek beşên *Mem û Zînê* de serî li ravekirina bi vî rengî dixê, Newrozê û rengê pîrozkirina wê, wekî ku ji yekê zana bihîstibe, wiha neqil dike:

11/14 Danayê mu’emmerê kuhensal
Ev rengine go ji bo me ehwal

Go: “Adetê pêşê zemanan
Ev bû li hemî cih û meknan

Weqtê ku şehsuwarê xawer
Tehwîlî dikir di mahê Azer

Ye’nî ku dihate burcê sersal
Qet kes nedima di mesken û mal

Bîlcumle diçûne der ji malan
Hetta digihîşte pîr û kalan

Roja ku dibûye ‘Îd û Newrûz
Te’zîmi ji bo dema dilefrûz

Sehra û çîmen dikirne mesken
Beyda û dîmen dikirne gulşen

Xasma ‘ezeb û keçê di bakir
Elqisse cewahirê di nadir

Têkda di muzeyyen û mulebbes
Vêkra li teferrucê murexxes

Lêkîn ne be tuhmet û be minnet
Belkî bi terîqê şer' û sunnet

Lewra ku ewan xered ji geştê
Meqsûd ji çûyina bi deştê

Ew bû ku çî talib û çî metlûb
Ye'nî du teref muhibb û mehbûb

Ev her du celeb ku hev bibînin
Kufwê di xwe ew ji bo xwe bibînin

2.18.2.1.3 Efsaneya Bejn û Boht

Di beşa 16an de di beyta 35an de Xanî behsa efsaneyêke ku, bingehên wê diçin demên dêrîn, dike. Bi rastî gelek millet hene ku, xwedî efsane an jî hin baweriyên der bareyê esliyeta xwe de ne. Meseleya ji ku derê hatina wan û efsaneyên li derdora vê meseleyê teşkilbûyî, ji demên kevna û heya niha, bûne mijara kevneşopa devkî. Vêca ji van efsaneyan hinek jê, bi rastî jî di nava hemî civakê de belav dibin û di rêjeyêke pîr fireh de bawermendên wan çêdibin. Li vê derê divê em bîr pê bînin ku, hin efsane hene ku, her çendî di metnên dînî de derbas nebûne jî wekî ku baweriyêke dînî bin, civakê ji wan bawer kiriye û di heqê rastî an jî ne rastiya wan hîç pîrs nepirsiye. Efsaneyên ku li derdora jiyana hin welî û hin pêşewayên dînî de teşkil bûne, bi tevahî bi vî rengî ne.

Di nava civaka kurdan de, gelek efsaneyên cuda li ser esliyeta milletê kurd hene. Li gorî hin baweriyên, kurd ji dema ku Keştiya Hz. Nûh li Çiyayê Cûdî daniye û vir ve, weke miletekî musteqîl hene. Ev efsane piştî xwe dispêre baweriyên dînî. Divê neyê jibîrkirin ku, Efsaneya Tofana Nûh, ne tenê di nava civaka kurdan de her wiha di nava gelek civakan de û carina ji kitêbên pîroz cuda, bi reng û lehengine dî, di nava civakine dî de jî heye. Efsaneyêke dî ya li ser esliyeta milletê kurd; Efsaneya Kawa an jî Efsaneya Newrozê ye ku me li jorê jê behs kiribû. Xanî di *Mem û Zînê* de ji bilî van

efsaneyan behsa Efsaneya Bejn û Boht jî dike. Ev efsane yek ji van efsaneyan e ku, jêdera wê Şerefname ye lê divê em bibêjin ku di nava gel de ew çend berbelav nîn e. Xanî di beşa 16an de di beyta 35an de wiha tîne ziman vê efsaneyê:

16/35 Hindî hene kîj û kur di Bohtan
Belkî di cemî'ê Bejn û Bohtan

Kes nîne bi lutf û husnê meşhûr
Îlla ku di deftera me mestûr

16/37 Ye'nî hemî rû bi rû me dîne
Hindî di vî şehre Ademî ne

Li gorî vê efsaneya ku di Şerefnameyê de derbas dibe; Bejn û Boht du bira ne û kurên serdarekî Cizîrê ne. Ji bo ku bibin xwedyê textê bajarê Cizîrê, her du bira li hember hev radibin şer. Di encama şer de Boht bi ser dikeve û dibe serdarê bajarê Cizîrê. Bejn jî diçe bajarê Hesenkêfê. Li dû baweriyê, hemî eşîrên kurdan ji nesla van her du birayan tên.¹⁴⁶

Girîngiya vê efsaneyê ew e ku, Cizîr û Hesenkêfê wekî navenda an jî cîwara ku yekem car milletê kurd lê zêde bûye an jî cîwar bûye nîşan daye. Bêguman em ji xwendinên îroyin ên dîrokê dizanin ku, welatê milletê kurd ê otantîk, herêma rojava ya welatê Îranê û başûrên behra Xezarê ye. Eger ev nêrîneke rast be, hingê ev efsaneya ku li jorê Xanî balê kişandiyê, ji aliyê dîrokî ne efsaneyeke ew çend dûr e. Hîç nebe ne wekî Efsaneya Kawa kevnar e. Lê kesên ku Efsaneya Keştiya Hz. Nûh wekî jêdereke dîrokî dibînin, dikarin hebûna herî otantîk a milletê kurd, bi bajarê Cizîrê ve girêdin. Bêguman hemî aliyên efsaneyan û baweriyên bi vî rengî, ne bi tenê mijara zanyariya folklorê ne.

Di nava milletê yahûdî de jî efsaneyeke bi vî rengî heye. Ew jêdera hemî qebîlên yahûdîyan digihînin her diwanzdeh (12) (li gorî hin jêderan ev hejmar 13 ye) zarokên Hz. Yaqûb. Li gorî efsaneya yahûdîyan, diwanzdeh qebîlên yahûdîyan hene û her yek ji vanan, ji kureke Hz. Yaqûb tên.

¹⁴⁶ K. Yıldırım, *Mem û Zîn, Çeviri ve Kavramsal Tahlili*, r. 208

2.18.2.2. Lehengên Efsaneyî

2.18.2.2.1 Efsaneya Cemşîd

Xanî di beşa 5an de behsa merdî û bêşûdiya milletê kurd dike de û di destpêkê de efsaneyeke ku jêdera wê Şehanameya Fîrdewsî ye bi bîr tîne. Wiha dibêje Xanî:

5/1 Saqî tu ji bo xwedê keremke
Yek cur'eyê mey di Camê Cem ke

5/2 Da Cam bi mey cihannuma bit
Her çî me îradeye xuya bit

Li vê derê Xanî ji bo ku halê kurdan, pêşeroja milletê kurd têbigihê serî li motîfeke mîtolojîk daye ku ev motîf di cîhana edebiyata rojhelat de, bi taybet di edebiyata dîwanî de hem bi meyê û hem jî bi cureyeke fa'lê ve ango zanîna pêşerojê ve têkildar, dihate bikaranîn. Ev motîf, motîfa *Cami Cem* an jî *Cami Cihannuma* ye.

Cami Cem, tê wateya qedeha Cem. Cem, serdarê çaremîn ê sulaleya Pişdadiyan e. Li gorî mîtolojiya Îranî, hefsed sal (700) jiyaye, di Zend Avestayê de jî wekî xwedayekî hindî derbas dibe. Milletê xwe li pênc beşên wekî; alim, zahid, leşker, cotkar û zenetkar veqetandiyê. Li dû rîwayetê, piştî ku li hemî cîhanê digere tê Azerbeycanê, di dema derketina rojê de li ser textê xwe rûdinê û ji ber xeftanê ku li xwe kiriye bi gewheran xemilandî ye, xeftanê wî, taca wî û textê wî bi hev re dibiriqin û mirovên ku vê yekê dibînin, di wateya tîrêjê de, peyva 'şîd' bi navê wî ve datînin û Cemşîd dibêjin. Dûre li şûna Cemşîd, Dehhaq dibe serdar û ew jî ji aliyê Kawayê Hesinkar ve tê kuştin û Ferîddûn tê ser text.¹⁴⁷

Tê rîwayetkirin ku, li ser qedeha Cem heft hîkmet hatine nivîsandin û li gorî pênc beşên ku civak ji wan beşan pêk tê; pênc goşe hatiye çêkirin. Li gorî mîtolojiyê, wextekî dema ku Cem û maiyeta xwe li geştê bûne, dibînin ku marekî bişid xwe li lingê çivîkekê lefandiye, çivîk difire. Bi fermana Cem, yek ji wan kesên di maiyeta wî de, bêyî ku zerar bide çivîkê li mar dixê û çivîkê jê xelas dike. Çivîka xelasbûyî, tê ba Cem û çend hebên ku ji nav nikulê xwe derdixê datîne ber Cem. Cem van heban datîne û ji

¹⁴⁷ K. Yıldırım, *Mem û Zîn, Çeviri ve Kavramsal Tahlili*, r. 151

wan dêliya tirî şîn dibe û tirî çêdibe. Ava tirî tê vexwarin û yê mayî tê rakirin. Rojekê dibînin ku tiriye ku li ber rojê pir mayî, dibe şerab û dema ku ew vedixwin pê xweş dibin. Piştî ku ev yek tê ferqkirin di dîrokê de yekem car îmalata şerabê tê kirin. Û Cem dema ku kî bê ziyareta wî, li gorî çîna ku jê ye, ji wî aliyê qedehê şerabê pêşkêşî wan dike.¹⁴⁸

Li gorî efsaneyê, yên ku di Cami Cem de yanî di Qedeha Cem de binihêrin, hemî hal û pêşeroja cîhanê dibînin; ji ber ku heft hîkmet li ser vê qedehê nivîsandî ne. Li gorî mîtolojiyê ev qedeha ku sira Heft Felekan tê de veşartî ye, ji bo ku vê yekê simbolîze bike, ji heft me'denan hatiye çêkirin û seyra cîhanê bi wê tê kirin. Jixwe wateya Cami Cîhannuma ew e ku, qedeha ku cîhanê nîşan dide.¹⁴⁹

Vêca ev mefhûm yanî *Cami Cem*, *Cami Cîhannuma*, *Cami Cemşîd*, *Ayineî Cem*, ku jêdera xwe ji mîtolojiyê digire, dûre di wêjeya klasîk de gelek hatiye bikaranîn. Her wiha di *Mem û Zîna* Xanî de jî ev mefhûm di hin cihan de dertê pêşberî me.

16/44 Ew her du wekî du Camê Cemşîd

Em her du mîsalê mah û xurşîd

23/1 Weqtê we ku nû 'erûsê xurşîd

Neh qubbe mîsalê Camê Cemşîd

Fîlcumle kirin bi rux mucella

Goya ku kirin bi zer mutella

39/52 Wan dîtî di baxî de serayek

Ayîneê Cem cîhannumayek

Wekî ku em ji van mînakên jorîn têdigihên, Xanî di destpêkê de ev motîf di wateya dîtina pêşerojê de bi kar aniyê ango balê kişandiyê ser wê bawerîya ku, ferz dike ku li ser vê qedehê sirên heft hîkmetan heye. Xanî ji ber ku di destpêkê de jî balê kişandiyê serê, mebesta wî ji nivîsîna vê berhemê; danîna meydanê ya çand û mezinahiya civaka kurdan e. Lewma ew bêzar e ku civaka kurd di vî halê nexweş de ye û dixwaze di Cami Cem de binihêre, da ku wê di pêşerojê de halê mîletê kurd çawa be.

¹⁴⁸ H.b. r. 151

¹⁴⁹ H. b. R. 152

Di beşên dî de Xanî bi piranî vê motîfa mîtolojîk di wateya xweşîkî û bêemsaliyê de jî bi kar aniye. Wekî ku di beşa 16an de lehengên berhema xwe Mem û Tacdîn bi ronakbûna wan, ji devê Zîn û Stiyê şibandiye Camê Cemşîd. Her wiha Xanî li vê derê di wateya biriqandin an jî ronîkirina hertiştî de jî ev motîf bi kar aniye. Di beşa 23yan de Xanî taybetmendîya vê motîfê, ya ku her tiştî ronî dike, bi kar aniye. Yanî dema ku ew dertê, hemî tarîfî vedigerin ronahiyê û tu tiştêkî veşarî namîne. Dibe ku ev aliyê vê motîfê bi baweriya zerduştî ya ku li ser hîmên Tarîfî û Ronahiyê sazûnye ve têkildar be.

Di beşa 39an de jî Xanî, têkiliyekê di navbera Seraya Mîrê Botanê û Cami Cem de daniye û koşka wî bi xusûsiyetên ku her xweşîkiyên cîhanê tê de hene, şibandiye Cami Cem. Yanî ew koşkeke wilo ye ku dema tu lê dinihêrî tu dikarî hemî cîhanê tê de bibînî, Lewra ew wekî ayineyekê ye ku cîhanê nîşan dide.

2.18.2.2.2. Rustemê Zal

Yek ji girîngtirîn lehengê çîrok û destanên civaka kurdan, Rustemê Zal e. Ew lehengekî mîtolojîk e. Ji ber ku, ji jidayikbûna wî heya bi mirina wî hemî bûyerên li derûdora jiyana wî qewimîne, bûyerên mîtolojîk in. Rustem di gelek çavkaniyan de yan bi navê qewmîyeta xwe wekî Rustemê Kurd/Rustemî Kurd an jî li dû nesebiyeta xwe wekî Rustemê Zal hatiye binavkirin. Nesla ku Rustem jê tê; Zal, Sam, Nerîman her tim parêzvanê xanedana Îranê bûne.

Bavê Rustemê Zal, hê dema ku hatiye dinyayê ji ber ku hemî bedena wî sipî bûye, bavê wî ew avêtiye û li gorî efsaneyê li çiyayê Elburzê, Teyrê Sîmurg ew dîtiye û biriye hêlîna xwe û ew xwedî kiriye. Dema ku Rustem jî hatiye dinyayê ji ber ku di zikê diya xwe de pir gir bûye û diya wî nikaribûye wî biwelidîne, Teyrê Sîmurg digihîje hewara wî û zikê diya wî diqelêşe û Rustem wilo tê dinyayê. Lê diya wî, Rûdabe, dimire.¹⁵⁰

Rustem hê di ciwantiya xwe ya zû de bi dêwan re şer dike, bi şêran re şer dike û wan têk dibe.

Beşeke girîng a Şehnameya Fîrdewsî, bi serboriyên Rustem re têkildar e. Ew her tim bi milletê Tûran re di şer de ye û wan têk dibe. Şerê wî yê bi Efrasiyab re di lehengiya wî de beşên herî binirx in.

¹⁵⁰ K. Yıldırım, *Mem û Zîn, Çeviri ve Kavramsal Tahlili*, r. 154

Di Şerefnameya Şerefxan de, kurdbûna Rustem bi taybetî hatiye destnîşankirin û dîsa li gorî Şerefnameyê; di Şehnameya Fîrdewsî de jî ew wekî Rustemê Kurd hatiye binavkirin. Her wiha di Gulîstana Sadî Şîrazî ku di sala 1278an hatiye nivîsandin, jî bo Rustem, Rustemê Kurd hatiye gotin. Ev îfade bi vî rengî derbas dibe: “Zal ji kurê xwe Rustemê Kurd re wiha got: ‘Dijminê xwe bêçare û biçûk nebîne.’¹⁵¹

Ji bilî van çavkaniyan di gelek jêderên dî de jî kurdbûna Rustem bi aşkerayî hatiye nîşandan.

Bêguman yek ji mînakên kurdbûna vî lehengê efsaneyî ew e ku; di nava zargotina civaka kurdan de û di destan û çîrokên de Rustemê Zal, lehengeke sereke ye. Çawa ku di çîrokên kurdan de, Mîrze Miheme, lehengekî sereke û mîtolojîk be, Rustem jî bi heman rengî, heta jê gelek zêdetir, lehengekî efsaneyî ye.

Di çîrokên Rustem de bi piranî em rastî motîfa dêwan tîn ku ew wekî temsîla hêza xerabiyê ne û Rustem jî her tim tevî hespê xwe yê efsaneyî Rexşê Belek, li hember wan di şer de ye û milletê xwe jî van heyinên ku zerarê didin her tişî xelas dike.

Di varyantên Memê Alana folklorî de, em rastî vê hêmana mîtolojîk nayên lê di *Mem û Zîna* Xanî de di gelek deran de, behs ji Rustemê Zal hatiye kirin. Bi piranî Xanî, milletê kurd, Mem, Mîr, Tacdîn û Gurgîn bi cesaret û mêraniyê şibandiye Rustemê Zal.

5/31 Her mîrekî wan bi bezlê Hatem
Her mîrekî wan bi rezmê Rustem

8/13 Muhtacê sexaweta wî Hatem
Mexlûbê şecaeta wî Rustem

43/21 Yûsuf ji melaheta wî mehcûb
Rustem ji şecaeta wî mexlûb

46/15 Arif wehe gote Rustemê Zal
Ev emri bi min muhal e bê qal

48/29 Ew Rustemê Gîw e, lendeha ye
Gencîne me ez, ew ejdeha ye

¹⁵¹ Metin Kewê Dilxêrî, *Di Sê Çavkaniyên Girîng De kurdbûna Rustemê Zal*, www. Avestakurd. net

Ji bilî lehengê efsaneyî Rustemê Zal, Xanî di gelek cihan de behsa hin lehengên dî ku di Şehnameya Fîrdewsî de derbas dibin lê di çîrok û destanên milletê kurd de pir dernakevin pêş me kiriye. Ev leheng jî lehengên efsaneyî ne. Wekî; Guhderz, Bijen û Gîv.

2.18.2.3. Heyinên Efsaneyî

2.18.2.3.1. Teyrê Enqa/Teyrê Sîmurg

Di *Mem û Zînê* de, di du deran de behsa Teyrê Enqa hatiye kirin. Xanî, ku ji kevneşopa gelêrî agahdar e, digel ku di hin deran de, Memê Alana folklorî ji hêmanên mîtolojîk paqij kiriye jî wî, li dû prensîbên edebiyata dîwanî û sembolên ku di edebiyata dîwanê de tên bikaranîn, ji nû ve hin hêmanên dî yên efsaneyî daxilî destanê kirine. Bêguman Xanî, di destanê de roleke aktîf nedaye van hêmanan bi tenê bi hin taybetiyên sembolîk ew derxistine pêş û di nava lehengên destanê û van sembolên mîtolojîk de li ser esasên teşbîhê peywendiyêke nû daniye. Wekî mînak, Xanî, wekî heyinên xeyalî behsa dêw û ejderan nekiriye lê lehengên destanê di gelek cihan de şibandiyê dêw û ejderan. Teyrê Enqa an jî Sîmurg jî di vê çarçoveyê de derdikevin pêş me.

Ev teyrê mîtolojîk, carina bi navê Sîmurg carina jî bi navê Enqa dertê pêş me. Yûnaniyên berê jê re Phoenix gotine. Di *Mantiqût Teyr* a Ferîddûn Attar de ew wekî Sîmurg, tevî efsaneya xwe derbas dibe.¹⁵² Lê her çendî ku ev teyrê mîtolojîk di Şehnameya Fîrdewsî û *Mantiqût Teyrê* de derbas dibe û ji wê derê belav bûbe jî, bingehên vê mîtolojiyê digihê heya Zend Avestayê. Di Zend Avestayê de behsa teyrekî bi navê Morayo Saêna tê kirin. Di zimanê Pehlewî de jê re Sênmerw hatiye gotin ku ev gelek nêzî navê Sîmurgê ye.

Taybetmendiya vî teyrî ew e ku, li pir bilindiyan dijî û emsalên wî nîn in. Li gorî hin efsaneyan ew nemir e. Li gorî Şehnameyê dema ku Zal çêdibe, ji ber ku her derê wî spî ye Sam (bavê wî) wî diavêje Çiyayê Elburzê û li wê derê Teyrê Sîmurg wî xwedî dike.¹⁵³

¹⁵² Ferîdüddin Attar, *Mantiku't Tayr*, Weşanên Ataç, Wer. Ayhan Yıldırım, ist. 2010, r.52

¹⁵³ K. Yıldırım, *Mem û Zîn*, r. 327

Hem ji Zend Avestayê hem jî ji Mantuqût Tayr û Şehnameyê em têdigihên ku ev Efsaneya Enqa an jî Sîmurg, efsaneyeke dêrîn a Kurdî/Îranî ye.

“Lî gorî mîtolojiyê, Sîmurg Enqa li ser guliyên Dara Zanîne dijî û agahdarê hemî zanînan bûye. Baweriya hemî çivîk, teyr û tuyûran pê hebûye ku dê rojekê Sîmurg Enqa wan xelas bike. Her çendî ku jiyana wan gelek xerab bûye jî ew her li benda Teyrê Enqa sekinîne. Lê her ku dem derbas bûye û jiyana wan aloztir bûye û Enqa derneketiye meydanê xwe nîşan nedaye, ew jî ji hebûna wî ketine şikê û di dawî de jê hêvî birîne.

Rojekê keriyeye çivîkên welatekî dût, mûyekî ji baskê Enqa dîtine û ji hebûna wî bawer kirine. Hingê hemûyan bi hev re biryar dane ku derkevin pêşberî Teyrê Enqa û jê alîkarî bixwazin.

Lê hêlîna Sîmurg Enqa li Çiyayê Qafê bûye û ev çiya ew çend bilind bûye ku, quntarên wî li ser ewran bûye. Ji bo ku bigihên wê derê diviyabûye ku heft newalên bêbinî derbas bikin. Hemî çivîk bi hev re firiyane. Di rê de hin westiyane û ketine. Pêşî Bilbil, evîna wê ya li Gulê hatiye bîra wê û vegeyiyaye, dûre Tûtî baskên xwe yên rengîn kiriye behane û vegeyiyaye, dûre Qertel dev ji qralatiya xwe ya bilindiyan bernedaye û vegeyiyaye, dûre Kund bêriya xerabeyên xwe kiriye, çivîka masiya bêriya werteyên xwe kiriye û vegeyiyaye. Her ku di ser newalan de firiyane hejmara wan kêmtir bûye.

Û di encamê de piştî ku di ser pênc newalan de derbas bûne, newala şeşemîn Newla Şaşbûnê û newala heftemîn Newala Tunebûnê bûye û çivîkan hêviya xwe bi tevahî jê birîne. Dema ku gihaştine Çiyayê Qaf, bi tenê sih çivîk mane. Piştî ku hêlîna Sîmurgê dîtine, fêr bûne ku wateya Sîmurg, sih çivîk bûye û ew Sîmurg bûne.”¹⁵⁴

Ev efsane, di wêjeya klasîk û morden de wekî motîfekê, pir hatiye bikaranîn. Xanî jî di *Mem û Zînê* de di du cihan de ew bi kar aniye.

39/28	Yek bit û nebit mîsal û hemta Mestûr ji rengê Zîn û ‘Enqa	Lê eger yek be û bê hemta be Wek Zîn û Sîmurx li pişt perda be
	‘Aşiq bi çi dê bikin medare? Bê sebr û mirin ewî çi çare?	Evîndar çawa dê bike sebrê? Çara wî çi ye eger ku nemrê?

¹⁵⁴ F. Attar, *Mantiku’ t Tayr*, Werg. A. Yıldırım, r.52

Wekî ku ji van beytan jî em fê m dikan, Xanî di navbera Sîmurga ku gihaştina wê pir zor an jî ne pêkan e û Zîna ku ji Mem gelekî dûr e de peywendiyekê daniye û Zînê şibandiye Sîmurgê. Çawa ku Sîmurg li pişt Çiyayê Qaf ê efsaneyî ye, Zîn jî li koşka Mîr Zeydîn e ku ji bo Mem ew dereke qedexe ye.

Di beşa 43yan de Xanî cardî serî li vê hêmana mîtolojîk daye û bi taybetiya wê ya ku li pir bilindiyan dijî ew bi bîr aniye.

43/49 Go ‘Qet ne we ye wekî wî gotî

Mîrim periya dilê mi sohtî

Şehzadeye şehnişîn mekan e

Enqa ye bilindî aşiyân e

Çawa ku Sîmurg, teyrekî bê emsal e û her li bilindiyan dijî, Zîna Mem jî wek Sîmurg bê emsal e (bi xweşikiya xwe wek periyân e) û li dereke bilind (ji aliyê mertebeya civakî ve) dijî.

2.18.2.3.2. Teyrê Hûma

Xanî ji bilî Teyrê Enqa, behsa teyrekî dî yê mîtolojîk dike; Teyrê Hûma. Ev teyr jî wekî Teyrê Enqa, ji ber taybetmendiyên ku ew simbolîze dike, di wêjeya rojhelatî de bi firehî hatiye bikaranîn. Ev simbol carina di şexsê evîndaran de carina jî di şexsê desthelatan de hatiye bikaranîn. Lewre Teyrê Hûma, bi pîrozî, şans an jî bi siûdê hatiye simbolîzekirin.

Li gorî efsaneyan ev teyr, pir bilind difire. Li bilindiyan bê rawestan difire û tu car li erdê danayne. Heta li gorî hin efsaneyan lingên wî nîn in. Di wêjeya rojhelatî de çanda gelêrî de bi wateya dilgeşî, dewlet û serdariyê hatiye simbolîzekirin. Li dû baweriyên berê, yên ku bikevin bin siya Teyrê Hûma, hem pîroz û hem jî bi siûd dibin. Ev teyr, siya baskê xwe deyne ser kê, wekî ku ‘Çivîka Dewletê’ li serê veniştibe tê hesibandin û ew dibe serdarê dewletê. Her çendî ku pir li bilindiyan difire û dirinde ye jî zirar nade tu kesê.¹⁵⁵

¹⁵⁵ K. Yıldırım, *Mem û Zîn*, r. 375

Xanî, di *Mem û Zînê* de di beşa 52yan de dema ku behsa taybetmendiyan Mîr Zeydîn dike, vê motîfa mîtolojîk bi kar tîne.

52/68 Sahibkerem e xwedan ‘eta ye
Zilla wî siha perê Hûma ye

Wekî ku xuya ye, Xanî di navbera siya perê Hûma û desthilata Mîr de peywendî daniye.

2.18.2.3.3. Ejder/Ejderha

Çawa ku di çîrokan de wekî motîfeke mîtolojîk dêw hene û ew temsîla xerabiyê, zordariyê dikin; carina di çîrok û efsaneyan de wekî temsîla zordarî, xerabî û metirsiyê, Ejderha dertên pêş me. Li gorî hin nêrînan, di navbera gotina Ejderha û Ajî Dahhaq de peywendî heye. Yanî yan peyva Aji Dahhaq tê wateya ejdeha/ejderha (ku mirov li rola wî ya di Efsaneya Kawa de dinihêre bi rastî gelekî nêzî vê têgihê ye) yan jî peyva ejdeha ji Ajî Dahhaq tê. Wekî ku tê zanîn, di Efsaneya Kawa de, Ajî Dahaq navê kralê Asûrî ye ku bi îleteke bêderman dikeve û du mar ji ser milên wî dertên û her roj divê ku mêjiyê du mirovan; kur û keçekê, bixwin.¹⁵⁶

Mar û ejderha du heyinên bi hev re têkildar in. Li gorî baweriyeke mîtolojîk, marên ku ji sed salî zêdetir bijîn, dibin ejderha û ji devê wan agir derdikeve û heyinên dî yên jîndar dixwin. Hingê melek wan digirin û diavêjin piştta Çiyayê Qaf. Dûre serê van ejderhayan pir dibin (wekî ejderhayê heft serî an jî marê heft serî), lingên wan pir dibin.¹⁵⁷

Di edebiyata dîwanî de carina porê hezkiriyan jî li ejderhayan hatiye şibandin. Ji ber ku ew hem dirêj e hem jî bi wateyeke razberî, xwe li evîndaran dilefîne, wan dadiqurtîne.¹⁵⁸

Ev hêmana mîtolojîk, ne tenê di zargotina miletên rojhelatî de, her wiha di zargotina miletên dî de jî heye. Rojavayîyan jê re Dragon gotine û li gorî tesewira civakên rojavayî, ew heyinekî perinde ye. Çîniyan ejderha wekî heyineke ku di nava avê de dijî û bi bask û ji devê wî agir dertê tesewir kirine. Di zargotina kurdan de wekî

¹⁵⁶ K. Yıldırım, *Mem û Zîn*, r. 349

¹⁵⁷ H.b., r. 349

¹⁵⁸ H.b., r. 349

ku me li jorê jî da diyarkirin, ew cureyeke marê mezin e. Pir dirêj e û heyinan dadiqurtîne. Her wiha ev heyin carina temsîla hêza zêde û cesaretê jî dike. Xanî jî di *Mem û Zînê* de bi van wateyan jî ew bi kar aniye.

Di *Mem û Zînê* de, di sê cihan de dertê pêş me. Di beşa 48an, beyta 29an de wiha derbas dibe:

48/26 Ger fewtî bikim cemî'ê ferzan
Tacdîn ku Didim ji dest xwe erzan

Min şewket û seltenen bi wî ne
Ew şuhret û şan min ji wî ne

Ev nam û nîşan û ev meqam e
Bê xatirê wî li min heram e

Ew Rustemê Gîw e, lendeha ye
Gencîne me ez, ew ejdeha ye

Xanî di van beytan de, lehengê navdar Tacdîn, şibandiye ejderhayê. Li vê derê ejderha ne sembola xerabiyê ye. Ew sembola hêz û qudretê ye. Her wiha Xanî, mînak ji lehengekî dî yê efsaneyî jî daye ku ew Rustemê Zal e. Ew jî nûnerê cesaret, başî û hêzê ye. Xanî balê kişandiye ser çîroka Gencîne û Mar an jî Ejderha. Bi rastî ev bawerî, yanî li pêş her gencîneyê hebûna mar an jî ejderhayekî wekî parêzvan, baweriyeye gelege berbelav e di nava civaka kurdan de. Hê jî di nava millet de çîrokên bi vî rengî hene. Di çîrokên bi vî rengî de, sêhr jî motîfeke aktîf e.

Her wiha em ji van beytan jî fêm dikin û Xanî jî di wê baweriyê de ye ku ejderha cureyekî mar e. Ne wekî Dragonê rojavayîyan, cureyeke perinde ye. Lewra Xanî, balê kişandiye ser efsaneyên mar û gencîneyan. Li vê derê Mîr dewletê temsîl dike ango dewlemendiyê temsîl dike û Tacdîn jî ejderha ye ku vê dewletê an jî dewlemendiyê diparêze.

Di beşa 53yan de Xanî dîsa di behsa Tacdîn de motîfa ejderhayê bi kar aniye.

53/18 Tacdîn ji serê xwe tac û tomar
Havête ser leşê Memê jar

Dîn bû ji tehesura birayî
Herçî ku didî wî ejedehayî

Fîlhal dikit ku wî fena ket
Teşbîhê Bekir di erdê ra ket

Tacdîn li ser mirina Mem ku, Beko bûye sebab, pir bi qehr û bi hêrs e. Di nava civaka kurdan de biwêjekê heye ku wiha tê gotin: *'agir ji devê wî dibare'*. Yanî kesekî dema ku pir bi hêrs be, mirov nikaribe xwe nêzî wî bike, wilo tê gotin. Bi rastî derketina agir ji dev û ejderhayê ku agir ji devê wî dertê, bi renekî bi hev re peywendîdar in. Yanî mirovê bi hêrs û bi hêz wekî ejderha ye. Lewma di van beytan de, Xanî di navbera Tacdîn û Ejderha de têkiliyekê, li ser simbolîzma hêza ku her tiştî têk dibe, tune dike û li pêş xwe tu astengî nas nake, daniye. Yanî ew wekî ejderhayekî ye ku ne pêkan e ku bê girêdan an jî astengkirin.

Xanî di heman beşî de di beyta 27an de cardî vê hêmana fantastîk bi kar aniye.

53/25 Dêwê ku vebestî wan bi tedbîr

Bizdandî li ber xwe qeyd û zincîr

Zincîr û kemenda wî şikînan

Derwaze û perde wî hilînan

Ejder ji mexareê ku ber bû

Derhal bezî di ne'şî wer bû

Xanî di van beytan de balê bi ser taybetmendiya pir bihêzbûna ejderhayan kişandiye. Her wiha em têdigihên ku Xanî jî wilo tesewir kiriye ku ejderha di şikeftan de dijîn ango hêlîna wan şikeft in.

2.18.2.3.4. Hesp

Di folklorê de, bi taybet di çîrok û destanan de, her wiha di efsaneyan de hesp heyinekî gelekî bi îtibar e. Lehengên çîrok û destanan pirî caran bi hepsên xwe yê efsaneyî navdar in. Taybetmendiyên ku hespê dikin heyineke efsaneyî an jî derasa muxtelîf in. Hespên ku li dû serencameke derasa hatine dinyayê û bi bask in hene. Hespên ku ji behrê derketine hene. Ev hesp, bi piranî bi bezabûna xwe ya derasayî û sêdaqeta xwe ya li xwediyên xwe tên zanîn. Li vê derê hesp diyardeyeke alîkar û çalak e ku wekî navgînekê ye ku lehengên destanan bikaribin karên derasa bi ser bixin. Her wiha wekî *Hespên Ereban*, hesp hene ku bi esaleta xwe tên nasîn. Hesp ne tenê di destan û çîrokan de, her wiha di nava çanda rojane ya civakê de jî gelekî girîng e. Çunkî ew di demên herî zor de, di şeran de, di rêwîtiyan de avantajê aşkera dide xwediyê xwe da ku ew karibe karên zor bi ser bixe. Lewma jî ew ne tenê ji aliyê hêmanên efsaneyî ve, ji aliyê çanda civakê ve jî diyardeyeke, hêmaneke jiyânî ye.

Di zargotina kurdan de, di destan û çîrokan de hespên efsaneyî, beza û esîl dertên pêş me. Çawa ku di destanan de bi giştî roleke wan a bi fonksiyon hebe wilo jî di destanên civaka kurdan de, hesp li kêleka lehengan wekî karaktereke destanê bi fonksiyon in.

Der bareyê motîfa hespê de ku di çîrok û destanên civaka kurdan de derdikeve pêş me, lêkolîner Zeynelabidîn Zinar, di xebata xwe de, di binê sernava **Hesp** de, di hejmarê **97**an de wiha gotiye:

“Çawa ku di çîrokan de ji mirovan lehengek heye, her wiha ji heywanan jî lehengek heye ku ew bi piranî jî hespek e, hin caran teyrek e, hin caran jî mişkek e. Lê di çîrokên lawiran de bi piranî şêr e û hin caran jî rovî ye. Lewra hatiye gotin ku şêr, qiralê daristanê ye. Di çîrokan de sê tîp hesp hene:

1. Hespê Bayê (Hespê ku difire)
2. Hespê Agir (Hespê Brûskê)
3. Hespê Avê (Hespê Deryayê)”¹⁵⁹

Di Destana Memê Alana ku Xanî ji *Mem û Zînê* re kiriye bingeh de, hespê Mem, Bozê Rewan (li gorî hin varyantan Bor), hespekî efsaneyî ye. Hem ji ber derketina wî ya ji behrê û hem jî ji ber rewanbûna wî ya derasa û di hin deman de alîkarbûna wî ya bi Mem re û wekî ku mirovekî be, bi Mem re axivîna wî; ev hemî

¹⁵⁹ Z. Zinar, *Şaxên Zanistiyê*, r. 131-132

hêmanên fantastîk in. Bor an jî Bozê Rewan di buhartina astengiyan de alîkarê herî mezin ê Mem e. Dema ku bavê wî yê padîşah, her deverê Muxurzemîn/Mixribiyan lê digire û deriyên bircan digire, Bor an jî Bozê Rewan bi rengê derasa di ser bircan de qebaz dide, digel ku lingên wî girêdayî ne jî. Dîsa Bor/Bozê Rewan soz dide Mem ku dê wî bigihîne bajarê Cizîra Botan. Dema ku Mem li ber çemê Cizîrê rastî qîza Beko ya remilavan tê, Bor/Bozê Rewan wî heşyar dike ku ew ne Zîna rastîn e. Li gorî hin varyantan (Varyant I, X.) piştî mirina Mem, Bor tevî hin eşyayên Mem bi serê xwe vedigere welatê wî Muxurzemînê û haya bavê wî bi mirina Mem dixê.¹⁶⁰

Bi rastî, axivîna hespan wekî mirovan, di mînakên dî de pir dernayê pêş me. Ev yek taybetmendiyeke orjînal e ji bo Destana Memê Alan û Bozê Rewan.

Di çîrokên Rustemê Zal de jî hespekî mîtolojîk dertê pêş me. Ev jî wekî ku di *Mem û Zîna* Xanî de jî derbas dibe, Rexşê Belek e. Rexşê Belek an jî Rexşê Rustem, hespekî gelek bijarte ye. Li gorî nivîskarê Şehnameyê Fîrdewsî, ew ji nava gelek keriyên hespan hatiye helbijartin. Taybetmendiya wî ya herî sereke ew e ku; li ser rûyê erdê tu hespekî mîna wî rewan nîn e, tu hesp nikare bigihê wî. Bi rewanbûna xwe ya derasa û Rustem ji gelek belayan xelaskirinê û bi qedera wî ya ku bi mirina Rustem re ew jî dimire, hespekî efsaneyî ye. (ev taybetmendiya hanê, yanî bi mirina leheng re mirina hespa wî jî, motîfeke pir girîng e ku hevrêbûna hesp û leheng nîşan dide). Li gorî efsaneyê, carekê dema ku Rustem tevî hespê xwe Rexş birîndar dibe, teyrê efsaneyî, Teyrê Enqa/Sîmurg, her duyan derman dike û baş dike.

Di destanên dî yên kurdan de jî motîfa hespên derasa derdikeve pêş me. Hespê Siyabend ê bi navê Deybilqiran, hespekî wilo taybet e. Ew jî wekî hespên gelek lehengan esîl û pir rewan e. Hespê lehengê destana Derwêşê Evdî û Edûlê, Derwêş, ê bi navê Hidman hespekî wilo ye ku di lehengî û çalakiya Derwêş de gelek rola wî heye. Her wiha di nava gel de, di efsaneyên li derdora jiyana Hz. Elî teşkilbûyî de, gelek caran behsa Duldula wî hatiye kirin û li ser Duldulê efsane hatine gotin.

Di *Mem û Zînê* de behsa Bozê Rewan nehatiye kirin. Ev mijareke gelek xerîb e. Çunkî ji bo şaîrekî dîwanî hesp, motîfeke pir girîng bû. Her wiha li derdora hespê leheng, mijar jî dihate dewlemendkirin. Lê sedema ku, çima Xanî Bozê Rewan ji destanê derxistiye, em nizanin. Belkî em dikarin di çarçoveya wê fikra ku me berê anîbû ziman de vê yekê destnîşan bikin ku; Xanî, Memê Alan ji gelek aliyên wê yên efsaneyî paqij kiriye û hin taybetmendiyan fantastîk ku di zargotina gel de hebûn jê

¹⁶⁰ Bnr. Li beşa Muqayese, Epîzota Kuştina Beko, Varyant I.

derxistiye û destanê li dû şertên wê demê realîze kiriye. Belkî bi van saîkan Xanî hespekî wilo derasa ku ji behrê derketiye, ji destanê derxistiye û nexwestiye *Mem û Zîna* xwe bi motîfên wilo gelêrî û çîrokî tije bike. Her wiha Memê Alan û Memê Ehmedê Xanî jî, ji hev gelek cuda ne ji alî karakter ve. Dema ku mirov *Mem û Zîna* Xanî dixwîne, mirov bi xwe jî wê kêmahiyê nabîne ku çima hespekî wî nîn e. Karakterê Xanî, Mem, ji lehengekî mêrxas an jî şervanekî bêtir, evîndarekî ‘nazik û hesas’ e. Lewma pêdiviya wî ew çend jî bi hespê nîn e. Lê Memê Alan ku ji bajarê Mixribiyan ê li kêleka behrê ye, ji bo ku Zînê bibîne jî û ji bo ku bikaribe bi hin zehmetiyan re serî derê jî, pêdiviya wî bi hespekî wilo efsaneyî hebû.

Her çendî ku Xanî behsa hespê Memê Alan nekiribe jî, wî behsa hin hespên mîtolojîk ku di hin destanên dî de derbas dibin kirine. Em ê lê binihêrin ku Xanî, bi kîjan mebestan behs ji van hespan kiriye.

Xanî, di beşa 47an de, piştî ku Tacdîn û birayên xwe Çeko û Arif, hew dikarin li girtîbûna Mem tehemul bikin û xwe amade dikin ji şer re, teswîra hespên wan bi vî rengî dîke:

47/1 Sersubhê ku şehsuwarê efleq
Eşheb ku kişande cayê ebleq

Edhem di tewîleê nehîn kir
Eşheb ji xwe ra ji nû ve zîn kir

Gurzê xwe yê ateşîn deranî
Tîxê xwe yê zerfeşan ku danî

Dinya ji mehabeta xwe zer kir
Tîx û kemera çiyar bi ker kir

Tacdîn û biran ji xelqê l’alî
Xwestin bi dilê xwe wan helalî

Kêşane derê bi reqs û bazî
Rexşê ‘Erebî semendê Tazî

Mismarî kirin bedû ji xeflet
Hişyarî kirin ‘edûw bi sewlet

47/8 Meydan beduwan kolan bi destkor
Goya vedidan li dijminan gor

Wekî ku em di van beytên jorîn de jî dibînin, dema ku behs dikeve ser lehengî û şer, hingê hesp wekî motîfêke diyarker derdikeve pêş. Yanî sedema nebûna hespekî Mem, an jî sedema nebûna Bozê Rewan dibe ku bi karaktera Memê ku Xanî ji nû ve afirandiye re têkildar be. Lewma Xanî dema ku li vê derê ketiye behsa şer û lehengiyê û bi taybet behsa Tacdîn û birayên wî û heybeta wan kiriye, di nava vê atmosferê de hespên wan jî wilo bi fonksiyon teswîr kiriye û ew şibandine Rexşê Rustem û Hespên Erebb ku bi rewanî û çalakiya xwe û esîlbûna xwe navdar in. Her wiha teswîra hespan a Xanî, teswîreke gelekî serkeftî ye û di navbera heybeta lehengên wî yê mîna Tacdîn, Çeko û Arif û hespên wan de, seranseriyeke mukemel heye. Yanî ew çawa wilo bi hêrs û qehr in, hespên wan jî wilo bi hêrs in ku lingên xwe li erdê dixin, erdê pîkol dikin û xwe ji şerê lehengên xwe re amade dikin da ku bi ser bikevin an jî tehdîd di şexsê hespan de jî cihê xwe bibîne û dijminan bitirsîne.

Xanî di beşa 17an de behsa du hespên efsaneyî ku di Destana Husrew û Şîrîn de derbas dibin kirine. Ev hesp, bi navê Şebdîz û Gulgûn in.

17/3 Xusro nebuwa siwarê Şebdîz
Şîrîn li şekir dibuye Perwîz?

Ferhadî cuwa sirişkê pirxwûn
Nîna, nedidî siwarê Gulgûn

Li gorî efsaneyê, Şebdîz hespê qralê Hindî ye ku wekî xelat daye Xusrew. ‘Şeb’ di wateya şevê de û ‘dîz’ jî di wateya reng de ye. Yanî wateya navê Şebdîz, Rengê Şevê ye. Xusrew ew çend ji vî hespê hez dike ku ew çî dixwe û vedixwe, dide Şebdîz jî. Û ji pêş de îlan kiriye ku kî agahiya mirina Şebdîz bide wî, ew ê wî bikuje. Rojekê stranbêjê wî Barbed, bi meqameke pir xembar stran dibêje û hin îmayan dike. Hingê Xusrew dibêje ku: “Qey Şebdîz miriye?” Li ser vê Barbed dibêje ku: “Min na, we got!” û wî tesdîq dike. Bi fermana Xusrew, resmê Şebdîz li ser tahtekî tê neqîşkirin û laşê wê bi

kefen tê definkirin. Di nava sih meqamên Barbed de, meqamekî bi navê Şebdîz heye ku bi vê efsaneyê re têkildar e.¹⁶¹

Lê li gorî fikra Nîzamî, Şebdîz hespa Şîrîna xwarziya melîkeya Ermen e.

Gulgûn jî li gorî varyantekê navê hespa Şîrîn e. Ji bêjeyên Gul û Gûn pêk tê ku, ‘Gul’ di wateya gul de û ‘gûn’ jî di wateya reng de ye. Yanî wateya navê hespê, Rengê Gulê ye. Li gorî efsaneyan, Şebdîz û Gulgûn canîkên heman mehîne ne û bêyî ku bavekî wan hebe hatine dinyayê. Mehîna ku diya wan bûye, li çolê xwe di peykerê hespekî daye û bi vî rengî avis bûye û Şebdîz û Gulgûn hatine dinyayê.¹⁶²

Xanî di beşa 60î de, behsa hêstira bi navê Duldul kiriye ku di çîrokên li ser Hz. Elî de derdikeve pêş me.

60/25 Bû rakibê duldulê enamil
Derhal digel me bû muqabil

Kêşa ji zebanî Zulfeqarek
Bû xesm digel me şehsuwarek

Di nava civaka kurdan de efsaneyên li ser lehengî û jiyana Hz. ‘Elî gelekî zêde ne. Di hin efsaneyan de behsa Duldula wî jî tê kirin ku ew hêstir e. Her çendî ku ew hêstir e jî, dîsa bi bezabûna xwe ya mûcîzeyî jê hatiye behskirin. Xanî di beşa dawî ya *Mem û Zînê* de Duldula Hz. ‘Elî bi bîr aniye.

Li gorî rîwayetan, serdarê Îskenderiyeyê vê hêstira spî, tevî kerekî bi navê Ye’fûr û cariyeyeke bi navê Mariye, wekî diyarî ji Hz. Muhemmed re şandiye. Dûre pêxember Duldulê daye Hz. ‘Elî. Hz. ‘Elî, ji ber ku di cengan de li Duldulê siwar bûye, jê re Şahê Duldulsuwar jî hatiye gotin.

Xanî di van beytên jorîn de, di navbera nivîsandina xwe, an jî dema ku dinivîsîne tevgerên xwe yê çalak û meşa Duldul de, teşbîhekê kiriye. Yanî nivîsîna xwe şibandiye meşa beza ya Duldulê. Her wiha Xanî balê bi ser şûrekî efsaneyî yê bi navê Zulfeqar de jî kişandiye. Bi rastî di hemî efsaneyên li ser Hz. ‘Elî de, Duldul û Zulfeqar jî weke motîfên bi fonksiyon li cem navê Hz. ‘Elî cih digirin. Li gorî rîwayetekê, şûrê bi navê Zulfeqar ji ezman, ji aliyê Cebrail ve ji bo Hz. ‘Elî hatiye anîn.

¹⁶¹ K. Yıldırım, *Mem û Zîn*, r. 212

¹⁶² H.b., r. 212

Lê di rastî de tê gotin ku, Hz. Muhemmed di şerê Bedirê de, ew wekî xenîmet girtiye û di şerê Ûhudê de ew daye Hz. ‘Elî yê ku şûrê wî di şer de şikiyaye.

2.18.2.3.5. Şahêmar

Wekî heyinek an jî cureyeke mirov-heywan, di gelek berhemên zargotinî, di efsane û çîrokên gel de derdikeve pêş me. Ev heyinên mîtolojîk di tu varyantên destana folklorî a Memê Alan de dernakevin pêş me lê di *Mem û Zîna* Xanî de, em lê rast tên. Bêguman di çarçoveya qalibên edebiyata klasîk de, di nava teşbîhê de Xanî ji wan behs dike.

Bingeha baweriya ji hebûna cureyekî mirov-heywanekî wiha mîtolojîk, ji efsane û baweriyên gel tê. Efsaneyê Şahêmar li seranserê erdnîgariya ku civaka kurd lê dijîn derketiye û li gelekî cihên dî belav bûye. Her wiha ji aliyê etîmolojîk ve jî peyveke Îranî/Kurdî ye ku ketiye gelek zimanan. Ji her du peyvên ‘Şah’ û ‘Mar’ derketiye meydanê. Efsaneyê Şahêmaran bi kurtî wiha ye:

“Bi hezaran sal berê xortekî pir çeleng hebûye bi navê Camasb. Li gorî hin varyantên vê efsaneyê, ew di heman demê de lawê Danyal e. Danyal berî ku bimire, ji hevsera xwe xwestiye ku kitêba xwe ya ku hemî ilmên wî tê de ne, teslîmî lawê wî yê ku dê çêbibe bê kirin. Li gorî hin varyantan jî ev xortê bi navê Camasb an jî Tahmasb, xortekî gelekî feqîr bûye. Li ser rûyê cîhanê bi tenê wî Şahêmaran dîtiye. Rojekê ew û hevalên xwe dadikevin bîrekê da ku hungiv derbixin. Piştî ku hunguv derdixin, hevalên wî, ji bo ku dest bidin ser para wî, wî di bîrê de dihêlin û diçin. Camasb, di wê bîrê de (an jî şikeftê de) kunekê dibîne ku ronahî jê tê. Ew, dema ku wê kunê fireh dike û tê de derbas dibe, rastî bexçeyekî wek bexçeyên bihiştê xweşik tê. Di vî bexçeyê de hewizeke pir xweşik û gelek maran dibîne. Li ser textekî li ber hewizê Şahêmaran dibîne. Bi derbasbûna demê re, Şahêmaran pê bawer dibe û demeke dirêj ew li wê derê dijî. (li gorî hin varyantan ev Şahêmaran, gewdeya wî wek maran e lê rûyê wî wek ê keçikeke pir xweşik e û Camasb evîndarê wê dibe) Lê piştî demekê Camasb, bêriya malbata xwe dike û dixwaze ku biçê. Her çendî ku Şahêmaran vê naxwaze jî, di dawî de destûr didê. Lê jê dixwaze ku soz bide ku; ew ê cihê wî ji tu kesî re nebêje. Camasb vê qebûl dike û diçe. Demeke dirêj li ser soza xwe dimîne. Lê rojekê padîşahê welat nexweş dikeve û wezîrê wî dibêje ku çareya nexweşîna wî bi tenê xwarina goştê Şahêmaran e. Li ser vê Camasb (ji ber ku gewdeya wî jî wekî ya maran bi pûl bû ye, tê dîtin) ji aliyê leşkeran ve tê girtin. Camasb, cihê ku Şahêmaran lê dimîne, nîşanê wan

dide. Dema ku Camasb dikeve hundir, Şahêmaran jê re dibêje ku min zanîbû tê li min îxanet bikî. Şahêmaran ji Camasb dixwaze ku gewdeya wî di qabekî ji axê de bikelîne û ava wê bide wezîr û goştê wê jî bide padîşah. Camasb wilo dike û di encamê de wezîrê zalim dimire û padîşah jî ji nexweşîna xwe baş dibe. Dûre padîşah, Camasb dike wezîrê xwe. Li gorî efsaneyê, mar hîn jî nizanin ku Şahêmaran miriye.¹⁶³

Li gorî hin varyantên vê efsaneyê, ev kesê bi navê Camasb di heman demê de Loqmanê Hekîm e. Lewma dema ku li ba Şahêmaran ma ye, Şahêmaran di heqê feyde û zirara hemî giya û hêşnahiyên li ser rûyê erdê de, hemî zanînan daye Loqmanê Hekîm.

Divê em destnîşan bikin ku, li gelek herêman mirov dikare rastî gelekî guhertoyên cuda yên vê efsaneyê bê. Ev yek, ji taybetmendiya motîfên wiha berbelav e.

Wekî ku tê dîtîn di Efsaneya Şahêmar de, em rastî gelek taybetmendiyan çanda gelêrî wekî Hekîmiya Gel û hêmanên zargotinî tîn.

Di nava çanda civaka kurd de, Şahêmar wekî heyineke ku, serî yê mirovekî û gewde yê marekî ye, hatiye teswîrkirin û ev teswîr bi rêya neqîşan li ser xalî û xalçeyan jî hatiye çêkirin. Carina ew wekî heyinekî du serî jî hatiye teswîrkirin.

Her çendî ku di zargotina civaka kurdan de, mar bi piranî bi temsîla xwe ya nebaş derdikevin pêş me jî, Efsaneya Şahêmar ne bi heman rengî ye. Di vê efsaneyê de, em bi feraseta dualîst a civakê re têkildar, du aliyên hêmaneke çandî û efsaneyî dibînin. Ew her çendî ku mar e jî bi hizir û bîr wekî mirovekî ye. Lê ew di heman demê de, zulûm û zordestiya mirovan û xayintiya ku di xwezaya mirovan de heye tîne bîra wan. Lewma wekî sedema di binê erdê de jiyina maran jî, vê karaktera mirovan tê nîşandan.

Di destana folklorî a Memê Alan de û di destanên dî yên civaka kurdan de em rastî vê motîfê nayên. Lê bi piranî ev motîf di çîrokan de derdikeve pêş me.

Di *Mem û Zînê* de, em di du cihan de rastî vê motîfê tîn. Li vê derê motîfa Şahêmar, di nava peywendiyên hunerên wêjeya klasîk de derdikeve pêş me. Di derekî de Xanî, di şexsê Mîr de hukumdarên şibandiye Şahêmar.

42/35 Hukkamî ji cinsê şahêmar in
Eshabê sumûm û muhredar in

Muhran ku didin bizan zehr e

¹⁶³ Mine Öztürk, *Şahmeran*, r. 3-7

Mihrê ku dikin bizan ku qehr e

Li vê derê Xanî balê bi ser dualîtiya şahêmar de kişandiye.

Di beşa 41an de dema ku Mîr bi ser Mem de hatiye û Mem, Zînê di bin ebayê xwe de veşartîye û du guliyên porê wê nîşanê Tacdîn daye, Xanî cardî motîfa Şahêmar, di nava peywendîya wê ya dualîst de, bi kar aniye.

41/4 Destê xwe ji hûçikê ‘ebayê
Kêşa û ‘ecaîbek numayê

Dîtin du kezî ji mişkê Tatar
Manendê du ser bi muhrê şehmar

2.18.2.3.6. Dêw

Ev heyinên mîtolojîk, di çîrokên civaka kurdan de, di efsaneyan de gelekî bi berbelavî tînin. Heta gelek çîrok û destanên mîna Rustemê Zal, naveroka wan a esasî, şerê di navbera dêwan û lehengên civakê de ne. Li vê derê dêw wekî temsîla hêza xerab derdikevin pêş me.

Ne bi tenê di zargotina mîletê kurd de, her wiha di zargotina gelek civakan de behsa heyinekî bi navê *dêw* tê kirin ku, ew di çîrok û efsaneyan de hêza nebaş temsîl dike. Ev motîf motîfeke pir kevnar e ku ji dewrên dêrîn maye û aydê vegotina dewrên mîtolojîk e.

Dêw, ne tenê ji aliyê zargotinê ve girîng in; ew, her wiha di çanda dînî-ayinî de jî derdikevin pêş me. Di nav peywendîya wan a bi xerabî û hêza xerab re tîkildar; ew bi dirûvên xwe yê herî xwerû, di dîne zerduştî û di kîtaba pîroz a zerduştîyê, Avestayê de, derdikevin pêş me.¹⁶⁴ Li vê derê ew, bi navê *daîva*, tînin nasandin û her tim wekî nûnerê şeytan an jî hêza xerab in. Lewma di nava mirovên baş û van *daîvayan* de her tim şerekî heye.

Ev şer bi dirûvên curbicur, xwe di nava çîrokên kurdan de jî dide nîşandan. Dêw di çîrok û efsaneyan de her tim karên xerab dikin. Yan prensesa welatan direvînin,

¹⁶⁴ Nurettin Albayrak, *Ansiklopedik Halk Edebiyatı Sözlüğü*, r. 136

yan jî li dora bajarekî an jî wargehekê cîwar dibin û zerarê didin gelê wê derê. Ew carina wekî *Çil Dêw* an jî *Dêwê Heft Serî* jî derdikevin pêş me. Hingê lehengekî radibe wekî Mîrze Miheme û civakê an jî prensesa welat ji destê dêwan rizgar dike. Lewma di çîrokên bi vê cureyê de leheng, di têkbirina dêwan de, xwe bi civakê didin qebûlkin.

Lêkokîner Zeynelabidîn Zinar, di xebata xwe de wekî hevbeşiyêke çîroka kurdî, di hejmarê 74an de motîfa dêw qeyd kiriye.

“Di Çîroka Kurdî de gelek dêw hene her tim bi lehengê çîrokê re şer dikin. Dêwên jin hene û yên mêr hene.”¹⁶⁵

Di zargotina civaka kurd de, em di çîrokên li ser Rustemê Zal, çîrokên Mîrze Miheme û çîrokên Eliyê Newêrek de bi berbelavî rastî vê motîfê tên.

Dêw di van çîrokan de her çendî ku temsîla hêzeke derasa û mezin dikin jî ew bi bêaqiliya xwe derdikevin pêş. Yanî motîfa dêw û motîfa bêaqil gelek caran di çîrokan de ligel hev derdikevin pêş me.

Her çendî îstîsna be jî di çîrokan de em carina rastî hin dêwên baş jî tên. Ew bi piranî piştî şerê digel leheng; têk çûne û ketine xizmeta leheng. Kengê ku leheng dikeve tengayiyê, tiştê dîke û ev dêw li cem wî hazir dibe û wî ji tengayiyê xelas dike.

Ji bilî Destana Rustemê Zal, em di destanên civaka kurd de, rastî motîfa dêw nayên. Her wiha di destana folklorî a Memê Alan de jî motîfa dêw dernakeve pêş me. Lê balkêş e ku di *Mem û Zîna* Xanî de, ew di nava peywendiyên hunerên wêjeya klasîk de, wekî temsîla hêza xerab derdikevin pêş me.

Bêguman di *Mem û Zînê* de dêw, wekî wan dêwên di çîrokan de derbas dibin, bi hebûna xwe ya maddî-fizîkî derbas nabin. Ew bi tenê, di çarçoveya hunerên wêjeya klasîk de, wekî sembola hêza xerab an jî wekî temsîla şeytan hatine bikaranîn.

Pênaseya Xanî ku, dêwan wekî şeytan an jî hêza temsîla şeytan dibîne, ji aliyê hêmanên dînî ve girîng e. Lewma her çendî ku di çîrokên kurdan de dêw, wekî temsîla hêza xerab derdikevin pêş me jî, ew bi temamî ne wekî temsîlkarên şeytan in. Ev reng termînolojî, yanî dêwan wekî temsîlên şeytan dîtin, bîngeha xwe ji bawerîya zerduştîyê digire.

24/38 Ger qismê muhibb û ger hebîb in
Elbette bi dijmin û reqîb in

¹⁶⁵ Z. Zinar. *Şaxên Zanistiyê*, r. 127

Hin dêw û hinek ji wan perî ne
Hindek di munafiqê Ademî ne

26/22 Şagirtê şeameta wî şeytan
Şermende ji gotina wî Bohtan

Bedçehre ji rengê dêwê kabûs
Bedfê'l û stîzekar û salûs

4/26 Elqisse bikî wî dêwê sekeş
Tenha û tenê biçîte ateş

Xanî, wekî ku em ji van beytên jorîn jî têdigihên, motîfa dêw, di wateya şeytan û hêza xerab de bi kar aniye. Lê di vê beyta jêrîn de Xanî, motîfa dêw, di wateya hêza derasa de bi kar aniye. Lewre di vê beytê de Xanî, Tacdîn şibandiye dêwan.

53/25 Dêwê ku vebestî wan bi tedbîr
Bizdande li ber xwe qeyd û zicîr

2.18.2.3.7. Efsaneya Mar û Gencîne

Di nava gel de wekî efsane gelek berbelav e ku, xezîne ji aliyê maran ve tîn parastin. Ne diyar e ku di bingehê vê baweriyê de çîrokeke taybet, wekî Şahêmaran heye an na, lê di vê mijarê de îroj jî di nava gel de gelek efsane hene.

Ji aliyê arkeologan ve hatiye tesbîtkirin ku pîrî caran piştî ku kralên mezin an jî mirovên mezin mirine û tevî wan gelek eşyayên wan ên giranbuha jî bi wan re hatine definkirin, li ser gora wan bi piranî figurên heywanên dirinde û bi taybetî jî figurên mar an jî ejderhayan hatine çêkirin. Wilo tê zenkirin ku ev yek ji dewrên arkaîk maye û bi ramana ku, gor bi tîrsa ji wî figurê dirinde an jî mar neyê talankirin, hatine çêkirin. Yanî sedema çêkirina figura mar a li ser gorên ku eşyayên bi qîmet tê de ne, ew e ku, gel jê bitirse û talan neke.

Her wiha wekî ku di Efsaneya Şahêmaran de jî derbas dibe, Mar wekî efendiyên binê erdê derdikevin pêş me. Ji ber ku piranî caran xezîne di binê erdê de tîn veşartin,

pir muhtemel e ku civaka ku maran wekî efendiyên binê erdê dibînin, bi regekî têkiliyekê di navbera van xezîneyên binê erdê û maran de çêkiribin.¹⁶⁶

Di nava efsaneyên milletê kurd de cihê maran taybet e. Çîrokên li ser maran, çîrokên li ser evîndarbûna maran a li keçikan û çîrokên mar û gencîneyan gelekî berbelav in. Lê di nava van hemî efsaneyan de ya herî balkêş Efsaneya Dehaq e ku wilo tê bawer kirin ku du mar li ser girmilên Dehaq hebûne û xwarina van maran, mêjiyê mirovan bûye.

Di varyantên Memê Alan de em rastî motîfa marên efsaneyî nayên lê di *Mem û Zîna* Xanî de, di derekê de Xanî balê kişandiye ser Efsaneya Mar û Gencîne. Di vê beşê de Xanî ji devê Mîr, ew şibandiye gencîneyê û Tacdîn jî wekî ejderhayê parêzvan daye nîşandan. Ev beş bi vî rengî ye:

48/26 Ger fewtî bikim cemî'ê ferzan
Tacdîn ku Didim ji dest xwe erzan

Min şewket û seltenen bi wî ne
Ew şuhret û şan min ji wî ne

Ev nam û nîşan û ev meqam e
Bê xatirê wî li min heram e

Ew Rustemê Gîw e, lendeha ye
Gencîne me ez, ew ejdeha ye

Bêguman hê gelek motîf û hêmanên efsaneyî hene ku, me di beşên dî yên vê tezê de, di binê hin sernavên taybet de behs ji wan kirine. Ev efsane an jî mît, li ser dêwan, li ser cinan, li ser periyan, li ser cadû/xûlanan, li ser hin baweriyên, li ser hin şexsiyet û baweriyên dînî ne. Wekî ku Xanî jî di beşa 58an di beyta 9an de dibêje: “*Hindek ji fesaneê di Bohtan/Hindek di behaneyên di buhtan*”, *Mem û Zîn* bi gelek motîf û hêmanên efsaneyî, çîrokî tijî ye.

¹⁶⁶ Nurettin Albayrak, *Ansiklopedik Halk Edebiyatı Sözlüğü*, r. 566

2.19. HEJMARÊN FORMEL

Hejmarên Formel di Motif Indexa Stith Thompson de di Beşa Z'yê de hatine nîşandan.

Z0-Z99: Formel

Z71-Z73: Jimarên Formel

Di xebata Zeynelabidîn Zinar de, ne bi navê hejmarên formel lê bi sernavên **55: Heft, 56: Çil, 65: Sê Bira, 66: Sê Xwişk**, wekî hevbeşiyê çîroka kurdî behs ji hin hejmarên formel hatiye kirin

Di hemî berhemên folklorî de, bi taybetî di çîrok, efsane û destanan de, di çanda maddî-manewî ya civakê de, pirî caran bi rengekî berbelav û hevbeş hin hejmar derdikevin pêş me. Taybetmendiya wan a berbelav û hevbeş, rê lê vekiriyê ku zanyarên folklorê û cureyên zanyariyên dî, li ser wateya wan, dîroka wan û efsaneyên li derdora wan bisekinin.

Ev hejmarên bi vî rengî, ku em dikarin wan wekî 1, 3, 4, 7, 9, 40, 1000 û 1001 rêz bikin, hem di nava mîtolojiya civakan de, hem di nava bawerî û dînên civakê de û hem jî bi giştî di nava çanda gelêrî ya civakê de xwedî fonksiyon in.

Pertev Naili Boratav, der bareyê hejmarên bi vî cureyê de wiha nivîsiye:

“Di nava baweriyên gel de, tê dîtin ku hin wateyên taybet li hin hejmaran hatine kirin. Em ji pir bi zêdeyî bikaranîna wan û li şûna ku hejmareke tam û teqez bê dayin, ji ev reng hatina bikaranîna wan têdigihên ku, wateyê wan a taybet heye. Hejmarên wekî 1, 3, 5, 7, 9, dîsa 40, 70, 72, 99, 300, 360, 1000, 1001 her yek bi serê xwe di wateyên taybet wekî pîrozî, bioxirî, bixêrî de tînin bikaranîn. Sedema ev reng bikaranîna wan, bûye mijara lêkolînên curbecur. Ev hejmar, ne bi tenê aydê çandekê an jî kevneşopê ne. Ji şaristaniyên herî kevin û vir ve, ev yek berhema hevpar a hemî şaristaniyan, çandan e. Beşeke ji van, digihên adetên kevin ên misirîyan, beşeke jê ji sumerîyan dest pê dikin û li ser erdnîgariya mezopotamyayê pêş ketine, hin jê bingehên xwe ji zanîne, ji zanyariyên ezmanî û stêrkên digirin; wekî li mehan, hefteyan an jî rojan dabeşkirina salan. Hin jê jî, ji zanînen feylesof Pythagoras mane.”¹⁶⁷

¹⁶⁷ P. N. Boratav, *100 Soruda Türk Folklorü*, r. 117-118

Li gorî nêrîna Boratav; bi taybetî hejmarên fer girîng in û di nava civakên ku li nava wan wêjeya gelêrî zindî ye, avahîsaziya kevneşopî hê li cih e û di baweriyên van civakan de, cihê wan taybet e.

“Ji 3yan dest pê bike heya bigihê 5, 7, 9an, hejmarên fer, bi piranî wekî hejmarên bioxir hatine zanîn. Di kevneşopa dînî, mezhebî û terîqî de, em dibînin ku nirxeke taybet ji bo hejmarên bi vî rengî tê nîşandan.”¹⁶⁸

Wekî ku em ji pênaseyên Boratav jî têdigihên, li dû taybetmendiya van hejmaran, wateyên mîtolojîk, dînî, felsefî, mezhebî, terîqî û çandî hene.

Di folklorê civakê kurd de, di çîrok, destan û efsaneyan de, em bi heman rengî rastî van hejmaran tên. Wekî mînak di Destana Memê Alan de Mem kurê tekane yê bavê xwe ye. Wekî dî tu birayên wî nîn in. Ev taybetmendiya tekane ya lehengên sereke, di gelek destanan de mewcûd e. Dîsa di heman destanê de, Tacdîn/Qeretajdîn tevê du birayên xwe sê bira ne. Di destpêka destanê de sê perî derdikevin pêş me. Sê perî an jî sê xwişk motîfekê ye ku, di gelek çîrokan de derbas dibe. Her wiha bavê Mem, Elî Begê jî tevî du birayên xwe sê bira ne. Ev yek jî ji aliyê hejmarên formel ve girîng e.

Di folklorê kurdan de ji bo rêwîtiyên pir dûr, îfadeya *çil roj û çil şev, heft sal*, an jî *şex mehan* tê bikaranîn. Li gorî hin varyantên Memê Alan, Mem di şex mehan de karibûye bigihê welatê Cizîrê. Li gorî gelek varayntan, ew di çil roj û çil şevan de digihê Cizîrê. Dîsa li gorî hin varyantan, Mem heft sal di zindanê de dimîne. Zîn heft roj piştî Mem dimire. Tacdîn diçe seferê û heft sal şûn de vedigere.

Di hin varyantên Destana Siyabend û Xecê de, heft birayên Xecê û heft xuşkên Siyabend hene. Dîsa Siyabend wekî gelekî lehengên sereke, lawê takane ye. Tu birayên wî nîn in. Di Destana Zembilfiroş de jî ev motîf heye. Zembilfiroş kurê tekane yê Mîr e.

Di çîrokên kurdan de em rastî *Heft Dêwan* an jî *Çil dêwan* tên. Dîsa em rastî *dêwên heft serî* tên.

Di kevneşopa gelêrî ya civakê kurd de, şîn û şahî yan *sê roj û sê şev*, yan *heft roj û heft şev* û yan jî *çil roj û çil şev* dewam dikin. Sê roj û Sê şev berdewamkirina şîn û şahîyan hê jî adeteke serdest e.

¹⁶⁸ H. b., r. 119

Di *Mem û Zîna* Xanî de hin hejmarên ku wateyên wan ên sembolîk hene û bi berfirehî derdikevin pêş me wiha ne:

2.19.1. Hejmara Sisê (3)

2.19.1.1 Di Folklorê de Hejmara Sisêyan

Ev hejmar di nava gelek hêmanên çanda maddî û manewî de cihê xwe girtiye. Ew hejmareke ew çend mukemel e ku, di nava dîn û baweriyên de, di nava mîtolojiyê de û di nava zargotina hemî civakan de cihê girîng digire. Anne Marie Schimmel, ku li ser çanda îslamî, pisporeke li pêş e, der bareyê hejmara sisêyan de tesbîtên gelekî balkêş û berfireh kiriye:

“Karaktera bi esrar a 3yan, di helbesta Du Bartas ê ramyarê Frensî ku di Sepmaineyê de nivîsiye, hatiye îfadekirin. Di vê helbestê de 3 wiha hatiye teswîrkirin:

Fera herî kevnar, hejmara ku şayanê Xweda ye
Hejmara xweşdivî ya bihiştê ku di navendê de ye
Ji her du aliyan jî bi heman pîvanî dût e,
Yekema ku serê wê nava wê û dawiya wê heye ye

Bi rastî jî ev hemî taybetmendiyan wê hene û ji ber vê ye ku bi gelekî bi berbelavî hatiye bikaranîn. Heta mirov dikare wê wekî hejmara ‘rastî’ a yekem jî bibîne û hejmara yekem e ku dirûvekî geometrîk jê çêbûye.”¹⁶⁹

Ji bilî van taybetmendiyan, Schimmel taybetmendiyan wê hejmarê wiha rêz kirine:

“Ji alî demê ve sê demên esasî hene; dema borî, dema niha û dema wê bê. Mînak ji alî ebatan ve, sê ebatên dinyayê hene; dirêjahî, bilindahî û firehî. Di xwezayê de sê rengên bingehîn hene; sor, zer û hêşîn. Hemî reng ji van her sê rengan derdikevin. Roj li sê danên esasî vediqete; şeveq, nîvroj û êvar. Sê halên madeyan hene; hişk, avî û gaz. Hemî tiştên ku li ser rûyê erdê hene ji aliyê cureyî ve di binê sê sîwanan de kom dibin: mîneral, nebat û heywan.

¹⁶⁹ Vgz. A. Sezer. *M. Mungan ve H. Bilimi*, r. 162

Di dînê xirîstiyaniyê de baweriya teslîsê li ser bingeha hejmara sisiyan rûniştiye; Bav, Kur û Rûhê Pîroz. Di mezheba Elewîtiyê de Xweda, Muhemmed û Elî sêyineyeke girîng e.

Sê beşên esasî yê anatomiya mirovan heye; ling, gewde û serî”¹⁷⁰

Zeynelabidîn Zinar, di çîroka kurdî de, wekî hêmaneke berbelav, hebûna sê bira û sê xwişkên wiha destnîşan kiriye:

“Sê bira: Di Çîroka Kurdî de, piraniya caran çend bira dilqên xwe pêkanîne û ji destpêkê heya dawiyê, ew bûne avakiroxê wê. Di hin çîrokan de du bira hene, di hinan de sê bira hene û di hinekan de yanzdeh bira hene û di hinekan de jî zêdetir bira hene. Lê bi piranî di çîrokan de, jimara wan sisê ye.

Sê xwişk: Di Çîroka Kurdî de hertim du xwişk, yan sê xwişkên hevûdu hene ku ji nepeniyê derdikevin û tîn xwe nîşanê lehengê çîrokê didin. Ew xwişk pir delal in, lê ya biçûk hîn delaltir û sipehîtir e.”¹⁷¹

Di varyantên folklorî ên Destana Memê Alan de jî hejmara sisêyan li pêş e. Di destpêka destanê de, sê periyên ku xwişkên hev in hene. Di destanê de, bavê Mem, Elî Beg, tevî du birayên xwe sê bira ne. Qeretajdîn tevî du birayên xwe sê bira ne. Bajarê Cizîrê li ser sê meheleyan e. Zînê qelendayiya Çeko ya sê salan e. Şîna Mem sê roj didome. Destana Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî, li ser sêyineya; Mem, Zîn û Beko rûdinê. Zînê sê roj li dû mirina Mem, dimire; varyant VI.

2.19.1.2 Di Mem û Zînê de Hejmara Sisêyan

Di *Mem û Zîna* Xanî de jî çawa ku di destana folklorî de derbas dibe; Tacdîn tevî her du birayên xwe Çeko û Arif, sê bira ne. Şîna Mem û Zînê sê roj û sê şevan tê kirin; çawa ku di çanda gelêrî de jî wilo ye. Dema ku Zînê dixin gora Mem, Mem sê caran jê re dibêje: “Merheba”.

Her wiha di *Mem û Zînê* de hejmara sisê, di nava hin peywendiyên dînî de jî hatiye bikaranîn. Di van beytên jêrîn de, em ê bibînin ku Xanî hejmara sisêyan bi çi rengî bi kar aniye.

2/10 Her sê weledê pir mewalîd

¹⁷⁰ H.b., r. 162-163

¹⁷¹ Z. Zinar, *Şaxên Zanistiyê*, r. 126

Xebra û sema digel meqalîd

Li vê derê ji her sê weledan mebest ev e; her sê tiştên ku ji çar ûnsûran; ax, av, hewa û agir, pêk hatine. Yanî heywan, maden û nebat.

3/9 Ew ewwel û rûh û eqlê ewwel
Hersê ne bi ewwelf muewwel

25/19 Sê roj û şevan bi dil peyapey
Wan teşneleban vexwarin ew mey

43/63 Hetta ne me hersêyan bi ker kin
Hûn dê Memê kusa nezer kin

55/46 Sê roj û şevan ji ferşê xebra
Peyweste diçûne ‘Erşê E’la

55/54 Sê carî ji qalibî seda hat
Awazî bi lefzê “merheba” hat

Ji bilî van bikaranînên rasterast ên li ser hejmara sisêya, em dikarin sêyineya ku di nava peywendiyên Xweda, Şeytan û Adem/Mirov de teşkil dike jî wekî mînakekê ji vê jimara formulîstîk re nîşan bidin ku Xanî jî gelekî jê behs kiriye. Dîsa sêyineya ku di nava peywendiyên Mem, Zîn û Beko de jî dertê di vê çarçoveyê de dikare bê hêlsengandin.

2.19.2. Hejmara Çar (4)

2.19.2.1. Di Folklorê de Hejmara Çaran

Di gelek dîn û baweriyên de ev hejmar derdikeve pêş me. Her çiqasî ku di berhemên folklorî de, bi qandî hejmarên mîna sisê, heft û çilî ne berbelav be jî, di xweza û baweriyên dînî de girîng e.

Di xwezayê de çar aliyên esasî hene. Başûr, bakûr, rojava û rojhelat. Dîsa ji alî bala mirovî ve, nêrîna mirovî ya li tiştêkî ve, çar hêlên esasî hene. Rast, çep, pêş, paş.

Çar hêmanên esasî ku hemî tişt ji wan çê bûne û bi navê *Enasirê Erbea* jî tên zanîn; ax, av, hewa û agir. Çar bayên esasî hene.¹⁷²

Di dîroka dînan de; di dînên sumeriyana de çar xwedayên mezin hene; Enlîl, Enkî, Anû û Îştar. Dîsa çar pêxemberên mezin û bi wan ve girêdayî çar kîtêbên mezin hene; Hz. Mûsa, Hz. Dawid, Hz. Îsa û Hz. Muhemmed. Di dînê îslamiyetê de çar melekên mezin hene; Cebraîl, Mîkaîl, Ezraîl û Îsrafil. Dîsa di dînê îslamiyetê de çar mezhebên esasî hene; heneffî, şafîî, malikî, hambelî. Di îslamiyetê de çar xelîfe hene; Ebûbekir, Omer, Osman û Elî. Li gorî tesewîfê çar rêyên esasî bo gihaştina xweda hene; şerîet, terîqet, heqîqet û marîfet.¹⁷³

Di xirîstiyaniyê de sembola herî mezin Xaç, çar aliyên esasî nîşan dide.¹⁷⁴

Li gorî varyanteke Memê Alan; Mem çar sal di hepsê de dimîne; varyant VII.

2.19.2.2. Di Mem û Zînê de Hejmarê Çaran

Di *Mem û Zîna* Xanî de her çendî ku ne zêde be jî di çend cihan de bi vî rengî derbas dibe:

2/9 Heftêd mîsalê durrê xeletan
Her şeş cîhet û çihari erkan

47/12 Em çar bira hebûn di sadiq
Her çarî li xizmeta wî aşiq

47/18 Em çari bira ne çari dîwar
Erkanê se'adeta wî her çar

47/19 Her çari serê di me wekî go
Çewgan îradeta wî kaşo

¹⁷² Vgz. A. Sezer. *M. Mungan ve H. Bilimi*, r. 166-168

¹⁷³ Vgz. A. Sezer. *M. Mungan ve H. Bilimi*, r. 166-168

¹⁷⁴ H.b., r. 167

2.19.3. Hejmara Heft (7)

2.19.3.1. Di Folklorê de Hejmara Heftan

Ev hejmar jî wekî hejmara sisêyan di baweriyên de, di mîtolojiyê de û di folklorê civakan de gelekî berbelav e.

Li gorî baweriya yahûdiyan, xweda cîhanê di şeş rojan de afirandiye û roja heftan roja bêhnvedanê ye. Li dû baweriyên bi Efsaneya Tofanê re têkildar, amadekariyên tofanê heft roj didomin û kevoka ku Hz. Nûh dişîne bo ku cihekî ziwa bibîne, heft rojan li ezmana difire.¹⁷⁵

Di baweriya îslamî de Xweda asîman wekî heft qat afirandiye. Di hecê de Kabe heft car tê tawafkirin; li dora wê heft car tê gerîn. Di tesewifê de heft reng nefis hene. Dîsa di Quranê de hatiye gotin ku heft deriyên dojhê hene. Di Quranê de di 77 sûreyan de behsa dojhê hatiye kirin. Di teqwîmê de heft roj hene ku hefteyê pêk tînin.¹⁷⁶

Di zargotinê de biwêjên mîna, *heft roj û heft şev, heft sal û heft meh*, dîsa *ji heftan heya heftê û heftan* biwêjên girîng in. Di çîrok û destanan de şerên ku heft sal dewam dikin, xurbetiyên ku heft sal didomin, şivanîyên ku heft sal tên kirin hene. Heft sal şivanîkirin carina wekî şertekî ji bo zewacê jî tê pêşxistin. Di çîrokên mîtolojîk de dêwên heft serî, an jî ejderhayên heft serî hene. Qûleya Babîlê heft qat e.

Zeynelabidîn Zinar, li ser vê hejmara ku di çîrokên kurdan de bi berbelavî tê dîtin, wiha nivîsiye:

“Ev jimara heft, di çîroka Kurdî de gelekî balkêş e û pir jî hatiye dubarekirin. Sedemê wê yekê çî be jî, ez bi xwe di lêkolîna xwe ya duwazdeh salên li Folklorê Kurdî de lê rast nehatime ku çima ev jimara wisa zêde hatiye dubarekirin. Wek nimûne: (ji bo dawetan) heft roj û heft şev dawet, di kirîvatiyê de heft roj û heft şev şahî, heft werîs, werîsên heft gundan, garana heft gundan, heft nan, heft kutilk, heft pîvaz, ji bo qelenê qîzan heft sal şivantî, di çûna rêwîtiyê an eskeriyê de heft salên xerîbiyê, heft bira, heft xwişk, heft bira û heft xwişk, heft bûkên malê, heft gule, heft rê, heft hezar, (di jinanînê de) heft jin, (di mêrkirinê de) heft mêr, heft sîtil savar û heft sîtil goşt û hwd. Di Folklorê Kurdî de pir caran hatine gotin”¹⁷⁷

¹⁷⁵ Vgz. A. Sezer. *M. Mungan ve H. Bilimi*, r. 168-169

¹⁷⁶ H.b., r. 168-169

¹⁷⁷ Z. Zinar, *Şaxên Zanistiyê*, r. 124

Li gorî hin varyantên Memê Alan, Mem heft sal di zindanê de maye; varyant II. Her wiha Tacdîn çûye seferê û heft sal şûn de vegeriyaye. Zînê heft roj piştî mirina Mem, dimire; Varyant II, IV.

2.19.3.2. Di Mem û Zînê de Hejmara Heftan

Di *Mem û Zînê* de jimara heftan di çend cihan de hem di nava peywendiya wê ya bi zargotinê re û hem jî bi astronomiyê re têkildar hatiye bikaranîn.

2/9 Heftêd mîsalê durrê xeletan
Her şeş cîhet û çiharî erkan

21/20 Agir te digo gihâste neftê
Pêtî jê diçû asîmanê heftê

23/82 Encumsîfet encumen, firûzan
Heft şev di temam û heft rûzan

24/3 Weqtê seherê ji rojê heftê
Agir te digo gihîşte neftê

57/16 Ew qesre ku heft tebeq ‘eyan in
Yek ya min e heft tebeqê di wan in

2.19.4. Hejmara Çil (40)

2.19.4.1. Di Folklorê de Hejmara Çilî

Ev hejmar wekî hejmareke bi raz cihê xwe di nava çanda gelên rojhelat de girtiye.

“Çil di nava hejmarên mezin de hejmara herî bi efsûn e û bi taybet li Rojhelata Navîn bi renekî berbelav tê bikaranîn.”¹⁷⁸

Di nava dîn û baweriyên terîqî de jî girîngiya vê hejmarê heye. Çil roj înzîva, di wateya paqîjbûn, pakbûnê de tê dîtin.

¹⁷⁸ Vgz. A. Sezer. *M. Mungan ve H. Bilimi*, r. 175

Li pey anîna zarokan jin, çil roj di nava ciyan de dimînin. Zarokê ku çilê wî hatibe, wekî ku merheleyeke temenî derbas kiribe tê qebûlkin.

Di teqwîma gel a civaka kurdan de çile hene. Çileya pêşîn û çileya paşîn du merheleyên girîng ên demsala zivistanê ne. Li bajarê Amedê çiyayê bi navê, Çiyayê Çil Welîyan heye. Di zargotina milletê turk de çîroka Çil Heramîyan çîrokeke navdar e.

Çil roj, çil sal, çil kes di zargotinê de biwêjên girîng in.

Lêkolîner Zeynelabidîn Zinar, hejmara çilî di nava peywendiya wê ya bi zargotinê re, wiha nirxandiye:

“Ev jimara Çil jî wek jimara 33, 13 û heft, di Çîroka Kurdî de gelekî balkêş e ku wisa hatiye dubarekirin, sedemê vê jî mîna jimara heft ne diyar e. Lê jimara çil, di dawet û şahîyan de, çil roj û çil şev, tê gotin. Di çêbûna zarokan de ji bo dê û ji bo zarûkê (di çil rojên pêşî de), çilî, tê gotin. Ji bo du zarûkên ku ev çil rojên wan ên pêşî ketine nava hevûdu, dibêjin, çilê wan yek e. Piştî mirina yekê/î ji bo bîranînê, çilrojîya wî tê bibîranîn. Gava yek sondekê dixwe an adekê li xwe dide, dibêje ku, ew heya çil rojî wiha nake yan dê bike. Yekî an yeka ku zêde dipeyive û tiştên bê pêdivî dibêje, yekî duyemîn jê re dibêje (eger jin be); çilzimanê, (yan eger mêr be), çilzimano. Gelek caran gava ji bo çareserkirina tiştêkî jî ku zeman tê kifşkirin, bi piranî çil roj qewlê xwe datînin.”¹⁷⁹

Di Memê Alana folklorî de piştî ku Mem û Zîn bi renekî derasayî, bi alîkariya periyên hev dibînin, li gorî hin varyantan, Zînê çil roj wext dide Mem da ku bê xwe pê bigihîne. Dîsa li gorî gelek varyantan; varyantên I, IV, X, XI, Mem di çil roj û çil şevan de gihaştîye Cizîra Botan. Qîza Beko ya remilvan, çil roj û çil şev li ber çemê Cizîrê li hêviya Mem disekine.¹⁸⁰

2.19.4.2. Di Mem û Zînê de Hejmara Çilî

Di *Mem û Zînê* de hejmara çilî di hin deran de bi vî rengî derbas bûye.

27/13 Çil rojî ne xwor ne xab Zînê

Ser ranedibû ji ser girînê

35/54 Ji ewwel ve li rex şeti nexweş ket

¹⁷⁹ Z. Zinar, *Şaxên Zanistiyê*, r. 124

¹⁸⁰ Bnr., *Epîzota Gihaştina Hev a Mem û Zînê*

Çil rojî temami şubhê leş ket

44/28 Deh carî bi heqqê bejn û balê
Çil carî bi heqqê zulf û xalê

49/30 Çil esrî dikin yekê mucerreb
Paşê ewî dê bikin muqerreb

56/14 Çil salî tu henzelê biçînî
Sed av bidî bihingivînî

2.19.5. Hejmara Sed (100)

2.19.5.1. Di Folklorê de Hejmara Sedî

Ev hejmar di zargotinê de bi wateya îfadekirina piraniyê hatiye bikaranîn. Di nava axaftina rojane ya civakê de bi rengêkî pir berbelavî tê bikaranîn. Her wiha carina ji bo mubalexekirina hin tiştan jî tê xebitandin. Bi piranî di nava biwêjên wekî; *sed car*, *sed kes*, *sed sal*, de tê bikaranîn

2.19.5.2. Di Mem û Zînê de Hejmara Sedî

Di *Mem û Zînê* de hejmara ku herî zêde hatiye bikaranîn hejmara sed e. Bi qandî ku me tesbît kiriye herî kême di sih û çar (34) cihan de ev hejmar hatiye bikaranîn. Li dû vê hejmarê, hejmara ku herî zêde hatiye bikaranîn jî hejmara du sed e, ku ew jî bi vê hejmarê re têkildar e. Hejmara du sed jî herî kême di heşt (8) cihan de derbas dibe. Rengê bikaranîna hejmara sedî ya di *Mem û Zînê* de, bi tesewira vê hejmarê ya di nava gel de, bi heman rengî ye. Çend mînakên awayê bikaranîna vê hejmarê wiha ne:

3/64 Sed cari bi jî te ey keremkar
Ger dê me hebin guneh du sed bar

6/46 Her rojê hezar bê newayan
Her lehze bi lutf sed gedayan

7/32 Bê deng ji xewrê dil bi aheng
Sed reng seda bidim wekî çeng

9/7 Sed can û dil û ceger disotin
Xelqê bi mesel ji wan digotin

14/50 Ew her du bi sed dilan hebandin
Rûniştin û her du wergerandin

40/41 Her lehze ji neyayêd Tetarî
Sed bari ji turreyan dibarî

44/26 Sed salî bigêrî min tu mebhûs
Ma ez qe didim ji weslê me'yûs

46/34 Her dem bibihîn ji nazenînan
Sed medh û hezarî aferînan

57/43 Sed şukur ez ê xirab û Tacdîn
Mehda bi te'elluqa Mem û Zîn

2.19.6. Hejmara Hezar (1000)

2.19.6.1. Di Folklorê de Hejmara Hezarî

Her çendî ku hejmara sed jî wateya piraniyê dide, mirov dikare hejmara hezar, wekî piraniyeke tam îfade bike. Yanî piraniya bêkêmahî. P. N. Boratav ji bo vê hejmarê weha gotiye:

“Hejmara hezarî (1000) bi piranî bi îfadekirina, vegotina piraniyê tê bikaranîn”¹⁸¹

¹⁸¹ P. N. Boratav, *100 Soruda Türk Folkoru*, r. 120

Di nava civakê de, di jiyana rojane de, ev hejmar di nava biwêjên mîna; *hezar sal, hezar car, hezar derd û dewa, hezar rê û dirb* de tê bikaranîn.

2.19.6.2. Di Mem û Zînê de Hejmara Hezarî

Di *Mem û Zînê* de, di nava peywendiyên ku di pênaseya jorîn de derbas dibe de; herî kêr di pênc cihan de derdikeve pêş me.

6/46 Her rojê hezar bê newayan
Her lehze bi lutf sed gedayan

10/13 Lewra ku bi şerî şubhê şer bû
Roja şerî ew hizare mêr bû

33/7 Hêja ji xwedê tu fikir nakî
Her roj hezar şikir nakî

46/34 Her dem bibihîn ji nazenînan
Sed medh û hezari aferînan

50/32 Gûya hejiya hezari bîşe
Mey bû rijiya ji qelbê şîşe

2.19.7. Hejmara Hezar û Yek (1001)

2.19.7.1. Di Folklorê de Hejmara Hezar û Yekî

Buhartina hejmarên mezin, bi rengê 1001, 101, 41, tê wateya “bêdawîtî, bêsinorî” yê. Li Anatoliyayê Hezar û Yek klîse û Hezar û Yek şev mînakên herî balkêş in. Ev hejmar îşaretê firehbûna bêdawî dike.”¹⁸²

Wekî ji pênaseya jorîn jî em têdigihên, ev hejmar bi tevahî tesewira piraniya bêdawî dike. Di nava civakê de, bikaranîneke bi vî rengî heye ku bi piranî di nava

¹⁸² Vghz. A. Sezer. *M. Mungan ve H. Bilimi*, r. 181

zarokan de derbas dibe; dema ku du zarok di meseleyekê de dikevin ber hev, yek jê ji bo ku gotina wî heya bi heya ji ya dî zêdetir be wiha dibêje: *Tu bêjî çi yeka min lê zêde*. Li vê derê bi zêdekirina yekê, tesewira zêdebûna bêdawî heye.

Çîrokên Hezar û Yek Şevê, di bikaranîna vê hejmarê de, mîna bîstê e.

Di nava civakê de, di wateya pirrengiya bêsînor û piraniya bêdawî de biwêjên mîna, *hezar û yek lisan, hezar û yek kulîlik, hezar û yek reng* hene.

2.19.7.2. Di Mem û Zînê de Hejmara Hezar û Yekî

Ev hejmar di *Mem û Zînê* de pir nehatiye bikaranîn. Bi qandî ku me tesbît kiriye bi tenê di cihekî de, bi nava peywendiya wateya wê ya ku pirbûna bêdawî dide, hatiye bikaranîn.

22/43 Ger min hebitin hezar û yek ser
Wan cumle di rojekê bi defter

Ger ez nekirim fîda bi carek
Mîrînî li min nebit mubarek

2.19.8. Hejmarên Dî

Di *Mem û Zînê* de ji bilî van hejmarên ku me li jorê dan, gelek hejmar hatine bikaranîn. Hin jê bi van hejmarên dî re girêdayî ne. Hin jê jî ji ber ku di nava folklorê de bi qandî van hejmarên jorîn wateya wan nîn in; me li wan, di bin sernaveke serbixwe de nekola. Hin hejmarên dî jî hene ku, têkiliya wan tenê bi stêrnasî an jî cureyên zanyariyên dî re hene.

Ev hejmar, bi vî rengî ne: 6, 9, 10, 50, 200, 300, 500, 2000, 100.000

BEŞA SÊYEM

DI MEM Û ZÎNÊ DE HÊMANÊN ÇANDA GEL

Çanda gel, ne bi tenê mijara zanista folklorê ye. Gelekî zanistên dî, wekî civaknasî, antropolojî, etnolojî û hwd. li ser çanda gel lêkolînan dikin. Girîngiya hêmanên çanda gel di nava folklorê de û pê ve girêdayî di nava wêjeyê de mijareke taybet e. Lewre her berhema edebî, çi gelêrî û çi jî nivîskî, bi regekî rûhê dewrên ku tê de derbas bûye, neqlê me dike. Dema ku em li van berhemên edebî dinihêrin, em di heqê çanda gel ya wê serdemê de digihîjin gelekî agahiyan. Di berhemên gelêrî ên wekî Memê Alan de, hin formên çanda gel, ji ber ku di van berheman de di cihekî gelekî krîtîk de rûniştine, bêyî ku guherîbin heya dewra me hatine. Her wekî ku di destpêka destanê de em rastî baweriya ji periyên tîn. Û hin formên çanda gel jî bi seyra dîrokî ya destanê re têkildar, di kîjan serdeman de derbas bûbin, ji wan serdeman hin form girtine nava xwe û gihîştine heya dewra me. Her wekî ku di Destana Memê Alan de em rastî gelekî taybetmendiyên dînê îslamê tîn û dîsa nîşaneyên ku bi dijberiyên mezhebî re têkildar derdikevin pêş me. Lewre berhemên folklorî ne bi tenê ayîneya dewrekê ne. Ew di heman demê de rûhê gelek dewrên ku tê de derbas bûne neqlê me dikin.

Lê di berhemên nivîskî yê wekî *Mem û Zîn* de rewş cuda ye. Di berhemên bi vî rengî de em bi tenê rastî nuweyên folklorî yê wê serdema ku berhem tê de hatiye nivîsîn tîn. Lewre di karaktera van berheman de guherbarî nîn e; ew bêyî ku guherîbin hatine heya dewra me. Ji ber vê yekê, ew di neqilkirina hêmanên çanda gel yê wê dewrê de, hukmên bêtir teqez derdixin pêş me û her wiha resmekî bêtir zelal yê dewra xwe kişandine. Dema ku em li van berheman dikolin, em der bareyê civaka wê demê de, der bareyê bawerî û kevneşopên wan, şîr û şahiyên wan, rêz û resmên wan yê civakî de yanê bi kurtî der bareyê çanda gel de digihîjin gelek agahiyan.

Folklornas Erman Artun ji bo hêmanên ku di nava çanda gel de tîn dîtin wiha nivîsiye.

“Çanda Gel, ji hemî hêmanên bi nêrîna dinyayê û nêrîna jiyane ya civakê re têkildar, ji adet û toreyên civakê heya bi hemî kevneşopan, ji rengê jiyana civakê heya bi hemî nixxên dînî-exlaqî yê civakeke ku li ser erdnîgariyê diyar dijî re, tê gotin.”¹⁸³

¹⁸³ Erman Artun, *Türk Halk Bilimi*, r. 357-360

Di berhemên zargotinî de motîf û di folklorê de hêmanên çanda gel gelekî nêzî hev in. Lê cudahiya motîfan ew e; ew di nava berhemên wêjeya gelêrî de cih digirin û di prosesa vegotinê xwedî fonksyon in. Wekî mînak, di berhemên zargotinî de mirin motîf e lê ji aliyê hêmanên çanda gel ve ji bûyera mirinê bêhtir, şîna ku li dû mirî tê lidarxistin girîng e. Di berhemên zargotinî de, Xocê Xizir hem motîfekê ye hem jî hêmaneke çanda gel e. Lewre ew di çîrokê de wekî lehengekî daxilê nava prosesa çîrokê dibe û motîfbûna wî ji vê tê. Lê ji ber ku ew li dû baweriyekê an jî dînekî hatiye hîn kirin, ew di heman demê de hêmaneke çanda gel e. Bi kurtî motîf, mijara avahîsaziya berhemên zargotinî ye lê hêmanên çanda gel, çi di nava berhemên zargotinî de û çi jî ji berhemên zargotinî bêrî; bi jiyana maddî-manewî ya civakê re têkildar û di hin rewşan de rengê helwestnîşandana spesîfik a civakê nîşanî me didin. Her wiha çawa ku em bi rêya motîfan der bareyê seyra kronolojîk û erdnîgarî ya çîrokan de digihîjin hin fikran; wilo jî bi rêya hêmanên çanda gel em dikarin der bareyê taybetmendiyan hevbeş û yên cuda yên civakê de bigihîjin agahiyan.

Di vê beşa teza xwe de, em ê bi tenê *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî esas bigirin û lê bikolin ku di *Mem û Zînê* de, hêmanên çanda gel bi çi rengî derdikevin pêş me.

Her çendî ku pêdivî bi lêkolîna li ser Memê Alana folklorî ji aliyê hêmanên çandî ve heye jî, ji aliyê sernavên ku me tesbît kirine ve, *Mem û Zîna* Xanî bêtir dewlemend e. Her wiha mijarên ku em ê di vê beşê de li wan bikolin, bi piranî di varyantên folklorî ên Memê Alan de, hîç dernakevin pêş me. Ev hêmanên ku di Memê Alana folklorî de dernakevin pêş me bi vî rengî ne: Cejna Newrozê, daweta Tacdîn û Stiyê, lîstik û govendên gelêrî, hêmanên dînî-bawerî, kevneşopa hekîmiya gel û di binê van sernavan de gelek sernavên dî yên taybet. Lewra me vê beşa teza xwe bi tenê bi *Mem û Zîna* Xanî bisînor kir.

3.1. DI MEM Û ZÎNÊ DE BAWERÎ Û DÎN

Berhemên zargotinî, her çendî ku em nikarin wan wekî berhemên dînî-bawerî binirxînin jî, ew di zîkê xwe de gelek şopên dînî-bawerî mewcûd dikin ku, bi şopandina vê seyra dîrokî ya berhemên zargotinî, mirov dikare di heqê serencama dînî ya civakan de jî bigihê hin fikran. Her çendî ku civak, di hin xaçerêyên dîrokî de, dibe ku carina dînen xwe û pê ve girêdayî, bi nisbî çanda xwe biguhêrin jî, ew dîn û çanda berê, bi tevahî ji nava civakê ranabe û her dem bi rengekî xwezayî, carina di çanda rojane de, carina di çanda maddî ya civakan de, carina di nava berhemên çandî û zargotinî yên civakê de yanî di çîrok, efsane û destanên civakê de, hebûna xwe bi rengekî dînamîk lê bêyî ku zor bidin sînoren nû yên dîn û çanda nû, didomînin.

Em dikarin berhemên zargotinî ji du aliyan ve bi baweriyên re têkildar şîrove bikin. Yek jê ev e ku; hin berhemên zargotinî, bi tevahî di heqê hin baweriyên miletan de ne. Ev cure bawerî, dibe ku bi kitêbên pîroz hatibin îspatkirin jî û dibe ku hîç di kitêbên pîroz de derbas nebûbin jî. Wekî mînak, di nava civaka kurdan de, bi berbelavî baweriya bi cinan û pîrebokan heye. Her wiha ziyaret û hin bûyerên wekî ‘xêza fila’ jî di nava baweriyên civakê de cih digirin. Ji van mînan hinek jê, di dîn de cihê wan hene û hinek jê cihê wan tune. Dîsa wekî mînak, *Efsaneya Kawa*, *Efsaneya Bejn û Boht* û *Efsaneya Tofanê* jî ji bo civaka kurdan efsaneyên girîng in. Vêca hin ji van efsaneyan di nava dîn de cih digirin û hin jê nagirin. Lê li gel zanyariya folklorê, divê ev di çarçoveya baweriyên de bên nirxandin. Çunkî di bîngeha wan de û sedema belavbûna wan de, bawerkirin heye.

Ya duduyan jî ew e ku; di berhemên zargotinî de li ser dîne wê civakê û hin şexsiyetên navdar yên wî dînî, dibe ku gelek hêman derkevin pêş me. Wekî çîrokên li ser pêşewayên dînî, wekî Hz. ‘Elî û Hz. ‘Umer û hwd. Dîsa dibe ku hin ji van bûyeran bi rastî tesbîtkirî bin û hin jî bê tesbît bin. Lê divê em van hemiyan wekî hêmanên dînî di nava berhemên zargotinî de binirxînin. Lewra ew bi çî hawî dibin bila bibin, jêdera wan, dîne ku civak jê bawer dike ye.

Di berhemên zargotinî de ji alî bawerî û dînî ve, dewlemendiyêke berbiçav heye. Heta mirov dikare bibêje ku berhemên folklorî bo nîşaneyên bawerî û serencama dînî ya civakan, diyardeyên gelekî girîng in.

Wekî ku tê zanîn, kurd di sedsala VIII û IXan de heger bi zorê û heger bi dilê xwe, dîne xwe guhartine û îslamiyetê qebûl kirine. Bi giştî wilo tê ferzkirin ku, dema ku civakê dîne xwe diguherîne, pê re çanda xwe jî diguherîne. Lê ev nirxandin, her çendî ku ji hinek aliyan ve rast e jî bi temamî nayê wê wateyê ku civak, hemî çanda

xwe ya berê jibîr dîkin û yekser bi prensîb û baweriyên nû dest bi jiyaneke nû dîkin. Bêguman şopên baweriya berê, bi rengêkî, ji xwe re di nava dîn û çanda nû de jî cih dibînin.

Civaka kurd, berî ku bibin musulman, li ser dînê zerduştîyê bûn. Li gorî lêkolînan, nêzîkê 1200 sal serdestiya dînê zerduştî di nava civaka kurdan û gelek civakên dî de berdewam kiriye. Dîsa beriya zerduştîyê kurd li ser dînê mîtra bûn. Serdestiya dînê mîtraîzmê jî bi sedsalan berdewam kiribû.¹⁸⁴ Eger em mînakekê bidin di vê nuqteyê de belkî mijar bêtir baş bê fêmkirin. Di nava civaka kurdan de, dema ku ew li ser dînê mîtraîzmê bûn jî Efsaneya Kawa hebû û mîletê jê bawer dikir. Dema ku dînê civakê guherî jî ev efsane her wilo di nava civakê de ma. Dîsa piştî ku civaka kurd ji dînê zerduştî derbasî ser dînê îslamiyetê bû jî ev efsane her wilo di nava civakê de hebûna xwe parast. Her çendî ku hêman û bûyerên ku di efsaneyê de diqewimin, derveyî dîn û aqilê realîst bin jî, ew wekî kevneşopeke baweriyê, di nava civakê de wilo ma. Dîsa di nava civaka kurdan de, bi taybetî di dewra zerduştîyê de, agir hêmaneke pîroz bû. Lê her çendî ku kurdan dînê xwe guhart jî, pîroziya agir li nava civaka kurdan her wilo ma. Îro jî ev bawerî di nava civaka kurdan de heye.

Yanî bi kurtî dîn û bawerî, di nava berhemên zargotinê yên civakan de, bi rengêkî gelekî dînamîk cihê xwe digirin û her çiqasî civak, dîn û baweriyên xwe diguhêrin jî şopên wan di nava folklorê de dimînin.

Mem û Zîna Ehmedê Xanî, çi ji alî hêmanên îslamî ve û çi jî ji alî hêmanên dînen berê yên ku civaka kurdan jê bawer kirine ve, gelekî dewlemend e. Bi taybetî motif û çîrokên ku jêdera wan bi giranî Avesta û baweriya zerduştî ne, di *Mem û Zîna* Xanî de tên dîtin. Balkêş e ku Ehmedê Xanî, gelek motif û hêmanên efsaneyî û bawerî ku, di destana folklorî de hene derxistîye lê di şûna wan de, hin motif û hêmanên nû yên ku bi dîn û baweriyên re eleqedar in, bi kar anîne. Mînak, hema bêje di hemî varyantên Memê Alan de, hevdiîna ewil a Mem û Zînê bi rengêkî derasa pêk tê. Li ezmana, sê periyên ku di rengê sê kevokan de ne û di heman demê de di qudreteke wilo de ne ku, her kesê ji jor de dibînin û dikarin qedera mirovan biguhêrin; biryar didin ku Mem û Zîn ên ku li ser rûyê cîhanê tu kes wekî wan xweşik nîn e, bînin cem hev, wan bi hev bidin naskirin. Lê di *Mem û Zîna* Xanî de, her çendî ku di gelek beşan de bi gelek munasebetan behsa periyên hatiye kirin jî, ew wekî ku di destana folklorî de derbas dibin, ne çalak in û ne xwedî hêzeke wilo ne ku qedera mirovan biguhêrin. Ew

¹⁸⁴Zerduşt, *Avesta, Zerduştîlerin Kutsal Metinleri*, Wer. Fahriye Adsay, Ibrahim-Bingöl, Weş. Avesta, İstanbul, 2012, r. 9-18

tenê wekî hêmaneke estetîk û xweşikîyê di berhema Xanî de cihê xwe digirin. Ji hebûna periyên bawerkirin û wan wekî hêzeke dînamîk li ser jiyana sosyal a civakê dîtin, baweriyeke dêrîn a gelekî civakan e. Her wiha em dikarin periyên, di nava motîfên baweriyê de jî binirxînin. Lê wekî ku tê zanîn, di dîne îslamê de ji bilî melekan, (ku ew bê cînsiyet in) ji hebûna heyinên wiha re cih tune. Hêjayî gotinê ye ku Xanî, ji hevdîtina ewil a Mem û Zînê, ev motîf derxistine lê di şûna wan de, tiştêkî nû bi cih kiriye ku ew jî bi baweriyên civaka kurdan re têkildar e. Xanî hevdîtina ewil a Mem û Zînê, li Cejna Newrozê rast aniye ku, di nava civaka kurdan de ev cejn bi Efsaneya Kawa/Dehaq re têkildar hatiye dîtin. Lewma em dikarin bibêjin ku; Xanî, hevdîtina ewil a Mem û Zînê ji motîfeke wiha giştî xelas kiriye û lehengên xwe di pêrozbahiyên cejna Newrozê de li hev rast aniye ku civaka kurd vê cejna kurdî/îranî wekî cejnêkî neteweyî dibîne. Yanî destanê li dû şertên demî, bêtir neteweyî kiriye. Her wiha li gorî baweriya Xanî, ne pêkan e ku perî li ser qedera mirovan wilo xwedî qudret bin.

Bêguman ev meyla Xanî, ne tenê di warê dînî-bawerî û efsaneyî de, her wiha di gelek warên dî de jî, (wekî ku li gorî destana folklorî, Mem ji Muxurzemîn e yan jî ji bajarê Yemenê ye lê li gorî *Mem û Zîna* Xanî ew ji bajarê Cizîrê ye) dikare bê dîtin.

Balkêş e ku, her çendî di guhertoyên folklorî ên Memê Alan de, em hîç bi rengêkî aşîkar li nîşaneyên dîne zerduştî rast nayên jî, di *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî de, ev nîşane bi rengêkî aşkera cihê xwe digirin. Her wiha Xanî, gelek sûdê ji motîfên zerduştî û çîrokên ku baweriya zerduştî tê de serdest in, girtiye. Bêguman em baş nizanin ku di dema Xanî de, dîne zerduştî li erdnîgariya Îran û Kurdistanê mabû an na, lê em vê dizanin ku Xanî, ne di wê hewlê de ye ku vî dîne ku di radeyeke girîng de hatiye jibîrkirin, wekî ku tune be, bihesibîne; bi rengêkî xwestiye ew bi bîr bîne. Her wiha di beşa ku Tacdîn ji bo xelasiya Mem û Zînê fedekariyeke mezin dike û mala xwe dide ber agir, Xanî wiha gotiye:

Mala xwe ji rengê qewmê Zerdeşt

Da agir û gaziya xwe raheşt

Li vê derê em dikarin bibînin ku, Xanî ne wekî hin rewşenbîrên îslamî nêzîkatî bi zerduştîyê dike. Ji ber ku îslamiyetê şerekî mezin e dînî-îdeolojîk li hember zerduştîyê kiriye, hin rewşenbîrên îslamî jî her tim ev dîn û pê ve girêdayî çanda li derdora wî, pir xerab û dijî dîn nîşandane. Di beşeke ku lehengî û fedekarî di radeya herî bilind de ye, bi vî rengî zerduştîyê bibîranîn, nîşan dide ku Xanî bi nêrîneke cudatir

li zerduştiyê dinihêre. Her wiha cejna Newrozê jî heya roja îro jî ji alî hin kesan ve wekî parçeyeke çanda zerduştî tê dîtin û pîrozkirina wê tê redkirin. Lê Xanî di berhema xwe de girîngiyeke mezin daye vê cejnê û ew wekî parçeyeke girîng ya çanda gelê kurd nîşan daye.

Di vê beşê de em ê lê binihêrin ku Xanî di kîjan beşan de bi çî peywendiyê, behs biriye ser motîfên dînî-bawerî, çî yên îslamî û çî jî yên der-îslamî.

3.1.1. Di Mem û Zînê de Dîn û Şexsiyetên Dînî

Di tesewira dînî ya Xanî de, bi giştî li ser rûyê cîhanê mirovên ku ji Xweda bawer kirine û yên ku bawer nekirine hene. Yanî mu'min û kafir. Xanî, bi taybetî di beşên Munacaet û Naetê de –ku bi destana folklorî re tu peywendiya wan nîn e- behsa hin dîn û baweriyên mezin kirine. Xanî di beşa diduyan de wiha gotiye.

2/14 Fîlcumle çî ewel û çî axir

El-Qisse çî mu'min û çî kafir

Heryek ji te ra we bûne mezher

Ewrengi di wan tu bûyî mudber

Wekî ku em ji van beytan jî dibînin Xanî, bi giştî bi çavekî dînî li cîhanê dinihêre û mirovan wekî xwedanas û xwedanenas li du beşan veqetandiye.

Di beşa duduyan de Xanî, navê gelek dînan û rêberê van dînan hildaye û li hemberî dînê îslamê têkçûna wan aniye ziman.

3/29 Şahê 'Erebî 'elem ku rakir

Kîsrayê 'Ecem eceb du ta kir

Rom û Hebeş û Fireng û Tatar

Herçî ku nekir bi dînî îqrar

Naçarî gelek bi şîr fena bûn

Heta ku hinek bi dîn teba bûn

Buxtane bi agirî dişûştin
Ateşgede cumlekî vekuştin

Gava ewî dîn kir aşîkara
Dawûdî û Sibîî û Nesara

Tewratî ewan jibîr kir ekser
Încîl û Zebûrî çûn ji ezber

Îsayî dema dixwende Încîl
Behsa wî dikir bi wehy û tenzîl

Go: “Mujde didim Resûlê Emced
Dê paşê min bê bi navê Ehmed”

3/37 De’wa xwe dikir bi dest û ezman
Destê wî bi seyf û dev bi Qur’an

Xanî di van beytên jorîn de gelek têgihên dînî bi kar anîne wekî; Qur’an, Tewrat, Zebûr, Încîl ku kitêbên pîroz ên sê dînên mezin; îslamiyet, yahûdîî û xirîstiyani ne. Pêşewayên van dînan Hz. Muhemmed, Hz. Mûsa û Hz. Dawûd, Hz. Îsa ne. Ji ber ku ev dîn û pêşawayên wan, ji alî civakê ve bi berfirehî tînan zanîn, em ê di heqê wan de agahiyên firehtir nedin lê di *Mem û Zînê* de di beşên pêş de em ê lê binihêrin ku bi kîjan wateyên cuda hatine bikaranîn.

Wekî ku di van beytan de jî tê dîtin, Xanî behsa gelek dîn kirine ku di nava wan de dînê zerduştî jî heye. Atşegede, tê wateya *cihê agir* an jî *mala agir* ku ev naveke giştî bû ku li perestgehên dînê zerduştî hatibû kirin. Di zimanê pehlewî de ‘Ataxskatag’ û ‘Atûrgas’, di zimanê zerduştîyên îranî û parsiyên hîndî de ‘Azeriyan’ hatiye gotin. Di van perestgehan de agir hêmaneke jênager bû ku temsîla hêza xwedayî û başiyê dikir. Ev perestgeh ne tenê mekanên dînî-ayinî bûn, di heman demê de wekî saziyên perwerdeyê jî xebat dikirin. Li vê derê karên perwerdeyê pêşî li derdora kitêba pîroz Avesta û şîroveya wê Zend Avestayê dihate dayin lê dûre mufredata perwerdeyê firehtir bûye û her wiha astronomî, matematîk, tib, dadgerî jî wekî ders tevli sîstema perwerdeya Atşegedeyan bûye. Di sîstema zerduştîyê de perwerde her tim cihekî girîng

girtiye û rêya xelasiya herî mezin her tim di perwerdekirina gel de hatiye dîtin. Di kitêba pîroz Vendîdadê de wiha hatiye gotin: “Ey Zerdüşte pîroz! Ji perwerdekar re bibêje ku tevahiya şevê bi xwendin û lêgerînê derbas bikin”. Ev perwerdekar ku ji wan re Arhravan dihate gotin, ji nava mirovên nefspiçûk, bi sebir, paqij û ji xerabiyên dûr dihatin helbijartin.¹⁸⁵

Xanî di van beytên jorîn de, ji bilî dînen mezin behsa pûtperestiyê jî kiriye ku ev cure bawerî jî, di dîroka gelan de prosesekê teşkîl dike. Lê li erdnîgariya milletê ereb, bi derketina îslamiyetê re ev bawerî bi tevahî rabûye.

Xanî di beşa munacaetê de cardî balê kişandiyê ser motîfeke zerdüşti:

2/26 Neylufê nazeperwerî kir

Ew jî te li mîhrê muşterî kir

Nîlufê di mîtolojiya kevin a hindî de semboleke mezin a afirînê ye. Li gorî lîteratora zerdüştiyê, wilo tê bawerkirin ku ew mezinahiya Zerdüşti di nava avê de diparêze. Ji ber vê ye ku roja 6an a meha Tîrê ku, wekî Hodradûz tê zanîn, wekî ‘cejna nîlufê’ tê pîrozkirin.¹⁸⁶

Her wiha di rêza diduyan de Xanî, bi renekî sergirtî destana evînê ya Mîhr û Muşterî jî bi bîr aniye ku di vê destanê de motîfên zerdüşti gelek in.

Xanî di beşa diduyan de behsa hin dîn û pêxemberên mezin kirine û bi taybetî bûyera Adem û Şeytan bi bîr aniye ku ev motîfeke gelekî girîng a dînî ye ku di wêjeyê de pir bi berbelavî hatiye bikaranîn.

2/46 Bê secde te ey Cenabê Me’bûd

Adem kire qiblegah û mescûd

Îsa te kusa gihande ewcan?

Aya bi çi te hebande ew can?

Dersa ku bi xef te gote Îdrîs

Elbette diçû meqamê teqdîs

¹⁸⁵ K. Yıldırım, *Mem û Zîn*, r. 142

¹⁸⁶ H.b., r. 134-135

Îblîsê feqîr ê bêcînayet
Hindî te hebû digel înayet

Her rojî dikir hezar ta'et
Lewra ku te da wî îstîta'et

Wî secde nekîr li xeyrê Me'bûd
Gêra te ji ber derê xwe merdûd

Xanî di van beytên jorîn de hin bûyerên ku di dîn de xwedî girîngiyeke mezin in bi bîr anîne. Ev rîwayet, di wêjeya gelêrî û ya klasîk de jî pir hatine bikaranîn.

3.1.1.1. Adem û Şeytan

Bûyera Adem û Şeytan, bi qandî ku di Kitêba Pîroz de derbas dibe wiha ye: Xweda, Adem ji heriyê diafirîne û ji hemî melekên dixwaze ku jê re secde bikin. Hemî melek vê fermana Xweda bi cih tînin lê bi tenê Şeytan li hember dertê ku ew bi xwe jî melekekî payebelind e. Lê sedema secdenekirina wî ya li hember Adem, li gorî hin rîwayetan xurûra wî ye ku ew dibêje, Adem ji heriyê ye û ez jî melekekî payebilind im. Li gorî hin rîwayetên di ku Xanî jî li ser wê fikrê ye; ew naxwaze ji Xweda pê ve ji tu kesî re secde bike. Lê di encamê de ew bêemriya Xweda dike û Xweda wî ji dergêhê xwe diqewêre.

Ev bûyer, bi vê wateya xwe ya sembolî, ji gelek berhemên edebî re bûye mijar û her wiha wekî ku Xanî jî tîne ziman; carina bûye mijara hin şîroveyan ku pirsan li kirinên Xweda dikin.

3.1.1.2. Hz. Îdrîs/Hermes

Li gorî rîwayetan, gelek îlm û huner ji aliyê xweda ve fêrî Hz. Îdrîs hatine kirin. Wekî mînak, hejmar û nivîsê herî pêşî wî bi kar anîne. Cara yekem wî terzîtiyê kiriye. Li gorî rîwayetan, mirovên berê wî çermê heywanan li xwe dikirin lê xweda zanîna dirûtina cilan hînê wî kiriye û ew kiriye 'pîrê terziyan'. Ji bilî van, yekem car bijîşkî û

astronomî jî fêrî wî hatiye kirin û misiriyên berê bi van zanînen ku wî belav kiriye re pir mijûl bûne¹⁸⁷

Li gel vê, yûnaniyan jî ew, wekî Hermes bi nav kirine. Li gorî nêrîna yûnaniyan, ew di dewra xwedayan de jiyaye û sembola zanîn, heqîqet û îlmê ye. Tê îdfakirin ku peyva Hermes, dûre wekî ‘ermiş’, ‘hermiş’, ‘ermiş’ derbasî zimanê tirkî jî bûye ku di zimanê tirkî de ‘ermiş’ tê wateya mirovê kamil, gihaştî, zana.

Xanî di beytên jorîn de, balê bi ser vê rewşê kişandiye û peyvên ‘îdrîs’ û ‘ders’ bi hev re bi kar anîne.

3.1.1.3. Hz. Îsa û Çarmix

Yek ji bûyerên herî navdar ên dîroka dînan, bûyera Hz. Îsa û hatina çarmixkirina wî ye. Ev bûyer di dîroka dînê xirîstiyaniyê de ew çend xwedî bandor e ku Çarmix, bûye sembola herî naskirî ya vî dînî heta belkî sembol ketiye pêşiya dîn bi xwe jî. Lewma ev bûyer, di nava çanda gelekî civakan de û di edebiyatê de bi berfirehî cih girtiye.

Li gorî felsefeya xirîstiyaniyê, Îsa di şûna gunehên hemî mirovahiyê de, hatiye çarmixkirin, lewre wî xwe ji bo hemî mirovahiyê kiriye qurban. Ev cure fikirîn; çarmix û qurbanbûna Îsa, bi dewrên dirêj wekî hêmaneke pir bi hêz hatiye bikaranîn.

Lê musulman vê bûyerê bi vî rengî nabînin û di Quranê de hatiye gotin ku, bi rastî Hz. Îsa di çarmixê de can nedaye. Xweda ew ji wê derê kişandiye cem xwe û di roja dawiya dinyayê de, ew ê dîsa vegeza ser rûyê erdê.

Xanî jî di beytên jorîn de ev bûyer bi bîr anîye û ji Xweda pirsîye ku çima an jî bi kîjan hincetan Îsa bi ezmanan ve hatiye kişandin.

Taybetmendiyeke dî ya Hz. Îsa ew e ku, wilo hatiye bawerkirin ku, ew nexweşan baş dike, miriyan sax dike. Ev yek mûcîzeyeke wî ya girîng e ku di hemî Încîlan de derbas dibe. Li gorî rîwayetan, keçika rêveberê Havrayê dimire û ev rêveber ji Îsa dixwaze ku were keçika wî ji nû ve vegerîne jîyanê. Îsa tê û bi destê keçikê digire û dibêje: “*Talîta Qumî/Kumîê*”, yanî, *Rabe Keçika min!* Li ser vê fermana Îsa, keçik sax dibe û radibe. Li gorî rîwayeteke dî, birayê Meryema Mecdelî, Lazar dimire û çar roj bi ser mirina wî dikeve, Îsa diçe ser gora wî dua dike û dûre bang dike dibêje: “*Lazar derê derve!*” Li ser vê rûh tê bedena Lazar û radibe piya û ji gorê dertê.

¹⁸⁷ K. Yıldırım, *Mem û Zîn*, r. 137

Ev taybetmendiya Îsa ku, nexweşan baş dike, miriyan sax dike; wekî motîfekê di wêjeyê de jî gelekî bi berfirehî hatiye bikaranîn. Her wiha di zargotina gelan de jî bal bi ser vê taybetmendiyê ve hatiye kişandin. Xanî jî di *Mem û Zînê* de, di çend cihan de ev mûcîze bi bîr aniyê û lehenga xwe Zîn şibandiye Îsayê ku miriyan sax dike.

39/14 Daîm ji xwedê dikir temenna
 Mem rabit û bête nik bi تنها

 Nageh fikirî ku Mem ji der hat
 Bîmar Mesîhî dî bi ser hat

Li vê derê Mesîh di wateya Îsa de hatiye bikaranîn. Jixwe navekî dî yê Îsa, Mesîh e. Xanî lehengê xwe Mem şibandiye Îsayê ku nexweşan baş dike.

Di beşa 52yan de, dema ku Mem di Zîndanê de ye û agahiya mirina wî belav dibe, Zîn bi ser de diçe û Xanî vê mûcîzeyê Îsa wiha bi bîr tîne.

52/60 Perwaneî şem'ê wê eyîsa
 Wer murdeî hate ser te Îsa

3.1.1.4. Hz. Mûsa û Qewmê Yahûdî

Jiyan û pêxemberiya Hz. Mûsa bi gelek mûcîzeyan û efsaneyên li dora jiyana wî tijî ne. Bêguman ev efsane, hempayên wan di çanda civakan de hene. Mînak li gorî rîwayetan, Hz. Mûsa dema ku hê zarokê piçûk bûye, di sepetekê de li ser çem hatiye dîtin û di Koşka Fîrewin de mezin bûye. Ev efsane bi heman rengî beriya Hz. Mûsa ji bo kralê Akadî, Sargon jî hatiye gotin. Bi kurtî di nava civakan de, rîwayetên li derdora welidîn, jiyîn û mirina çî pêşewayên dînî û çî jî pêşewayên civakî, pir dişibin hev û ew tijî mûcîze û efsane ne.

Lê têkoşîna Hz. Mûsa ya ji bo qewmê xwe da ku wan bigihîne yekîtiyekê û bike xwedî welatek; têkoşîneke dîrokî ye û ji gelek berhemên edebî re jî bûye mijar. Her wiha têkoşîna wî ya li hember Fîre'wnê Misrê jî gelekî girîng e. Di vê nuqteyê de Asayê Mûsa, motîfeke balkêş e ku ew darekî mûcîzeyî ye û bi fermana Hz. Mûsa tevdigere. Li gorî rîwayetan dema ku Mûsa ji Hz. Şueyb re şivantî dikir, jê darekî xwestiyê û Hz. Şueyb jî, ew darê ku ji Hz. Adem întîqal kiriye, daye wî. Lê ev darekî

mûcîzeyî ye û tiştê ku Mûsa lê ferman dike bi cih tîne. Mînak dema ku Mûsa li seraya Misrê, dar diavêje erdê, ew dibe marekî ziya û hemî marên sêrbazan dadiqurtîne. Dîsa dema ku Mûsa, qewmê xwe ji Misrê derdixe û tê ber Behrasor, Asayê xwe li behrê dixê û behr dibe du şeq û ew qewmê xwe di wê derê de derbas dike. Asayê Mûsa, di zargotin û edebiyatê de bi van mûcîzeyan ve girêdayî bûye motîfeke girîng.

Her wiha têkoşîna Mûsa digel qewmê xwe, derketina wî ya Çiyayê Sîna, li Çola Sîna çil sal qewmê xwe gerandin, motîfên girîng in ku Xanî di *Mem û Zînê* de balê kişandiye ser wan.

Ji bilî wan beytên ku me li di destpêka vê beşê de nîşan daye, Xanî di hin deran de wiha behs ji Hz. Mûsa kiriye.

36/7 Her kûh ji rengê **Tûrê Mûsa**

Ji enwarê **tecelliya** teyîsa

Her nehrek ji rengê ejdeha bûn

Her sebze ji mû'cîzeyan '**Esa bûn**

Her dar ji feydê newbeharî

Têk şû'le dida ji nûrê Barî

Her gul ji mîsalê **Ateşê Tûr**

Yek meş 'ele bêqusûrê pîrmûr

Her murxê seher bi xwe **kelîmek**

Her tûtî û qumriyek nedîmek

Her nexlî nîdakunende her gah

Teşbîhê **Şecer** digo: Enellah

41/20 Tacdîn te dî çî reng eda kir

Mûsa li me behrê xem ziwa kir

50/77 Hilgirtim û birme **Tûrê Sîna**

Bînende kirim digel xwe bîna

Di van beytên jorîn de Xanî, bi jiyan û mûcîzeyên Hz. Mûsa re têkildar gelek motif bi kar anîne. Meqседа Xanî ji Tûrê Mûsa, Çiyayê Sîna ye. Ev çiya li navbera Misir û Eymenê, li nêzikên Medyenê ye. Dema ku Mûsa qewmê xwe di çola Sîna de digerîne, demekê li vê derê disekinin û Mûsa tevî heftê kesî, bo ku bi Xweda re biaxive, dertê vî çiyayî. Li gorî rîwayetan ew dara ku li serê agirekî hebûye û bi Hz. Mûsa re axiviye jî li vî çiyayî ye.¹⁸⁸

Di van beytan de peyvên Şecer (Dar), Kelîm (yê ku ji aliyê xweda ve pê re hatiye axiftin), Ateşê Tûr (Agirê ku li ser dareke hêşîn pêketiye û rêbertî ji Mûsa re kiriye), ‘Esa (Darî Mûsa ku mûcîzeyî ye), Tûrê Sîna (çiyayê ku Mûsa li wê derê maye û bi Xweda re axiviye û Deh Emir jê re hatine dayin), Tecellî (xuyabûna Xweda ji Mûsa ve wekî nûrekê di Çiyayê Sîna de) hemî bi jiyan û mûcîzeyên Hz. Mûsa re têkildar in.¹⁸⁹

Di beyta ku di beşa 41an de derbas dibe, Xanî balê kişandiyê ser taybetmendiyêke dî ya Hz. Mûsa. Di vê beşê de Mem û Zîn li cem hev, di koşka Mîr Zeydîn de ne û hemî bajarî tevî Mîr derketine nêçîrê. Dema ku Mîr tevî maiyeta xwe vedigere koşkê, Mem û Zîn hê li wê derê ne. Mîr bi ser wan de tê û Mem, Zînê dixê bin ebayê xwe, wê vedişêre. Mem li hember Mîr ranabe ser piya û ji bo ku zehmetiya ku tê de ye bê fêmkirin, guliyê porê Zînê di bin eba de nîşanê Tacdîn dide. Tacdîn rewşê têdigihê û bo ku dawiyekê li vê rewşa xeter bîne û Mem û Zînê xelas bike, diçe mala xwe dide ber agir û Mîr tevî maiyeta xwe bi hewara wî de diçin û Mem û Zîn xelas dibin.

Xanî di navbera vê tengaviya Mem û Zînê û tengaviya Hz. Mûsa û qewmê wî ku, artêşa Fîrewn li dû wan e û ew tèn naçar li ber Behrasor disekinin û tu cihekî nîn e pê de herin de, teşbîhekê kiriye. Di bûyera Hz. Mûsa de qewmê wî, li aliyekî artêşa Fîrewn û li aliyê dî Behrasor dibîne û dikeve bêhêvîtiyê. Lê Hz. Mûsa Asayê xwe li behrê dixê û rê vedike ji qewmê xwe re û wan xelas dike. Rewşa ku Mem jî tê de ye dişibe vê yekê. Li aliyekî Mîr tevî maiyeta xwe û li aliyê dî Zîn di bin ebayê wî de. Mem bêhêvî ye. Lê di wê kêliyê de, Tacdîn wekî Mûsa dertê û wî ji vê rewşê xelas dike.

¹⁸⁸ K. Yıldırım, *Mem û Zîn*, r. 294

¹⁸⁹ H.b., r. 294

3.1.1.5. Hz. Îbrahîm û Nemrûd

Bûyera di navbera Hz. Îbrahîm û Nemrûd de, hem di çanda zargotinî de û hem jî di kitêbên pîroz de bi berbelavî cihê xwe girtiye. Lê girîngiya mezin a vê efsaneyê ew e ku, ev bûyer li ser axa Kurdistanê û li bajarê Rihayê qewimiye. Li vî bajarî hê jî bi vê efsaneyê re têkildar, Gola Masiyan heye ku, di çanda kurdan de xwedî cihekî bi qîmet e û her tim ji alî gel ve tê ziyaretkirin.

Bûyer bi kurtî wiha ye: Hz. Îbrahîm, ji dînê Nemrûd ku, pûtperestî ye, bawer nake, ji hebûna yek xwedayî bawer dike û rojekê dikeve pûtixaneyê û hemî pûtan dişikêne. Li ser vê ji aliyê Nemrûd ve tê girtin û bi cezayê şewitandinê tê cezakerin. Lê dema ku wî diavêjin nava agir, agir vedigere avê û darên tê de jî dibin masî û Hz. Îbrahîm naşewite û wekî ku ketibe nava bexçeyê gulên, dilgeş e.¹⁹⁰

Ev bûyer di çanda civaka kurdan de xwedî cihekî girîng e. Peyva ‘Nemrûd’ di zimanê kurdî de tê wateya nemiriyê ku bi ihtîmaleke mezin ev nav, di wê demê de cureyeke nasnavê kralan bûye. Dîsa li gorî kitêbên pîroz navê bavê Hz. Îbrahîm, Azer bûye ku ev jî di zimanê kurdî de tê wateya Agir (her wiha navê meha Adarê ye jî). Her wiha li gorî rîwayetan, yê ku li Nemrûd pêşniyar kiriye ku Hz. Îbrahîm bixe menceñqê û biavêje agir jî kurdekî bûye. Tê rîwayetkiran ku di dîrokê de yekem car Menceñq, ji aliyê kurdekî ve bi vê mebestê hatiye keşîfkirin. Ji ber ku ev bûyer li erdnîgariya Kurdistanê qewimiye, di nava gel de li derdora vê bûyerê hin efsaneyên dî jî çêbûne. Mînak du ajalên bi navê mazîzerik û gumgumok hene ku, dişibin hev lê dema ku gumgumok li derekî bê dîtin muheqeq tê kuştin lê ji ber ku gel mazîzerkê pîroz dibîne, kes destê xwe nade wê. Li gorî rîwayetan, dema ku Îbrahîm avêtine nava agir, gumgumokê puf kiriye agir da ku agir geştir bibe û Hz. Îbrahîm tê de bişewite lê mazîzerkê di devê xwe de av aniyê û li agir kiriye da ku agir bifeşe û Hz. Îbrahîm xelas bibe. Ji ber vê ye ku gumgumok wekî ajalekî nebaş lê mazîzerik jî wekî ajalekî baş û pîroz hatiye dîtin.

Xanî di *Mem û Zînê* de di beşa 35an de balê bi ser vê bûyerê kişandiye û di navbera lehengê xwe Mem û vê bûyerê de teşbîhekê kiriye.

35/26 Her çendî Xelîlî ey belakeş

Gulzarî li te dibîte ateş

¹⁹⁰ K. Yıldırım, *Mem û Zîn*, r. 290

Xanî di vê beytê de balê pê kişandiye ku her çendî ku dilê Mem û Hz. Îbrahîm dişibin hev jî, ew ar û pêtiya ku li Îbrahîm bûbû gulzar, neha li dilê Mem, gulzar bûye ar û pêtî.

3.1.1.6. Hz. Yaqûb û Hz Yûsuf

Hz. Yûsuf di wêjeya gelêrî û klasîk de, bi piranî bi hîkayeya Yûsuf û Zuleyxa hatiye bibîranîn. Lê girîngiyeke wî ya di heye ku bi tîkiliya wî û bavê wî Hz. Yaqûb ve girêdayî ye. Li gorî Tewratê, Yaqûb kurê Îshaq e. Yaqûb bi çar jinan re dizewice û ji wan diwanzdeh (12) zarokên wî çêdibin û yek ji vanan jî Yûsuf e. Yahûdî wilo bawer dikin ku, hemî qewmê Benî-Îsraîl ji van diwanzdeh zarokan çêbûne. Heta wilo tê gotin ku diwanzdeh eşîrên mezin ên yahûdiyan hene ku babê her eşîrekî yek ji van zarokan e. Li gorî Tewratê; rojekê Yaqûb bi mirovekî re dikeve gulaşê. Dûre Yaqûb ji vî mirovê dixwaze ku, wî pîroz bike. Ew mirov xwe wekî melekekî nîşanê wî dide û wî pîroz dike û navê Îsraîl lê dike. Îsraîl tê wateya, *'mîrovê ku bi xweda re gulaşê kiriye'*. Li gorî mîtolojiya cihûyan, bîngeha navê Îsraîl ji vê bûyerê tê. Lewma ew wilo bawer dikin ku, hemî Benî-Îsraîl zarokên Yaqûb in.

Li gorî Tewratê, Hz. Yaqûb ji nava van diwanzdeh zarokên xwe de herî zêdetir ji Yûsuf hez dikir, ji ber ku wî hin elametên pêxemberiyê tê de dîtibûn. Birayên Yûsuf ji vê rewşê hesidîn û tirs kete dilê wan ku wê bavê wan Yûsuf wekî mezinê hemiyan tayin bike û plan çêkîrin da ku Yûsuf bikujin. Li gorî hin rîwayetan, ew firotin karwanan û bavê xwe Yaqûb, bi mirina wî qanih kirin lê li gorî Qur'anê, ew avêtin bîrê û kincên wî yên bi xwînkirî ji bavê wî re anîn û ew qanih kirin ku Yûsuf miriye. Li ser vê, bavê wî Yaqûb, ji keseran kor dibe. Lê Yûsuf namire û ji aliyê karwanan ve tê dîtin û li Misrê wekî kole tê firotan. Ji ber ku Yûsuf xortekî gelek xweşik e, Zuleyxaya ku jina 'Ezîzê Misrê', Kitfir e, aşîqê Yûsuf dibe lê Yûsuf wê red dike. Encax piştî mirina Kitfir, Yûsuf bi Zuleyxayê re dizewice. Yûsuf, piştî gelek serboriyan, dibe wezîrê Misrê û di salên xelayê de hemî qewmê xwe xelas dike û bav û birayên xwe digire cem xwe. Dema ku Yaqûb dibihîze ku Yûsuf dijî, çavên wî yên korbûyî ji nû vedibin.

Ev hesreta Yaqûb a bi salan, ji gelek berhemên edebî re bûye mijar. Xanî di beşa 45an a *Mem û Zînê* de, li ser ketina zîndanê ya Mem, ji devê Zînê wiha gotiye:

45/20 Yûsuf te li min şîhande çalê

Hiştîm te di vê xerabemalê

Ye'qûbsîfet hezîn û nalan
Sebra dil û can te bir bi talan

Ez mayîme her wekî Zuleyxa
Bê Yûsuf û bêmirad û me'wa

Di van beytan de Xanî, hem hesreta Zuleyxa ya ji bo Yûsufê di zîndanê de û hem jî hesreta Yaqûbê ku bi salan li benda Yûsuf bi keser bûye, bi bîr aniye û Mem şibandiye Yûsuf.

3.1.1.7. Hz. Suleyman û Belqîs û Asef Berxiya

Hz. Suleyman di dîroka dînan de û her wiha di dîroka milletê cihû de xwedî cihekî taybet e. Her çendî ku ew di kitêbên pîroz de wekî pêxemberekî derketibe pêş jî, di nava civakê de ew bi piranî bi hin taybetmendiyan di tê zanîn.

Ji bo qewmê cihû, Suleyman piştî Hz. Dawid, yekîtiya milletê cihû mezintir kiriye û dewlemendiya wan, hukmê wan berfirehtir kiriye. Lewre ew di dîroka siyasî ya cihûyan de xwedî roleke sereke ye. Li gorî rîwayetan, pêşî Hz. Dawid dest bi avakirina Mescîdî Aqsa ya îroyin kiriye lê yê ku ew temam kiriye Hz. Suleyman e. Her wiha bi fermana Hz. Suleyman, Asef Berxiya 'Sindoqa 'Ehdê' ku ji Hz. Mûsa û Harûn maye jî neqlê vê mescîdê kiriye. Tê gotin ku di avakirina vê perestgehê de wî ji cinan jî sûd wergirtiye.

Wekî ku tê dîtin Hz. Suleyman hem ji bo dîroka cihûyan hem ji bo ya musulmanan û hem jî ji bo ya xirîstiyanan xwedî cihekî girîng e.

Lê di nava civakan de, her wiha di nava civaka kurdan de jî, Suleyman bi piranî bi motîfên wekî zengînî, bi teyran re axivîn, li cinan hukumkirin, gustîlka wî, û çivîka wî ya bi navê Hudhud (Silêmanê du nukil) û bi çîroka di navbera wî û Belqîs de tê zanîn.

Ev motîf, di zargotina gelan de her wiha di wêjeya klasîk de gelekî bi berbelavî hatine bikaranîn. Mînak ji bo bêsînoriya dewlemendiyê, motîfa Xezîneyên Suleyman an jî Xatema Suleyman hatiye bikaranîn.

Wilo tê bawerkirin Suleyman li bayê li teyran û li cinan hukum dikir. Ango di artêşa wî de heyinên bi vî rengî hebûn û wî bi alîkariya wan gelek karan bi ser dixist.

Ji Suleyman re tê gotin ku li welatê bi navê Sebe, keybanûyeke bi navê Belqîs heye. Suleyman jê re name dişîne û wê dawetî dîne heq dike û daxwaza teslîmbûnê jê dike. Di navbera wî û Belqîs de name diçin û tên. Nameyan, çivîka wî Hudhud dibe û tîne. Dîsa li gorî rîwayetan û Kitêba Pîroz, Suleyman ji yên derdora xwe dipirse ku kî dikare textê Belqîs jê re bîne. Serokê cinan dibêje: “*Heya tu ji ser textê xwe rabî ez ê wê bînim pêş te.*” Lê Asef Berxiya ku, wezîr an jî katibê wî ye, dibêje ku: “*Heya tu çavê xwe vekî û bigirî ez ê wê bînim.*” Û hingê textê Belqîs li pêş Suleyman peyda dibe. Wilo tê rîwayetkirin (her wiha li gorî Şerefnameyê jî) ev mirovê pîroz ê bi navê Asef Berxiya, kelaya qezaya Diyarbekir, Êgilê jî feth dike û li wê derê wefat dike. Her wiha gora wî jî li qezaya Êgilê ye. Li gorî Tewratê, Asef Berxiya ji nisla Hz. Yaqûb e.¹⁹¹

Ev efsaneyên li derdora peywendiya Suleyman û Belqîs, di nava civaka kurdan de bi berbelavî tên zanîn û gotin. Her wiha çîrokên li ser çivîka wî Hudhud jî di heman radeyê de tên zanîn û gotin.

Xanî di *Mem û Zînê* de, bi motîfa dewlemendiyê an jî pir biqîmetbûnê ve girêdayî, motîfa Xatema Suleyman (Gustîlka Suleyman) bi kar anîye ku em di beşa motîfa gustîlkê de li serê sekinîn.

Xanî di beşa 23yan de, dema ku behs ji daweta Tacdîn û Stî kiriye û textê ku Stî li serê ber bi koşka Tacdîn ve tê anîn, şibandiyê Textê Belqîs û her wiha Stîyê bi xwe şibandiyê Belqîsê. Xanî di vê beşê de balê kişandiyê ser bûyera Asef Berxiya jî.

23/36 Ye'nî ku ‘emareta Sitî tê

Qesra periya bi rastî tê

Her texte ji ‘ûdê sendelûsî

Textek xetebendê abenûsî

‘Erşek ji cewahiyan muresse’

Belqîs celîs û lê murebbe’

Dest bestî jhi pêş ve pîşekaran

Zerrînkemer û guherguharan

¹⁹¹ K. Yıldırım, *Mem û Zîn*, r. 242

Sed Asef Berxiya wekî ba
Hemmalî dikir bi ‘erşî dilşa

3.1.1.8. Hz. Danyal

Li gorî rîwayetan di dema kralê Babîlê Nabûqednazer (II) de (Bz: 605-562) jiya ye û ji aliyê vî kralî ve wekî esîr ji Qudusê tê girtin û wî dibin Babîlê. Li derdora jiyana wî, hem bi îlmê remlê re hem jî bi dîroka qewmê cihû re têkildar, gelek çîrok hene. Li gorî rîwayetan, Nabûqednazer xwenekê dibîne û tu kes nikare xewna wî jê re şîrove bike lê Danyal xewna wî şîrove dike û li ser vê yekê ji zindanê tê derxistin û Nabûqednazer wî dike şêwirmendê xwe. Tê rîwayetkirin ku wî milletê cihû bi saya zanîna xwe û kehanetan ji esareta Babîlê xelas kiriye. Li gorî rîwayetan, li Babîlê bîreke bi navê Danyal hebûye ku Hz. Adem hemî zanîn û hîkmetên ji aliyê Xweda ve jê re hatî dayin, di vê bîrê de veşartine.¹⁹²

Xanî di *Mem û Zînê* de, di beşên ku behsa remlê dike de, bi vê motîfê re têkildar, navê Danyal bi kar aniye. Di vê beşê de dayîna Sti û Zînê, Heyzebûn, bo ku sedema halê ku ew tê de ne têbigihê, diçe cem Şêxê Remmal. Xanî, Şêxê Remmal, wekî warisê îlmê Danyal ku remilvanî ye, daye nasandin.¹⁹³

19/1 Ew warisê ‘îlmê Daniyalî
Gava fikirî di şiklê fa’lî

Fîlhalî di rehmê ummehatan
Bêwed’’ê tewelluda benatan

Lihyan û Niqî bi yek ve dîtin
Tacdîn û Sitî pêkve dîtin

Şiklê ferehê digel xemê dî
Bêperde wî Zîn digel Memê dî

¹⁹² Bnr. Motîfa Fal û Remlê, r. 154-155

¹⁹³ K. Yıldırım, *Mem û Zîn*, r. 217

3.1.1.9. Harût û Marût

Ev efsane, di nava hemî dîn û çandên mezin de cih girtiye. Di kitêbên pîroz mîna Qur'an, Tewrat û dîsa di Avestayê de bi formên nêzîk derbas dibe. Di heman demê de ev çîrok, di nava çanda sumerî û akadiyan de her wiha di nava çanda îranî de jî hatiye dîtin. Li gorî forma ku di kitêba pîroz Qur'anê de derbas dibe; Harût û Marût du melek in. Xweda, ji bo ku ew dawî li sêrbaziya ku hatiye qedexekirin bînin, wan dişîne dinyayê lê ew bi xwe daxilî nava vî karî dibin, yanî sêrbaziyê bi kar tînin. Lewma ji aliyê Xweda ve tîn cezakirin û li Babîlê di bîrekê de bi ser serî tîn daliqandin.¹⁹⁴

Ev efsane bi formeke nêzîk di Avestayê de jî derbas dibe. Li gorî forma Avestayê, navê wan Haûrvatat (Hordad) û Ameratat e (Mordad). Hordad parêzvanê avê û Mordad jî parêzvanê hêşnahiyê ye. Hordad temsîla mukemelî û tendurustiya Ahûramazda û Mordad jî temsîla nemirî û bêdawîtiya Ahûramazda dike.¹⁹⁵ Ev her du melek, bi ser rûyê cîhanê ve hatine şandin da ku ji qewman re behsa xerabiya sêr û sêrbaziyê bikin lê ew bi xwe dikevin nav vî karê ku Ahûramazda qedexe kiriye. Lewma hatine cezakirin û bi ser serî di bîra Babîlê de hatine daleqandin.¹⁹⁶

Harût û Marût, di wêjeyê de bi sêr û sêrbaziyê re peywendîdar tê bikaranîn. Ji bo xweşikiyeke wekî sêhrê, Harûtî tê gotin. Xanî jî di nava vê peywendiyê de ev motîf bi kar anîye. Dema ku behsa xweşikiya Stî û Zînê dike, vê têgihê bi kar tîne û tîkiliya Harût û sêrbaziyê bi bîr tîne.¹⁹⁷

8/38 Husna xettê rux ji xettê yaqût

Çaha zeqenê ji sîhrê Harût

Goya kiribû ji mişkê bîzî

Remmalê felek nuqati rîzî

3.1.1.10. Xocê Xizir

Di Kitêba Pîroz de wekî qûlekî xweda ku hay ji hin zanînan heye, jê hatiye behskirin. Tê rîwayetkîrin ku Hz. Mûsa xwestiye Hz. Xizir bibîne û bi vê armancê bi

¹⁹⁴ K. Yıldırım, *Mem û Zîn, Çeviri ve Kavramsal Tahlili*, Weşanên Avesta, r. 175

¹⁹⁵ Nimet Yıldırım, *İran Mitolojisi*, Weş. Pinhan, İstanbul, 2012, r. 490

¹⁹⁶ Bnr. Motîfa Derasayî û Sêhrê, r. 85

¹⁹⁷ K. Yıldırım, *Mem û Zîn*, r. 175

xortekî re dertê rêwîtiyê. Di dawî de digihê armanca xwe û ew û Xocê Xizir bi hev re dertên rêwîtiyê. Di vê rêwîtiyê de sê bûyerên xerîb tîr serê wan ku, di destpêkê de Hz. Mûsa wateya kirinên Xizir fêr nake lê dûre Xizir, rûyê hundirîn ê van bûyeran û kirinên xwe jê re aşkera dike. Ji van bûyeran û kirinên Xizir, Hz. Mûsa têdigihê ku hin bûyerên di nava jiyana rojane de ew lê rast tîr, bi rastî xwedî wateyeke tijî sir in. Her wiha carina hin bûyerên ku wekî xerab tîr telaqîkirin û tîr serê mirovan, dibe ku bi armanca peydabûna encameke baş be jî.¹⁹⁸

Bi giştî di nava termînolojîya dînî de, Hz. Xizir an jî Xizir ‘Eleyhîselam, wekî kesekî pîroz ku ji hin zanînên ku taybetmendiyeke wan a xwedayî heye agahdar e, tê zanîn. Tê rîwayetkirin ku ew mirovekî baş bûye û piştî mirina xwe, rûhê wî di şiklê mirovekî de dertê meydanê û alîkariya mirovan dike.

Lê di kevneşopa çandî û di zargotina civakan de hin taybetmendiyan dî yêrên vê motîfa girîng hene. Xizir an jî Xizir, carina dibe ku wekî ‘*mirovekî zana*’, ‘*kalemêrekî rîhsipî*’, ‘*kalemêrekî alim*’, ‘*derwêşekî*’ jî derkeve pêş me. Ji ber ku, erka wan a ku di berhemên zargotinî de pêk tê, heman e. Ev motîf di çîrok, efsane û destanan de xwedî roleke ew çend girîng e ku, ew perçeyeke esasî ya avahiya berhemên zargotinî ye. Di xaçerêyan şikestinê de dertê û hem meyla hikayeyê û hem jî çarenûsa leheng diguherîne.

Di varyantên Memê Alan de, di varyanta şeşan (VI) de, di destpêkê de û di gihaştina Mem û Bengîn ya bajarê Cizîrê de, di varyanta Roger Lescot de, di çend xaçerêyan de derdikeve pêş me. (Berî ku Mem bê dinyayê, dertê pêş bavê Mem, dema ku Mem tê dinyayê derdikeve û navê wî lê dike, dema ku Mem ji bajarê xwe dertê da ku Zînê bibîne, Xocê Xizir derdikeve pêş wî û wî di heqê hin tiştan de heşyar dike) Di *Mem û Zîna* Xanî de ne wekî karakterekî çîrokê lê bi rengine dî, bi rêya teşbîh û bibîranînan carina navê Xocê Xizir derbas bûye. Di varyantên dî yêrên Memê Alan de em rastî motîfa Xocê Xizir nayên. Lê li şûna wê, di varyanta pêncan (V) de behsa Şêxê Hunkarî hatiye kirin ku bi îlhama ji xewnan, ji kordûndebûna bavê Mem re çareseriyekê dîtiye. Di varyantên dî de jî hertim behsa cotkarekî hatiye kirin ku tîkiliya wî ya bi Xocê Xizir re baş ne zelal e.

Di *Mem û Zîna* Ehmedî Xanî de jî, di çend cihan de navê Xocê Xizir derbas bûye. Balkêş e ku çawa di Memê Alana folklorî de Xizir, dema ku Mem di rêya gihaştina Zînê de rêya xwe şaş dike dertê; di *Mem û Zîna* Ehmedî Xanî de jî Xizir,

¹⁹⁸ Nurettin Albayrak, Ansiklopedik Halk Edebiyatı Terimler Sözlüğü, r. 272-274

dema ku Mem di nava wê atmosfera karnavalî ya Cizîrê de pê dihese ku kesekî pir xweşik li meydana bajêr e û dixwaze here wî bibîne, kesekî wek Xizir dertê pêş wî û Tacdîn û ew pirsra wî kesî jê dikin û Xizir jî rêya wan ber bi Zînê û Sityê ve rast dike. Yanî di her du berheman de jî Xocê Xizir dibe wesîle ku Mem bigihê Zînê û destan bikeve nava aktîvasyoneke nû.

14/15 Tacdîn sekinê û pirsiyar kir
Pirsra xwe bi yekê îxtiyar kir

Go: “Ey Xidirê rehê hîdayet
Bêj ev çi belaye bê nîhayet?”

Wî got. “Du şehlewendê şeddad
Îro li vî xelqî bûne cellad”

Di beşa 39an de dema ku hemî xelkê bajêr û Mîr diçin nêçîrê û Mem dimîne, bi rênîşandan dilê xwe derdikeve derve û ber bi rêyekê ve diçe. Li gorî Xanî Xizir di dilê wî de ye. Xizir wî ber bi Koşka Mîr ve, ber bi Zînê ve dibe. Yanî li vê derê Xizir dîsa bi fonksiyona gihandina hev a evîndaran derketiye pêş me.

39/10 Naçarî ji xdanî ew bi der ket
Ew da’iyê Xidrî bû bi ber ket

Ew Xidrî çi bû? Teşewwuqa dil
Ew şewqî çi bû? Te’eşsuqa dil

Di jiyana rojane û axaftina gel de jî ev motif carina tê bikaranîn. Wekî ku; mirovekî di tengayiyê de be û yek bigihê hawara wî, an jî alîkariyeke maddî-manewî lê bike, ew kes dibêje ku: *Dibê qey tu Xocê Xizir î*. Her wiha dema ku yek pir bi lez karekî pêk tîne di wateya pozîtîf de, pesindanê de, tê gotin ku; *wekî Xizir e*.

3.1.1.11. Dînê Zerduştî

Civaka kurd, berî ku bibin musulman li ser dînê zerduştîyê bûn. Li gorî lêkolînan, Zerduşt, berî mîladê di sedsala VIIan de jiyaye. Di dewra xwe de û dûre jî wekî pêxemberekî hatiye dîtin. Li gelek herêmên cîhanê, wekî Îran, Kurdistan, Azerbeycan û Hindistanê dînê wî bi sedsalan serdest bûye.¹⁹⁹ Kitêba pîroz a vî dînî Avesta ye. Di vê kitêbê de beşa herî girîng Gatha ye ku ev beş ji gotinên Zerduşt pêk tên. Nêzîkî 1200 sal serdestiya dînê zerduştî di nava civaka kurdan û gelek civakên di de berdewam kiriye.²⁰⁰

Dînê zerduştî bi piranî li ser dualîzma Ahûramazda û Ehrîman rûniştiye. Li gorî tesewira vî dînî, li ser rûyê cîhanê Başî û Xerabî her tim bi hev re di şer de ne lê di encamê de Ahûramazda yanî Başî bi ser dikeve. Ev taybetmendiya vî dînî ji vî alî ve dişibe dijberiya Şeytan a li hember Xweda ya di dînê îslamîyê de. Her çendî ku taybetmendiya herî sereke ya vî dînî ev dualîtiyê be jî, gelek zanyarên teolojîyê ev dîn jî wekî dînekî yekxwedayî û heq dîtine. Bandorên bawerî û hin prensîbên vî dînî, ne di warê dînî de be jî, di warê çanda gelêrî de, hîn jî di nava civaka kurd de hene.

Xanî di hin derên *Mem û Zînê* de rasterast û di hin deran de jî bi riya sembolan ev dîn bi bîr aniye. Çend mînak wiha ne:

41/15 Mala xwe ji rengê qewmê Zerdeşt

Da agir û gaziya xwe raheşt

3/32 Buxtane bi agirî dişûştin

Ateşgede cumlekî vekuştin

2/26 Neylufê nazeperwerî kir

Ew jî te li mîhrê muşterî kir

Nîlufêr di mîtolojiya kevin a hindî de semboleke mezin a afirînê ye. Li gorî lîteratora zerduştîyê, wilo tê bawerkirin ku ew mezinahiya Zerduşt di nava avê de diparêze. Ji ber vê ye ku roja 6an a meha Tîrê ku, wekî Hodradûz tê zanîn, wekî ‘cejna nîlufêrê’ tê pîrozkirin.²⁰¹

¹⁹⁹ Zerduşt, Avesta, *Zerduştîlerin Kutsal Metinleri*, amd. Fahriye Adsay, İbrahim Bingöl, r. 9-11

²⁰⁰ H.b. r. 9-11

²⁰¹ H.b., r. 134-135

3.1.1.12. Dînê Manî

Manîheîzim dînekî gelekî girîng e ku di pêvajoya navbera zerduştî û îslamiyetê de li Rojhelata Navîn, li Asyaya Navîn û Başûrê Efrîqa gelek bi tesîr bûye. Wilo tê gotin ku, ev dîn wekî têveliya baweriya zerduştî, exlaqê bûdîstî, çanda mîtraîk û sîstema xirîstiyaniyê derketiye meydanê. Dînê Manî wekî dînekî dualîst hatiye dîtin. Alîgirên wî, Manî wekî pêxemberekî heq dîtine.²⁰²

Li gorî hin rîwayetan Manî bi eslê xwe Suryanî ye û li bajarê ku îro bi navê Mêrdîn tê zanîn, hatiye dinyayê. Hingê Mêrdîn bi ser Babîloniyayê ve bûye û navê wê Mardînû bûye. Manî di 14ê avrêla 216an de hatiye dinyayê. Li gorî hin rîwayetên dî, bavê wî ji bajarê Hemedanê ye û ew bi xwe li Babîlê hatiye dinyayê.²⁰³

Ji ber ku di wan dewran de, baweriya zerduştî êdî gelek paşverû mabû û dîn ji rastiya xwe dûrketibû û ketibû xizmeta serdestan, dînê Manî zû belav dibe. Her wiha li nava mîletê ûygûr dibe dînê fermî.

Her çendî ku alîgirên wî, ew wekî pêxember dîtîbin jî, hem zerduştîyan hem jî dûre ereban ew wekî, *kesekî ji rê derketî*, tarîf kirine. Li gorî Şerefnameya Şerefxan jî, Manî ji aliyê Behram Çûpî yê ku esil kurd e, hatiye girtin û hatiye îdamkirin.

Taybetmendiyêke dî ya Manî ew e ku, ew bi hunera resim û mînyatorê re pir eleqedar e. Jixwe di wêjeyê de jî ji aliyê wî yê dînî bêtir, bi vî aliyê hatiye bibîranîn. Ji ber ku resim û mînyatorên wî li Çînê pir hatine ecibandin, jê re *Neqqaşê Çînî* jî hatiye gotin. Berhema wî ya herî navdar *Erjeng*, li ser resim û mînyatoran e.²⁰⁴

Xanî jî di *Mem û Zînê* de, motîfa Manî, bi neqqaşî û berhema wî ya navdar, *Erjeng* re têkildar bi kar aniye.

35/51 ‘Arid qewimî li neynikê jeng

Rewneq çû nema li neqşê Erjeng

Xanî di vê beytê de, behsa rewşa Memê ku ji derdê evîna Zînê nexweş ketiye, kiriye û xweşikiya rûyê wî şibandiye resimên birqîn ên di Erjengê de û gotiye ku ji ber perîşaniya halê evînê, wê birqîniya ku dişibiya resimên di Erjengê de, êdî li ser rûyê wî nemaye.

²⁰² K. Yıldırım, *Mem û Zîn*, r. 419

²⁰³ Nimet Yıldırım, *İran Mitolojisi*, r. 148-149

²⁰⁴ K. Yıldırım, *Mem û Zîn*, r. 419

60/19 Hindî ku serê min te teraşî
Ew çendî te kir gunetelaşî

Fehhaşî te kir ji rengê Xanî
Neqqaşî te kir mîsalê Manî

Xanî di van beytan de, pênuşa xwe daye axaftin û mutewazîbûna xwe aniye ziman ku di rastî de ew ne wilo helbestkar e. Ji ber vê xwestiye ku ji xwe re bibêje: “Ma tu wekî Manî yî ku, tu di îdaya neqqaşiyê de yî”.

3.1.1.13. Rojperestî

Di beşa Xlan de Xanî, dema ku behs kiriye ku xweda çawa mirovan cuda cuda û bi wesfîyetên cihêreng afirandiye, têgiha Rojiperest bi kar aniye.

11/8 Hin katib in û hinek di ustad
Hin mitrib in û hinek di cellad

Hin rojiperest in û hin şebefrûz
Hin xusserevîn in û hin xemendûz

Ji van beytan ne diyar e ku, Xanî di wateya, kesên ku ji rojê re diperistin, ev têgih bi kar aniye an ne ku bi tenê di wateya yên ku ji rojê ji ronahiyê hez dikin de ev têgih bi kar aniye. Lê rojiperestî, beriya hemî dînen mezin, wekî dîn an jî baweriyeyeke pir kevnar e di dîroka gelek civakan de. Çunkî mirovên berê gihîştibûn wê ferqiyetê ku roj nîn be, jiyana jî nîn e; roj nîn be ronahî nîn e, nebat nîn in. Lewma bi demên dirêj pîroziyeyeke mezin li rojê hatibû kirin û gelek civakan, wekî ku roj afirînerê her tiştî be, ew dihebandin. Hîn jî di jiyana civakî ya milletê kurd de û di çanda civakê de şopên vê yekê tînin. Mînak li ser navê rojê sond xwarin, kevneşopeke balkêş e. Wekî ku tê zanîn, dîne kevnar ê ku berê li nava kurd û farisan berbelav bû, mîtraîzim, dînekî rojiperestî bû. Ji vî aliyê ve bikaranîna vê têgihê di *Mem û Zîna* Xanî de gelekî girîng e.

3.1.1.14. Bûyera Kerbelayê

Di dîroka dînê îslamê de hin xaçerê û bûyerên mezin hene ku dûre bandoreke gelekî mezin li ser dîn û civakan kirine. Kuştina xelîfeyên wekî Hz. Umer, Hz. Osman û Hz 'Elî, her wiha şerên di navebera alîgirên xelîfeyan de û bûyera Kerbelayê, hin ji van bûyeran in.

Bi taybetî bûyera Kerbelayê, hem trajediyeye mezin e û hem jî di dubeşbûna cîhana îslamê de bûye xaçerêya herî dawîn. Ev dubeşbûn dûre tesîreke mezin li civakên musulman kiriye û bûye sedem ku pir xwîn birije. Divê em destnîşan bikin ku her çendî ku miletê kurd, di nava cîhana sunnî de cih girtine jî di nava van her du aliyên wekî sunnî û şîa de nebûne alîgirekî şerxwaz. Em vê nêrînê di Nûbihar Biçûkan a Ehmedê Xanî de jî dibînin ku wî xwestiye, zarokên kurd hem çar xelîfeyan baş bizanin û hem jî îmamên Şîa'yan.

Bûyera Kerbelayê bi kurtî wiha ye: Artêşa Yezîd, li Kerbelaya ku îro bajarekî Îraqê ye, Hz. Huseyinê ku neviyê Pêxember e yanî Ehlî Beyt e, tevî hevalên wî û malbata wî dorpêç dike. Dûre wan bê av dihêle. Hz. Huseyin, zarokê xwe yê şeş mehî ku di qumatikê de ye lê ji tîbûnê li ber mirînê ye, bilind dike û ji artêşa Yezîd dixwaze ku avê bidin wan. Lê ew, zarokê li ser destê Huseyin bi tîrekî dikujin û dûre êrîş dikin Huseyin, tevî 70 hevalê wî, wî bi rengekî wehşîyane dikujin.

Ev bûyer dibe sedem ku cîhana îslamê wekî şîa û sunnî bibe du beş. Lê trajediya ku li Kerbelayê pêk tê, ne tenê ji alî dînî ve her wiha ji alî mirovî ve jî trajediyeye mezin e û di zargotina civakên musulman û wêjeya wan de bi berfirehî cih girtiye.

Di edebiyata dîwanî de jî gelekî helbest û mersiye li ser Kerbelayê û karesata Ehlî Beytê hatine nivîsîn.

Di edebiyatê de ev bûyer bi piranî bi motîfa 'tîbûnê' re têkildar hatiye bikaranîn. Xanî jî di *Mem û Zînê* de bi vê peywendiyê, ev karesata dîrokî bi bîr aniye. Dema ku dayîna Sitî û Zînê ji bo ku halê wan fêhm bike diçe cem Şêxê Remmal, Şêx jê re wiha dibêje.

19/11 Ew bûne ji îşqê van di bêhûş

Ev bûne ji husnê wan di medhûş

Ev şifteê belayê îşq in

Ew tişneê Kerbelayê îşq in

Xanî di van beytan de motîfa Kerbelayê wekî lûtkeya evînê dibîne û diyar dike ku Mem û Tacdîn jî, tiyê evîneke wiha ne. Xanî bi motîfa tîbûnê û evîna xwedayî/heqîqî, radeya evîna Mem û Tacdîn nîşan daye.

Xanî di beşa 42yan de, dema ku behsa fesadiyên di heqê evîna Mem û Zînê de dike, gelek tégihên mûsikiyê bi kar tîne û di navbera van tégihên mûsîqî û bûyera Kerbelayê de teşbihê dike.

42/15 ‘Uşşaqî hezîn û bènawa bûn

Xel teşne Huseynê Kerbela bûn

Xanî li vê derê xwestiye bibêje ku, xelk ew çend dilxwaz bûn ji galegalên evîna Mem û Zînê re ku, ew wekî wan kesên ku di muhaseraya Kerbelayê de, tî bûn. Yanî radeya daxwaziya wan a ji fesadiyê re, di radeya tîbûna Kerbelayîyan de bû.

3.1.1.15. Mûcîzeyaya Ava Zemzemê

Girîngiyeke dî ya Hz. Îbrahîm ji bo gelek qewman ew e ku, du lawên wî bi navê Îsmâîl û Îshaq hene ku ereb nesla xwe digihînin Îsmâîl û cihû jî nesla xwe digihînin Îshaq. Her wiha derketina Ava Zemzemê ku, hê jî wekî hêmaneke pîroz tê dîtîn, bi Hz. Îsmâîl û diya wî Hacer re têkildar e.

Li gorî rîwayetan û Kitêba Pîroz, Hz. Îbrahîm, Hacer ku pêşî cariyeya wî û dûre jî dibe pîreka wî, tevî Hz. Îsmâîlê hê di qumatikê de ye, li cîwarê bajarê Mekkeyê dihêle û diçe. Piştî ku av û xurmeyên wan diqedin, Hacer bo ku avê bibîne, di navbera qotên Sefa û Merwayê de diçe û tê. Piştî ku heft car diçe û tê, dibîne ku li cihê ku Hz. Îsmâîlê piçûk pahniya xwe li erdê xistiye, av dertê. Li ser vê ew jî ji mirinê difilitin. Ji vê avê re di wateya ava pir de, Ava Zemzemê hatiye gotin.

Motîfa Ava Zemzemê hem di çanda civakê de û hem jî di edebiyatê de bi berfirehî hatiye bikaranîn. Ev motîf bi piranî di wateya ava pîroz, ava bi bereket, ava heyatê û ava bi nûr de hatiye bikaranîn. Xanî di beşa 52yan de, dema ku Zînê diçe zindanê da ku Memê perîşan bibîne, ev motîf bi kar aniye.

52/39 Ew xelwetiye di î’ tîkafê

Rabû ve bi niyeta tewafê

Ewwel ewî kir bi sidq der dem
Tecdîdê wudû' bi abê Zemzem

Westa li musella û meqamê
Wî cebhe gîhande îstîlamê

Tewfek du kirin li dor Beytê
Perwaneê per gîhande zeytê

Her wiha di van beytên jorîn de, têgihên mîna Tewaf, Beyt/Kabe, Meqam, Hecerul Eswed/Îstîlam hemî têgihên dînî ne ku di wêjeyê de wekî motif jî hatine bikaranîn.

3.1.1.16. Bihişt û Dojeh

Di *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî de, motifên bihişt û dojehê di çarçoveya giştî ya xelatkirin û cezakirina kevneşopî lê di nava esas û mantiqa dînî de dertên pêş me. Xanî di gelek derên *Mem û Zînê* de, têgihên *cennet* û *cehennemê* bi kar anîne

Dema ku em li mentalîteya çîrokan dinihêrin, her tim xelatdayin û cezakirin dertê pêş me. Ev cure fikirîn, bêguman ne tenê motîfeke folklorî an jî dînî ye. Her wiha di jiyana civakî û kar û barên civakî yên mirovan de jî, ev qaydeyeke giştî ye.

Di çîrokan de mantiqa xelatkirin û cezakirinê, di çarçoveya sazûmana exlaqî ya civakê de, bi regekî perwerdekar derbas dibe. Civak an jî hişmendiya civakê, li vê derê mesajekê dide takekes ku, divê ew her tim şiyar be û ji sîstema exlaqî re rêzgir be.

Di çîrok û berhemên dî yên zargotinî de, teqdîra cezakirin an jî xelatkirinê bi piranî di destê mîr, beg, padîşah, xweza û hin erkên dî yên civakî de ye, lê di dîn de ev erk di destê Xweda de ye.

Ev termînolojiya cezakirin û xelatkirinê, ji ber ku di cewherê xwe de ji çanda civakê tê, bi formeke nêzîk di dîn de jî bi heman rengî ye. Di termînolojiya dînî de jî 'başî' û 'yê baş' bi bihiştê tê xelatkirin û 'xerabî' û 'yê xerab' bi dojehê tê cezakirin.

Di *Mem û Zîna* Xanî de ev termînolojî, di nava esasên dînî-civakî de hatine bikaranîn. Xanî di hin deran de têgihên bihişt û dojehê wiha bi kar anîne:

Qehra te kire “muxelledunnar”

3/47 Îlla ku hinek ji îbnê Adem
Bûn derxurê ateşê cehennem

4/16 Yekrû ne li nik te kufr û îman
Yeksû ne li nik te xuld û nîran

Qehra xwe bikî eger tu zahir
Cennet dê li me bibîte agir

Wer feyzê bikit sehabê rehmet
Dozex li me dê bibite cennet

4/28 Têkra bi şefa’eta xwe xas ke
Vêkra me ji agirî xelas ke

Di van beytên jorîn de têgihên bihişt û dogehê bi tevahî di nava têgihîştina dînî de hatine bikaranîn. Li gorî tesewira dînî, mirov bi kirinên xwe yên baş diçin bihiştê û cezayê kirinên xwe yên nebaş jî bi agirê dogehê dikişînin. Xanî, carina di şûna têgiha dogehê de, têgihên ‘agir’ an jî ‘nar’ bi kar anîne.

8/22 Sehna heremê ji nazenînan
Cennet tijî bû ji hûrî’înan

Hûrî wî di cennetê gelek bûn
Xilman wî di hedretê melek bûn

12/9 Hûran kire meskenê xwe cennet
Bê perde û bê melal û minnet

Di van beytan de Xanî, bihiştê wekî cihekî bi hûriyan tijî teswîr kiriye. Bêguman ev tesewir jî bingeha xwe ji fikra dînî digire ku, di Kitêba Pîroz de bihişt wilo

hatiye teswîrkirin. Yanî kesê ku bêemriya xweda neke û xwe ji zewq û kêfên dinyayê vekêşe, li bihiştê di hedekî ku nikare bê tesewirkirin de, kêf û zewq bo wî hene.

25/39 Nageh seherêj ji rojê heştê
Ridwan meşiya ji nav bihiştê

Di vê beytê de Xanî, Tacdîn şibandiye Ridwanê ku parêzvanê bihiştê ye.

26/6 Ev nûr û zelum û kefr û îman
Ev xuld û seqer, bihişt û nîran

26/12 Van ehlê cehennem û ‘ezaban
Van laîqê cennet û sewaban

Di van beytan de wekî yên jorîn, bihişt û dojeh bi tesewira xelat û cezakirinê hatine hêlengandin.

36/1 Seyyadê şîkarê husnê exbar
Kir bo me ku serguzeşti îzhar

Go: Rojêke xweş bi fêsl û eyyam
Dewra felek fena serencam

Ferraşê qeda bi sun’ê qudret
Xebra kiribûn mîsalê cennet

Meşşatê sîfet cîhanê dîrîn
Tezyîn kiribû ‘erûsê ayîn

Her yek ji newal û kûh û deştan
Reh şubhetê goşeyêd bihiştan

Her rewde riyadê xuldê ekber
Her çeşme ji ‘eynê Abê Kewser

Di van beytan de Xanî, xwezaya Cizîra Botanê, bi xweşikiya xwe şibandiye bihiştê. Abê Kewser, li gorî rîwayetan navê kanî an jî hewzeke li bihiştê ye. Wilo tê rîwayetkirin ku, ava wê ji şîr spîtir û ji hinguv şêrîntir e.

37/1 Baxek we hebû Emîr Zeyneddîn
Baxê Îremê diçû bi mizgîn

Her dewhe ji wî û her tuyûrek
Yek qesir ji cennetê û hûrek

Bo şuştinê dest û pê û çavan
Kewser kiribû sebîlê Ridwan

Baxê Îrem, baxekî ye ku ji aliyê mirovan ve wekî alternatîfa bihiştê hatiye avakirin. Lewma di wêjeyê de jî wekî motîfekê, pir hatiye bikaranîn. Li gorî baweriyên, Îrem navê bajarekî ye ku li başûrê ‘Erebistanê, di navbera San’a û Hadramûtê de bi cih bûye. Li vî bajarî ji aliyê Şeddad ve bexçeyekî wekî alternatîfa bihiştê hatiye çêkirin. Ji vî baxî re Baxê Îrem hatiye gotin. Xanî li vê derê baxê Mîr Zeyneddîn jî bi xweşikiya xwe wekî ku ji Baxê Îrem jî xweşiktir be, teswîr kiriye.²⁰⁵

45/39 Eywan li me bûye darê mîhnet
Zîndan bi me bûye baxê cennet

50/83 Dîsan vegerim ji ba we reqqas
Murtadî bibim bi cenneta xas

52/85 Haşa ku di vê seraya fanî
Bê cennetê ‘Ednê cawîdanî

Heywansîfet em bikin zînayê
Beyhûde di meskenê fenayê

²⁰⁵ K. Yıldırım, *Mem û Zîn*, r. 297

Terdamen û sernigîn û merdûd
Şermende biçine pêşî Me'bûd

Me'bûdî ji bo me hûr û xilman
Tezyîn kirine di Baxê Ridwan

Ew muntezir in li rîhleta me
Fexrê dikin ew bi de'weta me

Lê cennetê aşiqan cuda ye
Mî'adê lîqaê kîbriya ye

'Alîtir e ew ji Baxê Ridwan
Nakuncîne wê çî hûr û xilman

Hêvî dikin em ewî ji Me'bûd
Nînin me bi xeyrê wî çî meqsûd

Di van beytên jorîn de, bihişt bi tesewireke cuda hatiye nîrxandin. Ev tesewireke tesewûfî ye ku di helbestkarên kevneşopa dînî de tê dîtin. Li gorî vê fikrê, armanca herî rastîn a mirovan, divê ne ew bihiştta ku bi horiyana hatiye teswîrkirin be. Divê armanca mirovên baş, rasterast gihaştina xweda be. Di kevneşopa edebiyata tirkî de, Yunus Emre jî li ser vê fikrê ye. Di helbestên xwe de dibêje ku, ew hûrî û periyana naxwaze, bi tenê dixwaze bigihê xwedayê xwe. Li vê derê Xanî, Mem jî derxistîye wê astê ku, ew ji hemî kêf û zewqên dinyayî û mirovî xelas bûye, her wiha jî bo dinyaya dî jî hêviyeke wî ya wilo nîn e. Ew bi tenê dixwaze bigihê xwedayê xwe. Dilgeşî û bihiştta herî bilind jî bo wî, ev gihaştin e.

57/9 Go: "Çûme diyarê Baxê Ridwan
Min dî du hezar ji hûr û xilman

Bîlcumle di qesrekî 'emeldar
Ew qesir bitûnî ji durrê şehwar

Yek şubhê Bekir bi tac û binper
Westayî li ber derî muqerrer

57/32 Tacdîn ku tu kuştî bê cînayet
Barî bi wî re çî kir ‘înayet?

Go: “Efwû kir ew cenabê Barî
Bû cennetî û neçûye narî

Di van beytên jorîn de, Xanî bi rêya motîfa xewnê, di heqê halê Mem, Zîn, Tacdîn û Bekoyê ku çûne dinyaya dî de, agahiyan dide. Berevajî nêrîna giştî, Xanî Beko jî wekî ku çûbe bihiştê nîşan daye. Ji ber ku li gorî fikra Xanî, Beko bi tenê wezîfeya ku ji bo wî hatibû dayin, bi cih aniye. Wî rê lê vekiriye ku evîna mecazî ya Mem û Zînê bigihê radeya evîna heqîqî. Her wiha Xanî, Tacdîn jî digel ku mirovekî kuştîye jî, li bihiştê nîşan daye. Li gorî nêrîna Xanî, Xweda ew ji ber vê kirina wî efû kiriye û xistiye bihiştê. Bi kurtî Xanî, hemî karakterên xwe di bihiştê de nîşan daye ku ev nêrîn xwe dispêre fikrên tasewûfî.

3.1.1.17. Dara Tûba

Motîfa Tûba yan jî *dara ebediyetê*, di wateya xweşbûn û bêdawîtiya xweşikiyên di bihiştê de hatiye bikaranîn. Wateya peyva Tûba; ‘bêhtir xweşik’ e. Li gorî rîwayetan, ev dar li bihiştê ye û koka wê yan li seraya Hz. Muhemmed yan jî li seraya Hz. ‘Elî ye. Ev dar bi şax û guliyên xwe, hemî darên di bihiştê de radipêçe. Her wiha mirovên li bihiştê, cilên wan ji kulîlk û pelên vê darê ne. Kesekî, siwarê hespekî bi dehan salan bi siwarî biçê jî ji binê siya vê darê dernayê. Dema ku mirovên bihiştê dilê wan ji fêkiyên vê darê dixwaze, dar şaxê xwe bi ser wan de xwar dike û fêkiyên xwe pêşkêşî wan dike. Yanî bi kurtî ev dar, sembola xweşikî û bêdawîtiya xweşikiyên li bihiştê ye.²⁰⁶

Di lîteratora dînê zerduştî de jî ev dar bi heman wateyê heye. Li gorî baweriya zerduştîyê, tovê hemî darên fêkiyan bi vê darê ve hene û navê vê darê: “Dirext-î Heme

²⁰⁶ K. Yıldırım, *Mem û Zîn*, r. 359

Toxme ye”. Dirext, di soraniya îroyin de jî tê wateya, dar. Yanî bi kurdiya îroyin em dikarin vê wiha wergerînin: “Dara Hemî Toximan.”²⁰⁷

Xanî di *Mem û Zînê* de di beşa 50yê de, Zînê bi xweşikiya wê ji devê Mîr, şibandiye vê dara bihiştê ku sembola xweşikiya bêdawîtiyê ye.

50/44 Mîr go: “Mekirin xiyalê batil

Ew bêheş e ez nebûme qatil

Zînê dikujim meger bi ‘emda

Tûba ye di cenneta herem da”

3.1.1.18. Di Mem û Zînê de Baweriya Bêyomiyê

Di nava baweriyên gel de, hem wekî kevneşopî hem jî wekî bawerî (li gorî dînen mezin; baweriyên batil), têgihên mîna oxir û bêyomî têgihên girîng in. Civak, li dû hin serboriyên ku ji aliyê civakê ve tên zanîn, an jî li gorî hin baweriyên taybet, hin wateyên taybet li hin tiştan, zindiyan an jî eşyayan dike. Ev tişt dibe ku darekê be, dibe ku kevirê be, dibe ku cihekî taybet be, dibe ku heywanekî be û dibe ku mirovekî jî be.

Pertev Naili Boratav, li ser têgiha ‘oxirê’ wiha şîrove kiriye:

“Oxir; ew hêza pozîtîf e an jî wesfîyet, başî, dilgeşî û bereket e ku; di cewherê objeyekê de, heywanekî de, karekî de, dem û deverê de heye. Civakê hin cure tiştên bi vî rengî wekî bi oxir û hinan jî wekî bêoxir/bêyom bi wate kirine. Tiştên bioxir tercihkirin û ji yê bêoxir xweparastin, wekî rengê helwestnîşandana di nava jiyana civakî de, derdikeve pêş me.”²⁰⁸

Di *Mem û Zînê* de, em di du cihên cuda de rastî vê baweriya ji bêoxiriyê tên. Yek jê; der bareyê serdestiya rom û farisan ya li ser kurdan e ku Xanî ev şibandiye rewşa kundê ku li xerabeyan dijî. Kund di zargotinê de wekî semboleke bêoxiriyê/bêyomiyê hatiye dîtin

²⁰⁷ H. b., r. 359

²⁰⁸ P. N. Boratav, *100 Soruda Türk Folkoru*, r. 123

5/18 Xalib nedibû li ser me ev Rûm
Nedibûne xerabeê di dest bûm

Ya dî jî di teswîra Beko de dertê pêşberî me ku Xanî ew wekî kesekî bêoxir,
heta di bêoxiriyê de ji Şeytan jî zêdetir dibîne.

26/20 Navê wî munafiqî Bekir bû
Belkî ji Belûqiya betir bû

Menna' û muzebzebîn û îblîs
Xedda' û xeberbezîn û telbîs

Şagirtê şeameta(bêyomî) wî şeytan
Şermende ji gotina wî Bohtan

Bedçehre ji rengê dêwê kabûs
Bedfê'l û stîzekar û salûs

Di *Mem û Zînê* de, di beşa 20an de dema ku Heyzebûn ji Mem û Tacdîn dixwaze ku, gustîlikên Sitî û Zînê bidin wê, Tacdîn vê yekê bi cih tîne lê Mem wekî ku ew gustîlik bo wî eşyayekî, an jî objeyeke ku aramiya rûhî tîne be, helwest nîşan dide û gustîlika Zînê şûnde nade. Li vê derê, bi eşyayekî wiha maddî ve girêdan, dikeve çarçoveya baweriya bi oxirê ku ew eşya dema ku ne li cem wî/wê be, kes xwe ji alî derûnî ve nerihet hîs dike. Mem vê gustîlika ku ji yarê girtiye wekî tilsimekê bo xwe dibîne û ji Heyzebûnê dixwaze ku, wê ji dest wî dernexe.

20/22 Go: “Daye tu min bidêre me’zûr
Kî canî didit ji dest xwe destûr?

Ev xatem e îsm e ger tilism e
Min can ew e, qalibê me cism e

Ey Daye, tu qasidê hebîb î

Bêşubhe li derdê min tebîb î

Sedqeê serê Zilcemaî, Zînê

Mestîne ji destê min nigînê

3.1.1.19. Di Mem û Zînê de Baweriya Nivîştê (Ezaîm)

Nivîşt, bi piranî bi armanca xwe ji xerabiyên mirov û xwezayê parastinê û ji nexweşînan muhafezekirinê, tê çêkirin. Cudahiya di navbera nivîşt û falê de ew e ku, di nivîştê de di heqê halên bi xef de agahîdayin an jî ji hin rewşên veşarî agahdarbûn nîn e. Nivîşt ji têgiha falê bêtir, nêzî têgiha sêhrê ye. Lewma di dîn de pir nehatiye teswîbkirin. Baweriya ji nivîştê, xwe dispêre derûniyeke kûr û girîft a mirovan. Mirov, bi rengê xerîb, dema ku ew nivîşt li ser wan be, xwe di nava ewlehiyê de hîs dikin. Û dema ku ew nivîşt ne li ser wan be jî, digel ku xetereyeke berbiçav nîn be jî, ew xwe pir bê hizûr û bi xof hîs dikin. Her wiha di radeyeke bi mubalexa de, di nava gel de hatiye bawerkirin ku, hin nivîşt hene ku mirovan ji xetereyên mîna, gule, şûr, kêr û her cure xetereyên dî diparêzin.

Ev derûniya ku rê li baweriya bi nivîştê vedike, her dem ne di nivîştan de, carina di hin eşya û objeyên taybet de jî tezahur dike. Yanî kes, dema ku ew eşya an jî tişt li balê be, li ser wî be, xwe di nava ewlehiyê de hîs dike û dema ku ne li balê be, xwe bê muhafeze, ji xetereyan re vekirî hîs dike.

Di van beytên jêrîn de jî em dibînin ku nivîşt, wekî tedbîreke der bareyê halên pêşerojê de, derdikeve pêş me. Lewma, Zîn û Sitî ji dayîna xwe Heyzebûn daxwaz dikin ku, ew bi nivîştê halên veşarî yên pêşerojê derbixe meydanê.

17/20 Ev rengehe gote Dayeya pîr

“Xalib ten emaye ‘eql û tedbîr

Te digo ku ‘bi de’wet û ‘ezaim

Halê ku xefî bitin dizanim’

3.2. DI MEM Û ZÎNÊ DE KEVNEŞOPA ŞÎN Û ŞAHIYAN

Di folklorê de şîn û şahî hêmanên herî karakterîstîk in ku di îcrakirina wan de gelek taybetmendiyên çanda gel derdikevin pêş me. Ew, êş û coşên hevpar yên civakê, bi rengê girseyî û bi rêzeqaydeyên kevneşopî ve girêdayî didin der. Lewma di her kêliya van merasîman de, ji alî yên ku beşdar bûne ve tê zanîn ku, wê çi bê kirin û wê çawa bê kirin. Bêguman ev nayê wê wateyê ku di rengê îcrakirina van merasîman de hiç guherîn pêknayên. Di nava dewran de gelek guherîn pêk tên lê ev reng guherîn, bi serencama guherîna çanda civakî û dîne civakê re seranser in. Lewra merasîmên civakî wekî ayîneya çand û baweriyên civakê ne.

Dema ku em li îcraya van merasîman dinihêrin, di her kêliya wan an jî merheleya wan de, wateyên curbecur ên civakî ku bi çanda maddî-manewî ya civakê re têkildar in, derdikevin pêş me.

Folklornas Erman Artun der bareyê bingehên merasîmên rîtuêl de wiha nivîsiye:

“Em dikarin bingehên merasîmên rîtuêl bigihînin heta serdema nêçîrvaniyê. Mirovên pêşîn, ji bo ku nêçîr baş bê kirin, ji sehr û hin hêzên derasa hêviya alîkariyê dikirin. Piştî ku civak ji çanda nêçîrvaniyê derbasî çanda çandiniyê bûne, ji bo ku çandinî bi behr û bereket be, curbecur merasîmên nûh derketine.”²⁰⁹

Bêguman em bi tevahî nizanin ku di herî destpêkê de, wateya van merasîman ji bo civakê çi bû an jî ew li dû kîjan pêdiviyên civakê derketin meydanê. Lê diyar e ku, ew ne tenê bi armanca kêf û şahiyana an jî şingirtinê dihatin îcrakirin. Wekî mînak, dema ku em li şahî an jî merasîma nêçîrê dinihêrin, çûndina nêçîrê, vegera ji nêçîrê hin wateyên xwe yên taybet hene. Wekî ku tê zanîn, di dewrên arkaîk de, nêçîr pêdiviyeye jiyanî ya mirovan bû. Eger ku nêçîr nîn bûna, hingê jiyan û civak bi xwe jî nîn bû. Çunkî hê çandinî nehatibû keşîf kirin an jî çandinî bi tenê têrî debara civakê nedikir. Lewma ew mecbûr bûn vê yekê îcra bikin û her wiha mecbûr bûn vê yekê bi hev re bikin. Her çendî ku merasîma nêçîrê, di *Mem û Zînâ* Ehmedê Xanî de û di gelek berhemên di yên wêjeyî de, bi rengê wekî ku merasîmeke kêf û seyrane be tê nîşandanê jî, ji xwendinên dîroka mirovahiyê em dizanin ku, di destpêkê de ev ne wilo bûye. Dema ku em li *Mem û Zînê* dinihêrin, em dibînin ku bi cîdiyeteke mezin biryar li ser merasîma nêçîrê tê dayin. Her wiha biryar ji alî rêvebirê herî payebilind ve tê dayin. Cîdiyet di radeyê wilo daye ku, Mîr ferman dide ku, tu kesê mîr an xort li bajêr

²⁰⁹ Erman Artun, *Türk Halkbilimi*, r. 239

nemîne û tevli nêçîrê bibe. Her wiha bi tenê ji mêran tê xwestin ku tevli nêçîrê bibin. Jixwe di wan dewrên dêrîn de mêr nêçîrvan û jin berhevkar bûn. Yanî ev wezîfeyê mêran bû. Ji vê cîdiyeta nêçîrê û tevlêbûna her kesê em têdigihên ku, ew rûhê di dewrên kevna de mewcûd bû, bi heman rengî di dema Xanî de jî hebû. Û dema ku em bala xwe didin vegera ji nêçîrê; hingê kêf û şahî heye. Wê cîdiyeta destpêkê, cihê xwe daye kêf û leyistikan. Lewre wan bi têrî civakê, seyd kiriye û gumana wan a ji birçîbûnê nîn e êdî. Û ew vê yekê bi govend û reqsê pîroz dikan, li dû rûhê dewrên dêrîn.

Her wiha di merasîma Newrozê de jî em heman wateyên civakî û xwezayî dibînin. Lewre Newroz ji aliyekî dî ve, belkî ji aliyê herî bingehîn ve, bidawîbûna zivistanê û hatina biharê simbolîze dika. Mirovên ku di demsala zivistanê de ji ber şertên xwezayî mecbûr bûn vekişin warên xwe, malên xwe; bi hatina biharê re cardî derdiketin derve û xwe ji karên nûh yê civakî-xwezayî re amade dikirin. Lewma bi merasîmeke wiha dest bi sala nû kirin, ji alî moral û kêfa civakê ve gelekî girîng bû. Çunkî wateya sala nû; kar û barên nû bû.

Bi vî rengî em dikarin gelekî şîroveyan li ser dawet û merasîmên şînê jî bikin. Lê nuqteya girîng ev e ku, têkiliya van merasîman bi pêdiviyên jiyana civakî û çandî re gelekî xurt bû.

Di vê beşa teza xwe de ez ê li ser Cejna Newrozê, merasîmên zewacê (qîzxwestin, mehrbirîn, dawet), kevneşopa şoşbîniyê, listikên gelêrî (reqs û govend), kevneşopa nêçîrê û keveneşopa şînê bisekinim.

3.2.1. Cejna Newrozê

Cejna Newrozê, di nava milletê kurd de, kevneşopeke gelekî kevna e. Her wiha ne bi tenê di nava milletê kurd de lê di nava gelek milletên Rojhelata Navîn û Asyaya Navîn de jî wekî cejnekê, bi wateyên curbecur tê pîrozkin.

Cejna Newrozê, her çendî di *Mem û Zîna* Xanî de wilo derbas nabe jî di nava gelê kurd de, bi Efsaneya Kawa/Dehaq re têkildar hatiye dîtin. Her wiha di dîrokê de Efsaneya Kawa jî, bi helweşandina dewleta Asûriyan û avakirina dewleta Medan re têkildar e. Dîsa ji aliyê xwezayî ve jî, 21ê adarê teqabulê bidawîbûna dirêjîya şevan û yekbûna şev û rojan jî dika. Her wiha di vê cejnê de wekî kevneşopiyekê vexistina agir, di ser agir de xweavêtin; -ji ber ku peywendiyê xurt a agir bi dîne zerduştî heye- wekî taybetmendiyên zerduştîyê hatine dîtin. Ajî Dahaqqayê ku, di Efsaneya Kawa de

derbas dibe, di Avestaya zerduştî de jî wekî mexlûqateke şeytanî jê hatiye behskirin.²¹⁰ Yanî bi kurtî ev cejn, cejneke ew çend girîng e ku hem bi dîroka miletê kurd re, hem bi baweriyên dêrîn re, hem bi efsaneyan re û hem jî bi veguherîna xwezayî re têkiliyeke wê ji nêz ve heye. Ji ber vê ye ku ev destan bi xusûsiyetên xwe yên cihêreng, rê vekiriye ku her miletê rojhelat xwe di navê de bibîne, lê xwedî derê. Bêguman ev yek mezinbûn û firehbûna çanda kurdan nîşan dide.²¹¹

Lêkolîner Mustafa Turan li ser taybetmendiya Newrozê de wiha nivîsiye:

“Li erdnîgariyeke fireh belavbûna pîrozbahiyên Newrozê, nîşan dide ku, ew ji alî gelek çandên cuda ve hatiye qebûl kirin. Lê ev taybetmendiya wê bûye sedema nîqaşên li ser esliyeta wê û çanda ku jê derketiye. Digel ku di pîrozbahiyên Newrozê de li gorî çandên cuda gelek motîfên hevpar hene jî, pir xwezayî ye ku hin motîfên cuda li gorî çandên cuda derkevin pêş me.”²¹²

Folklorînas Erman Artun ji bo bingehên Newrozê wiha dibêje:

“Pîrozbahiyên Newrozê, li erdnîgariyeke fireh belav bûne û di çanda curbicur miletan de cih girtine. Hin miletan bingeha wê li ser zemînekî mîtolojîk rûniştandine û hin miletan jî zêdetir bingeha wê gihandine zemînekî dînî.”²¹³

Di varyantên folklorî ên Memê Alan de, hîç behsa Cejna Newrozê nayê kirin. Li gorî varyantên folklorî, Mem û Zîn, li ser biryardayina periyên li ezman, hev û du bi rengê ku di jiyana rastîn de ne pêkan e, dibînin. Xanî vê motîfa derasa ku di çîrokan de dertê pêş me, ji destanê derxistiye û motîfeke jiyaniyê û kurdewar xistiye şûna wê. Ev tercîh, bêguman meyla fikrên Xanî jî dide nîşandan. Her wiha em ê di beytên jêrîn de jî bibînin ku, Xanî dema ku Newrozê teswîr kiriye, ew bi rengê karnavaleke nûjen teswîr kiriye.

Xanî, Newrozê wekî Sersalê, an jî destpêka biharê dibîne û behsa têkiliya wê û Efsaneya Kawa nake. Lê gelek balkêş e ku, Xanî, têgiha *Destana Newrozê*, bi kar aniye û *Kurdistanî*, gotiye bo vê destanê. Newrozê wekî destanekê dîtin –her çendî ku em baş pê nizanin ku Xanî têgiha destanê di wateya îroyin de bi kar aniye an na- nîşan dide ku Xanî, wê destana ku li dû vê cejnê ye dizane û her wiha wê rast qebûl dike. Her wiha

²¹⁰ K. Yıldırım, *Mem û Zîn Çeviri ve Kavramsal Tahlili*, r. 349

²¹¹ Şerefhan, *Şerefname*, wer. Ziya Avcı, Weş. Avesta, r. 99-101

²¹² Mustafa Turan, *Tarihi Kaynaklar Işığında Nevroz'un Menşei Meselesi*, Çap. Feryal Ank. 1998, r. 90

²¹³ Erman Artun, *Türk Halk Bilimi*, r. 241

tercîha Xanî ya bi ser Newrozê, ji aliyekî dî ve jî watedar e ku, gelek alimên ereb, cejna Newrozê bi zerduşiyê re têkildar dîtine û pîrozkirina wê di cih de nedîtine an jî guneh dîtine. Cejna Newrozê bi vî rengî derxistina pêş û wê di xaçerêyên destanê de di cihekî gelekî watedar de bicihkirin; cuda nihêrîna Xanî û xwerûbûna wî ya bi ser çanda miletê xwe ve nîşan dide.

Xanî di beşa 11an de dest bi behsa Newrozê dike û di sernava xwe de wiha dibêje:

“Dastana beyan Newroza sultanî/ Tesmiyê mewsimê surûr û şadimanî/ Bi mersûmê qedîmê Kurdistanî/ Ku wan digotê sersal/ ‘Ed dikirin bi ‘îdê wîsal”

Xanî, di heman beşê de wekî ku di gelek beşên *Mem û Zînê* de serî li ravekirina bi vî rengî dide, Newrozê û rengê pîrozkirina wê, wekî ku ji kalemêrekî zana bihîstibe, wiha neqil dike:

11/14 Danayê mu’emmerê kuhensal
Ev rengehe go ji bo me ehwal

Go: “Adetê pêşê zemanan
Ev bû li hemî cih û mekanaan

Weqtê ku şeswarê xawer
Tehwîlî dikir di mahê Azer

Ye’nî ku dihate burcê sersal
Qet kes nedima di mesken û mal

Bîlcumle diçûne der ji malan
Hetta digihîşte pîr û kalan

Roja ku dibûye ‘Îd û Newrûz
Te’zîmi ji bo dema dilefrûz

Sehra û çîmen dikirne mesken
Beyda û dîmen dikirne gulşen

Xasma ‘ezeb û keçê di bakir
Elqisse cewahirê di nadir

Têkda di muzeyyen û mulebbes
Vêkra li teferrucê murexxes

Lêkîn ne be tuhmet û be minnet
Belkî bi terîqê şer’ û sunnet

Lewra ku ewan xered ji geştê
Meqsûd ji çûyina bi deştê

Ew bû ku çi talib û çi metlûb
Ye’nî du teref muhibb û mehbûb

Ev her du celeb ku hev bibînin
Kufwê di xwe ew ji bo xwe bibînin

Dema ku me li jorê behsa hin wateyên cuda yên Newrozê kir, me dît ku gelek wateyên wê yên cihêreng ên dîrokî, efsaneyî, ayînî û xwezayî hene. Ji van beytên jorîn em dibînin ku Xanî, wateyêke jiyânî li Newrozê kiriye û Newrozê wekî wesîleya hevdfîtina xort û keçan û wesîleya îlana evînê, dîtîye. Bi rastî her çiqas mirov li vê cejnê hûr dibe, ew çend wateyên wê yên cihêreng û kûr dertên pêş mirov. Vêca dema ku ev hemî wate tînin cem hev û di cejnekê de wicûd dibînin, ew cejn payîdar dibe.

Newroz, xwedî taybetmendiyêke wilo ye ku, gelek civakan karîbûne ew wekî cejna xwe pîroz bikin. Ev taybetmendiyêke wilo ye, kodên wilo firehwate tîde hene ku cejn, ji cejneke asayî bêtir, vedigere pêdiviyêke civakî. Her wiha di nava civaka kurd de em dibînin ku ev cejn, bi wan hemî wateyên ku li jor derbas dibin tî pîrozkirin. Yanê civaka kurd, Newrozê ne bi tenê bi wateyêke statîk pîroz kiriye. Wan, li gorî şertên dema ku tî de jiya ne, an ji bingeheên vê efsaneyê hin aliyên wê derxistine pêş an jî hin wateyên nûh lê kirine û wilo ew pîroz kirine. Mînak dema ku civak nearam be û di tengayiyan de be, yan jî bi zulm û zordariyan re rûbirû be, mirov dibîne ku civak bêtir li wateya wê ya efsaneyî vedigere û taybetmendiya wê ya bi kesayetiya Kawayê Hesinkar

re têkildar, derdixê pêş û wê wekî xaçerêyeke berxwedana civakê, pîroz dikin. Lê dema ku millet di aramiyê de be vê carê taybetmendiya wê ya, ji tarîtiya zivistanê derketin û pêşwazîkirina ronahiya biharê, derdikeve pêş û ew wekî cejneke biharê, wekî rûdaneke xwezayî tê pîrozkirin. Herwaha di her demê de ji ber ku ew dibe hêncet ku xort û keç li hev bicivin; ew ji gîhaştina hev a evîndaran re dibe wesîle an jî dibe wesîle ku, xort û keç bask li evînên nû vebikin. Bi kurtî pirwateyiya Newrozê, sedema mayendebûna wê ye jî di nava civakê de. Eger ku civakê wateyeke teng lê bikirana, heye ku bi sedan sal berê an jî bi hezaran sal berê, wê ev cejn ji hafîzaya civakê derbiketana. Çunkî di çanda maddî-manewî de, qaydeyeke wilo heye ku, dema ku şertên civakî-xwezayî yên ku hebûna bûyinekî maddî an manewî ferz dikin, ji meydanê radibin; ew tişt (yanî ew nuweya çandî) bi xwe jî demekê şûn de radibe, tê jibîrkin. Lê li ser rûyê cîhanê kêma cejn an jî nuweyên çandî wekî Newrozê hene ku, li gorî şertên her demê, wateyeke jiyânî-civakî li wan bê kirin.

Di van beytên jorîn de em dibînin ku, ji devê *Danayê Kuhhensal*, Xanî vê cejnê wekî cejneke pîroz dibîne. Yanî têgiha ‘pîroz’ ji bo vê kevneşopê bi kar tîne. Ev yek jî nîşan dide ku Xanî Newrozê ne tenê wekî ku li jorê derbas dibe, bi wateya gîhaştina hev a evîndaran dibîne. Xanî di berhema xwe de, li gorî sazgeriya xwe, vî aliyê Newrozê derdixê pêş. Lê bi bîr tîne ku di rastî de ev cejn ji kevneşopeke pîroz tê.

Xanî, Newrozê di nava atmosfera karnavalê de radigihîne. Yanî ev cejn, ne tenê wekî cejnên dînî ku; mezin û piçûk li hev pirs dikin, an jî xizim û malbat li halê hev dipirsin, an jî ne tenê wekî cejneke fermî ku di astên jor de tê pîrozkirin, nîşan dide. Newroza ku Xanî teswîra wê dike, bi tevahî her beşê civakê digire nava xwe û ji cil û bergên xort û keçan heya listik û govendên gelêrî, wekî festîvaleke kêf û şahiyê ku li wê derê folklorê gel derdikeve pêş, tê pîrozkirin. Xanî di beşa 12an rengê pîrozbahiyên Newrozê wiha neqil kiriye:

12/1 Dewra felekê ji bextê feyrûz

Dîsan ku nûma ji nû ve Newrûz

Mebna li wî ‘adetê mubarek

Şehrî û sîpahiyên bi carek

Bajêr û kelat û xanî berdan

Teşbîh bi nijdiyan û cerdan

Sef sef dimeşîne kûh û deştan
Ref ref dixuşîne seyr û geştan

Esnafê umem sîxar û kubbar
Qet'a ve nema di şehri deyyar

Hindek be peyayî çûne baxan
Hindek be suwarî çûne raxan

Hindek be tebayî û be kisret
Hindek be hevalî hin be wehdet

Rabûne ve xanim û xewatîn
Wan jî tijî gul kirin besatîn

Hûran kire meskenê xwe cennet
Bê perde û bê melal û minnet

Dûşîze û duxter û ruwalan
Pakîze 'îzar û zulf û xalan

Etrab û kewa'ibê di 'ezra
Murdan û murahiqê di zîba

Eshabê qumaşê lutfê ruxsar
Erbabê meta'ê husnê dîdar

Wan lêk dikirin meta'ê yek 'erd
Texmîn dikiri bîttûi we'l-'erd

Sewdakerê işqê bûn di bazar
Hem baî'ê husn û hem xerîdar

Sersalî û bakir û ruwalan
Sedsalî û cuwan û pîr û kalan

Sersalî li resm û rahê me'hûd
Gêran diçû meqamê mehmûd

Cardî em di van beytan de dibînin ku Xanî ji bo vê cejnê, pênaseya *'Adetê Mubarek*, bi kar aniyê. Her wiha çawa ku îro jî Newroz, bi rengê ku hemî qadên civakî tevli dibin tê pîrozkirin, di dema Xanî de jî wilo bû. Di heman demê de ev cejn, ne li cihê ku ew lê dijîn, li derveyî bajar û gundan, wekî geşt û seyranê tê pîrozkirin. Xanî di van beytan de behsa xemla xort û keçan jî kiriye ku, Newroz bi rûhê cejnê û sahiyê tê pîrozkirin û xort û keç hev dibînin û xwe ji bo hatina ecibandî dîxemilînin.

Her wiha dema ku em bala xwe didin rengê teswîra Xanî ya çanda gel; çandeke pîr dewlemend û zindî bala me dikêşe.

Di beşên berdewam de jî Xanî bi heman rengî behsa pîrozbahiyên Newrozê kiriye û hevdîtina ewil a Mem û Zînê jî li Newrozê rast aniyê.

3.2.2. Merasîma Zewacê

Di çîrok û destanan de, ji aliyê zargotinî ve, di jiyana lehengan de sê merheleyên girîng hene. Ev merhele bi vî rengî ne: I. Hatina dinyayê ya leheng. II. Zewaca wî. III. Mirina wî.

Yanî hatina dinyayê, zewac û mirin sê merheleyên girîng in di çîrokan de her wiha di van xaçerêyan de serencama destan an jî çîrokê diguhere. Di zanyariya folklorê de ji vanan re di heman demê de *Serdemên Derbasbûnê* jî hatiye gotin. Lewre di van xaçerêyan de êdî dînamîkên çîrok an jî destanê diguherin.

Ali Rıza Balaman ji bo taybetmendiyên merasîmên zewacê wiha nivîsiye:

“Merasîmên zewacê, di nava xwe de muhtevayeke dînî û civakî dihewînin. Ev cure merasîm, di pêkhatina avahiya netewî û bîdestxistina gelek nîrx û helwestan de, bi fonksiyon in. Rengê merasîmên zewacan, li gorî dîrok, aborî û rengê niştecîhbûna civakan, diguhere.”²¹⁴

²¹⁴ Ali Rıza Balaman, *Gelenek, Töre ve Merasim, Weş. Betim, İzmir, 1973, r. 135*

Zewac an jî merasîmên zewacê, hem di avahîsaziya çîrok û destanan de xwedî girîngî ne û hem jî ji ber ku gelek nuweyên çanda maddî-manewî ya gel di van merasîman de tîpên pêşnûmakirin, girîng in.

Di vê beşê de, merasîma zewacê ya ku em ê li serê bisekinin, ne ya lehengê sereke ye. Ev, merasîma zewaca Tacdîn û Stî ye. Bêguman ev reng zewac, wekî ku me li jorê behs kir, di destanê de motîfa *Serdema Derbasbûnê* teşkîl nake. Jixwe di varyantên folklorî ên Memê Alan de jî, behsa merasîmeke bi vî rengî nayê kirin. Lewma ev zewac, ji girîngiya wê ya ku di avahîsaziya çîrokê de rolekê teşkîl dike bêtir, ji alî pêşnûmakirina nuweyên folklorî ve girîng e.

Di vê beşê de ez ê li merasîma qîzxwestin, mehrbirîn, dawet û kevneşopa şoşbîniyê binihêrim.

3.2.2.1. Qîzxwestin

Merasîma qîzxwestinê, yek ji hêmanên çanda gel a civakî û ayinî ye ku girêdayî hin rêzeqaydeyên kevnares û ev qayde ji alî her kesê ve tîpên zanîn. Di nava civaka kurdan de, bi serdemên dirêj bi giranî ji bo zewaca xortan ji evîne bêtir, li şertên hevsengiyê hatiye nihêrtin. Bêguman ev ne tenê ji bo civaka kurdan, her wiha ji bo gelek civakan wiha ye. Ev hevsengî, hem wateya wê ya çînî, hem xwedantiya mal û eşîrî, hem çandî, hem temenî û hem jî dînî heye. Yanî dema ku du kes bîna zewicandin, civak an jî malbatên wan pêşî lê dinêrin ku statuya her duyan a civakî hevseng e an na. Her du malbat an jî keç û xort di xwedantiya malê dinyayê de an jî di xwedan eşîrbûnê de hevseng in an na. Her du malbat an jî keç û xort, di heman radeya çandî de ne an na. Û nihayet her du alî li ser heman dînî ne an na. Vêca bi tenê halê evîne dibê sedema îhlalkirina van rêzeqaydeyan û ji alî civakê ve jî bi xweşbîniyê tê pêşwazîkirin; ji ber ku reweşeke îstîsnayî ye. Lewma di beşa 19an de Xanî bi rêya Şêxê Remmal wiha dibêje:

19/18 Şêx go ku di dînê işiqbazî

Bey'ek heye ew dibên terazî

Bê şertê kefaetê rewa ye

Şertê mute'aqidan rida ye

Wekî ku ji van beytan jî em têdigihên, Xanî jî heqîqeta hin şertên hevsengiyê qebûl dike lê dema ku evîn li meydana be, hingê hukmê van şertan radibe. Hukum bi tenê, razîbûna her du aliyan e.

Li dû van rêzeqaydeyan, divê alî xort pêşî agahiyê ji alî keç re bişîne da ku ew ê bîn û keçikê bixwazin. Yanî bêyî agahî, îro jî aliyê xort naçe ber derê aliyê keçikê. Ev agahî bi piranî bi navbeynkarek an jî qasidek tê şandin. Lê di *Mem û Zîna* Xanî de, di vê nuqteyê de jî rewş cuda ye. Lewma pêşî aliyên keç, yanî Stî û Zînê, agahî bi rêya qasida pîr, Heyzebûnê, dişînin da ku Mem û Tacdîn werin wan bixwazin.

21/29 Ey waqîfê waqî'atê dîrîn

Em xeyrê te mehreman nedêrîn

Tacdîn û digel Memê te gotî

Perwane ne, per li wan me sotî

Ew jî nuhe pur di întîzar in

Belkî ji me zêdetir neçar in

Rabe here zû bibêje Tacdîn:

Ger dê te Sitî bivê, Memê Zîn

Mizgîn ji we ra me hûn qebûl in

Em jî ji we zêdetir melûl in

Işqa we celew ji me reva ye

Manî' li me perdeya heya ye

Ew perde ji bo we ra 'edîm e

Bêperdeyî ji bo we ra qedîm e

Xwazgîn û wesaît û wesîle

Herçî ku ji ba we bîn cemîl e

Eve renga bibêje wan hebîban:

Mecmû'ê mewalî û xetîban

Hindek ji we ra bibin ricaçî

Hindek ji me ra bibin du'açî

Belkî kiribit xwedê muqedder

Wesla me û we bibit mueysser”

Wekî ku em di van beytan de jî dibînin, Sitî û Zîn jî her çendî ku, li dijî kevneşopan, agahî ji Mem û Tacdîn re dişînin jî, ew bi xwe jî wan qaîdeyên civakî tînin bîra xortan û dibêjin ku, perdeya şermê li wan dibe asteng ku her tiştî ew bikin. Lê ev perdeya şermê ji alî xort re nîn e.

Li vê derê Sitî û Zîn, dema ku peyama xwe digihînin Mem û Tacdîn, ji wan dixwazin ku ew tevî xezûr, navbeynkar, ên ku dikarin bibin wesîle, mela û xetîban bên. Yanî ev koma civakî, di merasîma qîzxwestinê de, divê ku amade be. Îro ji dema ku bûyerên bi vî rengî diqewimin, bi piranî li dû şertên civakî, hin kesên di jî tevli aliyê xort, tevli vê merasîmê dibin. Bi piranî eger ku ew kes ji her du aliyan ve jî nas be, an jî pêşewa yan jî rêberekî dîni be, bêtir rewa ye ev. Çunkî di merasîma qîzxwestinê de eger her du alî qayil bibin, hingê bazariyekê jî dest pê dibe ku wê çî bê dayin, çî bê stendin bo ciwanên ku dizewicin. Her wiha hazirbûna pêşewayên dîni jî, di tetbîqkirina hin erkanên dîni de girîng e. Bêguman kesên ku aliyê xort bi xwe re dibe, ji alî statuya civakî ve çiqas bilind bin, ew çend avantaj e ji bo wan. Lewra ji ber hatina wan be jî, ew nayên şikandin.

Li vê derê erka Heyzebûn an jî pîra qasid, erkeke gelekî folklorî ye ku, em di beşa Motîfa Xeberguhêz de, li serê sekinîbûn.

Piştî ku qasida pîr, Heyzebûn agahiyê dide Mem û Tacdîn, ew ji bo Tacdîn haziriya qîzxwestinê dikan. Xanî di beşa 22yan de, wiha teswîr dibe vê rewşê:

22/9 Rabûne ve çûne nik hevalan
Çendek ji meharim û ruwalan

Agah kirin ji macerayê
Rabûn bi te'essub û tebayê

Gava ku ewna bihîstî mizgîn
Hay dan bi tebayî xelq û xwezgîn

Hindek ‘ulema û hin di ‘adil
Hindek ‘umera û hin di cahil

Rabûne ve cumle çûne nik Mîr
Ev renga kirin qediyê teqrîr:

Hem di van beytan de, hem jî di yên ku me berî van dabû de, têgiha xwazgîn derbas dibe ku, îro jî ji heyeta ku diçe qîzê dixwaze re, xwazgîn tê gotin. Di vê heyetê de, dibe ku gelek kes jî hebin. Yanî bi taybet ji malbata xort û xizmên wî yên nêz. Têgiha xwazgîn di prosesa qîzxwestinê de têgiheke girîng e. Ew hem ji koma ku diçe qîzê dixwaze re tê gotin hem jî ji karê ku tê kirin re.

Wekî ku di van beytan de jî derbas dibe, dema ku Tacdîn û Mem wê mizgîna ji yaran dibihîzin, pêşî agahî didin derdora xwe ya nêz, heval û hogirên xwe û dûre milê xwe hildidin da ku heyeta xwazgîniyê çêbikin. Di vê heyetê de, ji ber ku ew bi xwazgînî diçin ber derê herî payebilind ê welat, pêşewayên milletê hene. Di koma xwazgîniyê de, ji her beşê civakê kes hene. Hinek jê, yên ku bi îlmê xwe civakê bi rêk û pêk dikin; *ulema*, hinek jê yên ku bi qanûnan jiyana civakê bi rêk û pêk dikin; *adil*, hinek jê yên ku di îdarekirina civakî-siyasî ya civakê de xwedan erk in; *umera* û hinek jê yên ku ji hemwelatîyên sade yên welat in; *cahil*. Wekî ku li vê derê tê dîtîn, Xanî, alim, dadwer û birêvebiran wekî tebeqeyên herî bilind ên civakê dîtiye. Me di beşa Motîfa Civakê de, bi berfirehî behsa vê mijarê kiribû.

3.2.2.2. Mehrbirîn

Mehrbirîn, di prosesa zewaca du kesan de li gorî kevneşopa çandî, rewakirin an jî meşrûkirina hatina cem hev a keç û xort e. Ev proses bi piranî meşrûiyeta xwe ji destûrdayina dînî digire. Di herî destpêka dawetê de ev şert tê bicihanîn. Da ku tiştê ku ji alî her du aliyan ve jî hatiye qebûlkirin li resmîyeteke dînî bê girêdan. Di hemî civakan de ev merheleya girîng, bi şertên dînî ve hatiye girêdan. Bêguman ev yek, bingeha xwe ji baweriyên civakê digire ku di vê kêliya herî pîroz de, bûyera zewacê bi benên zexim ên dînî tê girêdan. Her wiha di vê kêliya girîng de, pêdivî bi hin şertên

dînî tê dîtîn; li wê derê heq û huqûqên zewacê bi bîra her du aliyan tê xistin û ev di huzûra şahidan de tê tesbîtîkirin û bi dua, daxwaz û xwendina hin pasajên dînî tê temamîkirin.

Dema ku em baş bala xwe didin bûyera zewacê, em dibînin ku pêşî bi razîbûna her du aliyan û li dû adetên civakî xwestina qîzê dest pê dike, dûre mohra dînî li vê zewacê tê xistin û dawî bi tevlêbûna hemî civakê mohra çandî jî lê tê xistin û merasîma dawetê diqede. Yanî girîngiya merasîmên civakî yê bi vî rengî, yek jê jî ew e ku, di prosesa pêkhatina wan de, ji gelek aliyan ve, çanda maddî-manewî ya civakê derdikeve pêş me.

Dema ku Mîr bi zewaca Tacdîn û Sîtiyê qayil dibe, wiha ferman dide:

22/23 Mîr go ku: “Heçî we dîtî laîq
Elbette ji bo me ra ye faîq

Herçî ku wekîl e bêt û rûnêt
Mewla kî ye xutbê bixwûnit

‘Eqda Sîtiyê me kir li Tacdîn
Îcabe ev e qebûl e amîn

Fîlhal Çeko bezî û pê Mîr
Teqbîlî kir û qebûlê teqrîr

Mecmû’ê mela û şêx û mîran
Axa û ekabîr û feqîran

Vêkra bi devê xwe wan sena kir
Têkda bi dilê xwe wan du’a kir

Di van beytên jorîn de em dibînin ku di merasîma mehrbirînê de bûyera wekaletê jî heye. Ev yek bi pîranî ji bo aliyê keçîkê tê bikaranîn. Yanî aliyê kur, ew bi xwe di vê merasîmê de hazir dibe û bi pîranî keç, yan ji aliyê bav ve yan jî ji alî kesekî ku li gorî daxwaza keçîkê wekalet hatibe dayin ve, tê temsîlîkirin. Lê di her halî de jî divê ev wekalet hatibe tesbîtîkirin da ku zewac bi dilê her du aliyan e jî.

Balkêş e ku li vê derê, aliyê Sitî ji aliyê Mîr ve hatiye temsîlkirin lê aliyê kur yanî Tacdîn jî, bi wekaletî vê mehrê biriye. Ev yek dibe ku, ji ber ku aliyekî jê Mîr e; Xanî seza nedîtiye ku Tacdîn derbixe hemberî Mîr di vê mehrbirînê de. Yanî wilo tesewir kiriye ku, Tacdîn jî ji aliyê kesekî ku di payeya xwe de nêzî Mîr e ve, bê temsîlkirin.

Her wiha em dibînin ku li ser qebûliyê, Mîr ferman dide ku bang li mela bê kirin da ku were xutbê bixwîne. Yanî di prosesa mehrbirînê de, xutbe jî tê xwendin û peywirdarê dînî hazir dibe li wê derê.

Dawiya vê merasîmê, bi xwendina duayan û bi daxwaziyên dilxweşiyê تمام dibe. Her wiha hemî pêşewayên civakî di vê merasîmê de hazir in.

3.2.2.3. Dawet

Di çanda civakê de ji alî zanyariya folklorê ve jî, dawet xwedî girîngiyeke pir mezin e; ji ber ku, di dawetan de em rastî gelekî nuveyên çanda civakê tên û ev yek wekî dewlemendiya wê herêmê an jî wî welatî tê pêşkêşkirin. Ev dewlemendî ji lîstikên folklorî û govendan heya bi stranên gelêrî, ji xwarin û vexwarinên kevneşopî heya bi cil û bergên gelêrî, di qadeke fireh de cih digire.

Ji ber vê yekê ye ku, ji bo zanyareke folklorê, çavdêriya dawetekê kirin, ji bo têgihîştina çanda wê civakê xwedî girîngiyeke mezin e. Yanî mirov bi çavdêriya dawetekê, der bareyê çand û baweriyên wê civakê de, der bareyê avahîsaziya civakê û çînen civakê de, der bareyê folklorê civakê û gelekî xusûsiyetên civakî de digihîje hin fikran.

Li vê derê her çendî ku hin cudahiyên wê ji daweta ku di *Mem û Zîna* Xanî de pêk tê, hene jî, em li Mela Mehmûdê Bayezîdî binihêrin ku bi çi rengî behs ji dawetên civaka kurdan kiriye.²¹⁵

“Dema destpêkê keçikekî dixwazin, eger dan hespekî bi taxim erêkirin distînin. Paşê şîraniyê vedixwin û paşê nîşanê dikin û qelenê wan zehf dibe. Sed û dused û pênsed pez û çend bav û birayên bûkê, ji bo her yekê xelatek pêvîst e. Bê xelat nabe.

Eger xwediyê dawetê axa û yan dewlemend e, ew gazî kê ku bike, qeleqendekî mezin ji bo wî verê dikin û ewan gazî dawetê dikin. Van mirovên ku

²¹⁵ Agahiyên ku M. Bayezîdî ji bo dawetan dide, bêtirî derbarê dawetên kurdên koçer de ne.

hatine gazîkirin, li gora halên xwe du û sê û deh pezan ji bo xwediyê dawetê verêdikin. Û paşê jî bi xwe diçin dawetê û ew xwediyê dawetê ji mesrefa dawetê zêdetir pez û mal ji bo wî berhev dibe. Û eger xwediyê dawetê feqîr û jar be, dîsa ji bo dawetê rewşbaş û halxweş dibe. Lewra her kes zêde Toypayî(xelata dawetê) ji bo wî verêdikin. Hal û malek ji bo wî peyda dibe. Eger mirovên gazî dawetê dikin, mirovine biçûk û bêhal û mal in, serê her mirovî keleşekêrekî biçûk verêdikin. Û ewan mirovan gazî dikin dawetê. Elbette ev mirovê biçûk jî bivê nevê dê pezekî wek Toypayî ji bo xwediyê dawetê verêbike. Bi kurtayî dawet bê diyarî nabe. Zaf û hindik dê tiştêk ji bo xwediyê dawetê verêbikin. Jin jî di cih de tiştan dibine dawetê ji bo keçikê. Mesela ber û kulav û heqîb û goreyan dibin.

Û dawetên wan jî zaf bi deng û stran dibin. Ew Berîte dibêjin. Dengbêjên wan hene. Berîtan dibêjin. Ew jî bi govend direqisin. Lê jin û mêr û keç û kur hemî têkde destên hev û du digirin û dîlanê digerin. Lê dibe ku di dawetên maqûlan de def û neyê û kemaçe û defik û cangêr jî hebin. Belê sazbandên wan mitrib in. Her êlekî ji Kurdan mitribekî wan ê taybet heye. Ji biyaniyan mitriban naynin.

Dawetên wan sê rojan heta heft rojan li halê heryekî dibin. Bûk û zavê jî paşê tînin dixine govendê. Ew jî dîlanê dikin. Eger bûk û zava dikevîne govendê herkesek pez û dirav li wan şabaş dikin û gelek pez û dirav kom dibe. Gelek pişk û par ji wî diravî ji bo xwediyê dawetê û parek ji bo mitriban e.

Û dawet û tiştên ji mêvanan pêşkêş dibin û zad û te'amên Kurdan, birinc û goşt e. Êdî zêde ew zad û cureyên xwarinan û çêkirin û nişên xwarinê nizanin û nekirine adet. Ji ber ku gelek ji wan qet reng û cureyên xwarinan nedîtine û nizanin. Lê gelekî sifreyên xwarinê radixînin û tijî zadê goşt û birincê dikin. Ew cema'et dest bi dest rûdinên û dixwin û radibin. Destekî din tê û dîsa zad eger kêmbê tînin. Heta ku nas hemî xwarinê dixwin.²¹⁶

Xanî di *Mem û Zînê* de, di sê beşan de pir bi dirêjî behs ji daweta Tacdîn û Sityê kiriye. Di dawetê de Xanî balê kişandiyê ser xwarin û vexwarinan, fîraq û çîniyên ku ev xwarin tê de tînin pêşkêşkirin, reqs û govendên ku di dawetê de tînin kirin. Bêguman daweta ku li jorê Bayezîdî behs jê kiriye, bêtirî dawetên kurdên koçer û yên ku li gundan dijîn in. Li vê derê em daweta li derdora jiyana bajarvanî ya Cizîrê û li derdora koşka Mîr dibînin. Her çendî ku cudahî hene jî di pêşnûmakirina çanda gelêrî de cihên ku dişibin hev jî hene.

Di *Mem û Zînê* de dawet bi fermana Mîr dest pê dîke:

²¹⁶ M. Mehmûdê Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiyê*, Lêkolîn Jan Dost, r. 155-156

22/29 Mîr go: “Biqutin def û rebaban

Bînin hemî şerbet û şeraban

Da bezmeke şadimane danîn

Îro he ku subhe em nizanîn

Wekî ku tê dîtin, dawet bi fermana Mîr û lêdana defê dest pê dike. Li vê derê divê bê qeydkirin ku deflêxistin, di heman demê de tê wateya agahîdayinê jî. Ev di her şertî de ne agahiya merasîmên kêf û şahiyên e. Dibe ku nûçeyê girîng jî bi lêdana defê bê dayin. Ev agahî dibe ku dawetek, şahiyek, dibe ku îlana şerekî yan jî koçberiyek, an jî agahiyeke ji rêvebiran bi ser gel ve be jî.

3.2.2.4. Xwarin û Vexwarin-Firaq û Çînî

Xwarin û vexwarin û firaqên ku ev xwarin û vexwarin tê de tên pêşkêşkirin, perçeyê girîng a çanda civakî ne. Cureyên xwarinên ku di vê dawetê de tên pêşkêşkirin, nîşaneyên girîng in ji bo xwediyê dawetê, her wiha der bareyê avahîsaziya civakê û çînên civakî de jî agahî didin me. Îro jî li nava civaka kurdan, ev taybetmendiyeke girîng e. Dema ku civak tevli merasîma dawetê dibin, bi baldarî li xwarin û vexwarinan dinîhêrin û ev dibe mijara gotûbêjan. Di *Mem û Zînê* de, Xanî jî li ser vê sekiniye û bi teferûat ew wiha teswîr kiriye:

22/45 Tacdîn ku di xidmeta Emîr bû

Çeşna wî di dest û çeşnegîr bû

Elqisse bi şewketa xwe ew Mîr

Rabû bixwe bûye çaşnîgîr

Kêşa wî bi meclîsa xwe xwanek

Goya kire ferşî asîmanek

Qursê meh û mîhrê asîmanî

Înan te digo bi cayê nanî

Ev lengeriyê di zîv û zêrîn
Şubhetê felekê di jor û jêrîn

Her sehnê mezin mîsalê burcek
Serpoşê li ser ji rengê durcek

Her tebsî û kaseyê di fexfûr
Yek exterê pirdiyayê pîrnûr

Ceddy û hemelê di asîmanî
Buryan û kebabê mîhimanî

Her kase û tebsiyek yek enbar
Serşarê şebîhê nefse emmar

Enwa'ê te'am û çerb û şîrîn
Elwanê xeda û nuqlê rengîn

Van meşrebe û eyaxê Çînî
Dewran dikirin bi nazenînî

Seyyarsîfet bi geşt û seyran
Herçî ku didî dimayî heyran

Narinc û tirinc û nar û lîmû
Newbarê şaxîsarê mînû

Fanîz û nebat û qend û şeker
Mawerd û zebad û mîsk û 'enber

Hindan dikirin me'îde xaze
Hindan dikirin dîmaxî taze

Di van beytên jorîn de em dibînin ku Xanî bi regekî gelekî zindî behsa xwarin û vexwarin, firaq û çînî û curbecur fêkiyên sofreyê Mîr kirine. Em dikarin ev reng teswîra Xanî, wekî motîfeke dewlemendiyê ya wê serdemê bibînin.

3.2.2.5. Muzîk û Meqam, Amûrên Muzîkê

Xanî di heman beşê de yanî beşa 22yan de behs ji muzîkên ku li dîwana Mîr tînin îcrakirin, kiriye.

22/61 Ramûşger û xweşnawa û xweşdeng
Şayeste û xweşqumaş û xweşreng

Hevdengî hinek bi sewtê sazan
Hemrengî hinek bi fexr û Nazan

Muxnî û kemançe, ûd û tenbûr
Çeng û def û sûrena û sentûr

‘Uşşaq û newa, ‘Iraqî û ewc
Vêkra dikirin bi rastî zewc

Awaze û şu’be û meqamat
Bê perde bi mu’ciz û keramat

Zahir ku dibûn ji nayê gerdan
Xaretkerê ‘eql û dîn û îman

Saqî şewişîn bi abê engûr
Mutrib herişîn bi sîte sentûr

Qewwal û muxennî û xezelxwan
Mexmûr û siyah, mest û sekran

Elqisse li rexmê şeb’ê şeddad
Danîn bi wî resmî ‘ursibunyad

23/49 Sazan mirî hey kirin wekî Sûr

Kûs û def û kerrena û naqûr

3.2.2.6. Kevneşopa Şoşbîniyê

Ev kevneşop, kevneşopeke kevin û berbelav e di nava civaka kurdan de. Çawa ku di *Mem û Zînê* de derbas dibe, îro jî di nava civaka kurdan de bi heman reng û wateyê heye.

Şoşbînî an jî birazavafî, bi kurtî rêbertiya zava, rêbertiya dawetê ye. Şoşbîn an jî birazava, ji destpêka dawetê heya dawî, ji her karê zava û organîzasyona dawetê berpirsiyar e. Ew bi piranî xizim an jî hevalekî nêz ê zava ye. Li ser navê zava, xêrhatin li kesên ku tên dawetê dike. Di nava berpirsiyariya şoşbîn de, hin şîret û rênîşandanên di heqê şeva gerdekê de jî hene.

Şoşbîn di heman demê de ji ewlekariya zava jî berpirsiyar e. Wekî ku tê zanîn di nava civaka kurdan de gelek adet û leyistik hene di dawetan de ku, carina dibe ku zava ji wan zerar jî bibîne. Vêca wezîfeyêke şoşbîn ew e ku, zava ji xetereyan jî biparêze. Lewre ew, heya ku zava dikeve odeya gerdekê, pê re ye. Odeya wî jî ji bo wî amade dike û carina wekî ku di *Mem û Zînê* de jî tê dîtin, li ber derî disekine. Yanî bi kurtî ew di dawetê de hem temsîlkarê zava û hem jî parêzvanê wî ye.

Di *Mem û Zînê* de jî ev kevneşop dertê pêş me. Bêguman şoşbînê Tacdîn, hevalê wî yê yekta Mem e. Her wiha balkêş e ku Mîr, Mem wekî şoşbîn tayin dike.

22/78 Rabû ve ku xwan ji ber xewasan

Saqî geriyan bi cam û kasan

Mîr xwondine pêş Memo û Tacdîn

Go: “Çerxe li min Memo, tu şoşbîn”

Taybetmendiya şoşbîniya Mem, di van beytan de bêtir zelal dertê pêş me:

24/10 Meşşate û mîrîban û dayîn

Şoşbîn û meharimê di Tacdîn

Mustewcibê weqtê dîn mullaqat

Ber mûcîb û muqtedayê ‘adat

24/34 Yarê xem û şahiyar Memê jar
Vê ra bûye sahib û sîlehdar

Destê wî di dest û dil di dil bû
Bû hacibê derya, şîr li mil bû

Tacdîn bi vî terzî çû serayê
Mem ma li derî digel duayê

Di van beytên jorîn de, em erka şoşbîniyê ya di merasîma dawetê de dibînin. Mem wekî şoşbîn hem parêzvanê Tacdîn e û hem jî tevî hin wezîfedarên dî, odeya gerdekê ji bo zava hazir dike, pêdiviyên wî temîn dike û wî dibe koşka wî. Her li gel wî ye. Dema ku ew dikeve hundir bo gerdekê, Mem li wê derê, li ber derî disekine.

25/39 Nageh seherî ji rojê heştê
Ridwan meşîya ji nêv bihiştê

Mem hêj wisa li ber derî bû
Daîm ewî ser li ser berî bû

Hêja ewî mesken asîtan bû
Rojan û şevan we pasîban bû

24/37 Lewra ku xexûf bû mûlaqat
Melzûm e li aşiqan mûlaqat

Ger qismê muhibb û ger hebîb in
Elbette bi dijmin û reqîb in

Hin dêw û hinek ji wan perî ne
Hindek di munafîqê Ademî ne

Ji van beytan jî em dibînin ku Mem, heya ku zava ji gerdekê dertê jî li ber derî li benda wî dimîne. Ewlekariya wî bi cih tîne. Sedema vê yekê, wekî ku Xanî jî diyar dike ew e ku, kurd civakeke xwedî gelek dijmin in. Dijminatî û hesûdiya di navbera civaka kurdan de, bûye sedem ku erka parêzvantiyê ya şoşbîn derkeve pêş. Yanî, ji bo kesekî, dema wî ya ku ew herî zêde zeîf e, dema daweta wî ye. Lê hebûna parêzvanekî, vê valahiyê dadigire.

Kevneşopa şoşbîniyê, di beşa şîna Mem de, bi renekî cuda dertê pêş me. Piştî mirina Mem, Zînê kehaneta mirina xwe jî dike û ji Mîr daxwaz dike ku mirina wan her duyan wekî gihaştina wan û lewma jî wekî dawet bê pêşwazîkirin. Lewma di dawetekê de çi tê kirin, di merasima rakirina cenazeyên wan de jî ew hemî rêz û resm bîn bicihanîn. Lewma ji Mîr dixwaze ku, wî çawa di daweta Tacdîn de, Mem ji bo wî wekî şoşbîn tayin kiribû, di merasima rakirina cenazeyê wan her duyan de jî, Tacdîn ji bo Mem wekî şoşbîn tayin bike.

51/38 ‘Eqda Sityê çi roje xweş bû

Zînê ji ezel çi bextreş bû

Ne’şê mi bila Sitî digel bit

Tacdîn digel Memê bedel bit

Manendê Memê ji boy î Tacdîn

Tacdîn bi wî re bigêre şoşbîn

Şoşbîn bitin ew digel Memê min

Şahî bitin ew digel xemê min

3.2.2.7. Şahiya Dawetê

Daweta Sitî û Tacdîn, dawetêke wilo ye ku, hemî bajarî, tevî hemî çînen civakî, yanî feqîr û dewlemend, beg û giregirên civakê, alim û mela û şêx, hemî tevli vê dawetê dibin. Xanî di vê şahiyê de teswîreke wilo dike ku, her kes para xwe bi wekhevî ji vê şahiyê digire û her kes li dû tebîetê xwe, wekî xwe, tevli vê şahiyê dibe. Ev îdeala wekhevîyê, di gelekî cihên dî yên *Mem û Zînê* de jî derbas dibe.

Xanî, çawa ku cejna Newrozê di nava atmosfereke karnavalîst de dabe, wilo jî daweta Tacdîn teswîr kiriye. Yanî ev xusûsiyeteke Xanî ye ku şahiyana di nava rûhê karnavalîst de dide û hemî beşên civakî tevli vê karnavalê dike û wan di nava îdela xwe ya wekhevîyê de teswîr dike.

23/65 Xêzan û geda, xenî û zengîn
Şadan û hezîn û şa û xemgîn

Êdî nedibûn ji hev muşexxes
Te di go hemî mîrek in murexxes

Têkda di munasib û muwafîq
Vêkra di musafih û di mu'aniq

Hasil ku ji meqseda seramest
Bûn ew der û ban û ew sera mest

Hin mest û hinek digêr di bengî
Xwanende û bezlego û çengî

Her bengî û serxweşê di Bohtan
Têk hatine çerx û baz û lotan

Bêrîte, sema û saz û govend
Şîrîn û şekerleb û şekerxend

Her wekî ku em di van beytan de jî dibînin, Xanî behsa hunermend, palyaço û muzîkjenan kiriye ku ev hemî li dû wê atmosfera karnavalîst dertên pêş me. Dîsa em li nîşaneyên îdela wekhevîyê ya Xanî rast tên ku, di beyta 67an de ev hemî çînen civakî wekîhev, bi hev re hevseng hatine teswîrkirin.

Xanî di van beytên jorîn de behsa hin lîstikên gelêrî kirine ku ev hê jî di nava civakê de, di dawetan de tên îcrakirin; Bêrîte û Govend.

Xanî diyar kiriye ku daweta Sitî û Tacdîn, heft roj û heft şev ajotiye. *Sê roj û sê şev, heft roj û heft şev* an jî *çil roj û çil şev*, di dawet û şahiyên de hejmarên girîng in û folklorî ne. Her wiha Tacdîn di gerdekê de jî heft roj û heft şev maye.

24/3 Weqtê seherê ji rojê heftê
Agir te digo gihîşte neftê

Xanî behsa kevneşopa pere û zêr bi ser bûkê de avêtinê jî kiriye.

23/55 Tacdîn bixwe bûye padîşahek
Mem jî li tenîştê şubhê mahek

Rûniştî di şehînsahê ‘alî
Cem’ek ji ekabîran hewalî

Rabûn li teferrucê vewestan
Wan cumle tebeq di her du destan

Manendê tîbaqê asîmanî
Yaqût û zumurrudê di kanî

Rihtin tebeqê di wê nîsarê
Jor da li ‘emareta Nîgarê

Emma tebeqê di wan hemî pur
Zêr û wereq û cewahîr û dur

Yexmakerê gencê bûne maşa
Xêzan hemî bûne mîr û paşa

Xanî, bi anîna bûkê ya li ser text, -ku Xanî wî textî dişibîne textê melîkeya Sebeyê, Belqîs- şahiya dawetê digihîne asta herî bilind. Xanî, di vê beşê de teswîrên wilo kirine ku, di bajarê Cizîrê de li pêş her malî, li her kolanî şahiyekê hatiye lidarxistin û gel bi vê şahiyê sermest e.

23/45 Sofî û mela û feqîr û paşa

Vêkra li teferruc û temaşa

Xelqê ku ji dest xeman biferyad

Ferdeq qe nema nebûyî dilşad

Her ber derekê şemateyek lê

Her mecme'yekê temaşeyek lê

Te di go ku 'erûs 'eynê can e

Lew bûne beden li pey rewan e

Sazan mirî hey kirin wekî Sûr

Kûs û def û kerrena û naqûr

Şabaş û seda û gazegazan

Guhdarî xenî kirin ji sazan

Vêkra ku seda ji wan bider ket

Qesra felekê ku seda bi ser ket

Ev 'eyş û nîşat û şadimanî

Nadîde bi dîdeyan zemanî

Xanî bi van beytan, şahiya dawetê di radeya herî bicoş de teswîr kiriye. Xanî, behsa şabaşiyê kiriye ku, ev kevneşop hê jî di dawetên civaka kurd de heye. Yanî her kesekî, tişteki diyarî dike bo bûk û zavayê û ev bi dengê bilind tê îlankirin û dûre ji alî kesine ve “*şa be filankes şa be!*” tê gotin.

3.2.3. Kevneşopa Mizgîniyê

Di *Mem û Zînê* de, di vê beşa ku qasid di navbera evîndaran de diçe û tê de, faktora *mizgîniyê* dertê pêş me. Wekî ku di nava civakê de jî tê zanîn, mizgînî; anîna

xebera xweş e. Ev agahî dibe ku di navbera du evîndaran de be jî û dibe ku di navbera dê û kur an jî bav û kur an jî di navbera curbecur têkiliyên civakî de be. Bi piranî kesê ku mizgînê tîne, tê xelatkirin. Mizgîn, bi piranî bi vê îfadeyê tê neqilkirin: *Mizgîn li te! Mizgîn li we!* Yan jî carina wiha tê gotin di nava civakê de: *Mizgîna min bide! Mizgîna min bidin!* Li vê derê xebereguhêz, beriya ku xebera xwe neqil bike, diyariya ku wê bidinê dixwaze hîn bike û wergire.

Zeynelabidîn Zinar, ji bo kevneşopa mizgîniyê wiha gotiye:

“Mizgîn: Peyveke pir xweş e ku pê dilê mirovan vedibe, mirov pê gelekî şad dibin û xweş û hêsan dimînin. Dema ku tavilek ji bo tiştêkî tê kirin, piştî demekê yek xeberê dide ku ew tişt bi hêsanî çêbûye, yan rûdana xirab ku hatibû bihîztin ne wisan e, hingê mirov pê şad û bextewer dibe.”²¹⁷

Di *Mem û Zînê* de, motîfa mizgînê, di beşa ku Heyzebûn di navbera evîndaran de diçe û tê, derdikeve pêş me.

20/10 Ew mujde ewan dema kirin gûş
Yekcari ji şahiyên nema hûş

21/32 Rabe here zû bibêje Tacdîn:
Ger dê te Sitî bivê, Memê Zîn

Mizgîn ji we ra me hûn qebûl in
Em jî ji we zêdetir melûl in

22/4 Ew daye ji rengê Erestetalîs
Ser ta bi qedem lîbasê telbîs

Dîsan ketî sûretê tebîban
Hadir xwe gîhande nik hebîban

Ew mujde wekî me gotî got in
Ew sotî wekî nesotî sotin

²¹⁷ Z. Zinar, *Şaxên Zanistiyê*, r. 123

22/11 Gava ku ewan bihîstî mizgîn

Hay dan bi tebayî xelq û xwezgîn

Xanî jî wekî ku di çanda gelêrî de derbas dibe, mizgîniyê wekî dayin an jî anîna xebera xweş bi kar aniye.

3.2.4. Kevneşopa Nêçîrê

Di dîroka şaristaniyê de nêçîr û nêçîrvanî, hêmanekê ye ku di serdemeke girîng ya mirovahiyê de, cihekî wê yê taybet heye. Wekî ku tê zanîn, zanyar û dîrokzan dema ku li dîroka mirovahiyê kolane, dîtine ku di di serdemekê de mirovan jî weke hin heywanên ku hê jî bi wî rengî jiyana xwe didomînin, jiyana xwe û komên xwe bi nêçîr û nêçîrvaniyê berdewam kirine. Ji vê serdemê re, di termînolojiya zanyariya dîrokê de, Serdema Nêçîrvanî û Berhevkirinê hatiye gotin. Bi kurtî beşeke girîng a karên jiyane, derketina nêçîrê bûye. Lewre hê mirovahî ji her cure çandinî re ne aşîna bûye. Bi karên nêçîrê re, bi piranî mêr û bi berhevkirinê re jî jin peywirdar bûne. Ji ber ku mêr, demeke pir dirêj li derveyê warê xwe derbas dikir, di têkiliyên jiyane de giraniya jinê hebûye. Lewre ji vê serdemê re ji aliyekî dî ve, dewra Maderşahî (Ana Erkîl) jî hatiye gotin.

Ji ber ku di berdewamkirina jiyane de, nêçîr an jî xwarina goşt, xwedî girîngiyê jiyane bû, ev kar ji alî civakê ve bi cîdiyeteke mezin dihate kirin. Lewre ji bo ku di vî karê de bi ser bikevin, ew tevî çekên xwe yên bihêz û bi rengekî komî, bi hev re derdiketin nêçîrê; da ku bikaribin têrî malbatên xwe, têrî klanên xwe xwarin peyda bikin. Lê vegera ji nêçîrê –ji ber ku bi gelek xwarin û goşt vedigeriyan- bi kêf û şahî, bi reqş û govend û stran, yanî bi rengê merasîmeke şahiyê pêk dihat.

Her çendî ku dûre nêçîr û nêçîrvanî di jiyana civakan de, ji pêdiviyê jiyane bêhtir vegeriya kêf û şahiyekê jî, ew xusûsiyeta wê ya merasîmî –ku ev yek mijara folklorê ye- hîç hunda nebû. Bi taybetî li derdora mîr, beg û serdaran ev, her sal di demeke destnîşankirî de, li dû wî rûhê kevnar dihate îcrakirin.

Di *Mem û Zîna* Xanî de jî em rastî dîmenên pir zindî yên merasîma nêçîrvaniyê tên. Nêçîr bi fermana misoger a Mîr dest pê dike.

36/17 Mîrê ku felek mutî'ê ferman

Go: "Sibhê nebûyî qewmê Bohtan

Rabestî sîleh û gurz û şimşîr

Bîlcumle digel me bêne nêçîr

Hadir nebitin kesek di seydê

Ew dê bimirî di bend û qeydê

Wekî ku em di van beytan de dibînin fermana Mîr, li gorî wê cîdiyeta rûhê nêçîrê yê kevnar, teqez e. Mîr ferman dide ku, kî vê fermanê bi cih neyne, dê bi kuştinê bê cezakirin. Her wiha amadekariya nêçîrê bi çek û sîlehên wê demê ne. Li ser vê fermanê, Xanî amadekariyên Cizîriyan wiha teswîr dike:

36/20 Xelqê ku heta bi subhê kazib

Hadir kiribû bîsat û ratib

Fecrê ku numaye wan 'elamet

Rabû di wî şehîrî da qiyamet

Mêran vekirin 'uqab û bazî

Şêran dibirin piling û tazî

Dirende û adem û behaîm

Ferdeq qe nema di şehîrî qaîm

Dam û ded û ademî û heywan

Tifl û sebî, aşvan û rezvan

Elqisse qebîleya rîcalan

Fîlcumle kesek nema di malan

Xanî, li ser şêweya seydê jî agahiyan daye. Diyar kirye ku, ew di seydê de li kêleka çek û sîlehên wê demê, heywanên wekî qertel, baz û tajiyan bi kar tînin.

Xanî piştî ku der bareyê xwezaya Botanê ya wekî bihiştê de agahî dide, behs jê dike ku çi cure heywanên ku tên nêçîrkirin di wê xwezayê de dijîn.

36/13 Xergûş û xezal û gur û ahû

Ew qaz û quling û kebk û teyhû

Ker ker diçêrin li kûh û deştan

Ref ref difirîn di nêv bihiştan

Elqisse bi îqtîda zemanî

Bû fîrsetê 'eyş û kameranî

Fesla bigerin li geşt û seyran

Nêçîrî bikin ji wehş û teyran

Xanî, xwezaya Botanê wekî bihiştê teswîr kiriye û behsa heywanên ku di nava vê bihiştê de dijîn kiriye.

Xanî, dîmenên nêçîrê bi rengekî pir dînamîk û dewlemend teswîr kiriye.

36/26 Bû heşirgehek li seydigahan

Şefqet nekirin li bêgunahan

Ewçendi ji wehşiyên dikuştin

Goya ku wuhûşî qet nehiştin

Dirende, dewende û perende

Hin kuştî û girtî, hin fikende

Çapikhereket û nûciwanan

Wan faris û gurd û pehlewanan

Dirende dirandibûn bi şîran

Perende birandibûn bi tîran

Mehbûbê mîsalê şehlewendan
Merkeb'ereban xwedankemendan

Çoganî di dest digel gopalan
Havêtine gerdenêd xezalan

Ew şêresiwar û bebrê cengî
Xwûnî kiribûn belek pelengî

Ew çendî xezal ewan kirin seyd
Ew çendî piling ewan kirin qeyd

Êdî nedişîn digel xwe bînin
Belkî nedişîn ji cih hilînin

Kuşî ji xwe ra birin feqîran
Girtî bi xwe ra birin emîran

Dema ku em li teswîra Xanî ya xwezayê û heywanên ku hingê di wê xwezayê de dijiyan dinihêrin, em têdigihên ku wekî ku Ewliya Çelebî jî di Seyahatnameyên xwe de dibêje, hingê xwezaya Kurdistanê bi gelek daristanan ve tijî bû û li cihên wiha, pir bi ihtîmal e ku ev cure perinde û dirindeyên ku Xanî dibêje, dijiyan.

Di beyta dawî de, bi renekî balkêş em têdigihên ku, ev nêçîr bi rastî ji bo mîr û began bi tenê kêfekê bû lê ji bo xizanan ew hê jî bi wateya xwe ya dêrîn, pêdiviyeye girîng bû. Lewre heywanên ku tîn kuştin, bo ku goştên wan bixwin feqîr ji xwe ra dibin lê mîr û beg jî, ji bo ku renekî tevli jiyana wan bike, bi tenê yên girtî (zindî) dibin.

Xanî vegera Mîr û maiyeta wî ya ji nêçîrê, wiha teswîr kiriye:

40/13 Mîr hat li ser wî hinde 'esker
Surma û nefîr û kûs û mehter

Dadî li teblexan û sazan
Çawûş û seda û gazegazan

Pabende bi işqê her du ceyran
Dermande ji pêşê yek ve heyran

Qet seh nekirin ku ev çi reng e
Qet guh nekirin ku ev çi deng e

Mîr go: “Vekin evan xezalan
Pabende mekin evan şepalan

Têk berdine baxî wan wekî teyr
Da em bikin hero li wan seyr

Di van beytan de Xanî diyar kiriye ku, her çendî ku Beg û leşkerên wî, bi hay û hoyeke mezin, bi qelebalixeke mezin ku ji dengê dehol û zirnê û mehter û kûsê pêk tê, ji nêçîrê vedigerin jî; Mem û Zîn ji evînê ew çend sermest bûne, ji xwe ve çûne ku, haya wan hîç ji hatina wan çênebûye, hîç ew deng seh nekirine. Lewma Mîr li veqera nêçîrê bi ser wan de hatiye.

3.2.5. Di Mem û Zînê de Şîn

Motîfeke sereke ya ku di çîrok û destanan de dertê pêş me, mirina lehengan û bi vê rewşê ve girêdayî, kevneşopa şînê ye. Bûyera mirina leheng di zikê xwe de li du beşên girîng vediqete. Yek jê mirin bi xwe ye ku ev di avahîsaziya çîrok an jî destanê de motîfekê teşkîl dike, ku em di beşa Motîfa Mirinê de li serê sekinîne û ya dî jî şîna ku li dû mirina leheng tê lidarxistin e. Ev yek jî ji aliyê çanda gel ve gelekî girîng e. Ji ber ku, di şînê de em li gelek hêmanên maddî-manewî yên çandî rast tên.

Folklornas Erman Artun, li ser şînê wiha nivîsiye:

“Li dû bûyera mirinê şîn tê girêdan. Dirêjahiya vê şînê, li gorî faktorên dînî, kevneşopî û civakî tê tesbîtkirin. Şîn, li gorî xizmantî, rengê mirinê, temen û yên tèn sersaxiyê, tê diyarkirin. Di dirêjahiya vê pêvajoyê de, karên nîzamî yên berê nayên kirin. Di şînan de cilên rengîn nayên lixwekirin, xemil nayê kirin û merasîmên kêf û

şahiyê (dawet, sunnet, nîşan) tên betalkirin. Eger ku neyên betalkirin jî, ew bêyî merasîm, bi rengêkî bêdeng tên kirin. Di şînan de bi piranî di malan de tê sekinîn.²¹⁸

Dema ku em bala xwe didin jiyana lehengên çîrok û destanan; sê merheleyên girîng ku di avahîsaziya çîrokê de xaçerêyên girîng an jî kêliyên şikestinê yên çîrokê teşkil dikin, dibînin. Di Memê Alana folklorî de jî, em li van xaçerêyan rast tînin. Hatina dinyayê ya Mem, dibe dînamîkeke bingehîn ji bo destanê. Lewma jixwe hikaye ji wê derê dest pêdike. Dûre gihaştina wî ya bi Zînê, an jî li Zînê rasthatina wî, dibe xaçerêyeke di dînamîzma destanê de. Jiyana wî di wê kêliyê de bi tevahî diguhere. Dawî, mirina wî ya trajîk e ku, bi pêkhatina vê merheleyê, çarçoveya destanê êdî tê girtin. Yanî mirina leheng dibe dawîya destanê; ji ber ku, çîrokên mezin an jî çîrokên gelêrî û destan, li derdora jiyana lehengekî teşkil dikin. Ev her sê merheleyên girîng, wateyeke diyarker li ser çîrok an jî destanê pêk tînin. Lewma di nava tesnîfa motîfan a Stith Tohmson de, mirin wekî motîfeke girîng cih digire.

Lê ji alî hêmanên çanda gel ve, ji bûyera mirinê bêtir, şîna ku li dû mirinê tê lidarxistin, girîng e.

Lêkolîner A. Sezer, mirinê wekî xaçerêyeke girîng ya jiyana mirovan dîtîye.

“Di jiyana mirovan de sê demên derbazî hene. Ev sê dewr, welidîn, zewicîn û mirin in. Her yek ji van di zikê xwe de li hin beş û pêlikên jêrîn vediqetin. Li derdora van her sê serdeman, gelekî bawerî, kevneşop, tore, merasim, ayin, hin karûbarên dînî û efsûnî kom dibin. Ev her sê xaçerê, li gorî qalib û hêviyên ku ji çandên ku bi wan ve girêdayîne, bi rêbazeke seza tînin birêxistin.”²¹⁹

Wekî ku em ji vê tesbîtê jî têdigihên, ev her sê serdem û merasîm û adetên ku li derdora wan tînin îcrakirin, ji alî zanyariya folklorê ve gelekî girîng in. Bi rastî destan û çîrokên kurdan bi mînakên ji wan tijî ne. Dema ku em li Destana Siyabend û Xecê dinihêrin, em rastî van her sê merheleyan tînin. Yanî hatina dinyayê ya leheng, zewac an jî evîna wî û mirina wî.

Di *Mem û Zîna* Xanî de, bûyera şîne cihekî gelekî girîng digire. Xanî, wekî ku di gelek beşên di de jî serî li vê rêbazê daye; di beşa şîne de jî wekî ku tiştên di wê şîne de qewimîne ji yekê bihîstibe, dest bi behsa şîna Botiyan dike.

²¹⁸ Erman Artun, *Türk Halkbilimi*, r. 193

²¹⁹ A. Sezer, *M. Mungan ve H. Bilimi*, r. 258

53/1 Ew me'temiyê ku baxeber bû
Ev renga ji bo me newheker bû

Go: "Can ku ji hebsê ten cuda bû
Feryad û fixan ji şehri rabû

Bû welwele û fixan û zarî
Bû zezele û bezîn û hewarî

Bohtan ji mezin heta biçûkan
Nîswan û keç û benat û bûkan

E'yan û ekabir û e'alî
Mîrza û rûwal û laubalî

Yek ferd nema di şehri dilxweş
Bîlcumle di serxweş û muşewweş

Vêkra dibezin bi ser Memê ve
Wan derd birin bi ser xemê ve

Di nava civaka kurdan de, şîn merasîmeke wilo ye ku ne bi tenê bi bûyera mirinê û wê kêliyê re têkildar e. Ew girêdayî hin rêz û resmên dirêj e. Bi giranî hê jî şîn bi sê rojan, wekî ku Xanî jî diyar dike, bisînor in. Lê piştî ku heft rojên mirî diqedin merasimeke dî jî tê kirin û piştî ku çil rojên mirî diqede merasimên dî tên kirin. Her wiha her rojên êvara îne, kes û xizmên mirî diçin ser mezel û jê re duayan dikan, yasîn dixwînin, Quran dixwînin.

Di nava civakê de bi piranî mirina nexweş û extiyaran wekî xelasî tê dîtin. Ji ber ku baweriyê xurt a civakê bi 'dinyaya dî' heye, wilo tesewir dikan ku êş û elemên ku wî/wê li vê cîhanê kişandiye, dikeve ber gunehên wî/wê û ew li dinyaya dî rihetir dibe. Lê her çendî ku mirina extiyar û nexweşan wekî xelasî tê dîtin jî, hemî rêz û resmên kevneşopî tên bicihanîn.

Lê wekî ku Mela Mehmûdê Bayezîdî jî di çarçoveya çanda kurdan de neqil dike, kurd mirina zarok û xortan û her wiha kesên ku pir ji wan hatine hezkirin, qebûl nakin. Digel ku bawer dikin ku mirin ji aliyê Xweda ve tê jî, wekî ku li hember Xweda derên, destê xwe ber bi ezman ve dihejînin, vê mirinê protesto dikin. Bi rastî ev yek, digel ku civaka kurd gelekî bawermend in jî, di nava gel de berbelav e.

Îzedîn Mustefa Resûl, di heqê matema Mem de dibêje ku, Xanî vê bûyera şînê û dawetê nêzî hev kiriye.²²⁰

Bi rastî, ji tevgerên Zînê yên ku di şînê de îcra dike, em têdigihên ku Zîn vê mirinê wekî ku dawet be pêşwazî dike. Heta dikeve cureyeke transê û bi reqis diçe ser cenazeyê Mem.

Îro jî em di nava civaka kurdan de dibînin, dema ku xortekî dimire, bi taybetî ku ne zewicandî be, diya wî – ku vê mirinê qebûl nake- wekî ku daweta xortê mirî be, destê wî hine dike.

Dema ku em van mînakên di çarçoveya derûniya civakê de binirxînin, em dikarin helwestên bi vî rengî wekî protestoyeke li hember mirinên bêwext bibînin. Bêguman ev cure protesto û neqebûlî, bi piranî li dû mirinên neheq û kuştinan pêk tên. Her wiha mirov dikare wekî şîrove bibêje ku, kurd ji ber ku mirinên bi vî rengî qebûl nakin, dikevin rêya heyfstandinê. Eger ku sedema mirinê kesekî dî be, ew muheqqeq heyfa xwe distînin. Û ji ber vê rewşê ye ku, kuştin û doza xwînê di nava civaka kurdan de gelek zêde ye. Her wiha ku sebebê mirinê ne mirovekî be, li dû ‘teqdîra îlahî’ be ev, hingê ew wekî ku bêemriya Xweda bikin, ji Xweda gazinan dikin.

Mela Mehmûdê Bayezîdî li ser şînên civaka kurdan wiha nivîsiye.

“Kurd, ji bo mirina ciwana zêde şînê digirin. Cil û kincên reş werdigrin û serên xwe reş girê didin û jin û keç û xweh, guliyên xwe jêdikin, ew zêde matem û şînê dikin.

Eger mirovek bimire feryad û girîn peyda dibe, îcarê kesên malê radibin yê mirî li cihekî datînin û jinên dengbêj hene, lawjok û siwaro dibêjin û dikine hawar û gazî.

Dema ku mirovekî wan î ezîz û ciwan dimire. Dîsanî dibêjin ku, meazallah,: Xwedê te çi kir? Te filankes kuşt. Bi kurtî tiştên bêemriya Xwedê te’ala zaf dikin.”²²¹

²²⁰ Îzeddin Mustafa Resûl, *Ehmedê Xanî ve Mem û Zîn*, Wer. K. Yıldırım, Weşanên Avesta, 2007, r. 160

²²¹ M. M. Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiyê*. r. 144-145

Wekî ku em dibînin, mirina bêwext û mirina neheq di nava civaka kurdan de nayê qebûlkirin û ev neqebûlî bi rengê mohra xwe li şînê, li mersiyeyên ku di wê merasîmê de tên gotin dixê û dibe sedem ji hin tevgerên protestoyî re.

Lewma em dikarin sedema tevgerên Zînê yên di şîna Mem de li vê yekê şîrove bikin. Lewre di bin wê trans û reqsê de, cureyekî derûniya protestoyê heye.

Xanî di van beytên jorî de têgiha *hewarî*'yê bi kar anîye. Ev têgih ji bo hemî şînê tê bikaranîn. Bi rastî di nava civakê de dema ku tê gotin, *hewarê li dar xist*, an jî dema ku yekê got, *hewar! hewar!* Ev yek tê wateya xwestina alîkariyê. Bi hewara yekî de çûyin, bi mebesta alîkarî an jî xelaskirinê, çûyin e. Lê civakê, ji bo çûyina bi mebesta sersaxî li yekê kirinê jî, têgiha '*hewarî*'yê bi kar anîye. Dibe ku bi vê wateyê be ku; pêdivî bi alîkarîkirina maddî-manewî ya nêz û xizmên mirî ye.

Çawa ku Xanî, di bûyera dawetê, cejna Newrozê û çûyina nêçîrê de, hemî gel îştiraqê van merasîman kiribe, di bûyera mirin û şînê de jî bi heman rêbazî helwest nîşan daye. Yanî di matema Mem de, hemî bajarî tevî hemî tebeqeyên civakî hazir in. Û ew hemî wekî ku Mela Mehmûdê Beyazîdî jî dibêje, bi cil û bergên reş in û her wiha bi feryad û fixan in.

53/29 Hindî ku di şehrê Ademî bûn

Têkde bi **libasê matemî** bûn

Hindî ku hebûn di şehrî meşhûr

Xatûn û muxedderat û mestûr

Gêsûvekirî bi tayê terpûş

Ser ta bi qedem hemî **siyehpûş**

Bê mi'cer û burqu' û serendaz

Reş girtî ji bo Memê dilxwaz

Neyyahe û mîhrebana û dayîn

Goyende bi nale şubhê goyîn

Wan **mersiye** distiran bi aheng

Zîn rabûye pê bi qameta şeng

Nahîdesîfet li **dengê sazê**

Reqqas diçûye ber cenazê

Dam û ded û Ademî û mûran

Dar û ber û camid û tuyûran

Bîlcumle ji bo Memê dinalîn

Her yek bi meqamekî dikalîn

Tulpê reşê wan **siyehpûşan**

Reh şubhteê ‘ewrekî xurûşan

Ew çend ji ‘aridê di gulgûn

Vêkra diwerîn sirişkê pirxwûn

Goya ku di feslê Nûbeharî

Baran li gulşenan dibarî

Ev matem û ev **siyahpûşî**

Ev çarşev û îzar û pûşî

Bohtan wî zemanê kirne ‘adet

Bû resmê qedîmî ta qiyamet

Di van beytên jorîn de, em hemî rengên şîneke ku li dû mirineke nayê qebûlkin e, dibînin. Hemî bajarî bi cilê reş derketine, heta bi leşkerên fermî jî cilên wan reş in, jin cilên ser xwe diqetînin, parçe dikin (ev cure tevger, hê jî di nava civakê de heye. Dibe ku ev jî cureyeke protestoyê be), zêmar û mersiye tîn xwendin û feryad û fixan tîn avêtin û di encamê de Zînê bi xwe, wekî ku ev ne mirin be, wekî ku dawet be, di halê transê de, bi reqis diçe ser cenaze. Di beşa 51an de Zînê, agahiya mirinê wiha pêşwazî kiriye:

51/38 ‘Eqda Sityê çî roje xweş bû
Zînê ji ezel çî bextreş bû

Ne’şê mi bila Sitî digel bit
Tacdîn digel Memê bedel bit

Manendê Memê ji boy î Tacdîn
Tacdîn bi wî re bigêre şoşbîn

Şoşbîn bitin ew digel Memê min
Şahî bitin ew digel xemê min

Zînê, di van beytan de, kehaneta mirina xwe kiriye û xwestiye ku mirina her duyan wekî cureyeke gihaştin bê dîtin û wilo bi rûhê şahiyê bê pêşwazîkirin. Her wiha Xanî cardî bi van beytan, balê bi ser kevneşopa şoşbîniyê ve kêşaye.

Xanî di van beytan de, behsa sedema lixwekirina çarşeva reş ya jinên Bohtiyar kiriye û vê yekê ji baweriyên dînî bêhtir, bi şîna Memê ve girêdaye. Bi rastî îro jî ev kevneşopa lixwekirina çarşeva reş, li gorî herêmên dî yên Kurdistanê bi rengekî bêtir berbelav di nava jinên Cizîriyan de tê dîtin. Ji aliyê folklorê ve em dikarin vê, wekî bawerî an jî efsaneyekê jî bibînin. Yanî bingeha vê kevneşopa reşgirêdanê, ji wê efsaneyê tê ku; ji mirina Mem û vir ve jinên Cizîrê her xwe reş girêdidin.

Xanî di beytên jorîn de diyar kiriye ku, mirina Mem ew çend bûyereke nayê qebûlkirin e ku, ji vê êşê, dar û ber, kevir û teyr û tiyûr heta bi kurmoriyan dinaliyan. Ev reng mubalexa an jî rêbaz, di nava civakê de wekî biwêj jî heye. Mîsal tê gotin ku; *çiya bi halê wî giriya, an jî kevir bi halê wî giriya* û hwd...

Xanî, wekî ku di merasîmên dî yên civakî de jî balê kişandibû serê; di şîna Mem de jî diyar dike ku hemî beşên civakê tevli vê şîne bûne.

55/13 Cindî û sîpahî û emîran
Derwêş û re’îyye û feqîran

Dildar û şepal û nazenînan
Hûrî û perî û xemrevînan

Vêkra dikirin hewarî her kes
Efxan digihane Çerxê Etles

Di van beytan de Xanî, di heqê avahîsaziya civakê de jî agahî dane. Di nava civakê de beşên mîna; leşker, begzade, derwêş, feqîr û hemwelatîyên sade hene.

Mirina Zînê bi renekî derasa pêk tê. Ew ji pêş de kehanet dike ku ew ê jî bimire û wesiyeta xwe dike da ku, mirina wan wekî dawetekê bi şahî bê pêşwazîkirin û ji Mîr dixwaze ku wê jî li nik Mem defin bike. Ew, dema ku li ser cenazeyê Mem, bi Mem re diaxive jî vê yekê tîne ziman û demekê bi şûn de dimire. Ji aliyekî ve ev mirin dişibe cureyeke xwekuştinê jî ku di gelek çîrokên gelêrî û destanan de derdikeve pêş me. Yanî dema ku ji du lehengan yek jê dimire, yê/a dî jî li ser cenazeyê wî/wê dimire. Wekî ku Xecê, li ser mirina Siyabend, di çiya de de xwe diavêje û ew jî dimire.

Piştî mirina Zînê, li ser wesiyeta wê Mîr, gora Mem ji nû vedike û Zînê li kêleka wî defin dike. Her du evîndaran li kêleka hev veşartin, motîfeke girîng e di zargotinê de. Lê di *Mem û Zînê* de bûyera orjînal ew e ku, gora Mem ji nû tê vekirin û her du di yek gorê de tîne defînkirin. Di vê kêliyê de bûyereke mûcîzeyî pêk tê ku Xanî wiha îfade kiriye.

55/51 Ew her du guher di durcekê da
Ew şems û qemer di burcekê da

Bê wasîte wan kirin muqarin
Bê fasîle ew bi hev siparin

Hasil vekirin ji nû ve sendûq
Mîr gote Memê: Ji bo te me'şûq

Sê carî ji qalibî seda hat
Awazî bi lefzê “merheba” hat

Hemyan ku bihîstî sîrrê tehqîq
Bîlcumle kirin bi îşqê tesdîq

Bêguman ev reng definkirin û ji gorê de dengdana yekê mirî, ne li dû rêz û resmên dînî ne û her wiha di baweriya dîn de cihê wan tune ye. Lê ev mirin û negihaştina hev a Mem û Zînê li ser rûyê cîhanê, hem ji civakê re û hem jî di dawiyê de li Mîr, ew çend giran hatiye ku, li dijî rêz û resmên dînî be jî, wan her duyan xistine heman qebrê. Her wiha Memê mirî, bi regekî mûcîzeyî bi hatina Zînê, deng daye û “*merheba*” gotiye. Bêguman ev rewş giraniya trajediya mirina Mem û Zînê nîşan dide û her wiha bandora wê ya mezin a di nava gel de nîşan dide.

Xanî diyar kiriye ku, şîna li dû mirina Mem û Zînê, sê roj û sê şevan bi girîn û feryad berdewam kiriye lê tesîrên wan mirinan heya qiyametê wê dewam bikin.

55/46 Sê roj û sê şevan ferşê xebra

Peyweste diçûne ‘Erşê E’la

Sê roj berdewamkirina şînan, di roja îroyin de jî bi heman rengî ye. Şîn di dawiya roja sisiyan de tê rakirin. Lê hin rêz û resmên li dû mirî, di rojên dî de jî dewam dikin. Wekî piştî mirina wî di êvara îna ewil de çûyina ser gorê, di qedîna hefteyê û çil rojan de çûyina ser gorê û hin wecîbeyên dînî pêkanîn.

3.3. DI MEM Û ZÎNÊ DE KEVNEŞOPA HEKÎMIYA GEL

Ji destpêka mirovahiyê û vir ve, ji ber ku mirov hertim bi xwezayê re di nava têkiliyêke pir alî de bûne, hem bela û nexweşînan hatine serê wan, wekî ji xwezayê hatibin hizir kirine û hem jî di çareya başkirin û sererastkirina bela û nexweşînan de, serî li xwezayê dane. Ev reng peywendiya pir alî, rê lê vekiriye ku mirov di encama ceribandinan de fêr bikin ku, hin giya an jî fêkî an jî hêmanên xwezayê (wekî ax, kevir, av, dar û ber) ji hin nexweşînan re baş tînin û hinên di jî zirarê didin tendurustiya mirov.

Bêguman ev serencam, di proseseke hezaran salî de derketiye û lewma baweriyeke zexm a mirovan bi wan ve çêbûye. Heta ev bawerî ew çend zexm e ku, îro jî digel ev çend pêşketinên di zanista bijîşkiyê de jî, hê jî mirov vê zanyariya kevnare wekî tîba alternatîf bi kar tînin û ev li gelek deran tê qebûl kirin.

Ev cure hekîmî, ne tenê bi tedawiyan nexweşînan maddî re eleqedar bûye, her wiha bi tedawiya hin nexweşînan rûhî-derûnî re jî eleqedar bûye û sêr û efsûn hatine bikaranîn. Di nava civaka kurdan de, ji bo tedawiya hin nexweşînan bi vî rengî, çûyina ser ziyaret an jî hin mekanên pîroz û an jî nivîşt bi xwe ve kirin, divê di vê çarçoveyê de bê nirxandin. Di vê nuqteyê de li derdora têgiha ‘*hekîmiya gel*’, baweriyên dînî-ayinî yê civakê û ceribandinên wan ên xwezayî dikevin nava hev û ji vê têkiliyê, kevneşopeke wiha ku hêmaneke girîng a çanda gel e, dertê.

Pertev Naili Boratav li ser vê mijarê wiha gotiye:

“ Dema ku îmkânê gel nîn in, yan jî ji ber hin sedemên di ku dibin asteng ji çûyina wan a bijîşk re an jî ew naxwazin biçin bijîşk; bi armanca teşhîs û tedawiye, ji hemî rêyên ku serî lê tînin dayin re, em ‘*hekîmiya gel*’ dibêjin. Ji vî aliyê ve, têgiha ‘*nexweşîne*’ ji awayê ku em dizanin gelek berfirehtir e. Ji nexweşîne, divê em ne tenê kêmahiyên rewşên tenduristiyê fêm bikin. Li vê derê têgiha ‘*nexweşîne*’, ji qisiriyê/bêberiyê heya bigire bi nezerê, ji bandorên nebaş ku dikarin ji mirovan bînin heya bi seqetiyên/kêmahiyên ku ji heyinên derveyê xwezayê (cin-perî) dibin sedem û gelek cure nelirêtiyan, digire nava xwe.”²²²

Di termînolojiya folklorê de ji vê kevneşopê re, hekîmiya gel hatiye gotin. Lê pirî caran ji vê kevneşopê re di nava gelek civakan de, wekî ew kesê ku bi vî îlmê re eleqedar e, Loqmanê Hekîm hatiye gotin. Di nava civaka kurdan de, hem têgiha

²²² Vghz. A. Sezer, *M. Mungan ve H. Bilimi*, r. 225

Heqîmê Loqman û hem jî têgiha ‘*Dermanê Kurmancî*’ an jî ‘*Dixtorê Kurmancî*’ bi berfirehî tê bikaranîn.

Her wiha di nava gel de, li ser Hekîmê Loqman û Şahêmaran gelek efsane hene. Di beşa Motîfên Mîtolojîk de, di binê sernava Şahêmar de em bi berfirehî li ser vê Efsaneyê Hekîmê Lokman û Şahêmaran sekinîne.²²³

Têkiliya di navbera maran û dermanan de gelekî balkêş e. Digel ku mar, ji bo mirovan heyinên kujende ne jî, di zanyariya tibê de tê gotin ku, dermanê herî pêşîn, ji jehriya mar hatiye çêkirin. Dema ku em di çarçoveya vê rastiyê û Efsaneyê Hekîmê Loqman û Şahêmaran û bûyina sembolekê a mar di tîba modern de binihêrin; têkiliya hekîmiya gel û tîba nûjen jî bi aşkerayî xuya dibe.

Wekî ku em ji van agahiyên jorîn jî derdixin, di bunyeya kevneşopeke wiha de, gelek hêmanên çanda gel wekî, efsane (Hekîmê Loqman û Şahêmaran), zanîna xwezayê (dermanên ji nebatan û ji jehriya maran) û baweriyên gel (sêr, efsûn, ziyaret û nivîşt) civiyane. Ev taybetmendî di heman demê de, taybetmendiya folklorê bi xwe ye.

Di *Mem û Zîna* Xanî de, em li hin deran rastî hem têgiha Hekîmê Loqman û hem jî agahiyên der bareyê başkirina hin nexweşîyan de tên ku, em dikarin wan di çarçoveya hekîmiya gel de hêlengînin.

19/33 Rabû ve ‘ecûze şubhê Luqman
Ser ta bi qedem dewa û derman

Qarûre û huqqe, nişter û kîs
Hilgirtin ewa xebîsê telbîs

Dayî paxila xwe çend kitêbek
Dinima bi hekîmekî ecêbek

Vê teswîra ku Xanî dike, her çendî ji gelek aliyan ve dişibe bijîşkê modern jî, divê em bîr pê bînin ku, Luqmanê ku Xanî behsa wî dike, ew kesê ku hê ji kevneşopa hekîmiya gel îlham distîne ye. Her çiqasî neştera wî, kitêbên wî hebin jî ew hê jî ne bijîşkê nûjen e; ew Hekîmê Luqman e. Di van beytên jêrîn de, der bareyê tedbîrên li ser nexweşînan de, hîn bêtir agahî tên dayin.

²²³ Bnr. Motîfên Mîtolojîk, Şahêmar, r. 197-199

35/29 Ey dil te xwe daye ber hewayê
Qesda te ew e bikî sefayê

Emma ji tebîbê işqê sadiq
Min zaniye bo te ra muwafiq

Perhîz e ji qismê muştehatan
Teqwa ye ji van mulezzezatan

Herçî ku muxalifê hewa ye
‘Eynê wî ji bo te ra şîfa ye

Min pirsîye bêguman ji Luqman
Xasiyyetê şerbetan û loqman

“Herçî ku şîrîn e ‘eynê da ye
Herçî we ku tehl e ew dewa ye”

Di van beytên jorîn de em dibînin ku, Xanî hin zanînen kevnar ku di hafizeya gel de ji bo hin nexweşînan hene, bi bîr tîne. Xanî dibêje ku, ji bo kesên bi nexweşîna evîne ketine, ya herî baş ew e ku, xwe ji daxwazên nefsa xwe dûr bixin û çî tiştên ku li dijî daxwazên nefse ne, xwe nêzî wan bikin.

Xanî zanîneke dî ya girîng ku hê jî di nava gel de heye bi bîr tîne û dibêje; her çî tiştê ku şêrîn in ew zerar in ji bo bedena mirov û her çî tiştê ku tehl in, ew bi fayde ne. Îro ev rastî bi tehliya tahma dermanan jî di nava gel de tê bibîranîn.

Xanî di beşa 50yî de di heqê halê dînbûnê û tedawiya wê de agahiyeke kevnar daye.

50/7 Zanî ji hekîmekî mi bi tedbîr
Dîwane dewa dibin bi zincîr

Wekî ku me li jorê jî agahî dabû; ev cure hekîmî, ne bi tenê li nexweşînên maddî/bunyeyî dinihêre, her wiha di nava têgiha nexweşîna vê çandê de, gelek halên mirovî yên derûnî û rûhî hene ku ev jî dikevin nava vê têgihê.

Xanî di vê beyta jorîn de -her çendî ku tedawiyeke nerast be jî- balê bi ser rengê tedawiya dînbûnê ve dikişîne. Li gorî vê zanînê; yên dînbûyî, bi lizincîrxistinê, tên tedawîkirin. Pir bi ihtîmal e ku Xanî jî dixwaze şaşiya vê tedbîrê bîne ziman; lewre wî vê rastiye ji devê Mîrê ku, li hember evîna Mem û Zînê di nava şaşıyan de ye û Mem avêtiye zîndanê, aniye ziman.

Di beşa 45an de Xanî, giyayekî ku ji dewrên berê ve di tedawiya hin nexweşînan de tê bikaranîn, bi bîr aniye.

45/7 Ew rengi de'îf û jari bûbû
Goya ku bi cismê tarê mû bû

Ew mû geriya ji ze'feranî
Teşbîhê bi rengê rûyê Xanî

Giyayê Zaferanê, di hekîmiya kevneşopî de gelek hatiye bikaranîn. Ev giya ji bo bihêzkirina qelb, vekirina rengê rû, vekirina damaran û bilindkirina şehwetê hatiye bikaranîn. Xanî di van beytên jorîn de di navbera rengê rûyê xwe û yê Zînê de bi rêya giyayê Zaferanê teşbîhekê çêkiriye.²²⁴

Xanî di beşa 52yan de cardî balê bi ser motîfa Hekîmê Loqman kişandiye.

52/57 Ger teşneyî ev he abê heyewan
Ger xesteyî hate ser te Loqman

Xanî di vê beyta jorîn de, li ser nexweşiya Mem a di zîndanê de, têgihên mîna ava heyatê –ku motîfeke gelekî kevnar û girîng e di wêjeya gel de- û Hekîmê Loqman bi hev re bi bîr anîne. Li gorî efsaneyekê, Hekîmê Loqman ava heyatê dîtiye -ku li gorî baweriya gel; yê ku wê avê vexwe nemir dibe- lê dûre cihê wê hunda kiriye. Xanî di vê beytê de di nava hev de balê bi ser çend hêmanên folklorî ve kişandiye.

²²⁴ K. Yıldırım, Mem û Zîn, Çeviri ve Kavramsal Tahlili, r. 336

3.4. DI MEM Û ZÎNÊ DE LÎSTIKÊN GELÊRÎ (REQS Û GOVEND)

Lîstikên gelêrî an jî reqs û govend, di çanda maddî-manewî ya gel de xwedî cihekî pir bi qîmet in. Bi salên dirêj têgiha folklorê ku tê wateya ‘zanista gel’ û ji zimanê ewropiyan ketiye zimanê kurdî û tirkî, di wateya lîstikên gelêrî an jî govendê de hatiye bikaranîn. Tevî ku şaşiyeke berbiçav e jî ev, em dikarin vê şaşiye li girîngiya lîstikên gelêrî ya di nava folklorê de şîrove bikin.

Li ser bingeha lîstikên gelêrî û govendan, hin lêkolîn hatine kirin lê li ser wateya wan, di nava cîhana zanistî de, agahiyên kûr û taybet nîn in. Hin zanyaran, bingeha lîstikên gelêrî bi ayinên dînî ve girêdane û hin kesan ew bi kevneşopa nêçîrvanî û çandiniyê ve girêdane.

Zanyar Erman Artun der bareyê lîstikên gelêrî de wiha dibêje:

“Bingeha lîstikên gelêrî diçe heya bi mirovên pêşîn û jêdera wan çanda efsûnê ye. Beriya ku derkevin nêçîrê reqs û govenda ku bi hev re dikirin, baweriya wan a ji xwe zêdetir dikir û bi vî rengî li hember nêçîrê hîsa serketinê bi dest dixistin. Di van lîstikên kevnar de, lîstikvanan destên xwe li hev dixistin, lingên xwe li erdê dixistin û bi vî rengî ahengekê di nava xwe de çêdikirin. Ev yek bûye jêdera reqsên pêşîn.”²²⁵

Zanyar Emin Avşar jî balê bi vê ‘*hîsa serketinê*’ xistiye û wiha gotiye:

“Yên ku di şertên pir dijwar ên çiya de dijiyan, diviyabû ku bawerî û hîsa ewlehiyê bidin derdora xwe û bi vê rêyê, yanî bi rêya hin tevgerên ku em îro wan wekî reqs û govend binav dikin, ‘*hîsa serketinê*’ diafirandin.”²²⁶

Bêguman ev tehlîl, temasî hin xalên girîng dikin. Lê ku em ji aliyekî dî ve lê binihêrin, dema ku em bala xwe didin lîstikên gelêrî yên civaka kurd, em têkiliyeke xurt di navbera lîstikên gelêrî û perwerdeya civakî de dibînin. Heta ev cure lîstik, dûre wekî merasîmên teatral jî derketine meydanê. Ev her du hêmanên çanda civakî; tîyatro û lîstikên gelêrî bingeha xwe, ji pêdiviya perwerdeyê ya civakê ku endamên xwe ji çandinî, nêçîrvanî û hin xetereyên jiyanê (bi xwezayê re têkildar) re hazir dike, digirin.

Gelek lîstikên gelêrî yên civaka kurdan, di heqê çandiniyê û awayê çandiniyê de, der bareyê nêçîrvanî an jî parastina keriyên heywanên xwe li hember dirindeyan de, agahî didin me.

²²⁵ Erman Artun, *Türk Halkbilimi*, r. 325

²²⁶ Vgz. A. Sezer. *M. Mungan ve H. Bilimi*, r. 230

Her wiha dibe ku lîstikên gelêrî di herî destpêkê de, beriya ku axivîn hêmana esas a komunîkasyona di navbera mirovan de be, wekî cureyeke têkiliya di navbera mirovan de derketibe meydanê.

Bi kurtî di lîstikên gel de, em li şopên merasîmên ayinî, şopên kevneşopa nêçîrvanî û çandinî û şopên awayên perwerdeya gel û tiyatroyê rast tên. Ji bo dîtî û têgihîştina van şopan, pêdivî bi lêkolîneke hûr bi ser van lîstikan û tevgerên di van lîstikan de tên îcrakirin, heye. Lewra di nava pêlên demê de, di formên wan de gelek guherîn pêk hatine.

Di *Mem û Zînê* de pir bi belavî nin be jî, di hin cihan de lîstikên gelêrî dertên pêş me. Bi taybet di daweta Tacdîn û Sitîyê de, behs ji wan hatiye kirin. Bi taybetî behsa govend, berîte, reqs, sema û çerxê hatiye kirin.

Govend: Di dawetan de lîstika herî populer e. Bi regekî komî tê îcrakirin. Dawet bi govendê dest pê dikin û dûre derbasî lîstikên dî dibin. Di vê lîstikê de, stranên gelêrî jî bi regekî bi hev re tên gotin.

Berîte: Bi taybetî di nava xwendevanên medreseyê de populer e. Bê saz, bi tenê bi stranê re tê îcrakirin. Bi gelemperî di merasîmên îcazetên medreseyan de tê lîstin.

Reqs: Bi giştî ji dansa ku kesekî an jî du kes li hember hev îcra dikin re hatiye gotin. Di vê cureyê de, bi rêya tevgeran, komunîkasyoneke xerîb di navbera her du lîstikvan an jî lîstikvanekî û yên dî de dertê.

Sema: Ji kevneşopa lîstikên gelêrî yên kurdan bêtir, di çanda Mewlewiyan de heye û cureyekî dansa tesewûfî/dînî ye.

Çerx: Cureyeke Semayê ye ku semazen, li ser lingekî li dora xwe dizivire.

Di *Mem û Zînê* de di van beytên jêrîn de behs ji lîstikên gelêrî hatiye kirin.

23/71 Bêrîte, sema û saz û govend

Şîrîn û şekerleb û şekerxend

46/28 Bohtanê bikine reqs û govend
Da bêne temaşêê şekerxend

47/6 Kêşane derî bi reqs û bazî
Rexşê 'Erebî semendê tazî

51/17 Da vêk bikevin li min şekerxend
Têkda bihejin bi reqs û govend

53/34 Wan mersiye distiran bi aheng
Zîn rabûye pê bi qameta şeng

Nahîdesîfet li dengê sazê
Reqqas diçûye ber cenazê

3.5. DI MEM Û ZÎNÊ DE MUZÎK

Muzîk hêmaneke girîng a çanda gel e. Ji ber ku di gelek merasîman de, wekî dawet, sunet, merasîma nêçîrê, cejna Newerozê û hwd. parçeyeke girîng û tamamkar e, di folklorê de jî cihê wê taybet e.

Wekî ku tê zanîn, di çanda kurdan de ji alî muzîk û her wiha zargotinê ve, hêmana herî girîng, kevneşopa dengbêjiyê ye. Digel ku di *Mem û Zînê* de, em di heqê çanda dengbêjiyê de rastî tu agahî nayên jî, ne dûrî ihtîmalan e ku Xanî vê destana mezin ji dengbêjan bi xwe bihîstibe. Jixwe ew di gelek beşên *Mem û Zînê* de, vê yekê bi bîr tîne ku wî destanê ji yekê bihîstiyê û bi her munasebetê, bi pênaseyeke cuda wî tarîf dike.

Di *Mem û Zînê* de, di gelek beşan de behsa muzîk û hin amûrên muzîkê hatiye kirin. Her wiha wekî motîfeke çandî û mûsikî, behsa mitribên ku di dawetan de muzîkê îcra dikin û stranan dibêjin jî hatiye kirin.

Lê bêguman gelek ji van hêmanan, ne hêmanên çanda civaka kurdan ên xwerû ne. Ew temsîla rûhê muzîkê ya dewra Xanî dikin.

Di *Mem û Zînê* de wekî amûrên muzîkê, behsa van amûran hatiye kirin. 1-Ney. 2-Qanûn. 3-Çeng. 4- Rebab. 5-Def. 6-Kûs. 7-Ûd. 8-Tenbûr. 9-Ceres û Zebanê Ceres. 10-Muxnî. 11-Kerrena. 12- Naqûr. 13-Saz

Ev cure amûrên muzîkê, di beytên jêrîn de bi vî rengî derbas dibin:

60/30 Ney bûme di ‘alema neyistan

Mey bûm ne bi destê meyperestan

Gava ku te ez birim ji sazî

Ne dengê di min hebû ne gazî

58/7 Ew ney ne helal û ne heram e

Bêperdeya lê ne bêmeqam e

7/32 Bê deng ji xewrê dil bi **aheng**

Sed reng seda bidim wekî **çeng**

15/13 Manendê dehanê yari dilteng

Nalîn ji reha dilî wekî **çeng**

7/33 Manendê **rebabê** bê **kemañçe**
Deng bê ji **defa** me bê tebañçe

Zuhre bibihit newayê uşşaq
Reqqasî bibit li ewcê neh taq

Sazê dilê kul bi **zîr** û **bem** bit
Sazendeê işqê Zîn û Mem bit

7/23 Saqî! bide min şerabê gulgûn
Bê dengê **def** û sedayê **qanûn**

22/29 Mîr go: Bîqutin **def** û **rebaban**
Bînin hemî şerbet û şeraban

22/61 **Ramûşger** û **xweşnewa** û **xweşdeng**
Şayeste û xweşqumaş û xweşreng

22/62 Hevdeng hinek bi sewtê **sazan**
Hemrengî hinek bi fexr û Nazan

22/63 **Muxnî** û **kemañçe** û **ûd** û **tenbûr**
Çeng û **def** û **surena** û **sentûr**

38/22 Tenha ku xwe dî berek di bes bû
Ew sengî, **zebaneê** **ceres** bû

38/23 Dem dem we dida li **defê** mermer
Bî şubhe dilê beran dibû ker

23/49 **Sazan** mirî hey kirin wekî sûr
Kûs û **def** û **kerrena** û **naqûr**

42/17 Barê li cemazeê ne bes bû
Xemmazî di merteba **ceres** bû

40/14 Dadayî li teblexan û **sazan**
Çawuş û seda û gazegazan

23/50 Şabaş û seda û gazegazan
Guhdarî xenî kirin ji **sazan**

51/32 Îhsan ke tedarik û cîhazan
Hadîr bike **mitriban** û **sazan**

Di van beytên jorîn de, em ji zanîna kûr a Xanî der bareyê muzîk û amûrên muzîkê de, agahdar dibin. Lê ji vê yekê girîngtir, di beşa 42yan de dema ku Xanî, bi hin gotegot û hesûdiyan re têkildar, rewşa Mem û Zînê ya di nava gel de tîne ziman, serî li rêyeke gelekî serkeftî û balkêş dide ku, ev rêbazeke orjînal a Xanî ye. Xanî rewşa ku Mem û Zîn tê de ne û gotegotên di nava gel de, bi muzîk, newa û amûrên muzîkê wiha rave dike:

42/10 Razê di dilê Mem û Zînê
Sazê ku di perdeyha evînê

Hindî negihîştibû zebanan
Nedibû çu ziyar ji bo xwedanan

Midrabê zebanê xelqê nasaz
Bêperde ku bû terane perdaz

Zînê ne guneh, Memê ne sûcek
Agahî kirin buzurg û kûçek

Zengil bi deva gihanve zengûl
Meftûlî enamilan ji merxûl

‘Uşşaqî hezîn û bênewa bûn
Xel teşneê Husyenê Kerbela bûn

Meclîs bi newayê zîr û bem bûn
Memlû’ ji hewayê Zîn û Mem bûn

Barê li cemazeê ne bes bû
Xemmazî di merteba ceres bû

Xanî ji bilî van hêmanên mûsikî, behsa hin meqamên mûsikî wekî; Îraqî, Ewc, Rast, Huseynî, Gerdan, Rehawî, Uşşaq, Şu’be, Geweşt, Hîcaz, Şehnaz, Zengûl, Buzurg, Kûçek û Newa kiriye.

ENCAM

Me bi giştî di binê sê sernavan de li mijara xwe kola. Di beşa muqeyseyê de me pênc epîzotên destanê ji xwe re esas girtin. Di van epîzotan de me ji nêz ve dît ku hem di navbera varyantên folklorî ên destanê de hem jî di navbera van varyantên folklorî û *Mem û Zîna Xanî* de, digel hevbeşiyên esasî, cudahiyên kûr jî hebûn. Bi taybetî di epîzota *Mekan û Satuya Civakî ya Mem û Zînê* de, ev cudahî bêtir berbiçav bû. Digel ku di navbera varyantan de hin cudahî hebûn jî; der bareyê mekanê lehengan de, bi giranî me dît ku *Muxurzemîn*, *Muxrubzemîn* an jî *Mixrib*, *Mixribiyan* wekî mekanekî/welatekî hevbeş ji bo Memê Alan derkete pêş me. (Di hin varyantan de ev wekî Yemen jî derbas dibû). Wekî ku me di destpêkê de jî li ser peyva *Muxrubzemîn* şîroveya xwe kiribû; ev der wekî welatekî xeyalî û li gorî kevneşopa dêrîn a destanên berê derdikeve pêş me. Wekî ku dîrokzan Herodot jî dibêje; berî ku şerê Troyê biqewime, têkiliyên di navbera Rojava û Rojhelat de, bi tenê bi rengê qîzrevandinê tezahur dikir. Li gorî Herodot, di bingeha navên *asia* û *europa* de jî ev bûyerên qîzrevandinê hene.

Ji ber ku di Destana Memê Alan de ev termînolojiya dêrîn hatiye bikaranîn, yanî Mem bi tenê wekî presekî *rojavayî* hatiye nasandin, (wateya etîmolojîk a navê *Muxurzemîn* an jî *Mixribiyan*; welatê rojava ye) divê em destanê di vê çarçoveya fireh a kevneşopa dêrîn a mirovahiyê de binirxînin. Her wiha belavbûna destaneke wilo dêrîn a li ser xaka miletê kurd; nîşan dide ku di demeke dîroka kevnar de, miletê kurd serkêşiya vê dualîtiya parsenga şahristaniyê kiriye. Çawa ku di demekê de ev parseng di navbera fenîke û yûnaniyan de, di navbera pers û yûnaniyan de, di navbera misir û romiyan de teşkil kiribû, di demekê de jî di navbera medî û yûnaniyan de ev parseng tezahur kiribû.

Ji alî statuya civakî ya lehengan ve, me dît ku bi giranî di statuya *Zînê* de hîç guherîn nîn bû. Lê digel ku di navbera hemî varyantên Memê Alan ên folklorî de jî ji bo Mem hevbeşiyê aşkera hebû -ku wî temsîla çîna esîlzadeyan dikir; di *Mem û Zîna Xanî* de ji vî alî ve cudahiyeke derket pêş me. Mem dîsa jî dikaribû ji qatên jor ên civakê bihatina hesabandin, lewma ew kurê “debîrê dîwanê” bû lê li hember Mîrê Botan, statuya wî ne wekî varyantên folklorî bû. Yanî ew ne lawê mîran an jî padîşahan bû. Ev yek jî cudahiyeke girîng bû, di navbera varyantên folklorî û *Mem û Zîna Xanî* de.

Rengê hevdîtina lehengan, di hemî varyantên folklorî de bi renegke hevpar derket pêş me ku; sê perî an jî melek ku di postê sê kevok an jî sê qumriyan de, bi renekî derasa Memê Alan û Zîna Zêdan tînin cem hev. Ji aliyê varyantên folklorî ve li gorî vê epîzotê hevbeşiyekê hebû lê di *Mem û Zîna Xanî* de cudahiyeke berbiçav derket pêş me. Li gorî Xanî, Mem û Zîn, di rojê Cejna Newrozê de ku hingê wekî festîval dihate pîrozkirin, hev dibînin û evîndarê hev dibin. Ev rewş ji aliyê varyantên folklorî ve li kevnarbûna destanê dikare bê şîrovekirin û ji bo *Mem û Zîna Xanî* jî îfadeya realîzekirina hin prosesên destanê li gorî şertên demê ye. Di vê prosesa hevdîtina lehengan de, hem ji bo varyantên folklorî û hem jî ji bo *Mem û Zîna Xanî*, gustîlik bihevguhartinê evîndaran, wekî hevbeşiyekê derkete pêş me.

Yek ji hevbeşiyên sereke; epîzota nêçîrê û epîzota setrencê bû. Ev hevbeşî bi renekî wilo berbelav bûn ku, di hemî varyantan de û di *Mem û Zîna Xanî* de, bi heman rengî derketin pêş me. Em dikarin bibêjin ku, bi ihtîmaleke mezin ev epîzot, di dirûvê herî kevnar ên destanê de jî hebûne.

Rengê mirina Mem û Zînê, hem di varyantên folklorî de hem jî di *Mem û Zîna Xanî* de, kêr zêde bi renekî hevbeş derket pêş me. Mirina Mem a li zindanê û li dû wî mirina Zînê, di hemî varyantên folklorî û *Mem û Zîna Xanî* de, ji bilî hin nuansan, bi giranî wekhev bû.

Ji aliyê karakterên destanê ve, tevliheviyeke berbiçav hebû. Ji bilî Mem, Zîn û Beko, hema bêje di hemî varyantan û *Mem û Zîna Xanî* de navên karakterên di guherîne. Hem di mijara navê Mîr de, hem jî di mijara navê Qeretajdîn de û hem jî di hin karakterên di yên destanê de wekî Sitî, Bengîn, Gurgîn; me hem di navbera varyantên folklorî de hem jî di navbera ev varyantên folklorî û *Mem û Zîna Xanî* de cudahiyên girîng dîtin. Lê hevbeşiya li ser navê Mem, Zîn û Beko nîşanê me da ku, ev her sê leheng, temsîla dînamîkên esas ên destanê dikin û her wiha lehengên herî kevnar ên destanê ne ku, dûre daxilî destanê nebûne. Ev yek ji bo tesbîta halê herî kevnar ê destanê, nîşaneyekê girîng bû.

Di beşa avahîsaziya motîfê de, me ji nêz de dît ku, hem Memê Alana folklorî û hem jî *Mem û Zîna Xanî*, di warê motîfan de gelekî dewlemend bûn. Me xebata xwe bi giranî li ser nozdeh motîfên (19) hevbeş kir. Lê ev nayê wê wateyê ku, destan bi tenê ji van motîfan muteşekîl e. Bêguman bi xebateke berfirehtir, hejmara van motîfan wê zêdetir bibe.

Di xebata motîfan de, me cardî nuqtayên cuda û hevbeş ên destanê tesbît kirin. Di tesbîta motîfan de, em li wî şertî negeriyên ku motîf di hemî varyantên folklorî û *Mem*

û *Zîna Xanî* de mewcûd bin. Lê motîfên ku me tesbît kirine, bi giranî di hin varyantên folklorî û *Mem û Zîna Xanî* de bi regekî hevbeş hebûn.

Di vê beşê de bi taybetî ji aliyê motîfên mîtolojîk ve, me dewlemendiya Memê Alan û *Mem û Zîna Xanî* ji nêz ve tesbît kir. Ev taybetmendî yek ji nîşaneyên kevnarbûna destanê bû.

Ji aliyê tesbît û tehlîla motîfan ve, me dît ku Memê Alana folklorî û *Mem û Zîna Xanî*, zêde ji hev dûr neketine. Lewma motîfên ku me dît, bi giranî hevbeş bûn. Lê di formên wan de hin cudahiyên piçûk pêk hatibûn. Wekî motîfa Xocê Xizir an jî Motîfa hîleyê û hwd.

Her wiha me di vê beşê de, muqayeseyê ne bi tenê di navbera Memê Alana folklorî û *Mem û Zîna Xanî* de kir. Me her motîfê, pêşî bi giştî di nava folklorê de nirxand, dûre di Destana Memê Alan de tesbîta wan kir û herî dawî di *Mem û Zîna Xanî* de bi çî rengî derketibe pêş me, me ew tesbît kir. Her wiha me ji destan û çîrokên civaka kurd jî û ji destanên sereke yên cîhanê jî mînak da. Me di vê muqayeseya berfireh de dît ku, Memê Alan, ji aliyê forma zargotinî ve û bi avahîsaziya xwe ya motîfî, bi rihetî bi destanên herî mezin ên cîhanê re dikare bê muqayesekirin.

Di beşa dawîn de, me ji alî hin hêmanên çanda maddî-manewî ya civaka kurdan ve li *Mem û Zîna Xanî* kola. Ev hêmanên çandî, wekî hêmanên dînî-bawerî, şîn û şahî, kevneşopa hekîmiya gel, muzîk û lîstikên gelêrî û hwd. bûn. Di vê beşê de me ji nêzîk ve dît ku, Xanî di heqê dîn û baweriyên kevnar ên milletê kurd de agahiyên girîng dane û ev bawerî bi regekî zîrek raxistine pêş çavên me. Bi taybetî di hin derên *Mem û Zîna* de, balkişandina ser dînê berê yê milletê kurd, zerduştiyê, zîrekî û neteweperweriya wî nîşanî me dide.

Di vê beşê de, ya girîng ew bû ku, Xanî çanda şîn û şahiyê ya civaka kurd, bi regekî zindî û pir reng daye. Ji vê yekê, em gihastin wê baweriyê ku Xanî, çavdêrekî zanyar ê çanda civaka kurd bûye. Wî her prosesên şîn û şahiyên civaka kurd, bi regekî ku bi tenê çavdêrekî folklorê dikare bide, daye. Dema ku me bala xwe da rengê pîrozbahiyên Cejna Newrozê, me dît ku, Xanî girîngiya vê cejna kevnar a di nava civaka kurd de û wateya wê ya wê demê, bi regekî objektîf daye. Heta ev di radeyeke wilo da ye ku, mirov bi nêrîna xwe ya îroyin tînegihê ku, di dewreke wilo de, çawa ev cejn bi rengê ku Xanî nîşan daye, di dirûvê festîvaleke hemdem de, hatiye pîrozkirin. Em gihastin wê baweriyê ku, bi vî rengî li ser Cejna Newrozê rawestîna Xanî, di warê neteweperweriya wî de nîşaneyê girîng e.

Di vê beşê de, taybetmendiyeke dî ya girîng ew bû ku, Xanî bi taybetî di daweta Tacdîn û Sityê de û di şîna li dû mirina Mem û Zînê de, resmekî pir girîng a civaka wê demê kêşaye û bi rêya berhemeke wilo, ew mayenede kiriye. Xanî bi taybetî ji evîndarbûna hev a lehengan heya bi qîzxwestinê, ji qîzxwestinê heya mehrbirînê, ji mehrbirînê heya merasîma dawetê û di navê de di heqê kevneşopa şoşbîniyê de agahiyên girîng dane. Bêguman di van beşan de me şahidî li xwarin û vexwarinên wê demê, firaq û çîniyên wê demê, reqs û govendên ku wê demê di dawetan de dihatin îcrakirin, kir. Heman tiştî me di beşa şîna li dû mirina Mem û Zînê de jî dît. Me ji nêz ve dît ku, çawa ku îro civaka kurd li dû miriyên xwe sê roj û sê şevan şînê dîkin, di wê demê de jî bi heman rengî bûye. Her wiha lixwekirina cilên reş ya gel ya di şînan de, xwendina mersiyeyan li dû miriyan, îro jî bi heman rengî didome.

Bi giştî hem ji bo Memê Alana folklorî û hem jî ji bo *Mem û Zîna* Xanî, em gihaştin vê encamê ku, ev destan di nava çanda zargotinî ya milletê kurd de cihekî pir bi qîmet digire. Lewre, hem di warê avahîsaziya destanan de hem jî di warê bûyina nasname ya destanên bi vî rengî ji bo miletan de; Destana Memê Alan û *Mem û Zîna* Xanî, xwedî taybetmendiyan pir hêja ne ku me ev taybetmendî di dirêjahiya vê tezê de dane.

Her çendî ku di vî warî de xebatên bi vî rengî zêde nehatibin kirin jî, digel ku me di warê rûniştandina termînolojiyê de hin zehmetiyan kişand jî; dema ku me bi cesaret xwe li ser vê mijarê xwar kir me dît ku, ev destan di her warê zanyariya folklorê de, bi rihetî dikare bibe mijara lêkolînên zanistî ku dê pêş de li ser folklorê bêsêrî û bêdawî ya milletê kurd bîn kirin.

ÇAVKANÎ

- Acıpayamlı, Orhan: *Halk Bilimi Terimler Sözlüğü*, Ankara Üniversitesi, Ankara, 2010
- Akyol, Hilmi: *Çîrokên Mala Zalê*, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Amedê, Diyarbakır, 2006
- Albayrak, Nurettin: *Halk Edebiyatı Sözlüğü*, Weşanên Kapı, İstanbul, 2010
- Allison, Christine: *Yezidi Sözlü Kültürü*, Weş. Avesta, İstanbul, 2007
- Alptekin, Berat Ali: *Halk Hikayelerinin Motif Yapısı*, Weşanên Akçağ, Ankara, 1997
- Artun, Erman: *Türk Halk Bilimi*, Weşanên Kitabevi, İstanbul, 2005
- Aslan, Ensar: *Halk Hikayeleri İnceleme Yöntemleri, Yaralı Mahmut Hikayesi Üzerine Bir İnceleme*, Weşanên Dicle Üniversitesi, D. Bakır, 1990
- Aslan, Ensar: *Çıldırılı Aşık Şenlik*, Weşanên Dicle Üniversitesi Eğitim Fakültesi, Diyarbakır, 2001
- Aslan, Ensar: *Türk Halk Edebiyatı*, Weşanên Maya Akademi, Ankara, 2008
- Attar, Feridüddin: *Mantıku't Tayr*, Wer. Ayhan Yıldırım, Weşanên Ataç, İstanbul, 2010
- Avesta: *Zerduştilerin Kutsal Metinleri*, Wer. Fahriye Adsay-İbrahim Bingöl, Weşanên Avesta, İstanbul, 2012
- Bayezîdî, Mela Mehmûd: *Adat û Rusûmatnameê Ekradiyê*, Lêkolîn Jan Dost, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2010
- Bedlîsî, Şerefxanê. *Şerefname*, Wer. Ziya Avcı, Weşanên Avesta, İstanbul, 2007
- Bilgin, Sıraç: *Yazatlar ve Homa, Aryan Mitolojisi*, Weş. Doz, İstanbul, 1996
- Binbir Gece Masalları*: Wer. Alim Şerif Onaran, YKY, İstanbul, 2001
- Boratav, Pertev Naili: *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, İstanbul, 1982
- Boratav, Pertev Naili: *100 Soruda Türk Folkloru*, K. Kitaplığı, İstanbul, 2003
- Boratav, Pertev Naili: *Halk Hikayeleri ve Halk Hikayeciliği*, Weşanên Adam, İstanbul, 1989
- Celîl, Celîlê- Celîl, Ordîxanê: *Zargotina Kurdan I. II.*
- Celîl, Ordîxanê: *Kürt Kahramanlık Destanı Dımdım*, Wer. İbrahim Kale, Weşanên Avesta, İstanbul, 2001

- Ciwan, Murad: *Ehmedê Xanî- Jiyân, berhem û bîr û baweriyên wî*, Weşanên Doz, İstanbul, 1997
- Çobanoğlu, Özkul: *Halk Bilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, Weşanên Akçağ, Ankara, 1999
- Dost, Jan: *Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Şîrove û Kurdiya Îro*, Weşanên Avesta, İstanbul, 2010
- Eberhard, Wolfram: *Güneydoğu Anadolu'dan Aşk Hikayeleri*, Wer. Müfide Kocaoğlan Van Der Hoeven, Weşanên TDK, Ankara, 2002
- Elçin, Şükrü: *Halk Edebiyatı Araştırmaları I. II.*, Ankara
- Elçin, Şükrü: *Halk Edebiyatına Giriş*, Weşanên Akçağ, Ankara, 1993
- Elçin, Şükrü: *Kerem ile Aslı Hikayesi*, Weşanên Akçağ, Ankara, 2000
- Eliade, Mircea: *Mitlerin Özellikleri*, Wer. S. Rıfat, Weşanên Simavi, İstanbul, 2001
- Erhat, Azra: *Mitoloji Sözlüğü*, Weşanên Remzi Kitabevi, İstanbul, 1993
- Eyüboğlu, İsmet Zeki: *Bütün Yönleri ile Anadolu İnançları*, Weşanên Koza, İstanbul, 1974
- Farqînî, Zana: *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2005
- Farqînî, Zana: *Türkçe-Kürtçe Sözlük*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2000, Stenbol
- Gilgamêş û Çend Mythosên Din*, Wer. Kawa Nemir, Weşanên Jiyana Rewşen, İstanbul, 2000
- Günay, Umay: *Türkiye'de Aşık Tarzı Şiir Geleneği ve Rüya Motifi*, Weşanên Akçağ, Ankara, 1999
- Günay, Umay: *Folklor Mahsullerinin Tabiatı, Milletlerarası Türkoloji Kongresi*, Tebliğler, C. II. İstanbul, 1999
- Gündoğar, Sinan: *Kürt Masalları*, Weşanên Evrensel Basım Yayın, İstanbul, 2007
- Güzel, Abdurrahman-Torun, Ali: *Türk Halk Edebiyatı El Kitabı*, Weş. Akçağ, Ç. 3., Ankara, 2005
- Îbrahîm, Şukriye Resûl: *Edebî Folklorî Kurdî*, Weş. Zankoya Selehedîn, Hewlêr, 1984
- İlaydın, Hikmet: *Makaleler*, Weşanên Aydın Kitabevi, Ankara, 1999
- Kadioğlu, İdris: *Diyarbakırlı Ahmedî Yusuf u Züleyha*, Weş. Dicle Üniversitesi, 2005

- Kaya, Doğan: *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*, Weş. Akçağ, Ankara, 2007
- Kayan, M. Zahir: *Rewşen-Name*, Rpl. 80-92, Avrêl, İstanbul, 2003
- Kızıl, Hayreddin, *Diyarbakır ve Çevresindeki Dini Anlayışta Mitolojik Unsurların Etkisi*, ” Ankara Üniversitesi, Doktora Tezi, Ankara, 2010
- Kurdo, Qanatê: *Mem û Zîn, Duwanzde Varyant*, Weşanên Roja Nû, Stockholm, 1996
- Köprülü, M. Fuad: *Edebiyat Araştırmaları*, Weşanên Ötüken, İstanbul, 1989
- Lescot, Roger. *Memê Alan*, Weşanên Avesta, İstanbul, 1997
- Levi-Stratus, Claude: *Din ve Büyü*, Wer. A. Güngören, Weşanên Yol, Ankara, 1993
- Örnek, Sedat Veysi: *Türk Halk bilimi*, Weşanên Kültür Bakanlığı, Ankara, 2000
- Parıltı, Abidin: *Dengbêjler Sözüün Yazgısı*, Weşanên İthaki, İstanbul, 2006
- Pertew, Ramazan: *Zarok û Çîrok*, Weşanên Doz, İstanbul, 2009
- Pertev, Ramazan, *Notên Dersên Wêjeya Gel, Zanîngeha Mardîn Artuklu*, 2012-2013
- Propp, Vlademir: *Masalın Biçimbilimi*, Wer. Mehmet Rifat, Sema Rifat, Weşanên BFS, İstanbul, 1985
- Propp, Vlademir: *Folklor, Teori ve Tarih*, Wer. Necdet Hagil, Gülen Ofset, İstanbul, 1998
- Resul, İzeddin Mistefa: *Bir Şair, Düşünür ve Mutasavvıf Olarak Ehmedê Xanî ve Mem û Zîn*, Wer. Kadri Yıldırım, Weşanên Avesta, İstanbul, 2007
- Resûl, İzedîn Mistefa *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, Weşanxaneyê Aras, ç.3., Hewlêr
- Sadinî, Xalid: *Feqiyê Teyran*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2011
- Said, Edward: *Hümanizm ve Demokratik Eleştiri*, Kîtabxaneyê Agora, Çapa I., İstnabul, 2005
- Sakaoğlu, Saim: *Gümüşhane Masalları Metin Toplama ve Tahlil*, Ankara, 1973
- Sakaoğlu, Saim: *Masal Araştırmaları*, Weşanên Akçağ, İstanbul, 1999
- Seyidoğlu, Bilge: *Mitoloji Üzerine Araştırmalar*, Weşanên Atatürk Üniversitesi, Erzurum, 1992

Sezer, Abdulbasit, *Murathan Mungan ve Halk Bilimi*, Weşanên Maya Akademi, Ankara, 2010

Şenesen, Okuşluk, Refiye: *Şahmeran Lokman Hekim ve Adana Efsaneleri*, Weşanên YKY, İstanbul, 2000

Taraporewala, Irach J. I: *Zerdüşt Dini-Zerdüşt'ün Gathaları Üç Unutulmuş Din: Mitraizm, Maniheizm, Mazdakizm*, Wer., Nice Damar, Weşanên Avesta, İstanbul, 2002,

Teyran, Feqiyê: *Şêxê Sen'aniya*, Amd. Celîlê Celîl, Instituta Kurdzaniyê, Wîen, 2003

Tezcan, Mahmut: *Kültürel Antropoloji*, Weşanên Kültür Bakanlığı, Ankara, 1997

Thompson, Stith: *Motif Index of Folk Literature*, Weşanên Indiana University, 1955-1958

Tükmen, Fikret: *Tahir ile Zühre*, Weşanên Kültür ve Turizm Bakanlığı, Ankara, 1983

Uluslararası Ehmedê Xanî Sempozyomu, Diyarbakır Büyük Şehir Belediyesi, Diyarbakır, 2008

Uzun, Mehmed: *Dengbêjlerim*, Weşanên İthaki, İstanbul, 2008

Xoşnaw, Nerîman Ebdula-Ebdula, Îdrîs: *Kurdolocî*, çapxaneyê Rojhelat, ç.6., Hewlêr, 2010

Yıldırım, Dursun: *Sözlü Kültür ve Folklor Kavramları Üzerine Düşünceler*, Türk bitîği, Weşanên Akçağ, Ankara, 1998

Yıldırım, Kadri: *Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Çevîrî ve Kavramsal Tahlili*, Weşanên Avesta, İstanbul, 2010

Yıldırım, Kadri: *Ehmedê Xanî'nin Fikir Dünyası*, Ehmedê Xanî'yi Anlatmak ve Yaşatmak Projesi, Ağrı, 2011

Yıldırım, Nimet: *İran Mitolojisi*, Weşanên Pinhan, İstanbul, 2012

Zekî Beg, Mehmed Emîn: *Dîroka Kurd û Kurdistan*, Wer. Ziya Avcı, Weş. Avesta, Stenbol, 2002

Zinar, Zeynelabidîn: *Di Çanda Kurdî De 37 Şaxên Zanistiyê*, Weşanên Pencînar, Stockholm, 2009